*JI JINA AZAD RE*
*ROJNIVÎSA ŞEHÎD ROZA SEMSÛR*

Cihê Çapê: Maatbaya Azadî
Dîroka Çapê:Havîna 2018’an

Weşanên Komîteya Xebatên Şehîdan A PKK’ê

Li Şûna Pêşekiyê

Me weke Komîteya Xebatên Şehîdan A PKK'ê rojnivîsên hevala Şehîd Roza Semsûr ku ji aliyê Navenda Çapemeniya YJA Star'ê ve di Çileya 2015'an de bi Tirkî hatine weşandin, wergerand Kurdî (Kurmancî) û diweşînin. Derbara hevala Roza û rojnivîsên wê de Navenda Çapemeniya YJA Starê kurt jî be nirxandin-pêşekiyek kiriye. Lê dîsa jî eger em bi yek hevokê bînin ziman, demereke bihêz a hunera şoreşgerî di berhemên (bi taybetî helbest) hevala Şehîd Roza de dîtin mimkûn e. Nivîsên din jî ne kêmtir in... Em pêşekiya Navenda Çapemeniya YJA Starê (ya ji bo pirtûka Tirkî) weke bûyî pêşkeş dikin.

"*Hevala Roza hevalek ku nû gava xwe avêtiye nav têkoşîna şoreşê û bi lez pratîze bûye. Nû dest pê kiriye ku xwe nas bike, şoreşê, rastiya Kurd, xweşikî û bedewiyên ku ev têkoşîn di hinava xwe de dihewîne û aliyên nakok ên rastiya me kişf bike. Em bi qasî ku van nakokî û pevçûnên wê yên navxweyî dibînin, îdîaya wê ya di têkoşîna şoreşê de jî dibînin.*

*Xwediyê îdîa û israr e, keçeke ciwan a xwediyê lêkolîn e Roza; jîr û hêza wê ya watedanê mezin e. Hevalek ku pirsên wê, bersivên wê heyî ye. Dibe ku temenê wê têrê nekir, bersivên pirsên xwe peyda bike. Lê temenê wê, têrê kir ku bersivên pirsên me di hindurê xwe hilgire. Di temenê xwe yê ciwan de gelek tiştên li ser milîtanî, lêgerînê, îrade, azadî û li ser îdiaya xwe û israra xwe, coşa xwe ya jiyanê û hezkirina xwe, li ser nirxên têkoşîna sosyalîst hilgirt. Em dizanin, eger jiyan bikira dê bibûya yek ji milîtanên bi hêz a tevgera azadiya jinê.*

*Di jiyana xwe ya çiya de gelek tişt bi cih kiriye û pir kêfa wê ji van çiyan re hatiye, aliyên xwe yên bicoş û zarok li cem xwe hildigire tîne ziman. Bi gotina wê bi xwe, rêwîtiya "Rozê" tîne ziman.*

*Daxwaza herî mezin a hevala Roza Semsûr ji hevalan ew e ku heval jî rêwitiya wê û tiştên ku wê di vê şoreşê de jiyan kirine bixwînin û*

*bizanin û hemû heval tiştên jiyan kirine di nava vê dîrokê de bi cih bikin.*

*Ew di rojnivîsa xwe de, nivîsandinê, wate dayîna tiştên tên jiyankirin û bi awayê nivîs di nav rêzikan de bi cih kirinê de bi me dide hezkirin. Bi me re mêzekirina li jiyana gerîla ya jineke ciwan a xwediyê îdîa û bi xwe bawer dike û tiştên ji vê mêzekirinê digihîjin ser kaxizê parve dike.*

*Baweriya me heye, hemû heval dema rêwîtî û meşa şoreşê ya Rozê dişopînin dê dersên mezin derxin û careke din pê serbilind bibin ku ew jî li gel hevalên weke wê, parçeyek ji heman dozê ne.*

*Em jî pir pê serbilind in ku em van rojnivîsan bi we re parve dikin û yek ji tiştê ku wê herî zêde jê hez dikir, wesiyeta wê tînin cih.”*

**Rozaya Me**
**Ax Roza...**
**Birîna Dilê Me Ya Nayê Kewandin**
**Ji Bo Rozaya Me, Roza Ya Min...**

Di vê dema ku em jiyan dikin de, mirovahiya roja me ku di rêya şaş ya di dema borî de hatiye ceribandin dimeşe, her şaşitiya ku îro hewl tê dan bê rastkirin ji me parçeyekî qut dike û dibe.

Şidlên wêrek ên îro, bi awayekî bêberjewendî dest bi vê meşê kirine.

Vaye em neçar man, tenê di pey yên ku di vê dema trajîk de berwext çûyîne temaşe bikin. Ev şahidiya ku gelekî kêm kes pê diwêrin, ji bo me jî tê maneya êşên mirov nikare xwe jê bide aliyekî. Li pêşberê tevlîheviya bi plan ku ji demên qedîm heya bi roja me hatiye pêkanîn, bûn kesên bi tendirustî, bi giştî ji bo mirovên li cîhanê, bi taybetî jî li coxrafyaya Kudistanê, ji bo me tê wateya xewn û xeyala li pişta çiyayê Qafê.

Divê em felsefeya jiyanê ya çaryek sed sala dawî ji derveyê vê bigirin. Ne mimkun e ku em dema em niha tê de jiyan dikin bi awayekî zelal şîrove bikin. Ji ber vê yekê, divê em vê rastiyê ti car paşguh nekin ku bendekeyên rast di mêjiyên mezin de tên avakirin, pêşeroj bi vî awayî diyar dibe, herî kêm xwe bi xwe rizgar kirin tenê yek ji tiştên baş ku bê kirin e.

Di vê dîroka ku zekaya analîtîk bahozan radike de, hê jî em dikarin pir hestewar bin. Bêyî ku em dest bidin aliyên erênî yên hestewariyê, eger hebe gotinek ku em ji aliyê dijber ve bînin ziman ew jî ev e; divê em bizanibin ku hesabê atoman jî hatiye girtin û ketiye di bin berjewendiya sîsarkan de, rewşa me ya niha berê avê dide vî aşî. Vaye, tam jî di vê kêliyê de em hatine qonexeke biryar stendinê. Yan em ê bê alî bimînin, xewa xwe ya hezar salan bidomînin –îhtimaleke din em ê her tiştî bibînin bi awayekî felç, li tiştên tên jiyankirin mêze bikin û êş bikişînin- yan jî em ê bi ber bayê van tilîliyên asê yên vê govenda tê gerandin bikevin û vê jiyana genî bûyî şermezar bikin, hilweşînin.

Ma em ê karibin tam vê gavê wêrekiya ku bersiva vê pirsê bidin, nîşan bidin? Ma em ê karibin ewirên xwe ji awayên şaş ên dema borî bidin aliyekî, bi wêrekî bidin ser rastiya îro tê jiyankirin, jiyana hatiye dorpêçkirin a sîstema siyasî ya di roja me de? Ma em ê karibin bêjin 'heya bi vê derê' û li pêşberê vê rewşa heya bi îro berdewam kiriye, eşkere qîr bidin ku "ji vê bi şûnde dinya weke bihuştê bibe." Em di serdema qraltiya zanist-zanîn ji rê hatiye derxistin de jiyan dikin. Aliyekî me xwerû û saf e, em ne lîstokvanên vê leyistokê ne. Me di dilê xwe de bendereke paqij a keştiyan hiştiye û wê diparêzin, bi hêviya ku dê rojekê zarokên egîd ên dîrokê bizivirin. Ji bo ku ji keriyê wawikên li me hêwirîne, ji sasirkên êdî nizm difirin û keriyên zêde bûne yên gornebaşan re qîr bidin ku hê zarokên paqij ên vê erdnîgariyê gotinên xwe yên dawî nekirine.

Rêwîtiya zarokên Toros ber bi Zagrosê dest pê dike...

Hê dema em pir biçûk bûn, li ser hebûna gerdûnê xeyalên me yên bêguneh hebûn. Di nava lêyistokên me yên zarokatiyê de hê me ti leyistokên zor û zehmet nedîtibû. Wê demê em mezin nebibûn û hê cîhan gemarî negirtibû. Piştre?...

Piştre tûfan e, piştre bahoz e, deryaya kirêtiyê ye, war û cihê wawikan e, serdema dînazoran e. Bi rastî piştî wê ti tişt tine; çîçeka jiyanê, behra hêviyan di temenê xwe yê panzdeyan de diçilmise, hişk û req dibe diçe. Ew roj ev roj e, ji her xeyala humanîst re bi xwînê berdêl tê diyarkirin.

Di binê potînên şaristaniya ku wî bi xwe diyarî mirovahiyê kiriye de gelê min ê ku neçarî şer hatiye kirin ê dostê aştiyê eciqandin ne leyistokeke çarenûsê ye. Weke keç û kurên wî yên ku ji bo wî xwe feda dikin. Û em dizanin ev diyalektîka biêş xwe dispêre beriya hezaran sal.

Her çendî hê nehatiye bibinxistin jî, bi zanebûna ku me di çaryek sed sala dawî de pê xwe amade kiriye em ê dawî li vê dubendiyê bînin. Baş e, bi berdêlên giran be jî Pira Siratê ya tinebûnê li pey me ma. Ya ku em ê bikin aliyê îxanetê yê di nav van axan de serî dide hetahetayî tinekirin e.

Vaye dê wê demê li bexçeyên xwezayî yên gul û çîçekên rengîn, zarokên te yên nûgihaştî bimeşin. Yên bi navê Rûken, Brûsk, Roza...

Ya ji vê bi şûnde dê hestewar be... Ji ber ku tiştên li Kurdistana sed sala bîst û yekê tên jiyankirin, çîrokek ku ji aliyê mirovekî/ê ve îfadekirina wê di maneya hestewar û trajedî de zehmet e digire dest. Li ser şehîdên me yên ku lehengên vê çîrokê ne nivîsandin, anîn ziman, tenê paragrafek jî be karekî pir zehmet e. Ji ber wê sedemê mirov ji kû derê dest pê bike, di mêjiyê mirov de hejandin pêk tên. Dîsa ji ber wê yekê em di hindurê xwe de bêdeng in, em hewl didin fêrî bi êşên xwe re jiyankirinê bibin. Tiştên 22'ê Cotmeha 2011'yan de hatine jiyankirin bandorên ti car jê neçin li ser psîkolojiya me kirin. Di şevekê de ji me qutkirina 36 mirovên xweşik ên cîhanê em ê ti car qebûl nekin.

Pirê kaniyeke sih û şeş çavî ye, xwîn diherike ji her çaviyê!

Li ser rondikên ku me ji bo bîst û heşt birînên me yên li Bêzarê rijandine, sih û şeş kaniyên xwînê zêde bûne, deryaya ku me ji rondikan û xwînê daye hev, dê bibin sedema rabûna tûfana hêrsê, dê bi serê xwînxarên ku bûne bela serê me de biteqe.

Me di wê sir û seqama zivistanê de li wê mala xwe ya germ, di wan şevên tarî de stran digot. Ma ew xwîşk û birayên ew stran digotin dê careke din wisa li hev rûnîn? Roza, ma tu dizanî, piştî çûyîna te ew çûkên şîn ku li ser têlên telefonê datanîn êdî stran nabêjin. Ji bo xatirê wan rojên ku me li quntarên Toros silkên şekir kom dikir, bizivire û were Roza!

Jînenîgariya Rozaya me: Li ser erdên ku Toros û Firat dikevin zikhev, dilê şaristaniya Komageneyê ne, di sala 1989'an di nav malbateke ji heşt xwîşk û birayan pêk tê weke endama şeşemîn a malbatê tê dinyayê Roza. Heya bi temenê xwe yê şeşan bi Tirkî nizane. Li gel me Kurmanciya ku gelek hevalan dide bişirandin a Semsûr-Mereş hakim e. Di şeş saliya xwe de dest bi seretayî dike û jîrbûna wê ji aliyê mamosteyên wê ve tê ziman. Lê Roza piştî ku seretayî xelas dike, naxwîne, ji ber ku şenseke wê ya wisa tine ye, dibistan tine. Piştî ku du sê-sal dimîne, derbasî Stenbolê dibe. Her çendî hin caran bê Semsûrê jî ev seredan ji çend rojan derbas nabin.

Di Gulana 2009'an de tevlî gerîla dibe.

Taybetmendiyên diyar ên Rozaya me: Ji bo Rozayê xwezayîbûn girîng bû, çi dibû bila bibûna, bi tiştekî şiklî yan jî dişibe wê bihesiya,

têrê dikir ku ji wî tiştî nefret bike. Dîsa, taybetmendiyeke wê ya din; dixwaze bila ji bo jiyanê be, dixwaze bila ji bo mirov bi xwe be eger jiyaneke ji rêzê bihata jiyankirin ecêb gunehê xwe pê dianî. Li gorî Roza, diviyabû jiyan bi cidî bihata zanîn û di her kêliya û reftariya jiyanê de li gorî pîvanên jiyanê bihata jiyankirin, ti dema bihata wendakirin tine bû. Dîrokek qerase ku mirov ji dema borî fêr bûya û pêşerojek ku mirov li ber ronahiya wê ronî bikira hebû. Ji ber vê yekê fêrbûn û xwe perwerdekirin ji her tiştî girîngtir bû. Ya din jî di jiyana civakî de ji bo jinê xeyalên cuda dikir. Lêgerînên wê yên wisa hebûn; li gel pênc-şeş jinan bi hev re jiyana xwe diyar bikin, bêyî ku muxtacî ti kesî bibin derbara pêşeroja xwe de ew bi xwe biryar bistînin, li gel hev li malekê jiyan bikin. Ev xeyala xwe di temenên zarokatiya xwe de jî dianî ziman û bawer im li çiyê ev pêk anî.

Her çendî Roza xwediyê sîstematîkeke fikrî ya zêde analîtîk bû jî ewqas jî hestewar bû. Roza li dijî bi her awayî fêrbûnên ku di jiyanê de maneyeke wan tine bûn, bû.

Hefteyekê piştî 22’ê Cotmehê dema ku min li wê erda sar a Meletî termên nêzîkî deh jê jin bîst û çar hevalan dît, ez pê qaneh bûm ku ti mana û armanca hebûna me tine ye, her çi tiştê aîdî mirov be hewce ye di agirekî mezin de bê şewitandin.

Piştî meha Gulan 2009’an me cara yekemîn li wê derê Roza ya xwe dîtibû, lê belê me nedikarî nas bikin! Me nedikarî parçeyeke ji canê xwe ji xwîna xwe nas bikin... Hemû tiştê hatiye jiyankirin li aliyekî, gotinên heyî nikarin psîkolojiya ku ev rewş bi mirov re bi pêş dikeve bînin ziman.

Li ser erdên Kurdistanê, xwîşkek ji hembêza birayekê hate spartin axê...! Ka tu bêje jiyan yên ku berwext diçin çima evqas xweşik in?

Vegere û were Roza...

Çavê me li rêya te man di saeta 8’ê êvara 18’ê Gulana 2009’an de... Em wisa man sekinî... Bi hesreta dilê xwe.

Yên ji cem me berwext çûyîne, di dilê me de hesteke nîvçe dihêlin. Bûyerên di dema borî de bi bîranîn, ji ber ku nikare rewşa pêk hatiye biguhere em tîmî bi hesta tewanbariyê dihesin, heya ku em jî rojekê

weke wan her tiştî li pey xwe bihêlin û biçin, yanî her tişt li ser kêliyan e. Li bende dimînî ku dawî li her tiştî were û neletê lê tînî.

Piştî Pirê sonda me ew e, em xeyalên wan pêk bînin. Heya em bi wan re hev dibînin...!

Nêzîkî du meh piştî 22'ê Cotmehê termê Roza ji aliyê malbata hevala Şîlan Ergün ve hatiye stendin û li Wan/Erdîşê hatibû spartin axê. Piştî testên ji Erdîşê hatibû wergirtin li gundê Aşağıdağlıca yê giredayî navçeya Gergera ser bi Semsûrê ve hatibû spartin axê. Ji ber vê yekê bû gerîlaya destpêkê ku termê wê hatibû anîn van axan. Dîsa, bû şehîda destpêkê ya jin a navçeya Gergerê.

Birayê wê
Şoreş Semsûr



Nasnav: **ROZA SEMSÛR**
Nav û Paşnav: **SUNA ÖZDEMİR**
Dîrok û Cihê Jidayikbûnê: **01.10.1989/Semsûr**
Navê Dayikê: **Besê**
Navê Bav: **Mehmûd**
Dîrok û Cihê Tevlîbûnê**: 19.05.2009/Stenbol**
Dîrok û Cihê Şehadetê: **22-23'ê Cotmeha 2011'an/Geliyê Tiyarê**

**Ji Hevalên Çapemeniyê Re**

Piştî kêliya ku min tehma jiyana gerîla kir, nivîsandin jî ji bo min bû nefes stendinekê. Eger ez rojekê bi layiqî xwe bigihînim wê şensa gihaştina asta şehadetê, ji hevalên min ên heja daxwaza min ew e ku nivîsên min bi misogerî bên gihandin malbata min. Di şert û mercên me de rojnivîs weke gelek qîmetên me bi xetereya wendabûnê re rû bi rû ne. Ji ber vê yekê qopîkirin û hilgirtina wan a saxlemiyê girîng e.

Min ji beriya vê du rojnivîs nivîsandin. Bi vê re dibe ya sêyemîn. Ya destpêkê li çapemeniya Xakûrkê ye, ya duyemîn jî li çapemeniya Zagrosê ye. Ev, ya sêyemîn e nizanim çi lê bikim. Ez dixwazim vê jî

bişînim çapemeniyê lê ji ber ku ez bi xwe nikarim biçim, fikar û tirsa min ew e dibe ku wenda be. Xweziya ew şensa min a qopîkirinê hebûya. Ez nizanim ka ew rojnivîsa ku min di nîvenga pratîka borî de şandibû gihaştiye yan na. Yanî weke tê fêmkirin tenê ya ji min re maye ‘hêvîkirin e’. Em mêze bikin ka ez ê biryara çi bistînim.

Dîsa li çapemeniya PAJK’ê gelek nivîs û helbestên min hene. Hêviya min ew e ji hevalan, ev hemû werin berhefkirin û arşîvkirin û eger heja be, pirtûkek bê çêkirin. Bila li ser qepaxa wê xwezaya şîna şîn û ax, çîçekên renga reng, ji dûr ve li asoyên çiyayên ez pir jê hez dikim ên grî ên bi heybet ezmanekî keska kesk hebe, bila bi lêdana tîrêjên despêkê yên rojê li çîçekan bi awayê wêneyekî bê dawî, ev dîmen xelas bibe. Bila navê pirtûkê Ji Jina Azad Re be û li ser qepaxê weke roja hiltê be. Bi çekên xwe, gerîlayên jin rûnîştî bin. Xeyala rastiya ku dixwazim pêk bê ev e.

Dîsa jî hevalên min ên heja dizanin.

Silavên bê dawî ji bo Roja Min Rêbertiyê

Gerîlaya YJA-STARÊ
Roza Semsûr

# ROJNIVÎSA YEKEMÎN

# ESTÊRÎK

## Estêrîk

Bila navê vê rojnivîsê Estêrîk be. Gelo yên bixwînin dê biecibînin? Dibe ku ti kes nikaribe bixwîne...

**“Du tav li ezman nabin” (Sema Yüce)**

Nivîsandin; şahid e
Nivîsandin; dîrok e
Nivîsandin; zanebûn e
Nivîsandin; exlaq e
Nivîsandin; wate ye
Nivîsandin; îdeolojî ye
Nivîsandin; bibîranîn e
Tiştên hatine jiyîn nerizandin e.

Binivîsin da ku bi dîroka şaş, bawerî û îdeolojiyên şaş mêjiyên we neyê dagirkirin. Timî divê yên dixwazin heqîqetê jiyan bikin, binivîsin.

**Li çiyan**

Îro di dilê min de êşek heye, dilê min zîz e. Hersa min mezin dibe. Dibe oqyanûseke mezin, diherike nava dîrokê hesab dipirse. Dilê min ji bo hezkirin û xweşikiyên bê hempa amade ye. Ber bi afirandinên nû tê dehfdan.

Piştî jiyana qerebelix a bajaran li zîrveyên çiyan ên bê deng û aram im. Em, bi zehmetiya sir û seqama ku hebûna me tîne bîra me li pey lihevparvekirinê û heqîqetê ne. Gelo ez dilê xwe vekim, bi hezkirina ji azadiyê bifore?

**12’ê Gulana 2009’an**
**Arê**

**Rûpeleke nû**

Min doh ji bo jiyana xwe rûpeleke nipûnû vekir, weke xwezaya demsala biharê zindî dibe, paqij û çalak e. Dema terka wê cîhana hatiye gemarîkirin, wî bajarî gemarî didim, hestên pir cuda û azadiyê pir zêde hîs dikim. Weke girtiyekî/e ji qeyd û bendên xwe rizgar bibe...

Jiyana me weke labîrentekê ye. Weke kolaneke neder, em bêyî ku bisekinin di nav de digerin û her digerin. Û dema em rojekê zîrekiya jê derketinê nîşan didin, em dimînin heyirî. Em fêm dikin ku jiyaneke cuda jî hebûye, mimkun bûye ku mirov ji tinebûyina xwe, xwe rizgar bike û xwe bigihîne gelek tiştan. Bi şiklekî bi heybet daxwaza afirandinê di zanebûnê de ber bi çav dibe. Weke ku serbixwebûnê ji her aliyî ve ruhê min amade kiribe, bi wê heybetê, weke ku laşê min ji qeyd û bendên xwe rizgar bûyîbe. Xwebûna min a ku dîrokê heya bi dawiyê dîl girtiye, di nava matmayîna xwe afirandinê de ye, lê ev hê ne xwebûn e jî. Em ji qeyd û bendên me û xwebûna me dorpêç dikin rizgar dibin. Azadî, zanebûna me dorpêç dike.

Ji bo ku mirov ji qeyd û bendan rizgar bibe, çalekiyeke lêpirsîner, lêkolîner, wêrek û xwediyê zanebûn şert e.

Her tim wê fikara ku ez ê vê rûpela paqij a hatiye vekirin qirêj bikim, hêvî û xeyala min ew e, afirandina herî xweşik, herî watedar û ya herî mezin pêk bînim...

Û dibêjim;

Ji bo derketinên bi hêz, qutbûnên esasî hewce ne.

**20'ê Gulana 2009'an**

**Xewn**

Îro di wê rêya min pir dixwest bimeşim de me, di nav xewna te de me. Ji bo karibim bibim keça azad a xewna te ya xweşik ku ji ber berdêla wê tu mehkumê esareteke mezin bûyî, dibezim.

Ax ev gihaştin, min carekê xwe gihandiba çiyê, min karîbûya dawî li nediyariyên dilê xwe bînim; karîbûya nefeseke herî paqij bistînim. Gava xwe digihînim xwebûna xwe, karibim bibim layiqê te û vê dozê; di rêya ku te vekiriye de bi têkoşîneke herî mezin bimeşim.

Ji Roja Mezin a hebûna min ku dilê min germ dike re hezkirinên bê dawî...

**25'ê Gulana 2009'an**

**Li dibistana PKK'ê**

Li wî cihî me ku min dixwest li wê derê bim. Gihaştim cil û bergên ku min xeyala wan dikir û hevalên min li cem min in. Xeyala wê tiştek bûye, ew jiyankirin tiştekî pir cuda bûye. Li dibistana PKK'ê jiyana xwe bi navê Roza didomînim. Gelo ez ê karibim bibim endameke PKK'ê? Hêvî dikim hêza min a watedanê têrê bike.

**02'yê Hezîrana 2009'an**

**Bi xatirê we**

Belê, niha li ser bingeha ku ez ê berê xwe bidim Zagros, diçim biryargehê. Jînda, Viyan, Yildiz û Dorşîn li cem min in. Ji Arê û wan hevalên xweşik veqetîm. Gelo em ê bi wan jinên xweşik ve careke din hev bibînin? Kî dizane...

Ji Xakûrkê û hemû hevalên min li pey xwe hiştiye re bi xatirê we.

**15'ê Adara 2010'an**

**Diçim şer**

Em di nava nediyarî, bêçareserî û li bendemayineke hetahetayî de ne. Milîsan ji Xakûrkê em girtin û saet nêzîkî dehê şevê ye, di şeveke tarî de em di araziyeke biyanî de bûn. Yên hewce ye em bigirtana deng li me bikirana, me jî bersiv bidana û bi rê biketana. Lê qurye nehat û bû şeva destpêkê ya zehmet ku min di bin baranê de derbas kiriye. Em pênc hevalên jin bûn. Me fikar û tirseke mirineke vala û ketine destê dijmin jiyan kir. Baş bû me ev fikar derbas kir. Milîsan sibeyê agahî dayine. Em ji cadeyê girtin. Em niha li ser rêya Zagros li Adilbeg in. Li vê derê em ê du rojan bimînin û paşê meşa xwe bidomînin. Min ji hevalên rêveberiya Zagros hevalê Reşîd li vê derê li ser rêyê nas kir, jixwe hevala Zaxo nas dikim.

Îro dê starta Newrozê ji Geverê bê dayîn, ax çi xweş e...

Li Çarçelayê jî hevalan çalakî li dar xistiye, belê ez diçim şer gula min, pir kêfxweş im û hêvî dikim ez bibim layiq.

**17'ê Adara 2010'an**

**Kelecan**

Deftera min a heja, ma dizanî ez gihaştim cihê xwe. Erdnîgariyeke wisa ye, xweşikiyeke nayê tarîfkirin e... Em piştî meşeke dirêj a heşt saetan gihaştin biryargehê. Heval Zaxo û Armanc li wê derê bûn. Hevalên jin ên tev bi coş û xuroş... Ev du roj in ez li vê derê me. Heval bi me re axifîn, diçim geliyê Zapê. Ji bo min qadeke nû ye, ez jî nû me. Bi şens im, ji ber ku hevalên çar-pênc salên wan tije dibin jî hê nû nû tên vê qadê. Bawer im mirov şensa xwe bi xwe diafirîne. Hêviya min ew e, ez ê layiqê vê roja xweşik û serbilind bim.

Hê min behsa sir û seqama vê derê ya ku mirov dicemidîne nekir. Timî kişif digere. Dengên obus û hewanan kêm nabe. Li rojhilat qereqola Oramarê heye. Divê em quralan pir bi dîqet pêk bînin. Bataniyên me kêm in, bi şevan ji sir û seqamê em dilerizin. Ji sermeya em xwe bi hev du ve dijdînin. Têhna laşê me hevaltiya me xurtir dike. Bi kelecan li benda pêşerojê me. Ez pir ji van çiyan hez dikim...

**23'ê Adara 2010'an**

**Hêvî**

Hezkirinên me xwe li tariya şevan didan. Ji bo ku sibe tariyê ronî bike, da ku rengê berbangê hilgire... Me hêviyên herî azad di bexçeyên herî berhemdar ên dilê xwe de çand, da ku zîl bidin û şîn bên. Me li beramberê pêlên hovitiyê şer kir... Ji bo zaroktiya herî xwerû me dem dizî. Dema em bi vê zarokatiyê mezin bûn, me bi vê zarokatiyê soz da heyv û stêrkan. Em ê îxanetî daxwaz û xeyalên xwe nekin...

**Adara 2010'an**

**Tepeyê Kaleyê**

Çend sal, çend meh, çend roj derbas bûn. Mirovên vê erdnîgariya xweş hatin qirkirin, hatin surgînkirin. Li ser erdên herî berhemdar feqîrtiya herî dirinde jiyan kir. Jê re tê gotin cîhanek, jê re tê gotin gerdûnek, jê re tê gotin şerê hebûneke azad. Ka dibêjin mirov ji ber hizira xwe mirov e, îro mirov ji ber hizira xwe di asta zindiyê herî bi xetere de ye. Bila Xweda û Xwedavend bên bibînin, îro sahneyên vî şerê bi heybet ku li filîmên herî yekemîn derbas dikin.

Em li çiyayên aza yên Kurdistanê ku landika dîrokê ne. Erdên Kurdistanê deryayeke wisa ye; ji Êzîdiyan, Keldaniyan, Ermeniyan heya bi Yahudiyan hemû qawîman di hinava xwe de hildigire. Îro em ne tenê şerê serkeftina gelekî dimeşînin, yê ku em dimeşînin şerê serkeftina nirxên dîrokî ye. Ev têkoşîneke biesil û serbilind e. Îradeyê diceribîne, exlaqê bi cih dike, wijdan tîne bîra mirov, mirov dike hebûna herî birûmet, weke dayika xwe be digihîje xwezayê. Jinên Kurdistanê bi van hestan şer dikin.

Vê gavê em li girekî ne. Dijmin ji tirsê xwe diavêje ber bextê teknîkê. Bi çekên herî pêşketî yên weke qobre, obus, hawan, termal, tirsa herî mezin dijî. Kêfa min pir ji hevalên min ên jin û çiyan re tê, evîndara wan im. Ev evîneke wisa ye, ji aliyekî ve tirsa layiqnebûnê, min dorpêç dike; ji aliyê din ve dilê min tije bi kelecan dike û dicoşim.

Belê, niha li wî cihê timî ez dixwazim biçimê, li girê Kale me. Pir girekî stratejîk e. Li beramberê me Cîlo, aliyê me yê rastê Çarçela, aliyê me yê çepê Garê û Geliyê Zapê, li başur jî Gerdiya heye.

Li tepeyê Şehîd Gafûr jî dijmin heye. Me bi şevê ronahî û serê sibe jî agirê wan dît. Hevala Viyan, Rozerîn, Sema û Roza tepeçî ne. Li beramberê dijmin bûn pir hesteke cuda ye.

Bi qasî ku me kêmekê ji beriya niha guhdar kiriye, li Bakur operasyoneke mezin dest pê kiriye. Îsal dê bibe saleke zor û zehmet ku şerekî mirin û mayînê bê meşandin. Em ber bi encamekê ve diçin. Ez bi hemû zanebûna xwe li ser esasê ku ez ê vê têkoşînê bimeşînim soz didim zarokên xweşik ên pêşerojê, ku ev doza pîroz a PKK'ê dê bi ser bikeve.

**27'ê Adara 2010'an**

## Berf û îrade

Gavekê biavêjim aliyê din ê sînor, ez ê derbasî Bakur bim. Em li ser sînor in, em pêdiviya xwe ya avê ji Bakur tînin. Ma bi sînorên çêkirî dikare welatek bê parçekirin? Çendî rebenokî ye…

Doh salvegera şehadeta fermandarê mezin hevalê Egîd bû. Kedkarê mezin ê şerê vî sînorî, afirînerê guleya destpêkê, afirînerê guleya şeref û

rumetê… Bi rêz û hezkirineke mezin wî bi bîr tînim. Gerîla, bi sîstema konfederal xeta me ya azadiyê hê jî saxlemtir dike. Ji bo vê pêvajoyê, ji bo vî şerî pêngavên weke yên we hewce ye.

Doh bi şevê me heya bi 12:00 nobed girt. Dema ji cihê nobedê zivirîm dest pê kir berf bibare. Nebêjin ma dawiyê Adarê, ev çi berf e. Li van girên bilind ên bêhna azadiyê jê tê, berf, xwîn, zehmetî, îrade, bûye beşek ji laşê me. Xwarina me stêrik e, çaya me ji ava berfê ye, kuçikê me ji tenekê ye, em cihê rûniştina xwe ji daran çêdikin. Em di şikeftê de xew dikin, kîsên xewê yên zirav em bi kar tînin û ji ber sermaya hişk em pir diqerisin. Lê ruxmî her tiştî em hevaltiya herî baş û jiyana herî watedar em li van deran diafirînin. Em her kêliyê bi mane û bi fêmkirinê jiyan dikin.

**28'ê Adara 2010'an**
**Geliyê Zapê/Tepeyê Kale**

**Hêrs**

Ji nişka ve ji dîrokê hesab tê xwestin
Roj, gerdûnê germ dike
Bi awayekî herî zelal û herî germ
Berevajiya hemû dagirkeran…
ji ber bêdeng kirinê
Dema ez bûn jineke ciwan
Ku hatiye asta dawî ya eczbûnê
Bi hêrsekî pir mezin nehlet lê tînim û didim der,
Di kûrahiya dilê min de qiyamet radibe
Em neçar in dîrokê ji xewa wê ya neletî şiyar bikin.

**4'ê Nîsana 2010'an**

**Bendewarî**

Nebêje "ev jî çi ye" û nemîne heyirî. Navê wê rojnivîs e, nabe ku di rojekê de mirov du caran binivîse, min efû bike, ji demeke dirêj e pê de mijarek ku ez dixwazim binivîsim, her talox dikim û tiralî dikim heye.

Çawa dikare bê vegotin, gelo çawa dikarim vebêjim? Ma pênûsa min, tiştê dilê min, kûraniya ku min xwe gihandiyê bide der? Ma hûn dikarin bêjin di demek ku hin kesayetî hê jî li bendê ne, em dikarin kîjan şerî bi ser bixin? Di vê têkoşîna bi şeref de gelek tişt di zikhev de ne. Navê wê têkoşîn e, her tişt têkoşîn e.

Weke zarokekî/ê ji peravên Îmraliyê ber bi welatê rojê li ser navê afirandina pêşerojeke azad, bi exlaq, bi wijdan û watedar mirovek nû ji dayik dibe. Ji bo kêliyekê pênûsa min disekine. Dihizirim, ya ta li nîvenga eniya min gelo ne tav be!

Rêberê min, eger tu ji dayik nebûya, ma em li ser van çiyayên me yên xweşik ku gelek tiştên sîstemê hatiye derbaskirin, hewl tê dayîn ku sîstema konfederal bê bicihkirin, dibûn? Ma em ji vê hevaltiya te ya bêhempa ya di navbera cinsan de agahdar dibûn? Ev jiyan di berdêla her tiştî de ye, nefes û bêhnek ku herî nehatiye jiyankirin, herî bêriya wê tê kirin, tê xeyalkirin e. Bila hemû pêşeroj û paşeroj vê demê bihesûde. Çarê Nîsanê hişyarbûna xwezayê, banga gerdûnê ye. Bi ser de jî weke şoreşgerekê di nav xewna vê rasteqîniya te afirandiye de bûyîn... Dibe ku hemû pêşeroj bûna şoreşgera/ê vê demê bihesûde, vaye te bi awayekî mezin û xurt pêşkeş kir. Te got, “layiqê vê bibin”. Vayê dem dema wê ye, derfet heye ku mirov mohra xwe li dîrokê bide, hem jî bi awayekî herî zelal û herî serbilind.

Şoreşgerî, gerîlatî li erdnîgariya Kurdistanê tiştê herî pîroz e. Li Mezopatamyayê, li Zagrosê roja ji dayikbûnê pîroz dikim. Her çendî nebihîzî jî ez qîr didim. Her çendî nebînî jî weke te dikir, xeyal dikim. Ji dilê xwe ber bi Îmraliyê kevokeke hezkirinê difirînim. Dizanim kêfa te ji kevokan re tê. Kevokên ku bi baskê xwe hêviya aştiyê hildigirin. Soz didim rojekê dê hemû Kurdistan, Amara tije bi kevokan bibe, ez dibêjim, milîtanî ew e ku ji bo rastiyê, ji pîvan û rêgezan tawîz nedayîn û di her şert û mercê de ev bi serxistin e… Felsefe, bi awayekî azad û xwezayî li jiyanê mêzekirin û her wisa mane afirandin û bê bendewarî jiyan kirin e…

**4’ê Nîsana 2010’an**

**Geliyê Zapê**

**4’ê Nîsanê**

Me doh 4’ê Nîsanê pîroz kir. Hevalan pasta çêkiribûn. Ji ber ku hêjmara me kêm bû, me nekarî ‘taburcu’ çêbikin. Ev du roj in em dahûrandinên Rêbertiyê temaşe dikin. Em vê gavê CD’ya 15’ê Tebaxê temaşe dikin. Em ê di çarçoveya ku min diyar kiriye de pir baş nîqaş bikin.

**5’ê Nîsana 2010’an**

**Milîtanî**

Silav ji te re deftera min a xweşik. Ji beriya vê du saet, Dr. Bahoz Erdal berpirsiyarê giştî yê berê yê HPG’ê, ji hevalên Cîlo û Geliyê Zapê re civîneke manedar li dar xist. Hevalên Cîlo hemû ne amade bûn, nîvê hevalan li hindur in. Naveroka civîna me, pêvajo, sekna me û tiştên ji me tê hêvîkirin bû. Bêyî ku vê diyar bikim ez ê derbas nebim, min cara destpêkê hevalê Bahoz li şervanên nû dît. Ez pir zêde bêhna wan mezinên me yên ewirên watedar diavêjin derdora xwe, bêhna gundiyên min ên ruh paqij ên nijadê Aloman jê dikim. Pir sempatîk û hanekbaz e, xwediyê uslûbek ku cih û demê bi axaftina xwe re yek dike û sekneke fermandarekî leşkerî ye. Ev civîn qederekê erênî bû. Jixwe pir ji van civînan hez dikim. Dema ku hin caran tiştên ez difikirim wisa li wê derê tê ziman kêfxweş û bextewar dibim û jê piştrast dibim, baweriya xwe ya bi xwe qat bi qat zêde dikim.

Çiya cuda ye mirov her kêliyê ji her tiştî agahdar nabe. Her tişt dûrî mirov e û ev jî ji bo kes dibe sedema pêşketinên cuda. Tiştê herî zêde jê ditirsim ew e ku di vê pêvajoya pratîkî ya giran de nikaribim binivîsim. Dibe ku di pratîkeke baş û serkeftî de vê qebûl bikim. Lê hedefa min ew e her duyan bi hev re bimeşînim. Ev li Roza, li navê milîtanekê tê: Milîtanî…

Pir bi kelecan im. Diçim Bakur, di navbera me û Botanê de tenê geliyek heye. Bi wê derê re, bi Zapê re, bi Cîlo re, bi her deverê re têkiliya me heye. Çiqas tiştekî baş e, ma ne wisa ye?

Ka bizanin ez fêrî çi bûm? Rêbertî hewl dide ji bîst salan e vir de li vê derê binkeyên gerîla yên mayende bide çêkirin. Û em îro ji bo ku vê

armanca xweşik, xewna xweşik pêk bînin li vê derê ne. Baweriya min heye em bi ser bikevin. Ji bo şervanên Rêbertiyê serkeftin...

Du roj beriya vê li tepeyê Elîşêr bûm. Dinya ecêb sar e. Tehtên wisa derketin li pêşberê me nayê vegotin, tê jiyankirin. Me sohbetên îdeolojîk ên erênî jî kirin. Em du hevalên jin û sê xort bûn. Bi zêhniyeteke nû, li ser navê pêşerojê di nav jiyana PKK'ê de, di jiyaneke herî biwatedar de, dijmin dişopînin û gav bi gav ber bi jiyaneke nû ve diçin.

Di vê meşa pîroz de cangiraniya hevalan, rêkûpekî û disîplîna wan tê nîqaşkirin. Di tabûra Gerdiya de hin tişt hatine jiyankirin, werhasil, jixwe li ser tê axifîn. Gelek tiştên bên nivîsîn hene. Bawer bike dema min tine, divê xelas bikim, hevala Dilar dibêje, "bû mijara raporê…"

**9'ê Nîsana 2010'an**

**Li Çiya Gerîla**

Vê gavê baraneke xweş dibare dest pê kiriye. Jixwe her der herî ye, hema bêje em gaveke bi pêş de du gav paşde diçin. Tebî paşê tavek derdikeve. Ji nişka ve hemû zehmetî tên jibîrkirin. Çikîna bêhnê dema mirov dide arwazan, çongên te yên diêşin û laşê te yê di sir û seqama hemû şevê de nerazaye, her tişt tê jibîrkirin. Eger piştî baraneke xweş lê dike tavek weke senîkek zêrîn diteyise derkeve, têkoşîn serbilindî ye. Em di nava têkoşîneke wisa de ne, ne zehmetiyên fîzîkî, valahiyên fikrî di mêjiyên me yên ji bo guherînê amade ne de texrîbatên nayên jibîrkirin diafirînin. Ji aliyekî ve nêzîkbûn û ferasetên bê zanebûn û rebenokî, ji aliyekî ve jî hevaltiyên herî bêhempa, tiştên tên parvekirin, hevalên zor û zehmetî dikişînin. Weke hevala min porzer û dilxweş, heval Sema. Ji beriya demeke kurt min ew nas kir lê ji wê hez kir. Weke zarokekê paqij e. Emoş, porên wê, te tînin bîra min. Ya din jî dosta Roza ku îxanet nake, cudabûn heye di vê roja dîrokî de.

Hevalên mayîne yên Cîlo diçin. Hevala Bêrîvan ji Xakûrkê hatibû, hevaleke pir xweş e. Ji wê jî cuda dibim, weke kesên ji wan cuda bûme. Hevalê Bahoz ji bo hevalên Geliyê Zapê civîneke din jî li dar xist û çû. Di merasîmê de ne amade bûm. Ji ber ku min nobeda girtiyekî/ê dîgirt.

Ev tevgereke gerdûnî ye, di nav vê şoreşa biesil de. Ji bo wan pir xembar dibim. Vaye texrîbatên civakî ku sîstemê ew afirandine. Mafa ti kesî tine ye vê cîhana xweşik bixe vê rewşê. Em ê vê baş fêrî wan mêjiyên kevinarî bikin.

Hevalê Dara zû zû banî min dike. Hemû ponijîna min firiya. Ez berpirsiyara lojîstîkê me û ew jî îro xwarinpêj e. (Bila ev mijar li aliyekî bimîne. Hevalê Bahoz got, “her tim binivîsin!” Li tesadufê binêre, min civîna ji beriya rojekê nivîsandibû. Pir şabûm. Hê tiştekî din jî got, li ser cudabûna ku min kêliyekê ji beriya vê jiyan kirî bû: “di nava PKK’ê de vesazî û guherîn her gavê dibe.” Hêza me ya Cîlo ji ber barana zêde nikare biçe. Agahiya wê hat. Vê gavê hevala Sozdar xwe avetiye mangeyê. Pir jê hez dikim. Çavên wê pir manedar in, em baş hev fêm dikin, belê em jiyan dikin.

**10’ê Nîsana 2010’an**

**Herî û Gerîla**

Barana dîn û har bûyî, ji ewrên ji hilmê pêk hatine xwe berdaye xwarê da ku erdê hembêz bike. Tov li ber zîldanê ne. Lingên kedkar ên gerîla weke bi xwezayê re yek bibin di nava heriyê de ne. Dema bi heriyê şa dibin dişemitin, em bi vî awayî rêyeke dûr û dirêj dimeşin. Cil û laşê me yê ku zêdetir bi pênc rengan renga reng bûne; ma hûn qet têra xwe bi axê re bûn yek? Ma we tehma li gel hev jiyankirina bi axê re kiriye? Em di keştiya biesl a hebûna xwe de, li benderan in. Dipirsim, ma hûn li kû derê ne? Ma hûn bi mêjî û laşê xwe yê ku sîsteman weke qeşa lê kiriye, li bajarên qerebelix ên bi avahiyên çîmento bilind bûne, di nava sermestiya asîmîlebûnê de ne?

**Nîsana 2010’an**

**Heval**

Ji vê derê re dibêjin Bakur. Em vê gavê gerîlayên Bakur in, ji bo mercên vê derê em xwe amade dikin. Me doh nuxteya xwe guhert. Li jêra tepeyê kelheyê (Kale) ye, cihekî hêrî stratejîk e. Tepeyê bê girtin jî

tepeyê çeteyan e. Êdî heya ku bolîka vê derê bê, em ê mêze bikin. Em ji wê dola tije herî weke tê gotin gavekê bi pêşve û du gavan paşve, derketin.

Belê hevalno, zarokên xweşik ên Kurdistanê û mirovên pêşerojê, dixwazim ji bo we binivîsim. Dixwazim hûn bizanin ev erdnîgarî di rojekê de çend demsalan di zikhev de jiyan dikin… Serê sibeyê wê sir û seqama ku lingên mirov dicemidîne. Ev tehtên bi heybet û bilind ên Zagros ku gerîla bi wan gavên xwe yên pîroz bihost bi bihost lê geriyaye, ji berfê spî bûne. Ber bi nîvro bi taveke har û dîn ku mirov disincirîne ve em rû bi rû dimînin. Piştre hemû aso ji aliyê ewrên xembariyê belav dikin ve tê dagirtin. Û weke li cudabûnê enirîbe baraneke xweş lê dike. Cil û bergên me weke rengê heriyê lê tên. Piştre baran weke keçên dişibin biharê, dorê didin zîpikê. Cil û bergên me yên dema ter dibin li ber bayê req dibin, piştre cil û bergên me yên ku me li ber dumanê hişk kirine û tev bûne herî, bi laşê me ve dizeliqin û bi min îlegalîteyeke giran didin hîskirin. Li erdnîgariyeke tije av, rêya saetekê dûr em ji bo avê dimeşin. Li ser erdên me yên dewlemend ên petrolê em li ber agirên qedexe, xwe germ dikin. Di xwezaya me ya rengareng de weke merasîma miriyekî be em bi rengê grî, kesk û tarî dibin. Stranên bi bêdengiya goristanan dibêjin. Dema çeka me hevala me ya herî girêdayî be, em li ser erda xwe dîlgirtî û qeçax jiyan dikin. Vaye hêrsa dilê me, îradeya me wisa mezin dibe, dibe ji pola. Em wisa dimeşin tehtên bilind ên weke devê şûran in. Ev, weke mîlada dostaniya gerdûnî bin zehmetî dostaniya me bi hêz dikin.

Heval! Vaye ev navê me hemûyan e. Qet nebêjin ma navê her kesî dibe yek nav! Li cem me her kes heval e. Pir kêfa min ji çiya û hevalan re tê. Em li ser welatê xwe bûn penaber: Pengizîna çar aliyan, weke Cuhiyên dîasporayê. Belê, di van bexçeyên bê dawî yên xwezayê de aliyên me yên bêzanebûn, kevneşopî, zeyif û lewaz jî hene. Em ji vê re dibêjin têkoşîna herî mezin a herî zehmet ya hindurîn. Alternatîfa wê jî ew e, jiyanek ku zehniyet bên guherîn û bi azadî pêk bê. Jiyan, jiyana me li ser fedakarî, samîmiyet, dirustî, hezkirin, radîqaliya rêxistinî û ya herî girîng jî li ser zemîneke mirovane ye. Çeka herî mezin a Rêbertiyê heza wî ya empatiyê bû. Hin caran li gel me ev pir zeyif dibe, ev rewş li

ser dilê min dibe birîn. Hestên min gur û geş dibin, hinekê bi zanebûnê dikewin di mêjiyê min de bi şiklê hêrs û kîn, di dilê min de weke hest, di çavê min de weke rondik xwe didin der. Eger ez hinekê jidil bim; rondikên êdî narijin, bi hêrs û kîn, bi girêdana serkeftin û guherînê, dizivire hewldan û kedê.

Roza divê çalaktir bî, êdî li Bakur î, Viyan jî wisa ye… Temam, hemû hevalên kevn in, xwediyê tecrûbe û ezmûnên jiyanê ne. Ked dayîne, ya herî girîng jiyan kirine. Rêzdar im û qîmeteke mezin didimê. Û ji bo ku ya herî wêrek pêk bînim, fêm bikim, bi xwestekeke mezin xwedî lê derdikevim, hewl didim, kedê didimê. Ev demek e çavdêrî jî dikim. Ruxmî ku nû me, ne xwediyê tecrube me, difikirim ku baş tevlî dibim. Hema bêje li gel wan weke hev im. Lê hin caran di feraseta me ya mirov de nêzîkbûnên ji nişka ve tên guherîn, em ne di ferqê de ne derdikevin holê. Mirov qira xwe bîne jî, hezar carî bêyî û biçî lojîstîkê jî, çalak û bi plan jî bî nêrînên ji bo te naguherin. Ew nêrîn tabû ye. Dibe ku weke dixwazin bibînin lê mêze dikin. Ji ber ku em nû ne, dixwazin rastiyên xwe li ser me ferz bikin. Dixwazin van şidlên nû gihaştî û ciwan, keçên xweşik ên welatê min weke bixwazin bimeşînin. Lê ez Roza me, min, ji bo jiyaneke serbilind û adil, li pey xwe jineke rondikan dirêjîne, xwîşk û birayên ciwan, kesên jê hez dikim hiştin. Ji bo azadiyê… Nabe, hevala hêja, ez ne pezeke ji kerî me. Dilê min pê dişewite ku çima mirovahî empatî nake. Ji bo îqtidarperestiya rê û rêbazan xemgîn im. Hevala Bêrîtan dibêje; "Şer bike gula min, em her ku şer dikin zêde dibin û xweşik dibin."

Îro dê hevala Bêrîvan û Nûda derbasî Cîlo bin. Nûda hevaleke Rojhilatî ya ciwan e. Weke bagera çiyan xweşik e, me ji hev hez kir lê cudabûn jî ji me hez dike. Nûdaya pordirêj û esmer, meşa wê dişibe ya min. Qet çavê xwe naşkîne, pir çalak û hewldêr e. Bû sedem ku ez, di wê de xwe bibînim. Bêrîvan; ew gerîlaya ez li wê digerim, yek ji hevalên xwediyê bandor e. Gelek tişt jiyan kirine, gerîlayeke dîn û çavkaniya moralê ye. Endameke YJA-Starê ye, ji wê re jî û ji me re jî serkeftin…

**Nîsana 2010'an**

**Xweza**

Berpirsiyara lojîstîkê me, em ê îro lojîstîkê sererast bikin û ji bo êvarê kerengan sor bikin. Pir tehmxweş e, weke patatêsên di ber rûn re sorkirî ne. Bi ard de tê kirin û bi wî awayî tê sorkirin. Min serê xwe rakir, li pêşberê min Cîlo bi bûkaniya xwe ya spî wisa bi heybet e, pêwîst e hûn bibînin. Em ê jî biçin… Îro dengê balafirên şer zêde ye…

**14'ê Nîsana 2010'an**

**Îxanet**

Em li ber barana îxanetê şil bûn, ji binî ve hikma cîhanê li me hatiye birîn. Ev peyv li vê defterê nayên, îxanet ne layiqê vê jiyanê yê. Ev kesayetiyên reben, bêzabûn ne layiqê vê doza gerdûnî ne. Dema ku kesek gavekê ber bi bêbiryarbûnê ve biavêje, di pey re yeke din û piştre êdî ew xayînekî/e çiyê û têkoşînê ye. Belê, her tişt di destê mirov bi xwe de ye. Nebesiyên îdeolojik, mêjiyekî şelo... Hizirên ku ji aliyê sîstemê ve hatine parçe parçekirin, laşê ku di şert û mercên zehmet de hinciriye, morala ku di şert û mercên zehmet de kêm dibe û şikestina îradeyê, hezkirina kêm dibe, bêhêvîbûn, bêbiryarî, dudilî, fikar, pir zêde li ser kêliyê ponijîn, di vê de bi binketin û weke qonaxa dawî revîn… Dibe ku di nava salîseyan de mirov bibe her tiştî. Diyalektîka manewiyeta mirov awayê herî li pêş ê guherîn û veguherînê ye.

Kesayetiyek ku hemû hevalan pê bawer dikir, min pir kêm nas dikir ê sala 2008'an tevlî bûbû îxanet kir. Dema doh nobeda saet heştê digire heval fêm dikin ku Helgurtê ku nobeda wan digirt êdî îxanetkarek e. Reveke li ser rêya Bakur. Gelo ji mirinê tirsiya, bi awayekî ji têgîna demê bêagahî? Vê gavê ji bo nota hevdîtinê navber didimê. Çend notên hevdîtinê çêbûn, nayên xwendin. Dê pir baş be… Belê, em di navberê de ne. Du notên hevdîtinê hatin xwendin, pir berfireh e û fêrker e, nirxandina Newroz û 4'ê Nîsanê, jixwe nirxandinên li ser pêvajoyê jî hebûn. Ev 61 sal in te ji temenê xwe û kesayetiya xwe gelek tişt dan têkoşîna gelekî û têkoşîna azadiya jinê, lê em ji te fêm nakin. Mêjiyê me dişibe mencelek ku tê de dogmayên bi hezaran sal dikele. Di tabûra me de ez bûm şahida reva destpêkê, di vê dema berbangê de. Li ser

nebesiyên me difikirim, li ser berpirsiyariyên me yên li beramberê hevalên me difikirim, hêza me ya empatiyê, hêza me ya pratîzekirina vê û feraseta me ya cinsiyetperest difikirim…

Rêbertiya min, em ji bo ku mirovan qezenc bikin, têkoşîna jiyaneke mirovane ya mezin dimeşînin, hê kêm e, ne bes e. Xweziya tu li vê derê bûya, ma me ev jiyan dikirin? Bi vê destpêkê dilê min pê diêşe û rexnedana xwe didim û di heman demê de jiyan û mirovan dihizirim. Lêkolînernebûnê, takekes û civaka xafil ku nezaniyê ew tirsandine, talan kirine…

Ji bo jinê, ji bo mirovahiyeke nû, ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî Akademî şert e. Fêmkirin tiştek e, bûn xwediyê îhtimala pêkanînê tiştek e, pêkanîn tiştekî pir cuda ye. Pirsgirêka me pratîzekirin û pêkanîn e. Divê kêliyekê ji beriya kêliyekê komîn mezin bin. Li Iraqê reyên aliyê Kurd kêm bûne. Jixwe ev pirsigirêkeke polîtîkayê ye. Hilbijartina li Tirkiyeyê nêzîk dibe, werhasil, bi xatirê te…

**16’ê Nîsana 2010’an**

**Afirandin**

“Kîjan bajar me hemêz dike, kîjan derew dikare bixapîne dilê me? Kî dê li derê me bide ji bo kulmek xwê, ji bo pariyek nan yan jî ji bo evînê?”

Belê, em îlegal bûn di pergala ku sîsteman di mêjiyê mirovan de ava kiriye. Lê em di gerdûna xwe de bi şiklekî herî azad, serbixwe, xwediyê îrade ber bi pêşerojê ve dimeşin û diafirînin.

Jiyankirin hunerek e. Kesên herî kêrhatî, hewl dide, bi ser dikeve. Afirandin baweriyek e. Ya ku rastiya mîtolojiyên 5000 salan deşîfre dike, mêjî û ruh dorpêç dike hezkirina mezin e. Bi serxistin, bi nirxa kedê mezin dibe, zêde dibe, ji dilan diherike, çemeke gerdûnî ye diherike deryayan û oqyanûsan pêk tîne. Û dema dilê mirov xwe digihîne oqyanûsan, weke sîpelên azad ji bo evîna heqîqatê diherike û dilketiyên hev, bi maneya jiyanê xwe dixemilînin…

...

Em niha li ser zimanê me yê şêrîn ê Kurdî, talîmatekê dixwînin. Ji beriya kêliyekê feraseta pêşverûtiyê ya hevalên ji Başur û jiberkirin û axafîna wan a bi Tirkî ku bi hewesê bi pêş ketiye hate rexnekirin. Jixwe eger nêzîkatiya me ji zimanê me re çi be em ê wê pratîze bikin… Pir rast e, eger em di nava xwe de têkoşîna vê nemeşînin, em ê şerê kîjan çandê, kîjan xweseriyê bimeşînin? Êdî divê dema wê hatibe. Ev Tirkî min jî ecz dike. Ji dema ku ez hatime pê ve ev rewş min ecz dike û diêşîne. Lê hewldana min, daxwaza min heye. Min hinekê jî bi pêş xistiye. Baweriya min heye ez ê bi ser bikevim. Deftera min, ew rojên ku ez ê bi Kurdî binivîsim jî bên. Tu kenê xwe bi min bike û ev wêjeya Tirkî jî, ev mijara zelal e ziman dewlemendî ne. Em çendî zêde ziman zanibin, ewqas zêde awayên dewlemend ê mêzandina me, xîtaba me, rêbazên me û rê û rêbazên têkilî danîna me li gel mirovan hebe.

**17'ê Nîsana 2010'an**

**Ji bo ku zarokên birçî têr bibin**

Merhaba Kurdistan, merhaba rûpelên spî… Ez dizanim hûn xwe bi min de ecz dikin. Vaye navê vê pratîk e. Mirov ji hizirînê dûr dixe. Biqasî mirov bifikire dem peyda nakim. Eger karibe di demeke herî biçûk de bişirînekê, bîranînekê, agahiyekê bi cih bikî tu xwediyê şenseke mezin î. Ma tê bîra te Rozê, demêkê te dixwest biqasî hizirandinê tine bikî, wêrek bî. Ji ber ku dema tê nefikiriya tê êş nekişanda êdî. Ma çendî balkêş e ne wisa ye dostno, em vê gavê li dema hizirînê digerin. Saniye, deqîqe, roj, meh, sal derbas dibin û gerîla dimeşe. Jiyan ewqas dagirtî derbas dibe ku her kêlî pir cuda ye, dê careke din neyê jiyankirin, bîranîneke herî bi rumet e, her kêlî kesayetiyeke cuda ye, psîkolojiyeke mirovên cuda ye. Ewqas dewlemend e, em li lûtkeya sosyalîzmê ne…

Min pir bêriya romanan, pirtûkên zanist û agihayê kir. Xwedavendno, eger ez nexwînim ez ê bimirim, lê dem… Vaye tiştê ji bo pratîkê hewce ye û berdêla wê. Tebî, em hevsengî çêdikin. Heya bi niha teorî bû, niha jî em ê ezmûna pratîkê bidin lê çavê min ê ku têrbûn çi ye nizane, ji xwe re teoriyê kêm dibîne. Lê bi rastî jî kêm e. Zanebûn

wê bingehê pêk tîne. Yanî defter, em ê di van deman de gelek şensên zanistê ji dest bidin. Yanî em ê talox bikin, ji bo zanînê dereng bimînin. Zanîn ne tenê teorî, pratîk jî hewce dike.

Rozaya bê sebir hinekê rehet be. Tê her duyan bimeşînî. “jina bê tabû, ya nêzîkî kesayetiya azad”, hevala Berbiheyv ev di platforma min de anîbû ziman. Gotibu ku ez pir wêrek tevgeriya me û heta carekê gotibû ku wê ez hesûdîme. Dirustî…

Ev, tevgera xwe bi xwe fêmkirinê ye. Rozaya baweriya wê bi xwe mezin, xwedî bawerî û biryar. Çiqas jî ji xwe hez dikim. Keça qure û qariyerîst. Baweriya we hebe zêdetir ji çiya û Kurdistanê hez dikim; Ji jinan, ji jiyanê, ji şer, ez pir samîmî me.

Belê vê gavê em li tepeyê Çeteyan in. Tepeyê min ê seyemîn ê suprîz. Vê ez li nobeda roj a du saetî me. Ji beriya kêliyekê min bi dûrbînê kişfeke baş kir. Dijmin ecêb mewzî çêkirine. Dîmenên wan spî ne, hatine li ber sînorê Başur. Li vî tepeyê çeteyan heval dibêjin ku berê leşkerên KT disekinîn. Qereqolên kevn hema li vî gundî hatiye vala kirin ê jêra me ne. Vê gavê vîziniya meşekê bala min ber bi xwe ve kişand.

Doh piştî dersê sizmayê bi lez û bez ez, Adar, Amed û hevalê Welat em hatin tepe. Hevala Rozerîn dê bihata lê ji ber ku nexweş bû ez hatim.

Kurdistanê çar demsal di zikhev de bi me da jiyankirin. Doh em dîsa li ber tavê şewitîbûn. Lê dema em gihaştibûn tepe we halê me bidîtana, sir û seqamek ku ne kêmtirê ya Sibîryayê bû, bi avhewayeke tev baran ku li ya Stenbolê derbas dike, em şilopilo bûbûn. Rêyeke yek saetê, ya pir arwaz bi erzaqên xwe yên li pişta xwe, em derketin. Ji beriya wê piştî ku me cihê bi dar û daristan derbas kir, em di gundê pir xweşik ê Borê re derbas bûn. Vê gavê bi wî dengê xwe yê tê naskirin obus guhê mirov diteqîne. Belê, dema em li ber baranê dimeşîn, hêlîzên heya bi pişta me dihatin, rêwazên taze ku me dixwarin… Dema em di cem qereqola kevn re derbas dibûn baraneke pir xweş dibarî dest pê kiribû. Bi çeka xwe ya ku min weke zarokekê ew hemêz kiribû em bi awayekî bê deng dimeşiyan. Belê, li şûna zarokan di hemêzê me de çek hene.

Doh ne rojeke bê vegotin, rojeke bihata jiyankirin bû. Ev dijminê li Şehîd Gafûr ji bo bi rehetî binivîsim firsend neda. Ez her carê xwe xwar dikim. Deng pir nêzîk tê.

Hevala Zaxo li jêr li cem bû. Hevaleke potansiyela wê pir bi hêz e, bi heybet e, jineke mînak e. Li qada Rêbertiyê mayî ye. Li ser Partîbûnê, li ser qada Zagros civîneke nirxandinê li dar xist. Tevlî nîqaşên nota hevdîtinê bû. Ji ber pirsekê, me hewl da li ser mijara jinê ku Rêbertiyê jî digirte dest li cem hevalên xwe yên xort em nîqaşekê bimeşînin. Ne ku dîsa seknên nebes, pasîf û zêhniyetên wisa bi şiklê xwe yê kevneşop bi pêş neketin. Lê pir paş derbas bû, vaye em ê fêr bibin, em ê sîstema xwe ya konfederal ava bikin. Ew ê fêr bibin, ew ê ji wê xurûra ya rebenokî xwe bidin aliyekî, bi wê potansiyela xwe ya kuştina zilam tevî wan jinên ku timî evîndarên wan dibûn jiyaneke azad ava bikin. Çavkaniya hemû pirsgirêkên civakî, gerdûnî, mirovî, pirsgirêka cins e û têkoşîna wê ye. Vaye ew gav bi gav vê fêm dikin. Em kêlî bi kêlî diafirînin. Ji bo ku zarokên birçî bikenin, fêrî ken bibin.

Doh xweza hatibû şûstin. Ber bi êvarê taveke xweş derket, di bin vê tavê de erdnîgariyeke keska kesk heya bi asoyan berdewam dikir û komeke gerîla ber bi şer ve dimeşiya.

**24'ê Nîsana 2010'an**
**Tepeyê Çeteyan**

**Heqîqet û Tenêbûn**

Em hê li tepe ne. Em ê îro dakevin. Ez û hevala Adar, dike mêjiyê me biteqe. Nekenin lê bi vê hevala A… re zimaneke heye, nizane bisekine. Eman Xwedavenda min… divê her tişt di cih de û di demê de be, bi pîvan be. Ez gêjjj bûm. Em ê vehesîna, ew jî nebû.

**1'ê Gulanê**

1'ê Gulanê cejna karker û kedkaran e. Belê, vê sibeyê em bi 1'ê Gulanê hişyar bûn. Heya bi sibeyê weke ku kedkarek be baranê xweş lê kir. Her alî şil û pil bûye. Biharê, Nîsanê weke ku hemû ecziya xwe ji

me rake barana xwe ya dawî valayî ser me kir. Li mangayan, taximan, her kesî şalên xwe heya bi çongan kişandiye, çante û çiyê me hebe – zêde tiştek jî tine- şil û pil bûye. Sibeyê bi awayekî şil bûyî em hişyar bûn. Nasekine jî! Tebî ya diket li ser milê me kedeke mezin dayîn bû. Ax dostê me yê herî bedew agir. Pêxistina te bi darên terbûyî zehmet be jî, tu dîsa weke xelaser gihaştî hawara me. Dema em razana her çendî me pelên agir bi cihê razanê de kir jî dîsa erd weke qeşayê bû. Vaye mirovahî ev e, em şert û mercên ku kesên di nava sîstemê de yek saniye jî nikaribin xwe lê ragirin, bi hezkirina xwe ya mezin derbas dikin û xweşik dikin. Axx dostên heja, hevalên me yên hewl didin morala me xerab bikin jî ne kêm in. Lê gotina ‘heval’ pir heja ye. Pêwîst e mirov ji yên layiq nabin re nebeje. Rûyekî tehl û tirş, vaye ferasetên di jiyanê de herî zêde min didin zoriyê.

Ya din jî ev têgîna fermandariyê, hinekan ecêb dike ezez û navendperest. Terza xwe ya şexsî, bi navê rêxistinê bûye ferz dike. Grûbekê biçe Dalê, grûba din ê biçe Gelî. Min dixwest bi Sema û Rozerînê re biçim. Bawer im em ê pir bi aheng û serkeftî bibûna. Kî dizane? Ji bo min ferq nake, ez dikarim li her derê bikim; ji bo vê yekê baweriya min bi min mezin e. Bila ev mijar li vê derê bimîne em bizivirin kedê.

Hiyerarşî çi ye, hevalno? Hiyerarşiya erênî li cem me amûra ku diçe armanca ji bo jiyaneke azad û wekhev e. Her kes vê di teoriye de xweş tîne ziman. Ew felsefe ji bê kêmasî ye. Lê tevî vê seraserabûn, jiberkirina tiştan, na, tenê pirsgirêk ne ev e jî, hê berfireh û tevlîhev e. Li ser fermandariyê, bi hêviya ku ez ê di demên pêş de li ser binivîsim, niha nesekinim. Hevalênên me yên gihaştina astên bilind; hinekê temenên wan jî borî ye. Pir jî êş, zehmetî û êşkence kişandine.

Axx Roja wateyê ya dilê min, temam divê mirov karibe bi hurmet be, karibe di çarçoveya alîkarbûn, dilnizmbûn û berpirsiyarbûnê de nêzîkatî bê çêkirin. Ev tişt di asta ku nebe nabe de ne. Ev disîplînek hindurîn ku hatiye daqurtandin e. Vaye ev mirovbûn e. Lê mixabin ya tê jiyankirin cuda ye; şert û mercên zêhniyeta îqtidarperest e. Helwestên bi vî şiklî, “weke nêzîkî her kesî dibin nêzîkî min nebin, ez cuda me” sînorên tehamula min derbas dike. Eger rêgezek, pîvanek hebe li gorî

kes nayê guherîn. Ji libeke herî biçûk a xîzê bigire, heya bi galaksiyeke herî mezin a gerdûnê derbasdar û heman tişt e.

Rêbertiyê, ne têkoşîna kariyerê ya hevalên nebes, ne yên ku Wî di şikil de bi gotinê didin jiyankirin yên ku hewl didin di cewher de bidin jiyankirin qebûl kir. Em vê mijarê zelal bikin; tevger û helwestên bi rastî jî dibin zemîna. Lewçetî û ferasetên şaş, bi tundî şermezar dikim û di van nuxteytan de ji kûr ve nerehet im. Jixwe îqtidar gustîlkeke bi sêr e. Divê bi her tiştê xwe ve jiyan û hevaltiyeke xwezayî hebe, PKK ev e. Xeta Zîlan ev e, hezkirina ji jiyanê ye. Bê bendewarî…

Em bizivirin mijara xwe ya destpêkê. Mirovahiya xweşik, vaye ez di rojeke wisa de cejna we ya kedkaran a 1'ê Gulanê pîroz dikim. Ez par li kolanên Stenbolê bûm. Niha jî li Geliyê Zapê me, weke gerîlaya Bakur a YJA-Starê li bendê me, amadekarî dikim. Belê, jiyan wisa ye. Îsal li Zagros hewl didim bibim gerîlayekê. Nebêjin te ji bîr kiriye, ez ji bîr nakim. Nozde roj man ji bo salvegera hatina min. Mamoste Ümmü, Emoş, Murat, Cemo, Aysel, Bariş, Êmê û birazeya/ê min ku navê wê/î nizanim û Besê, berdiliya/ê min dayê, bavo. Bavê min ku min nekarîbûye pê re biaxifim, ji keça we ji we re silav hene. Silav ji we re kesên ez jê hez dikim. Hezar silav ji we re mirovahî, hezar silav ji te re Rêber Apo, meydana Taksîmê.

**1'ê Gulana 2010'an**

**Perwerdekirina Xwe Bi Xwe**

Belê, hejmara me temam bû. Me îro perwerdeya xweser dît. Jixwe dîsa Roza destpêk kir û ji hevalan hizirên wan ên li ser xwe wê bi xwe jî stend. Me analîzên Rêbertiyê yên pir girîng ên sala 96'an di wê pêvajoyê de bi pêşxistine xwend. Heman paradîgma ye, lê ji aliyê fêmkirinê ve evqas salên dûr û dirêj derbas dibin. Vaye dem û cih, em ji dûr ve dişopînin.

**5'ê Gulana 2010'an**

**Derketina Tepe**

Belê, weke hûn dibînin min encax kariye piştî sê rojan nivîsê temam bikim. Em li Elîşêr in. Vê gavê taveke derewîn tam di nava eniya min de lê dide. Li cem min hevala Sema, Helena hene. Rozê dîsa li tepe ye. Ji beriya vê sê rojan tevî Adarê ji bo kişfê hatibû vê derê. Lê ne rojeke asayî ya kişfê bû. Baranê piştî 1'ê Gulanê weke dîn û harbûyî erd av da û xweza şûst. Erd bi temamî şil bûbû. Em di saet sisêyan de rabûn û çûn. Heya em derketin zîrveyê em şil û pil bûn, bi ava li ser hêlizan em heya bi pişta xwe ter bûn. Mekabên me weke şûstibûn lê hatibûn, ji ber ku gorayên me şil û giran bûbûn her ji lingê me dişemitîn. Di rêya ku hevala Adar em tê re anîbûn –mirov nikare bêje rê, teht, daristan û arwazeke pir nebaş bû- bi bezînê em derketibûn. Baş e ku em di dawiyê de gihaştin. Sir û seqemek heye, dinya mij û duman e, ewr e û girtî ye. Bi başî em nikarin kişif jî bikin. Tebî dema rê xelas bû, têhna lingên min ên ter şûna xwe ji êşeke pir mezin a serê tiliyan re berda. Em pir bê tedbîr bûn û ji ber ku hevala Adar çaxmaq jî ji bîr kiribû me nekarî agir pêxin. Bi wê xurûra xwe ya mezin jî bi cîhazê têkilî çênekir û negot "em xwe berdin yan na?" Me ezmûneke şeş-heft saet a îradeyê da.

Ew fêr bûye, di sir û seqama Çarçelayê de maye. Lê ji bo min destpêk bû. Hevala Adar bi rê de ket û lingê xwe êşand. Na, ez ji bo çi ecz dibim ma hûn dizanin, me vala vala ew zehmetî kişand. Yanî neçariyek bûya û maneyeke wê hebûya "ser seran û ser çavan" ew zehmetî serbilindiya me ye. Em jî bi wê armancê derketin çiyan. Baş e, eger sebeba wê bêtedbîriya me û helwesta heval a 'ez navend û serhişkiya' wê be? Biwestim jî, ji bo tiştên din firsendê ji dest bidim jî, ji erk û wezîfeyê pir hez dikim, di çarçoveya berjewendiyên xwe de nêzîk nabim û ji hesabgiriyê neftet dikim. Ez pir ji çiyan, ji jiyan û mirovan hez dikim. Eger ne ji van ferasetan bûya min li ber her tiştî xwe ranedigirt. Min bi şevê xwe ecz nedikir û dilgiranî nedikir eger bêhna ezeziyê jê nehata.

Deftera min û gerîlayên hêviya gel, xwe baş ragirin, hevalên Çarçela bersiva dijminê hewl dida operasyon li dar bixe, da. Bist û du leşker mirin. Du hevalên ku şidlên ciwan bûn, şehîd ketin. Di rêya serbilindî û şerefê de tevlî karwana şehîdan bûn. Dijmin jî weke biserdegirtina

qereqolê daye nûçeyan. Tebî ma qet dikare rastiya xwe bêje? Wê rojê bi top, obus, hawan, qobre û hwd. bi her tiştî li Çarçelaya me ya pîroz dan. Em jî li firinê bûn wê rojê. Tevî hevala Barîn, me wêrekiyeke mezin nîşan da û şûstina serê xwe ya ku me ev meheke talox dikin di nav du deqîqeyan de li ber dengê balafirên şer me pêk anî.

Kêliyekê ji beriya niha me li ser çongan xwe berda hinekê jêrtir. Min ji bo xewê navber da. Nerazam, min xwe dirêj kir. Dengê qobre, dengê balafirên keşfê dihat. Di cih de rabûm ser xwe. Dema em dihatin hevala Helena bi rê de ket, destê wê pir ne baş şîn bûye. Heya bi êvarê êşiya. Êşa neynûkan pir xerab e. Vê gavê saet 15:35 e. Em ê di saet 16'yan de xwe berdin.

Hevala Barîn ji perwerdeya sabotajê hatiye, dê tevlî hevalên Cîlo bibe. Hevaleke xweş a ji Başûrê Biçûk [Rojava] e. Hevala Ezda bi fermandara taximê re ye. Ew jî hatin. Dibêje "vesaziya hevala Sozdar çêbûye" Axx Xwedavendê, daxwaza min ew e ku qet neçe. Yanî di turên dawî de em li benda wê ne. Dibêjin ku li qadên em ê biçinê, li ser nuxteyan zêde operasyon tên lidarxistin. Par qederekê wendahî hatiye dayîn. Bi sonda me ya girêdana me ya bi şehîdan, ez vê pratîkê weke şenseke mezin dibînim.

Dilê min tev kîn û nefret e, dixwazim tola wan bistînim û bibim layiqê wan, ji bo min ev ceribandinek e. Ji ferasetên bi şiklê 'vaye bila ez zû şehîd bikevim û hwd" bi vî awayî bi hêsanî hevalên xwe dişînin mirinê, zêde zêde nefretê dikim û wan şermezar dikim. Ma qet dikarim wisa bi hêsanî şehîd ketinê qebûl bikim? Daxwaza min ew e ku bibim şehîdeke azadiyê ya bi wate, serbilind, serkeftî û di dema wê de. Ev jî di destê min de ye, di destê te de ye, di destê me de ye. Li çiyayê Kurdistanê, li Cûdî, li Dêrsimê û Bêzarê, ji bo bîranîna rondikên dayikên me yên heja, ji bo me bînin dinyayê êş kişandine, mirineke pîroz dixwazim. Axx lê dayê, keça te dê ber bi herêmên nêzîkî Colemerg û Çelê ya ku cihê şerê germ e ve dest bi rêwîtiyê bike. Ew qadên dijmin pir jê ditirse çiqas xweşik in ma ne wisa ye? Daxwaza min ji te ew e tu bibî evîndarê baweriya min, ronahiya zindana min. Roja te ya dayikan pîroz be.

**9'ê Gulana 2010'an**

Bimeşe ber bi Dalê ve!
Min hemêz bike, hemêz bike!
Belê, vesaziya min ji bo Dalê hatiye çêkirin
Dayê jina xweşik, pir ji te hez dikim…
**10'ê Gulana 2010'an**

**Kêmas**î

Vê gavê hevalê Rêşîd endamê rêveberiya qadê û ji rêbeberiya Zapê hevalê Mehmûd li vê derê ne. Civîn hate lidarxistin. Ji ber ku xwarinpêj bûm, min nekarîbû tevlî bibim. Ji civînan re kêfa min tê, jixwe ji ber westanê ji pêvajoya siyasî dûr dimînim, nikarim radyo û hwd. guhdar bikim. Ez nikarim bixwînim jî, axx... Hevala Sozdar derbasî Cîloyê bû. Me li ser pêvajoyê, kêmasiyên min sohbet kir. Min got, ez xweşbîn im, dema borî ji bo hin tiştan bêdeng mam, qonaxa ji vê bi şûnde dê bibe lîberalîzm. Wê jî xwestiye bêje ku ez ji aliyê rêxistinî ve kêm mayî me. Dibe ku me gelek tişt jiyan nekiribe, lê nuxteyên me xwe pê de ecz kirine, mijarên ku me şaş dîtine: Pirsgirêkên kedê, kesayetiyên ku bi bêplanbûna xwe dema me xwarine jî hebûne.

Em di mijara radîqalbûn ku me nîşanî cinsa din daye de li beramberê hev nîşandanê de kêm man. Bi rastî ji bo van hemû mijaran bînim ziman, min di mêjiyê xwe de plana wê çêkiribû û li ser rêbazê hizirîbûm. Lê belê ji ber kêmasiya negirtina tekmîlan, di ser re derbas bûna demê û ji ber giraniya xebata zêde, min ji bîr kiriye. Ya din jî niyeta min a baş, fikirînên min ên ji bo neşkênandinê, mantiqeke bi şiklê, 'pir tecrûbeyên wan heye, asta wan bilind e, ez nû me û dibe ku min baş neşopandibe' diyarker bû. Bi rastî jî di demên dawiyê de ecz bûm û min qet layiqê Rozayê nedît. Hevala Sozdar fermandareke mînak ku timî di nava şervanên xwe de ye. Rêşiyên kefiyeyeke leşkerî çêdikim. Berhemeke keda destan û ronahiya çavan e. Her ku çêdikim û lê mêze dikim pir kêfxweş dibim.
**12'ê Gulana 2010'an**

**Rê**

Niha em dimeşin, li pêşberê min Cîlo û di navberê de jî Çiyayê Belkis heye. Pir bi heybet û bilind e. Hê nû bihar hatiye vê derê, em ber bi Colemêrgê, Samûra, Dalê rêwîtî dikin. Min îro tevî BKC'yê, arwazekî dirêj ê tev bi berf bi şemitînê qut kir, her kes ma heyirî.

**Keda destan ronahiya çavan**

Newalên asê
Sir û seqam û qeşa
Weke şûrê şerên giran û tuj
Li guzekên lingan dide
Ma qet tê bîra kê ku bêje ax û ox?
Çi be jî ev can û goşt e
Li ser sîdanê agirê şer hatiye kutan
Qefiyeya wê ye
Ku ji ba û bageran re meydanê dixwîne,
Qlêş, kefye û rextê wê/î
Şal û êlekê wê/î yê çil berîk,
Silaveke ji cîhanê re ye
Sembola azadiyê ya gelên mezlûm e
Hin jê diyarî ne, hin xelat in
Havîn û zivistan her lê ye
Carekê xwêhdan dide, carekê diqerise
Çi vedibêje û çawa jî li ber xwe dide
Tebaqa, çaxmaq û cixareya wê/î
Çaydanê ji teniya agir reş bûye
Çente jê re balgîf, erd bûye doşek, di berqafeke wenda ya çiyan de
Bûye jiyan, şiyar û evîn, hezar cure xweşikî û bedewiyên gerdûnê
Gora, dayikê honandiye ji liveya berxên kozê çê.
Dixwazî, benekî jê bikişîne
Avê dikişîne, ter dibe, lê îxanet nake
Di nîvê reyê de nahêle
Bi keda destê dayikê, bînahiya çavên dayikê hatiye honandin

Bi liveya berxa bi ava çiyan hatiye avdan,
Bi kerengên şîrî yên çiya, mezin bûye
Berxa ber kozê, roja ku zaye hatiye qusandin û honandin
Hin jê diyarî ne, hin xelat in

**Seyit Ahmet (Edip)**

Ez dixwazim vê helbesta xalê xwe binivîsim. Ji ber ku ev demeke dirêj e min dubare nekiriye destpêkê min tevlîhev kir, lê min piştre sererast kir. Ji vê helbestê pir hez dikim. Dema hatim çiya min maneya wê hê baştir fêm kir. Ji ber ku bi wî re heman tiştî jiyan dikim. Ka lê mêze bike, xarziya te çeka te rakiriye, di şer de ye…

**Li ser rêya Geliyê Zapê**

Vê gavê em bi rê de ne. Li gorî we em bi kû de diçin? Belê, şervanên azadiyê li ser rêya Geliyê Zapê, ber bi herêman ve dimeşin. Em bûn du taxim, weke hûn dizanin Dalê û Gelî. Vê gavê me navber dayê û hin heval bi şûnde dimînin. Barê me pir giran e. Ma hûn dizanin di pratîka xwe ya destpêkê de li Bakur min BKC rakiriye, li pişta min çar sed gule hene. Di hilgirtina min a BKC’ê de heya bi vê derê hevalan alîkarî da min. Her kes dipirse û dibêje “ma çi dinivîsînî?” Ji beriya vê kêliyekê jî gotin “bîî bi rastî jî dinivîse.” Hevala Berçem hate cem min bi wê bişirîna xwe ya germ bi şiklekî kêfxweş pirsî “çi dinivîsî?” Divê em ji bo pêşerojê hin tiştan bihêlin, ji bo ku tiştên em jiyan dikin nebe weke qet nehatine jiyankirin, divê em ji dîrokê re hin notan bihêlin.

Li cem min ji taxima Dalê hevalên Helana, Sema, Jiyan, Berfîn, Roza, Elî, Loqman, Serhildan, Amed, Welat, Demhat hene. Gruba Gêlî; Şêrîna Rozerîn, bi dengê xwe yê bêhna qurnaziyê jê tê Ezda, Adarê, Viyana xweşik, Zinar, Ûlaş, Sîpan. Tîma din li pêş çû û hevalê Tekîn û fermandara bolîka me hevala Berçem heye. Hevala Ezda dibêje, “tê di rojên pêşde çi bibînî, çi nebînî, nenivîse, paşê hewesa te namîne.” Belê, ji ber fikara ku ez ê nikaribim rojên awarte binivîsim jixwe pir ditirsim û bi ber dikevim. Ji niha ve hevala Sema pir zêde hewl da lê hinekê li

pey hevalan ma. Em mêze bikin, ez ê karibim BKC'yê li hindur bi kar bînim yan na? Ji ber ku pratîka min a destpêkê ye di dilê min de hinekê weswese heye, lê bila baweriya min bi min heye. Di encamê de di meşa me ya xweşik a gerîla de rê didome.

Ya ku nêzîk dibe kêliya cudabûnê ye…

Em dilketiyên keskahiyê ne, ji aliyekî ve jî em dildarên bêhna catirê ne…

Piştî çend rojan em ê bibin du grûb. Êdî em ê berê xwe bidin çalakiyan, herêmên xwe.

**14'ê Gulana 2010'an**

**Feraset**

Belê mirovahî, em di hemû biharan de bi meşa gerîla dimeşin. Ji ber ku em nêzîkî Dalê bûne em sekinîne. Sibeyê dê grûba Dalê biçe, meşa gerîla ti car xelas nabe. Hê em ê pir bimeşin li Zagros.

Zagros…

Rêyên wê ji arwaz û nişivan pêk tên. Çalên kûr, zîrveyên nêzîkî ewran, eger mirov bimeşe kendalên dibe ku mirov lê parçe parçe bibe. Rûbarên dîn û har bûyî û pirên me yên xwezayî ku gerîla çêkirine… Sibeyê dê di gerîla de saleke min xelas bibe. Par îro di nava hestên ecêb de, bi şiklekî pir bi kelecan, keçeke ciwan ku ber bi nediyariyê ve rêwîtî bike bûm.

Rêber Apo û hemû mirovahî, gelê Kurd ê egîd ê rêzdar û zarokên rojê, ez dixwazim li van çiyayên me yên bi vê zehmetiyê kemilîne, tiştê zehmetî didin min parve bikim. Ji aliyê fîzîkî ve min qet zehmetî nekişand, berevajî bûm xwediyê îradeyeke bihêz ku heval heyirî hiştine. Pratîka min a destpêkê li Bakur e. Li herêmeke weke Zagros im. Doh di wê tariya ku çav çavan nedidît de, li ser şiverêyeke asê û bi kendal, bi şiklê ku li pişta min çar sed gule, di çenteyê min de nanê min û pêdiviyên min ên şexsî û bi BKC bêyî ku qet ji hevalan qut bibim li herî pêş bûm. Fêrî meşên şevê nebûme, li ser erdnîgariyê ne serwer im. Hê wê rojê, li arwaza destpêkê min bi barê xwe yê giran xwe gihand

hevalên xort. Man heyirî û serê xwe hejandin û li min mêze kirin. Baweriya wan pê tine ye ku hevalake wan a jin xwediyê îradeyeke wisa be, bi wê zêhniyeta xwe ya kevinde temaşe dikin, dema keseke ji aliyê îdeolojiyê ve kûr, ji aliyê pratîkê ve bihêz dibînin dimînin heyirî û dihesûdin jî. Şaş fêm nekin, ez ne keseke pratîkperest im, berevajî kesek ku li dijî wê ferasetê şer îlan kiriye me. Li van çiyan bi moral, bi coş, hezkirin û kelecanekê dimeşim, nefesê distînim, jiyan dikim. Ji ber ku baweriya min bi vê dozê bi qasî mezinahiya çiyan û hetahetayiya oqyanûsan e. Jineke lêgervanê heqîqetê û milîtanek ku li dijî bêdadiyê şer dike me.

Ma dizanî ez kengî nikarim bimeşim? Weke ku di meşa doh de bûyî dema li pêşberê hevalên min bêxemî pêş ket, dema ji her kesî dengekî cuda derket û hevalên westiyane dest pê kirin uslûba xwe xera bikin, zehmetî dikişînim.

Min bibexşîne Rêberê min, em nikarin wê xeta îdeolojîk û felsefîk ê bûne mirov kesayetiya ku te afirandiye biparêzin, bi şiklekî xurt xwedî lê derkevin. Rastî û kesayetî, ferasetên ji kûr ve dilê min diêşînin di nava zehmetiyê de xwe didin der. Di meşa me de feraseta hevaltiya PKK'ê, hişyarbûn, kolektîvîzm pir kêm bû. Plansaziya rêxistinî, rêkûpêkî, disîplîn ji aliyê pêşengên me ve baş nedihat plankirin, rêveberiya me pasîf dima.

Vaye ferasetên kesan û bi vî şiklê xwe ferzkirina wan a li ser jiyanê, Rozayê pir diêşîne û zehmetî didê. Niha hûn ê bêjin meşeke çendî aloz e. Na na, di gerîla de aliyek ev e, aliyê din timî kêfxweşî û dagirtî bi wate ye. Me hemûyan li ser berfê ecêb xwe şemitand. Xweziya me hemû yek bi yek kişandiba kamerayê. Tolbûnên me, ketinên me, şemitîna BKC'yê di destê min de, bi temamî şilûpilbûna me, libên berfê ku dema ez dişemitîm bi şiklekî dijwar li ser çavên min dida, ber bi dawiyê ve bi awayê bi hevgirtinê û bi qoordîne hatina me, ketin û rabûnên yên di wê şivereya bi kendal de tiştên bi ber dikevin mirov bîne ziman bûn.

Destpêkê hevalê Loqman ket. Wisa dida qîran ku dilê min zîz dibû. Bawerim dûvikê wî ji şûnê derketibû. Rozarîna me ya ku hevala me ya berpirsiyarê karê tendirustiyê bû, rasterast çû ser. Her kes çûbû ser wê.

Me du heval li ser wî hiştin ku sibeyê wî bigirin û bên nuxteyê. Hê em pênc deqîqe nemeşiyabûn hevala Rozerîn jî ket. Hem jî wê jî dûvikê xwe êşand. Fermandarê me yê tabûrê lê mêze kir ku rewş nebaş e got, ‘em ê îşev li vê derê bin’. Bi hatina balafira kişfê jî, di nava kîsên xewê de me li xwe kire sibe. Hevalan bi hanekî digotin ‘eger wisa biçe û çend hevalan li cem wan em bihêlin, heya bi nuxteyê ti kes namîne’. Hevala Helena û hevalê Zerdeştê li pêşiya min dema ketin qederekê deng derxistin. Hevala Helenaya xwedavenda Yewnanî, ji ber ku hevalên xort her tişt bi hanekî digirtin ecz bûbû. Ji ber ku ecz bûbû û bi lêz di ber min re derbas bûbû, bi xweşikî tekmîl nedabû û nestendibû bûbû sedem ku ew hewaya giran a wê derê hê jî girantir û aloztir bibe. Heqê Xwedavenda me hebû! Piştî pala arwaz ku li wê derê qereqola asê ya Oramarê xuya dikir bê nefes mam. Pişî ku hevala Helena aşkere got, ji neçarî BKC ji min girtin. Alikariya çi, heya rê xelas bû kirin pitepit. Hevalekî bi navê Xemgîn ê ji hevalên Cîloyê, ruxmî barê xwe bi rastî jî pir alîkariya me kir. Demekê jî Helenayê rakir, jixwe ji bo nêzîkatiyan em her du jî pir ecz bûbûn. Vaye bê wate di demên zehmet de dostanî bi hêz nabin. Yekparetî, fedakariyê ji nişka ve şûna xwe ji ezeziyê re hiştibûn. Weke ku BKC ne ya taximê bûye, tenê ya min bûye. Vaye ezmûna PKK, vaye sotîneriya têkoşînê, vaye di zikhev de jiyankirina xweşikî û kirêtiyan û vaye yekparetî. Ji bo her tiştî alternatîfeke me heye. Ew jî; rêxistinî û partîbûn. Ev panjahrên hemû ferasetan in.

Morala hevala Sema xerab bûbû û ji ber vê yekê xwarin nexwaribû. Em ji beriya vê du saet li ser van mijaran bi hev re axifîn û daketin û me çay çêkir. Bawer im bi ser ketim û min morala wê anî cih. Min berpirsiyariyên wê yên milîtaniyê û felsefeya jiyanê ya Rêber Apo anîn bîra wê. Vê gavê Rozerîn li hemberê min e û em her du jî bê sekn dinivîsin. Hevala Berfîn dibêje, “bes e, Dalê jî heye, defter xelas bû.” Hevala Berfîn di xebata xwe parastinê de ye. Hevaleke ji Rojava ye û pir xweşik e. Ji beriya niha ji bo em çaya xwe ya tarî vexwun me navberek dayibû. Bi xuşexuşa avê, bi xwezaya kesk û bi pêşiyên bi min ve didin û dikin ku ez canê xwe bixurînim ve ez dibêjim bi xatirê te. Dil û hêvî…

Lê dil, dema carekê dil bişkê êdî hev nagire
Ji ber ku jiyan di wê derê de veşartî ye.

“Min bi dilê xwe girt û ber bi şer ve meşiyam
Meşiyam û min xwe gihand zîrveya çiyan
Ji bo ku şidla evînê hişk û zuwa nebe
Min hebûna xwe bi dostan ve parve kir”.

**18’ê Gulana 2010’an**

**Salveger**

Salekê beriya vê ji sînorê dewletekê derbasî dewleteke din bûm. Bi temamî salekê piştre dîsa li wê derê me. Sînor bê wate û vala ne. Li Bakur, li Zagrosê me. Di gerîlatiyê de saleke min temam bû. Balkêş e! Dem çi zû derbas bûye, weke mirov çavê xwe bigire û veke, ma ne jiyaneke çi bilez e? Dema saleke min temam dibe, gelo ez ê dereng bimînim? Ma ez ê karibim xwe bigihînim leza şoreşê? Ji nişka ve ruhê min vediguhere, dilê min bi lezeke pir mezin vediguhere, mêjiyê min bi hezar fikrê tevlîhev bûye, weke bajarekî tevlîhev e.

Hêvî laşê min ber bi jiyaneke awarte ve kaş dike. Çavên min ên bi coş, moral û baweriyeke mezin mêze dikin di vê pêvajoyê de pir cuda ye. Di wê pêvajoya sê rojan de gelo ji ber bindestiya pûçbûyî ya pênc hezar sal e, ji ber nebûna îradeya azad e, gelo ji ber hesreta pêşerojeke paqij û manedar, ji ber hesreta jiyaneke paqij e yan jî ji ber bêxemî û nebûna empatiya mirovahiya ku pê re robotbûn pêş dikeve, rondikên min weke rûbereke şelo diherikîn; xembar, bi hesret û giran…

Di berbanga wê sibeyê de bi şiklekî ji bo pêşeroja nehatiye jiyankirin bi hêrs, weke pêleke din û harbûyî ji bo ku careke dawî karibim Cemal bibînim destên min timî diçûn pencere û perdeyê. Destên min ên dirêjî telefonê dibûn bi xembariya li pey xwe hiştina dayikeke rondikan diweşîne dilerizîn. Bi amadekariya ku careke din nebînim min awirek avêtibû Muratê hogirê xwe. Ji bo Êmoş û Doğukan bi rondikên çavan bi xatirê we. Ez ê cilên te yên xweşik careke din nikaribim li xwe bikim

ew bişirîna min a fêlbaz û derewîn ji bo te ye Ümmü… Ji ber ku careke din me dê hev nedîtana min ew axaftina di devê derî de bi şiklê ku dem têrê neke dirêj kir, jinap Emîne. Birayê min ê fîlozof, dema ku te dest bi leyistokeke satrancê dikir tu mezin dibûyî; êşa vê ya herî giran di qirika min de asê maye. Aysel, bavê Musa, Barış ez ê nikaribim careke din bikevim dikana bêdeng, derî hatin girtin û cudabûnên bêdawî dest pê kirin.

Ez û Newal bi rê de ne. Lingên me ber bi çiyayên azadiyê, hêviyê û mezinahiyê ve dimeşin. Mêjiyekî bê fikar, bi hestên pir mezin û cejna sporê ye. Îsyana li beramberê sîstemê ye. Hêrsa ji bo ciwantiya hatiye pûçkirin e. Îsyana li hemberê koletiyê ye, hesreta ji bo milîtaniya azad e. Dema me cara destpêkê gerîla dît, me hev hemêz kir, me bi kêfxweşî qîr kir. Piştre Newal û ez, em ji hev qut bûn. Piştî salekê weke îsal jiyan dikim qutbûnên timî didomin ên xwe dubare dikin, didomin. Ji bo te gotineke min heye, ji hevalan re sozeke min heye, ji mirovahiyê re, ji Rêber Apo re sozeke min heye.

"Ji bo şoreşê kesayetiyên bi heybet pêwîst in."

Hevala Sema bi şekirekî hezkirinê salvegera tevlîbûna min pîroz kir….

**19'ê Gulana 2010'an**

**Xweşikî**

Li aliyê min ê rastê tehtên quntarên Cîlo ku bi şînahiyeke tarî ya tev berf ên serê wan li ezmanan e û li wêneyekî resamên herî serkeftî derbas dike, li aliyê min ên çepê bişgokên bi rengê kesk ê ku mirov pê ji ser xwe ve diçe yê meha dawî ya biharê, dar û xwezaya ji nû ve jiyan dide û şîn dibe. Bayekî sermayê dide hîskirin, şiverêya me daye berxwe û tê…

Axxx xewa xweş!

Çend xweş e dengê avê, dengê herî xweş ê çûkan, erdnîgariya kesk. Tehtên bilind ên tev bi berf. Ezmanê şîn, rûbareke zelal û ewrên ku dema her diherike vedibêjim. Dinya dizivire û bê sekn dem diherike. Vediguhere jiyan, weke zengilê dêrekê diguhere û hêdî hêdî diherike bajarên Star. Jinên azad diherikin çiyayên Zagros, Cîlo, Cûdî, Sîpan û hwd.

**20'ê Gulana 2010'an**

**Cîlo**

**Gelê min ê heja**

Bi qasî ku ji bo te bimirim min ji te hez kir, gelê min. Bes êdî birêjîne rondikên çavan. Belê, gelê min ê birêz ê fedakar, mahsûm, paqij, divê rondikên te xelas bin. Divê neheqiya li te hatiye kirin xelas be. Gelê min, gelê herî qedîm, herî pîroz ku heqê mirovbûyîna herî bi şiklekî zelal bi destxistiye gelê min e. Li gundên ku bêhneke xurt a Neolotîkê jê tê, sembola komînalîteyê ye jinên pîr, dayikên me.

Doh piştî meşeke dûr û dirêj me bi şiklekî westiyayî û ji hev ketî xwe gihand cihekî. Me weke taxim li ber tavaheyvê sofreyeke erdê danî û nanê wan ê xweş, pênir, dewê wan hebû. Li derûdora me diya egîd a Kurd û milîsa me ya ku kesekî temendirêj bû her dizivirîn, bi ser me de dikalîn, digot, “eger hûn destûrê bidin ez ê BKC rakim.” Heval, welatparêz û şoreşgerê ku çiqas tiştên bi xeterêvgirtiye ber çavan. Belê ez dibêjim şoreşger, êşkence, birçîbûnê, surgîn, mirin, hem jî mirineke hovane girtine ber çavan û alîkariya me didin. Ma ev ne şoreşa herî mezin e û çi ye?

Vê gavê nobedar  im. Eger mirov bide ser rêya hemberê min dê biçe Çelê. Em li Zozanan in. Me doh teht û zinarên pir tuj û asê qut kirin û derketin nuxteyê. Ji giraniya guleyan, dikir milê min qut bibe. Di wî gundê bi nav û deng ê Ehmedê Xanî re derbas bûm. Di dilê min re ev hevok derbas bûn: gundên me yên terka wan hatine dayîn, hatine valakirin ên qedîm û bedew; kî dizane hestên kîjan keça me ya ciwan weke barana Nîsanê erd şil kir. We li ser vê erdnîgariyê jiyaneke çawa borand? Dibe ku pêşiyên me jiyaneke herî watedar, kolektîf, tev bi hezkirin ku em bi hesreta wê ne domandin. Yan jî dibe ku gundekî tije bi çîrokên dramatîk be ku ên di encama şerên sîstem û baweriyan de bi pêşketibin. Surgîn, şîn û giryan, êş û kenên nîvçe mayî… Paşê rêwiyên wan erdan, nêviyên wan erdan... Dengê lingên me yên di wê şeva xwe mirandiye de dixwazin ruh bidin wan erdan, çeka gerîla ku li ber tavaheyvê diteyise… Belê gelê min ê heja, gerîla, keç û kurên we dane ser şopên we, li ser van erdan şerekî giran dimeşînin li ser vê erda bihuştî… Xêr û bêra evîna me jiyanê dide axê. Di berdêla mirinê de me ji te hez kir gelê min, bes birêjîne rondikên çavan.

Belê, em bên li ser pirsgirêkên me yên neteweyî (!)… Ji dema em hatine vê derê ve pirsgirêkên me yên rêveberiyê hene. Pirsgirêkên rojeva hevalên jin bi temamî mijûl dikin. Biborin lê êdî ez ê bêjim bêzar bûme. Texmîn bikin em çend şervan in? Yek fermandarê bolîkê, du fermandarên taximê, du jî fermandarên tîmê, grûb bi tevahî ji heşt kesan pêk tê. Jixwe pirsgirêkên uslûbê, tehamulê hev nekirin, dilnizm nebûn, hevkilandin… Ne şervan lê fermandarên me rojev in. Em doh hatin, barê me hemûyan pir giran bû û em hemû pir westiyayî bûn. Hevala

Helena bela xwe li derûdorê dida. Carekê ecz dibe û her tiştî ji bîr dike, dengê xwe bilind dike. Hin caran nêzîkatiyên wê yên pir teng bi pêş dikevin. Ne ji heqê ti kesî ye jiyanê tevlîhev bike, moralê têkbibe. Ji ber wê, hevalê Dijwar mohra bêmoraliyê li me da. Ma çi heqê wê heye? Belê ez ê di tekmîla vê êvarê de rexne bikim. Eger wisa bikin dê çawa mirov qezenc bikin, em ê çawa bibin şopdarê vê îdeolojî û felsefeyê? Vaye ji tiştên nava jiyanê yên biçûk û ji rêzê, ber bi teqandinên kritîk ên mezin ve diçe.

**24'ê Gulana 2010'an**
**Dalê**

**Wendabûyîn**

Doh li nuxteyeke em nû hatibûnê dema bi şevê ji bo dewrkirina nobedê diçûm gel hevalên xort, di tariyê de wenda bûm. Ji ber ku em ber bi êvarê hatibûn, ji bo anîna avê bêyî lê mêze bikim rasterast derketibûm. Bi rastî eger min qîr bida dê bibîstana, hevalên çûbûn kar û wezîfeyê jî hebûn, helbet dê bizivirîna. Rastiyek heye ku ew jî ev e, ji ber ponijînê, min dîqeta rê nekiribû, dema lê digerîm jî wisa dilşikestî bûm, nexwe hakimiyeta min a li ser araziyê baş e. Piştre dema hevala Berçem şiyar kirine, dîtiye ez ne li cem wê me pirsa min kiriye. Wê jî gotiye ku ez çil deqîqayan li nuxteyê geriyame, min nobed dewr kiriye û tiştekî cuda jî ew nizane. Dema min dengê wan bihîst, min ber bi jêr ve bazda. Kî dizane di mêjiyê wan re çi derbaz bû? Roja beriya wê ji ber ferasetên heyî, bêdeng bibûm. Ji sedî sed hizirîne ku ji ber alozbûnê dibe ku ez çûyîbim. Werhasil sibeyê hevalên ez didîtim dikeniyan. Ne

neheq in jî, lihevfitilîneke ecêb... Vaye encameke tiştên hatiye jiyankirine. Hevala Helena dibêje, “ev çend roj in bala te belav bûye, çavkaniya xwe ji vê distîne, biponije û bi ser xwe ve bê.” Dibêje, “bandorê li ser her liv û tevgera te dike.” Weke wê gotina ku dibêje, “hem diz e, hem topiz e.” Yanî hem dibe sedem ku mirov aloz bibe û hem jî dibêje, “çima tu aloz î, bala te çima belav bûye?” Belê Roza ti tiştî ji xwe re neke asteng û berpirsiyariya xwe ya weke milîtan pêk bîne.

Vê gavê çawîşa bi roj im…

**25’ê Gulana 2010’an**

**Dalê**

**Gotinên hevalê Perwer**

“Ne Vîetnam ne Kûba, ne Angola. Em agir in, dîrok in li ser çiyan.” Gerîlayê Dersimê hevalê Perwer; “belê, şoreşgerî, gerîlatî û Kurd di rêya dûr û dirêj û zehmet a şoreşê de bi hezaran têkoşîn di zikhev de ye. Têkoşîna hebûn, cins, mirov, ekolojîk, wate, jiyan, sosyalîzm. Zarokên sosyalîzmê li çiyayên Kurdistanê ne. Ma hûn dikarin navê vî şerî, vê şoreşê lê bikin? Ne dişibe Vîetnamê, ne Kûbayê ne jî dişibe gerîlatiyeke cuda. Ev pêkhatina ku dihate gotin ti car tiştekî wisa nabe, îsbata wê ye. Gelo ne ji zarokên agir û rojê bûya, ji derveyê wan ti kesî dikarî li ber vî dijminê hov ê barbar xwe ragire? Eger bipirsin ku hovên herî mezin ê dîrokê kî ne, ez ê bêjim, yên ku deriyên hovitiyê vekirine, dijminê me yê ku em li dijî wî şer dikin. Doh wisa digot, “kesên baş dijminê xwe nas nekin ti car nikare li dijî dijminê xwe têkoşîneke baş bimeşîne. Em xwediyê dijminekî wisa ne ku dîrok jê re nebûye şahid, eger ne wisa bûya bi şiklekî hêsanî me dikarîbû bi hezaran şoreşan weke Kûba, Vîetnam û hwd. bi hêsanî pêk bînin. Di vî şerî de qural tine, wijdan tine. Pêjna sosyalîzma ku parazvana mirovatiyê ye nayê. Di vî şerî de hovîtî û bêeslbûn heye. Ev şerê me ne tenê li dijî dewletekê ye. Ne tenê rizgariya herêm û gelekî ye jî. Ev şer lêgera heqekî gerdûnî, şerê heqîqeteke gerdûnî ye. Ev şer li dijî zanebûna çelexwarî, zanebûna bi tirs, îdeolojiya îqtidarperest, qebûlkirina sîstemeke hov û bixof serhildanek e. Ji ber vê yekê zehmetiya wê zêde ne û dijminê wê pir bi

tirs û bi xof e. Gerîlayên bi xweragir ên Kurd ji aliyekî ve dûrî hemû sîsteman jiyana xwe didomînin, ji aliyê din ve jî, aliyê vê jiyanê, bi şiklê roman bi şiklê hunerî anîna ziman û hîn di dewlemendkirinê de zeyif man.

Weke ku Rêbertî dibêje, ‘em bi awayekî cuda dijîn, dîrok nebûye şahidê jiyaneke wisa’. Em ji aliyê nivîsandinê ve, jiyana ku em pê dijîn kirina malê dîrokê ve lewaz man. Me bi ked û êşên mezin mucîzeyên pir mezin afirand. Di her kêliya wê de efsaneyek veşartî ye. Me nekarîbû vê jiyana li romanên Rûsan derbas dikin bikin belge, bi awayê film îfade bikin. Lê Rêbertiyê îsbat kiribû ku em çawa bê ziman mayîne, yên dîrok afirandine çawa bê dîrok mayîne û tine bûne.

Me nekarîbû li ser rûpelên spî lêgerekê, kêfxweşiyekê, moral, kesayeytiyên herî bi coş û senaryoyên ku rastiyên heyî bi me didin fikirîn binivîsin. Hevalê Perwer jî wisa dibêje, “bi tecrûbe û zanebûna ku bi salan kemiliye binivîsin.” Û bi kêfxweşiyeke mezin pênûsê digirim dixim nav lepê xwe. Çi tesadufeke mezin e, ez jî pîr ji nivisînê hez dikim. Di temanê xwe yê zarokatiyê de li Dersîmê dest bi gerîlatiyê kiriye. Xwestiye tirs û dogmayên ku zarokatiya me ya bê guneh û zelal, dorpêç dike, wan perdeyan bide aliyekî. Berevajiya her şerê ku bi qasî nefesekê nêzîkî mirinê ye ketiye nav… Mirin bi jiyankirinê bi temamî heft caran xweşikirin… Ma ne li ser rêya hetahetayî ye, bi jiyankirinê xwe digihîne heqîqetê. Bi gelek armancan ketiye bin barê têkoşîneke mezin. Helbet zehmetî hebûne.

Ey axa pîroz a mirovahiyê, hêza bi sêr a jiyanê; ji bo te, ev can, ev xwîn, ev ciwanên sembolên xweşikî û bedewiyê ne. Ciwantiya hatiye dorpêçkirin, jiyana dorpêçbûyî, di nav tirsa hatiye dorpêçkirin de ber bi serxwebûnê ve dimeşin. Dimeşe hevalê Perwer, bi wan lingên xwe yên ber bi mucizeyan ve dimeşin ên pîroz û kedkar vê gavê li Dalê dimeşe hevalê Perwer…

Ma hûn dizanin cudahî û ferqa têkoşîna me çi ye? Ev têkoşerî weke fêrbûneke mezin nîşandan û pêkanîn, şerê vê yê zehmet. Em ji bo ku li herî pêş têbikoşin her tiştî dikin. Em dema tevlî gerîla dibin bi kêfxweşî, moral, xwestek, coş, evîn, lêgerîn, bi hesreteke mezin a ji bo evîna heqîqetê tevlî dibin. Dema em li zîrveyên şeref û serbilindiyê

çeka xwe hemêz dikin, tiliyên me diçin ser textikê kîndar û bi hêrs ê li pêşberê hezkirin û bişirînên herî derewîn. Her şev çeka xwe hemêz dikim, bi îsyana xwe ya ji bo sîstema hov a barbar.

Di nav jiyana sîstemê de dema yek dibe leşker di wan malan de şîn tê girêdan, rondikên çavan dibin çem û diherikin. Birêkirinên bê dilê xwe û ji neçarî bi pêş dikevin. Tirsa mirinê weke ewreke reş digire her derê. Eger cihê leşker biçê cebheyê pêş be li ber çavên maliyan de êdî ew kesê diçe leşkeriyê miriyek e. Êdî kêliya wî ya dawî û raboriya wî bûye bîranîn. Her kes li benda mirineke tije bi xof û tirs, bi fikar e û bi psîkolojiyeke wisa jiyan dike.

Lê em? Her gotina me, her liv û tevgera me, her rapora me tije bi hesreta kûr a qadên şerê germ e. Em ên ku bi meşeke herî leşkerî ji bo aramî, azadî xwezayê şiyar dikin û radikin ser piyan ku weke pêlekê, gerdûnê bi enerjiya xwe dadigirin, xwediyê bawerî û biryar in. Ji bo wan mirineke herî mezin, ji bo me azadî û ji nû ve ji dayik bûyîn. Hûn ê bêjin li herî pêş kî dimeşe?

Kî qezenc dike vî şerî?

Ferq û cudahiya vî şerî ev e, cewhera wî ev e…

Belê mirovahî, hevalên min piştî çalakiyê di şer de ne, em niha Gelî jî pir mereq dikin. Em li bendê ne ku çi qewimiye. Çar heval çûyîne, televîzyonan weke sê birîndar dayîne, Hevalê Zinar, Ezda, Gabar çûyîne çalakiyê. Hêviya min ew e tişt bi wan neyê. Em doh ji bo li araziyê mêze bikin çûn. Araziya Dalê cihê herî asê û dijwar e. Me cihên wisa, tehtên wisa dîtin bi gotinê nabe, pêwîst e mirov bibîne.

Nizanim çendê mehê ye. Lê rojên dawî yên meha Gulanê ne…

**Gulana 2010'an**

**Şaşitî**

Çi qewimî dê texmîn bikin tiştên ku min ji beriya vê di rûpelekê de nivisîbû talan bû û çû. Li vê derê çalakî hatiye lidarxistin, lê ne hevalên me ne. Têkilî hate çêkirin, me wisa fêm kir. Amadekariyên wan hebûne, ji ber wê yekê tevlihev bûye, şaş hatiye fêmkirin. Bila, em fêr bûn ku dê çalakî bê lidarxistin. Dawiya dawî em ê çalakî li dar bixin. Lê ez ê

kengî biçim çalakiyê? Hezkiriyê min, delalê min ê çalakiyê; armanca me ew e em cîhaneke mirov karibin lê jiyan bikin ava bikin, ne ku welatekî wendabûyî ji nû ve ava bikin. Û şoreşgerî dişibe mirina ji evîndariyê…

**Gulana 2010'an**

**Westabûn**

Sê rêveberiyên min hene, tenê ez şervan im. Wisa ye. Min di tekmîla îro de pêşniyar kir ku bên cem hev û bi hev re biaxifin û ji bo ku pirsgirêkên wan di demên pêş de ji wan re nebin asteng çareser bikin. Pirsgirêk bi xerckirina kedê tên çareser kirin. Ji bo mirovek bê qezenckirin eger hewce bike em ê bi saetan biaxifin. Divê em wê fedakariya Rêber Apo ya ji bo mirovahiyê ya di bin nîrê esaretê de hewce ye em bi moraleke mezin û serbilindiyeke mezin ji xwe re bikin mînak û esas bigirin.

Ji ber kişandina erzaq qira hevalan rabûye, em heya bi sibeyê bê sekn dixebitîn. Dema em diçin tepe li Daleya dibe ku araziya herî asê ya Kurdisatanê be, bi guleyên BKC'yê ha bibeze û ha bizeze. Ev di gerîla de sala min a destpêkê ye. Pratîka min a destpêkê ye. Tecrûbe û azmûna min çênebûye û hakimiyeta min tine. Di encamê de ma ev ne leyistoka zarokan e! Temam, ji aliyê fîzîkî ve xurt im, fikara wan ji min tine ye, lê rastiya şer pir cuda ye. Tê hûrguliya herî biçûk bihizirî.. Wisa bi terzeke nêzîkbûnê ya bê xem ti car nabe. Ji dema ku em hatine Geliyê Zapê pê de pirsgirêka me ya neteweyî(!) banyo ye. Em bîst û çar saetan di liv û tevgerê de ne ji bo mirov li van çiyan be divê bihêz û xwediyê tendirustî be. Dikare derfet bên avakirin û lê tê paşguhkirin. Ez dibêjim li cem te zêde zêde axivîm derftera min.

**Gulana 2010'an**
**Dalê**

**Pengava 1'ê Hezîranê**

Dayik ji gotina 'aştî' westiyan. Ciwan bi derketin û qîrkirina li kolanan westiyan. Ev tam 11 sal in li Îmraliyê têkoşîna bê eman a çareseriya aştîparêz a demokratîk dimeşîne. Ev sîstema kevnare bûyî ji

xwîn û wexta hatiye vala derxistin têr nebû. Û em Hezîraneke pêngavê jiyan dikin. Em li çiyayên me li ser şopa Egîdan in. Têkoşîna azadiya Kurdistanê di qonaxa pêvajoyeke nû de ye. Me îro bi komîsyontiya erênî û çêker ya hevalê Perwer di perwerdeya nota hevdîtinê de li ser van mijaran nirxandin bi pêş xistin. Vegotineke pir xwezayî û xweşik dike, hewce ye mirov bibîne, naxwe nayê vegotin. Belê, em jî bila êdî xwediyê vê şensê bin.

Pêvajoyeke piralî ya dîrokî ye. Dema wê ye ku em di çarçoveya xweseriya demokratîk de sîstema modernîteya demokratîk a ku alternatîf e, berbelav bikin û bi cih bikin. Em ê Akademiyan vekin, dibistanên xwe ava bikin, li Kurdistanê ji bo zarokên agir û rojê pêşerojê amade bikin, bi zanebûna dîrok û jiyana herî pîroz em ê aboriyê bi pêşengiya jinê ava bikin, mirovahiyê bigihînin aram û rehetiyê; evînên herî xweşik, têr û tije, ji keç û xortên pêşerojê re em ê bikin xelat. Em ê dayikên ku rondikên çavan rêjandine, bi wan rondikên kêfxweşiyê bidin rêjandin. Em ê pêşerojeke wisa ji bo wan ava bikin ku dê zarokên xwe yên di landika mirovahiyê de di nav êş û êşkenceyê de mezin kirine, bi serbilindî hemêz bikin. Em ê li dijî sîstema pûçbûyî ya Îmraliyê têkoşîneke wisa bimeşînin; şerekî mezin û bi heybet ê gerîla. Em ê zêhniyeteke nû bidin mirovahiya bêmane bûye. Çawa dema mirov pêlî textikê dike gule yek bi yek bê şik û guman bi lezeke mezin dikevin nav liv û tevgerê, em ê hêvî û wate biafirînin. Di dilên herî bêrehm û zingar girtî de êdî em li ser rêya serkeftineke bi heybet in.

Belê, li her derê çalakiyên me bi pêş dikevin. Pêvajo, dema Rêbertiyê xwe bi paşde kişand dest pê kir. Hevalên me çalakî li dar xistine. Ev sê roj in ji grûba êrîşê agahî nayê girtin. Bi îhtimaleke mezin birîndar û şehadet hene. Axx, me karîba demekê ji beriya demekê agahî bistenda. Mirî û birîndarên dijmin hene. Her çendî wan di çapemeniyê de kêm nîşandan jî, em dizanin derew e. Lê çi li wan hevalan hat, hevalên ku çar roj ji beriya vê li cem me bûn, ma dibe ku yek ji wan tev tine bibe? Axx Xwedavenda min! Xwazika ti kes tevlî karwanê şehîdan nebûyîbûna. Zû ye, ji bo wan pir zû ye. Hê dem heye. Ji bo rêwîtiya serbilind hê dem heye. Hê gelek tiştên bên kirin, kêliyên bên jiyankirin hene.

Axxx Roza! Doh qobre hatin, herdu bi lezeke mezin derbas bûn. Piştî hevalên me paşde kişîne pir êrîş kirine. Jixwe çi qewimiye li wê derê qewimiye. Axxx ev bi paşde kişîna… Ka li şensa min mêze bike, min serê xwe dişûst. Dema serê xwe dişom an êrîşa balafirê yan jî êrîşa qobreyê pêk tê, yan jî xweza tê xezebê û dibe tûfan. Min fêm nekir, sedem çi ye? Hevala Helena dibêje, “dema tu biçî ji bo serşoyê em ê mewziyên xwe asê bikin.” Çi tiştekî ecêb û pêkenok e, ma ne wisa ye? Bî, min nekarî li gorî kêfa dilê xwe li qobreyê jî binêrim!

Di demeke nêzîk de em ê jî biçin çalakiye. Her bijî! Întîqam, ruhê întîqamê, hêrsa întîqamê… Dilê min diçe çalakî, hemleyeke nû. Serdem û dema Bêrîtan, Zîlan, Mezlûmên nû ne. Ji bo bûn volqanekê, bandor li dîrokê kirin û şewitandina hemû derawan bi têhna agir, ji bo azadkirina dad, rastiyên ku ji nû ve zindî bikin, azadkirina mirovahiya xweşik, azadkirina jiyanê û ji bo li Îmraliyê kevok firandinê, dem û mekan banî dike. Dibêje, “xwe bigihîne Rêbertiyê, xwe bigihîne pêşeroja azad a li asoyan xuya dibe û jiyanê. Ruxmî çem û rûbarên diherikin, tu jî li cem wan biherike…

**Hezîrana 2010’an**

**Mirin di meha Hezîranê de zehmet e**

Mirina di Hezîranê de zehmet e. Belê, Hezîranê Zîlan gihand asta bangekê. Demê Egîd afirandin. Ey zeman, gava tu wisa diherikî û diçî, bi bêxemiya xwe min dubare dizivirînî bîranînên te daye jiyankirin. Vî mêjiyî dibî li ser rêyan, dibî li ser tepeyê ku em li wê derê şil û pilo bûne. Tiştên min li cem te parve kirine, hatina min û te ya destpêkê ji biryargehê...

Adar; keça egîd a Başûr. Sembola wêrekî û jina bi hêz. Hevala min a bi nav û deng, gelo te got “ax!” dema birîndar bûyî? Ma bi wê fîzîka xwe ya xurt bi çeka xwe çûyî ser mewziyê? Çi tişt li ber çavê te derbas bû, wan çavên te yên reş çi dîtin? Ew kenê te, ti car ji ber çavên min naçe. Xwîngerm û bêguneh, di dilê xwe de fedakarî dihewand, dema kîn û rika xwe nîşanî dijmin dida, bûyî kedkara pratîkê, di vê hemleya duyemîn a 1’ê Hezîranê de. Dema çûyîbû, bêyî ku em bizanin em ê

nikaribin careke din hev bibînin, me nêrînên xwe parve kiribûn. Axx Adar, bûyî şehîda destpêkê ku min ji nêzîk ve nas dikir. Li Xakûrkê di hevdîtina me ya destpêkê de ma min dikarî tiştekî wisa bihizirim? Kê dikarî bizane dê gelo Colemêrgê wê bedena te ya nazik hemêz bike. Û Sîpanê ku ji bo hevala xwe şehîd bûyî… Vaye hevaltî, sîstema alternatîf a PKK'ê, şoreşa wê ya exlaqî û wijdanî.

Niha di destê min de radyo heye, weke radyoya timî di destê te de bû. Min strana "Ey Serok" guhdar kir û navber dayê. Te çi xweşik nan vedikir, neynûkên xwe lê didan; vaye min ew mîrate ji te wergirtiye. Her cara bibim nanpêj ez ê te bi bîr bînim. Bûyî şehîda meha Hezîranê, şehîda hemleya me ya nû. Bûyî xwedana çalakiyeke serkeftî.

Her bijî Adar û Sîpan!.. Xweşikên çalakiyê.

Hevalê Gabar ji milê xwe bi guleyê birîndar bûye û li cem me ye… Sih û yek leşker mirine, di çalakiyê de neh çek, termalek hatiye rakirin. Dibe ku ji ber barê giran ê çekan bûye sedema wê birîndariya xayîn. Belê, sotînerî û bêrehmiya jiyanê dest pê kir.

Dor, dora me ye û dema întîqamê ye. Em ê vê serkeftinê bidomînin û bibin layiqê têkoşîna milîtanên egîd ên PKK'ê meşandiye, we meşandiye. Axxx çiyano, ma hûn dizanin ez di nav hestên çawa de me! Vaye em di nav maneyê de ne û jiyan dikin. Dê çawa bi encam bibe, em nizanin. Dem…

Ma ez ê jî karibim bibim xwediyê ewqas şens. Ax dilê min dişewite dilê min, hê pir zû bû ji bo çûyîneke wisa. Em her tiştî di berdêla xwînê de ji nû ve ava dikin, çi heyf û mixabin e ku em di berdêla xwînê de ava dikin.

**4'ê Hezîrana 2010'an**

**Bibîrxistin**

Vê gavê bêhneke pir xweş tê. Li cihê nobeda nuxteya me ya li ser tehtên bilind im. Aliyê herêma me tîne bîra mirov, dişibe wan deran. Ev bêhna pir xweş û tuj, Semsûrê, çiyayên Toros tîne bîra min. Mirov ber bi xwe ve dikişîne.

Bayek bi awayekî pir xwezayî vê gavê porê min tevdide...

**Hezîrana 2010'an**

**Bêrîvan**

Bêrîvan Karakaş gerîlaya salan e, dema vesaziya min a ji bo Zagros bihîstibû çawa qîr kiribû. Hevala min a dînejin ku dixwaze bê Zagros, hewce dike hûn nas bikin. Miroveke ne ji rêzê ye, hevaleke awarte ye. Bêrîvana Serhedî…

**Hezîrana 2010'an**

**Hezkirin**

Vê gavê hevala Rozerîn û Sema ku zêde zêde dinivîsin ji min re dibêjin, "pênûs û defter xwe li ber me nagirin, xelas bûn."

Ji kenê Rozerîna weke zarokan, ji jinan, ji vê jiyanê pir hez dikim…

**Hezîrana 2010'an**

**Gund**

Me doh xwe berda gundan. Ji bo ku li birîna hevalê Gabar mêze bikin sê hemşîre ji Colemêrgê hatibûn. Hevalê Gabar, Tekîn, Demhat, Serhildan, Tîrêj, Çekdar, Roza û grûbek ku ji hevalên Xwe Parastinê pêk dihat em doh bi şev li gund bûn. Em bi awayê hin di kemînê de hin di nobedê û hwd. de bin belav bûn û me tedbîra xwe stend. Em li mala milîsê timî tê cem me bûn. Keça wî bi mêvanperweriya Kurdan a hezaran sal û rehma dayikekê xwarinek datanî pêş min û xwarinek ji pêş min radikir û her digot, "ma çima xwarinê naxwî?"

Pir ecêb jî bûm, piştî bi salekê çûbûm gund. Ji nav sîstema me bi xwe, mêzekirina li nav jiyana em jê hatin pir cuda xuya dike. Her tişt pir sexte ye, li hev çêkirî ye, ji cewhera xwe hatiye dûrxistin. Bi rastî tiştên ti car ne xwezayî ne û ji min re pêkenok tê. Mirov dikare bi awayekî pir zelal çanda me ya mirovperwer ji hev derxîne. Rewşên trajîkomîk jî hene. Hewesa ku asîmîlasyonê ew afirandine, di livûtevgerê de û di cil û bergan de xwe dide der. Rozaya li Stenbolê hat bîra min. Jixwe gundê me yê xweşik Aloman jî li cem wê… Min dît ku ew gund dê bi exlaqa xwe ya paqij, wijdanê xwe yê xerab nebûyî û bi zanebûna xwe ya xurt, çawa bibin bihuşta jiyana azad a welatê me.

Xwezayîbûna li cem wan bandoreke pir mezin li ser mirov dikir. Li dijî burjuwaziya biçûkirinê û marjînalîzekirinê hêrsa min bi pêş dikeve. Ax çiyano, gundno, utopyayên min, cihên herî bilind, malzaroka jiyana watedar…

Dema li gund wê keça ciwan em dîtin çavê wê çirusîn. Bi dengekî wisa digot, “heval…” Weke gerîlayeke jin li pêşberê wan bûm. Pir bi kelecan û germ bûn. Ez fikirîm ku gelo li şûna wan ez bûma dê çi li min bihata? Xeyala bi heybet a gerîla hate bîra min. Bi şêwazekî ku bibim layiqê berpisiyariya ser milê xwe, pîvan û rêgezên milîtaniyê biparêzim hinekê axifîm. Ewirên wan hinekê jî bi xembarî, dilbiêş û mînetdar bûn. Yên ku wan îro ditîtin îhtimal hebû sibe, du sibe tevlî karwanê nemiran bûna. Ma ne guneh bû ji wî temen û wê ciwantiyê re? Kesên li pêşberê wan, kesên ji bo mirinê bûn. Wisa li me mêze dikirin. HPG, hêviya wan a ku xeyalên wan dixemilîne bû… Navê hebûna bi awayekî azadane bû PKK… Weke biçin çalakiyekê me xwe amade kir û em çûn. Me karê xwe xelas kir û em derketin. Dema em dihatin nuxteyê min bi kêfxweşî û heyranî li vê keştiya di tariyê de bi evîneke pir cuda ya jiyanê ku ber bi heqîqetê ve dimeşe ya tije milîtanên me ye û xwe digihîne bendera konfederalîzmê temaşe dikir. Bi saya Rêbertiyê…

**11’ê Hezîrana 2010’an**

**Li dûr im**

Roza bi kû derê ve çûye, li kû derê ye? Li cih û warên dûr e, li Samûra ye. Em doh ji quntarên Semadarê hatin Samûra, Gelî. Grûba me ji hevalên Perwer, Qendîl, Welat, Çekdar, Berçem û Roza pêk dihat. Em ji gelek gundan derbas bûn; di şiverê û cadeyan re derbas bûn. Li gorî ya Dalê araziya vê derê nermtir û rehetir e jî. Em li saet şeşê derketin û sibeyê, me di saet şeşan de xwe gihand nuxteya hevalan. Li cem min BKC’ya min a ku pir ji min hez dike jî hebû. Ji ber ku ti kes tine bû me ew jî anî.

Em donzde saetan meşiyan. Me ji gund, li Guzereşê milîs girt cem xwe. Bi pêşwazîkirina germ a dayikan, pîrejinan em kêfxweş bûn, me bi

hev re xwarin xwar û paşê me dewam kir. Me gundên weke Mezra, Tuxubê, Zayîde, Heşetê qut kir.

Dema ku min sibeyê li herî pêş xwe gihand nuxteyê heval Rozerîn, Viyan û Ezda ji ber bayê sibeyê û westabûna erka ku wê şevê pê de çûbûn di xeweke kûr de xewn didîtin. Sibeyeke xweş bû. Min xwe nêzîkî Rozerîn kir. Porê wê pêl dabû, piştre min çente û çeka xwe danî û ji wan re got rojbaş! Di cih de dan xwe û rabûn li serxwe. Weke çêjikên wêrdekan mabûn şaş, serçavên hemûyan werimîbû. Nedizanîn ku em ê bên. Min piştre ev hevalên pir bêriya wan kiribûn maç kirin, têra xwe hemêz kirin. Hevala Ezda dilzîz bû, ji ber pir bi awayekî şidayî hemêzkirina wê ez hestewar bibûm. Ji tiştên vê dawiyê hatibûn jiyankirin bandor bûbûn. Niha jî ez li vê derê me, li cem van hevalan im. Gelo Sema û Helena çi dikin? Xweziya derfet hebûya wan jî heval bidîtana. Ew jî çûn aliyê Valto da ku li hedefan bigerin, araziyê nas bikin û hwd. Grûbek heval jî hevalê Gabar birin Başûr. Van demên dawiyê grûba Dalê belave ye. Li vê derê jî, hin heval çûne kişfa cihên cuda. Em pir mijûl in, em şer dikin. Çar aliyên Gelî qereqol in, tepe ne, gund û cade ne. Erdnîgariyeke xeter e…

**12’ê Hezîrana 2010’an**

**Xweşikbûn**

Ma hûn pê dizanin ahenga min a li gel jinan pir baş e. Hîs dikim her kes ji min hez dike. Xwediyê coş, moral û kêfxweşî me. Bi her kesî re didim û dîstînim. Ji ber ku zû ecz nabim, teng nabim, uslûba xwe xerab nakim, dema pirsgirêkek derdikeve bi nêzîkatiya çerserkirinê nêzîk dibim û ti tiştî ji xwe re nakim asteng heya bi niha ti pirsgirêk derneketin. Adapteyê pratîkê jî bûme. Fîzîka min baş e, ruxmî ku BKC ye, dema di nav van tehtên asê de em dimeşin hin heval nikarin xwe bigihînin min. Ev min bextewar dike. Ne ji bo pesna xwe bidim dibêjim heval jî dibêjin, “xwediyê îradeyî, jîr û zekî yî.”

Difikirim di mijara rêgez û pîvanên me de dirust im. Hevalên xort ji jinên xwediyê rêgez û bi pîvan bandor dibin. Li gorî vê nêzîk dibin. Bi rastî jî mimkûn e kesayetiya min a rehet û xwezayî, bibe sedem ku ew

bimînin şaş. Lê ji lewçetiyê nefret dikim û ti car destûrê nadim ku bê wê astê.

Sekna jinê pir girîng e, pir diyarker e. Li vê derê asta zanebûnê ya îdeolojîk, rêxistinî pir girîng e. Ji ber vê yekê em weke jin dikarin hevalên xort li xeta azadiyê girêbidin, guherîn û veguherîna kesayetiyê, nûbûna zehniyetê bi pêş bixin. Ji bo vê jî hewce dike asoya jinan berfireh be. Yê/a ji te hez dike, divê karibe li gel te ji bo heqîqetê têbikoşe. Eger dibêje ji te hez dikim, divê karibe hîs bike ku heqîqet evîn e, evîn jî bi jiyana azad watedar dibe û divê xwediyê wê zanebûnê be ku ti tişt ne hêsan e, azadî berdêl dixwaze…

Belê, kêlî bi kêlî hewl didim bi rêgez û pîvanan têkoşîna vê bimeşînim. Bawer im hinekê jî serkeftî me. Çima, ma hûn dizanin? Ji ber ku min jirêzêbûn red kiriye û xwediyê îdîa me ku xwe bigihînim milîtaniya jina azad. Di sîstema kapîtalîst de laşê jinê girîng e, lê em cuda ne. Di moderníteya demokratîk de em girîngî didin bedewiya ruhî. Di vê jiyana ku em her kêliyê bi hev re jiyan dikin de ajo sembola şermê ne.

Evîna herî rast a serbilind; di jiyana azad de evîna ku bi ruhekî gerdûnî. Li mirov, xweza, li jina ku azad û dadê heml e…

**13’ê Hezîrana 2010’an**

**Xwaziya**

Axx berpirsiyarî, xwaziya her kes te hîs bike…

Xwe bi kesayetiya jina azad re yek kirin û ew qebûl kirin di rêyên îdeolojîk ên asoya zanebûnê re derbas dibe.

**Hezîrana 2012’an**

**Operasyon**

Vê gavê li kifşê me. Gundê Heşetê li pêşberê min e. Hema li biniya wê, gundê Gissê heye. Cade û av di ber hev re berdewam dikin û diçin. Erdnîgariyeke paqij e. Deşt tam li pêşberê min e, qereqol bi lampeyên xwe yên bi şevê diteyisin dibe bajarekî îqtîdarê.

Doh dema dinya bû tarî û li ber heyveke xemgîn ku kêm mabû biçe ava, li ber barana Hezîranê ku demeke lê kiriye, li ser tehten bi heybet, bi awayekî xwe dirêj kirî, gava ku min li cihê me yê întîşarê yê dişibî şaneşînekê dijmin dişopand, min ji hevala Ezda, hilatina rojê li Araratê guhdar dikir. Ji bo wê Ararat pir cuda ye. Tam dişibiya weke ku li Semsûrê li ber wê heyva bi heybet û wan stêrkên mezin di xeweke kûr re çûyînê û bi têhna tava sibeyê çavê xwe vekirinê. Belê, min jî li Nemrûtê xweşikbûna hilatin û çûne ava ya rojê ji hevala Ezda re vedigot.

Ruxmî ku hejmara wan bi hezaran e, niha em gerîlayên qasî taximekê ne ji bo leşkerên li vê qereqolê çiqas girîng û xeter in. Doh fikirîm û her ku fikirîm di ber xwe re keniyam. Ji ber ku em ji mêj ve bi ser ketine. Me tovên tirsê, ecêb xistiye dilê wan.

Ji ber vê yekê jî doh li operasyonê bûn. Belê, sibê em bi dengê qobreyan ji xewê şiyar bûn. Balonên berdidan azman ronî dikirin û dûkeleke reş belav dikirin. Bi qasî şeş jê berdan. Em jî derketin şikêrên jora me û dema qobre dihat me tevger nedikir. Serasera gule dibarand. Demekê gule reşand cem me. Gava ku me dît li azman qobre difirin û ber êvarê jî leşker weke pez di cadeyan re dimeşin, em fikirîn dibe ku leşker daxin û li derûdorê operasyonekê li dar bixin. Belê nêzîkî hezar leşkerî hebû. Xwe ji sirt berdan xwarê û hêdî hêdî meşiyan.

Me hemû roja xwe di nava şikêra ku em tê de xwe vedişêrin, bi nan û ava ku hevala Ezda aniye derbas kir. Ew xwediyê tecrûbe bû. Ji derveyê wê ti kesî tiştek neanîbû. Hevala Viyan jî ji ber ku çenteyê xwe neanîbû destpêkê xwe bi xwe ecz bû û nan nexwar lê piştre xwar. Ji ber ku çenteyê Roza bi grûba çûbû kemînê re bû tiştên wê li binê tehtê man.

Doh grûba me ya pênc kes ji bo ku li ber skorskyê kemîn vedin çûn ew cihê leşker lê difitilîn. Bi xwe re qernas, du BKC û sê qlêş birin. Dikarîbûn leşkerên doh nêzîkî Gelî paşde kişîne li cadeyê biqefilînin. Lê ti tişt neqewimî. Dema dûrbîn di destê hevalê Perwerde bû, ji pirsa ‘gelo çi qewimî?’ re, bersiveke wisa dida; “ji ber kelecanê dê dilê min bisekine.” Belê em niha benda agahiyan in. Gelo çi qewimî? Me agahiyek jî nestend. Em lê binêrin, em dîqeta terza liv û tevgera xwe dikin û li bendê disekinin. Deftera Rozerîn ku emanetê min kiribû li jêrî

ma, hewce dike vê gavê wê bistînim. Ew jî bi wê qernasa xwe ya pir jê hez dike ji bo sekvaniyê çûbû, bawer im dê saxlem bizivirin. Li pratîkê em bi şevê tevger dikin, em her şev diçin erzaq. Bi roj em tevger nakin, îstirehet dikin, rûdinîn. Roja han ez, Viyan û hevala Ezda weke hêza YJA-Starê bi şevê em daketin gund û me hin xebat kirin. Weke jin çûyîn pir xweşik bû. Di şeva reş û tarî de em pêşengên rêyê bûn. Gerîlayên jin ên bi heybet, jina bi hêz dibe, jinên bi hêz dibin û jiyanê xweş dikin çiqas xweş e. Rola me ya di jiyanê de diyarker e. Axx eger em nebin…

**16'ê Hezîrana 2010'an**

**Çalakî**

Hevalan çalakî li dar xistine, rojek tine ye cenaze neçin Tirkiyeyê. Hevalên Xakûrkê çalakiyeke berfireh a super li dar xistine. Tê gotin sih û heft kuştî lê ji sedî sed hê zêdetir e. Birîndar jî hene û gelek malzemeyên teknîkî, malzemeyên leşkerî hatiye rakirin, hin jî hatine îmhakirin. KT dihêje. Hemleya me bi awayekî pir xurt didome. Evqas şer jî bê şehîd nabe. Sê şehîdên me hene. Hevalê Botan Başkale ku me li Arê hev nas dikir û hevalê Qurtay Wan, Devrîm Tatvan bi lehengî nefesa xwe ya dawî dayîne. Birîndar jî hene. Parastineke pir xurt a hevalan hebûye. Li herêma Şehîd Bêrîtan a Xakûrkê, li ser girê qonserve çalakî hatiye lidarxistin. Gelo Arzelen û Pelşîn çawa ne?

Hê tiştên cuda yên qewmî jî hene. Dijminê ku ji ber vê yekê dîn û har bûye, hemû heq û hiqûqa mirovahiyê bin pê kiriye û êrîşê gelê me, zomên gundan kiriye, miriyên wan hene. Ev çi wijdan e, ev çi şerekî bê qural û bê rehm e? Sîstema me ya alternatîf dikin hedef. Ewqas ecz im ku bi yek gotinê ev hov in.

Gelê min ê bedew, bi vê hovitiya xwe nikarin hê zêde mirovahiyê bixapînin. Maskeyên wan tê xwarê. Ji ber vê ye ev panîk û lezûbeza wan. Belê, masaya qrîzê ji mêjde pêk hatiye. Erê, wan xwest. Vê gavê nota Rêbertiyê ya hevdîtinê tê xwendin. Deng hinekê qutqutî tê, ez ê piştre bigirim û guhdar bikim.

Hevalên me bêyî ku tiştekî bikin hatin. Ji bo ku di gundekî re derbas bin taktîk kirine û cilên gundiyan xistine ber xwe. Ji hev re dibêjin û dikenin.

Dema ketine nava operasyonê neçar mane paşde bikişin. Belê, hevalên me amadekariyên çalakiyeke nû dikin. Dê êvarê vesazî bên xwendin û biçin. Lê Roza weke bûkeke nû dimîne. Berçem, Viyan, Roza, ji ber ku em nû ne, dibêjin Partî nikare rake û hwd. hevalê Perwer dibêje; “ez qet nikarim rakim.” Dibêje; “bi şiklekî hestewar nêzîk nebe û ecz nebe, şer karê tecrûbe ye, nivîskara me tu hema her binivîse.” Belê, ez ê binivîsim. Ji ber çûna evqas hevalên xweşik hîs dikim ku westabûnekê ez dorpêç kirime.

Doh em çûn erkekê, bi şevê li ber ronahiya taveheyvê, Roza, Ezda, Rozerîn û hevalên xort… Rozerînê zehmetî dikişand li hêviya wê mam û weke her tim me bi sohbet kirinê meşa xwe domand. Nuxeteyên em tê de zehmetî dikişînin weke hev in.

Meşa min baş e. Li van çiyayên pir jê hez dikim weke bifirim dimeşim. Bawer im hêza hezkirinê ev e. Delala me ya Agiriyê, fermandara me ya taximê hevala Ezda dema ez ketim pêşî, ez hişyar kirim û terza min weke li gorî xwe bûnê nirxand. Me hevalê Welat jî da sekinandin û em li bendê man ku ew bikeve pêşiyê û piştre em ketin tevgerê. Tevgera me weke ku navenda gerdûnê be her kesî ber bi xwe ve dikişîne, weke miqnetisekê, me berê hemû mirovahiyê daye mirovbûnê.

**20’ê Hezîrana 2010’an**

**Noxteya Şehîd Sîpan**

**Heval**

Pirsek; eger yek bêje, “peyva gerîla herî zêde bi kar tîne çi ye?” Eşkere ye dê bersiv bibe ‘heval’. Ma hûn man şaş? Gotineke gerdûnî ye, ‘Heval’.

Kêliyekê ji beriya vê kewekî xweşik ji ber me rabû, qasî jê hat kire qebaqeb û li baskên xwe da, firiya û çû…

**Hezîrana 2010’an**

**Îradeya jinê**

Ma hûn dizanin; şoreşa jinê xwe gihandiye serkeftinê. Li van çiyayên qedîm bi hemû bêhna xwe ya xweşik ve cîgerên me tije dibe, weke xwîna di damaran de can dide, weke avê diherike. Ev tam heşt roj in hevala Berçem, Viyan û Roza li çiyayekî bilind ê bi kendal, di tariya tarî de vê navbera zeman weke ji dîrokê hesab bixwazin tije dikin. Ma di wê sîstema pûçbûyî ya kevnare de ev mimkûn e? Hê jî zêdetir, ev dijminekî pir bêrehm e jî dişibe şerekî her tim di kemînê de; dilê xwe dibijînin

xezalên xweşik. Belê, dijminê me hov e û bê rehm e, herî zêde jî ji êrîş û egîdî û xweragiriya me ya jinên Kurd ditirse…

Difikirim digihîjim wê encamê ku ya me îradeyeke ecêb mezin e. Ez û Viyan bi rastî jî em pir bi hêz in. Em ewqas bi lez in nikarin xwe bigihînin me. Me di vê pêvajoyê de li gel hev sohbet kir. Em doh di nanpêjiya xwe de ketibûn qrîza kenînê. Hûn ê bêjin sedem çi bû? Ji ber ku me hevîrê xwe û bi ava sar strayîbû, tirş nebûyîbû. Dibe ku ji havin jî be. Lê belê nanê me weke ew nanê hevalê Çekdar wan lêxistibû ku req û weke lastikê bû heft rojan berdewam kir. Gotinek heye, dibêje “lome neke ji cîranên xwe, îro li serê wan e û sibeyê dora te ye.”

Lê me dixwest bi heweseke mezin ji hevalên me yên ku ev deh roj in ne li van deran in, pir westiyane û hincirîne nanekî baş bipêjînin. Dema ev nebû me di ber nan re senaryoyek nivîsand. Xeyalên me wisa bûn; “em ê di fermiyetê de radibin, rexnedana xwe didin û sedemên wê dibêjin: herî dawî em ê dibêjin, ji ber ku heval ji bo çalakiyê çûbûn timî em bûbûn nanpêjên sabît, li şûna ku bi me re pisporî bi pêş biketa, li cem me berevajiya wê bi pêşketiye û hwd.” Em ji kenan zikopişto bûbûn. Dema karê hevala Berçem bi cîhazê xelas bû hate cem me. Min hevîr bi hevkariya wê strayîbû. Ji ber wê yekê nedikariya dengê xwe bike. Bi bêçareseriya tiştek nekirinê me hemûyan digot, heyfa nirxên me. Belê, em ê ders jî bistînin û ji xwe re bikin tecrûbe.

Di vê navberê de dema em bi tenê man min û hevala Berçem me sohbet kir. Min rexne û fikrên xwe yên ji bo wê anîn ziman. Min diyar kir ku hewce dike em ji aliyê têkoşîna azadiya jinê ve hê hişyar bin û her çendî biçûk be jî em destûrê nedin tiştên wisa. Ew jî wisa dihizire. Got ku wê talox kiriye, bi mantiqa ku vaye em jin çareser dikin, girîngî daye pirsgirêkên hevalên xort û di vê nuxteyê de kamasiyên wê hene. Yanî tiştê ez bêjim axaftineke baş û erênî bû, bêhna min fireh bû. Divê em weke hevalên jin alîkarî bidin hev.

Em bên ser mijara ku ez jê xemgîn bûme; hevala Zaxo ku ez pir jê hez dikim, pir qîmet didimê, hevaleke kevn, xwediyê tecrûbe, nêzîkî milîtaniya jina azad e ji cem me diçe, vesaziya wê çêbûye. Doh bi cîhazê axifî û bi her kesî re axifî û ji wan xatir xwest. Planên wê hebûne ku bê û me hemûyan bibîne lê çi feyde, bê şensî… Lê belê ez hatim vê

herêmê. Min pir dixwest pê re demekê bimînim. Destpêkê min ew li Arê nas kiribû. Ji aliyê leşkerî ve jî sekneke wê ya bi hêz û heybet heye. Hevala Zaxo li qada Rêbertiyê maye, çi tiştekî baş e! Xwaziya her kesî qasî te berpirsiyarî û pêwîstiyên vê şoreşa mane û wijdanê hîs bikira û pêk bianiya… Te ji bo xwe mînak digirim. Di nav şoreşê de hema bêje pijiyane. Pir ked, têkoşîn dane û bi ser ketine jî. Bûne kesayetiyên ku êşan ew bi hêz kirine.

Em şoreşa jinê deyndarê gelek tiştan in, deyndarê wan in jî. Doh, vê mijarê ez pir xemgîn kirim. Ji bo tiştên neqewimin re dîsa min got, “xweziya.” Em nizanin dê biçe kû derê, lê bi baweriya ku ev vesazî hewce bûye hêvî dikim ez ê careke din wê bibînim. Serkeftin ji bo te endama milîtana jina azad a Rojava.

Ev demeke ji hevalan deng dernediket. Me pir meraq dikir û dawiya dawî hatin. Grûba kemînê doh bi şev di nobeda min de hat. Çi li yên din hat gelo? Me agahiyeke revê stend, em nizanin ji kîjan hêzê ye.

Ka em lê binêrin, of, offf….

**28’ê Hezîrana 2010’an**

**Jiheveqetîn**

Dilşikestî me, dişibe werbûna di kendalan de. Weke ku peravên dilê min qeşa girtine, rûbarên xembariyê diherikin. Vê berêvarê bêriya stêrkan dikim, sterkên min şibandine kesên jê hez dikim. Ji bo stêrkên ji cem min xurucîne dilê min şikestî ye, dîsa dilzîz bûme!!!

Ax jiheveqetin, ey jiyan! Jiyana ku di mijara hunera digihîne hev, parve dike û ji hev vediqetîne de bûye pispor! Gelo bi vî halê me dikenî? Dibe ku tu ji kenan zikopişto jî bibî he! Ma pê dizanî ez îro nikarim ji ken zikopişto bibim.

Li van çiyayên me yên qedîm bûm delala kendalan, derdikevim hêlînên teyr û bazan navê we qîr didim. Hemû lehengên bê nav ên dîrokê, yên ku dîrokê dinivîsîn lê bê dîrok mane…

Ey hêrs û kîn, çawa jî mirov hemêz dikî weke evîndaran. Ma birînên me yên çûyînan sax bûn?

Hûn çi dibêjin ey zozano? Di dilê min de teyrek bask dide. Weke bixwazim bikevim xewê û careke din hişyar nebim çavên xwe digirim. Utopyayên xwe hemêz dikim û bi nav xeyalan dikevim. Piştre ji xewna

rastiyê hişyar dibim. Li temenê xwe yê li dûv jiyanê xirikî ye mêze dikim.

Temen welatekî wenda ye, gerdûnek e, xwezayek e, zindiyek e, mirovek e, jinek e, zarokek e, keçek e ciwan a li pîrozbahiya şer e…

**Hezîrana 2010’an**

**Nivîsîn**

Grûba çûye çalakiyê bi B-7’ê li çeteyan dan, du kuştî û birîndarên wan hene. Xayînê bi navê Welat Kobanê ev çend roj in bû sedem ku em rojên pir zehmet derbas bikin. Kesekî pir tirsonek, ziman dirêj bêîrade bû. Ruxmî tiştê hatinê jiyankirin, çalakiya ku bi birçîbûn û westabûna ku ji aliyê xwestek û israrê ve hatiye çewisandin û wisa hatiye bi ser xistin. Heval saxlem vegerîn. Me bi şevê gelek macera jiyankirin.

Hevalê Perwer civîn li dar xist. Kêmasî û nebesî hatin rexnekirin. Belê, terz û ferasetên şaş zû yan derereng wenda dikin. Heqê ti kesî tine ye şervenên azadiyê yên Rêbertiyê vala vala biwestîne. Ev terz min dîn dike, nikarim xwe bigirim. Çareseriya herî baş rêxistinî bûn e, belê em ê ji vê bi şûnde mêzê bikin.

Ez hê li Gelî me. Min bêriya Dalê û hevaltiya li wê derê kiriye. Bêrî kirin, ken û gotinên nîvçe mane. Hevalê Perwer çû. Tam ji bo şer hatiye xuluqandin.

Salên dûr û dirêj ku neçariyê ew kaml kirine şer ji bo wî bûye girêdaneke mezin. Me fermandarê xwe yê leşkerî bi merasîmeke leşkerî bi rêkir. Ji min re digot, “nivîskara me.” Ez ê bibim layiqê vê hezkirin û rêza wî û hewl bidin tiştên hêvî kiriye binivîsim. Digot, “em ê piştî çend salan te bişînin Dêrsimê” em lê temaşe bikin ka dê bi kû derê ve biçe ev keştî? Sîpela êş, zehmetî û kêfxweşiyan.

**1’ê Tîrmeha 2010’an**

**Gelî**

**Pirsgirêk**

Em niha hatine û li nuxteya em doh bi şev lê sekinîne, ya nêzîkî Xwe Parastinê ye. Ez, Berçem, Zerdeşt û hevalên Xwe Parastînê, Bedîrxan û Botan in. Pir germ e. Doh me li maleke gund xwarin xwar. Bi qasî em biteqin xwarin dan me. Dîsa dayikek ku bi tena serê xwe mayî bû. Me li gel vê dayika kedkar ku pir qedir û qîmet dida me, sohbet dikir ku westabûna ji ber kedê ya ev çend sal tê çi maneyê. Mitfaqa wê ya belavela û tevlîhev, dayika min a ku digot, "mayîna bêyî keç bûye sedema tevlîheviya karê min." Jixwe ne neheq bû jî.

Doh lingê min bi erda birinc çandî ya li keviya şiverê çû û me li avê da. Jixwe em ji ber şaşfêmkirinê li vê derê ne ji beriya em ji Gelî derkevin me civîna xwe ya tîmê li dar xist. Pir baş bû. Em hemû qederekê axivîn. Me yek bi yek hev nirxand. Hevala Rozerîn jî bi nêzîkbûnên xwe yên hestewar û serasera bû sedema aloziyê.

Me li gel hevalê Bedîrxan bi şevê qederekê li ser mijarên îdeolojîk, rêxistinî sohbet kir. Li Semsûrê qederekê xebat kiriye, her derê û malbata me hemûyan nas dike. Bi mirovên me re di heman zindanê de maye û got ku pismamê min Memed, ji hatina xwe piştî demeke kurt dema ji Amedê derbasî Xerzanê bûye şehîd ketiye. Belê, hemû ciwanên me yên marjînalîze bûne nas dikir. Piştî salan xwîşka Cemal, Barış ku li gel wan di heman zindanê de mabû, li Geliyê Zapê, li Zagrosê dîtibû. Jixwe ev tesadûfên jiyanê ne, ew nizane. Min negot ku ez ji wan im. Bi israr pirsî. Ez pir şibandime, Hacera pevjîna Osman. Eman Xwedavendno, çiqas balkêş e, di nav civakê de jî timî behsa vê biserhevebûna me dikirin. Lê careke tenê ew dîtibû û wisa piştî salan ez dişibandim wê… Em keçxaltîkên hev in lê bila… Ji ber aliyê rêxistinî ve min nexwest bêjim lê wî bawer nekir.

Sema Wan û Êrîş, di nav hevalên Sumbulê de bûn, bi hev re revîne. Dibêjin ku hevala Sozdar pir ked daye Sema. Vaye îxanet, ixanet… Jiyan didome, ruxmî her tiştî.

Pir diyar e û weke me jî rexne kir, hevalê Bedirxan diyar kir ku li gel hevalên Gelî feraseta taximperêstiyê tê jiyankirin. Digot qey ez jî ji wê taximê me. Min jî destpêkê xwest bi pirsên weke çima û ji bo çi, fêm bikim ku sedema vê çi ye. Lê ruxmî ku rojekê li cem me mayîbû baş çavdêrî kiribû. Belê, ferasetên bi vî awayî ber bi malbatperestî û çetetiyê dibin. Ji ber ku ew bi xwe di nav de ne ferasetên wisa çelexwarî ferq nakin. Kesekî

ji derve tê dikare pir baş fêm bike. Ewqas mercên jiyaneke rehet afirandine lîberalîze bûne. Ji wan bipirsî hevaltiya samîmî ye. Lê belê zêhniyeta me ya ku pêk tê ev e, li pêşberê hev zêde rehet bûn, hev parastin yanî feraseta “em, taxima me, em û ne ti kesî din.” Dema di jiyana asayî de yan jî ji nav wê taximê wezîfedariyek dibe yan jî dema morala hevalekî/ê ji wê taximê xerab dibe, bi hestiyarî nêzîk bûn, zêde bala xwe nedana ser hevalên din… Hevalên xort ên din jî dixwazin jinan ber bi xwe ve bikişînin.

Hevala Rozerîn pir serasera ye, dibêje, “bila her tişt di cih de pêk bê.” Xwe sînordarkirin ji bo Rozerîn astengeke mezin e. Axx keça şêrîn, xweşika kenînê, pir delal dikene. Ji bo min got ku ez di jiyanê de ne çalak im lê ez nas nekirime. Ew di cih de her tiştî dixwaze ku pêk bê. Ev jî rêbazeke pir xerab e. Di mirov de zêhniyeteke nû ava dike. Divê mirov li gorî wê bi şiklekî çêker, xwediyê rêbaz û bêyî ku ti car ji rêgezan ya wî bidî nêzîk bibî. Min hinekê xwe da ber lêpirsînê, weke destpêkê bûye min nexwest rasterast bidim nav bûyeran. Hinekê jî ji ber rêz û hurmetê bû. Hevalê Çekdar dema li ser min nirxandin dikir, bi awayekî dijwar got, “xwe bes dibîne.” Li gorî min hinekê jî rexneyeke bertekperest bû lê ez ê li ser biponijim û dîqeta wê bikim.

**5’ê Tîrmeha 2010’an**

**Bin darguzekê**

Di gerîla de jiyan evînek e, ya ku xweşikî û bedewiyan diafirîne ew e. Kî dizane kî man li vê derê, kê xwarin xwar û çay vexwar? Hevalê Remezan li vî parçeyê axê xwediyê pir bîranînan e. Li cem yekeya Xwe Parastinê dimîne. Malbata wî li Mexmûr e û ew bi xwe nîv gerîla ye. Hevalê Remezanê Çelê ku hevalekî pir nazik e, fedekar e, zindî ye, li ser xwe û bi hêz bû, hêvalê Dijwar, Loqman, hevala Berçem, û Roza mirîşkên li nuxteyeke li pişta Guzereşê bû, bi nanê ku dayikan di tandurê de pehtibûn xwarin.

We şaş nebihîst hê em bi rê de ne. Hevalê Zerdeşt doh li gundê Mezre ji me veqetî. Wê rojê dema dît ez dinivîsîm got, “me jî hinekê binivîse, em bikevin nav dîrokê.” Min di dilê xwe de ji vî hevalê ku doxtorî xwendiye re got, jixwe tu bi wî dengê xwe yê xweş di nav dîrokê de yî. Belê, marşa me ya qedîm ew dibêje.

Piştî ku em şevekê li şikefta xwe man, li mala Mam Xidir me bi hevalên Xwe Parastinê ve hev dît. Doh min bi zarokên biçûk re sohbet kir. Min û Ronahî me nobed bi hev re girt. Xwîşka Şukranê refa çaremîn xelas kiribû. Pir şêrîn bû, min pir bêriya zarokan kiriye. Hêlîn, Adem, dê û bavê wê, jinbiraya wê, bi malbatî gerîlayên ku bi salan e pêşwazî kiribûn dîsa pêşwazî kirin. Ronahiyê starana ku wan rojan her li ser zimanê min bû got. Paşê min ji wê re behsa Şehîd Ronahî û Bêrîvanê kir. Ronahiya Biçûk digot ku ew piştî bûyerên tecawûz û wendakirinan ji navenda pir hez nake. Ev bûyerên dema ku bihîst tirs û xof dixin dilê wê û gotinên wisa, nêrîna malbateke ji rêzê ya Kurd didan der. Gelekî hincirî ye…

Mezin be û mezin be Ronahî; mezin be, dibe ku li vî welatî êş tine bibin. Tu yê weke Rozaya demekê di temenê te de bû mezin bibî. Dema tu mezin bûyî em ê ji bo te û yên weke te dinyayeke xweşik ava bikin. Wê demê hûn ê li wê pîrozbahiya jiyanê ku ez bi hesreta wê me ya hezkirin û aramiyê bijîn. Hûn di keştiyên heqîqet û evînê de, li ser erdên bê sînor nefesê bistînin, bi axê re bibin yek, li gel xwezayê bibin yek, ji bo zarokên xwe pêşerojeke serbilind amade bikin…

Belê, em bi BKC’yê li gundan digerin. Taxima me ya din jî dê bê. Jixwe piştî rev û surgînan em ji tabûrê kêm mayîne. Li cem hevbûn ji gelek aliyan ve dê baş be. Bila weke dixwazin wisa rehet hespên xwe nebezînin. Ya din jî dema çalakiyan e, em ê her di liv û tevgerê de bin. Her bijîî!

Par di vê mehe de hevalek ji şervanên nû hatibû cem me, ev hevala ji şervanên nû hatibû cem me ji ciwanên zanko yên ji kampa Şehîd Rustem (Mexmûr) bû. Ez fêr bûm ku ev heval, keça hevalê Remezan e. Wê demê me bi hev re sohbet kiribû. Ji heval Pêlşîn re gotibû ku ew min pir zekî dibîne û wê ji min hez kiriye. Çi tesadufeke mezin e piştî salekê em bi bavê wê re li ser heman mijarê diaxivîn, ji min re dibêje ku ew keçeke pir zekî ye. Dibişîrim, çi tiştekî balkêş e! Ev tiştên balkêş her rastî min tên. Malbatek ku bi Partiyê re yek bûyî...

Ya din jî behsa hevalê Xebat jî bikim. Ew jî ji navenda Colemêrgê ye, sala 93’an tevlî bûye. Dema cara destpêkê Dalê, weke herêm ji xebatê re vekirine vedibêje. Ji ber ku dijmin hewl daye gel bike

cerdevan pir rojên birçî, şevên zehmet derbas kirine. Hevalekî ku amadeyî xelas kirî yê xwediyê asteke diyar a çandî ye. Wan deman û rewşa niha didim ber hev û kendal derdikevin li pêşberê mirov. Niha zêdegavî, ji bo xwe û gel nêzîkbûnên ji rêzê hene. Tiştên wisa çavê gel dişkîne û bê bawer dike. Ew ji bo cilê li ser me û gerîla xwediyê hurmet in. Em çawa vê paşguh dikin? Ma ev ne şerê wijdan û heq bû? Vaye hin kesayetî wisa ne.

Îsal ji bo hêzên leşkerî daketin gundan qedexe ye, divê rêxistin nekeve bin qontrolê. Ruxmî wê ji ber hin tiştên ji neçarî em neçar dimînin bikevinê. Divê em li ser bisekinin. Eger em hişyar nebin dibe ku em bi rehetî derb bixwun. Vaye ez ji bo vê xefleta me ecz dibim. Hevalê Dijwar dibêje ew ê li ser bisekine. Hevalekî pratîk û pir radîqal e. Terza wî diecibînim. Jixwe dema ew hebe yên din bê deng dibin, pir komîk e ma ne wisa ye?

Hevalê Bedran, Zerdeşt û Roza bi hev re dê biçin çiyayên Bêzar ên Semsûrê. Erdên xalê min lê şehîd bûbû; Çiyayê Bêzar… Ka li kû ne ew Apoçiyên berê…

Gelek tiştên binivîsim hene, lê destê min pir êşiya û melûl melûl difikirim ku ez ê îşev çawa di wê rêyê dirêj re BKC'yê bi şûnde bibim.

**8'ê Tîrmehê 2010'an**

**Mêşa hingivîn**

Mêşeke hingivîn ketiye guhê min û diperpite, dengê wê dibihîzim, hema bêje dinale. Ax Xwedavendno! Nikare derbikeve jî… Bî, ez ê çi bikim? Ev çi tiştekî ecêb e hate serê min? Ev ê çawa derkeve, offf!

**Saet 05:14**

**Heman roj**

**Şehîdên me**

Li nuxteya Şehîd Hedar li nobedê me. Ev der nuxteya destpêk û dawî ya milîtanên çalak a hevala Adar û hevalê Sîpan ku du kevokên aştiyê bûn ên ji qada Geliyê Zapê çûbûn. Zarokên agir û rojê ji vê derê dest bi rêwîtiya xwe ya dawî ya di welatê rojê de kirin. Ev nuxte berevajiya yên din daristan e, giyayê zer bûne û hişk bûne bi goraya min ve

dimînin. Derxistin qederekê ked û hewldan divê. Nuxteya Şehîd Sila teht û şikêr bû, em dîsa li cihekî pir bilind in. Divê gerîla li van hêlînên teyrûbazan bin.

Wê roja han şensa min çêbû ku li televîzyonê temaşe bikim. Dema min gelê me yê di serhildanê de ye dît, min jê moraleke mezin stend û li van çiyayên me yên hîseke tenê mayînê wergirtiye weke agahiyekê bistînim li min hat. Belê, em pir bi rumet in. Em xwediyê şenseke mezin in ku gelekî me yê pir ji me hez dike û me diparêze heye; em zarokên vî gelî ne, milîtanên vî şerê mirovtiyê û milîtanên vê dema biesl in û hevalên Rêber Apo ne, peyrewên Roza, Clara, Nataşa, Bêrîtan, Zîlan û Besêyan in.

Noteke hevdîtinê ya din jî hate xwendin. Piştre hevalê Dijwar, bi awayekî kurt û cewherî kêmasî, şaşî û rastiyên li taximan, di tabûrê de tê jiyankirin anî ziman. Di nav rêveberiyê de nîqaş kiribûn, xwestibû ji hevalan re jî eşkere bike. Weke sohbetê bû, pir baş bû. Bi vî awayî dema li ser pirsgirêkan nîqaş dibe û di hindurê mirovan de ti tişt namîne pir bextewar dibim. Belê, pir ji rêgeza eşkerebûnê hez dikim. Ev derket holê; di tabûrê de gelek rexne tên pêşxistin lê ev di pratîkê de pêkanîn lewaz e. Jixwe hejmareke me ya diyar heye, yanî yên rexne dikin jî em in, yên dikin jî em in. Pêwîst e em bi giştî dîqet bikin.

Heval dê vê êvarê biçin çalakiyê. Axx, ez ê kengî biçim? Lê divê em nelezînin. Eger me grûb bi grûb arazî nas bikira dê baş bûya. Bi taybetî hevalên jin. Min roja han di civîna xweser de anî ziman, doh jî min di cîhazê de bihîst. Li ser mijarên weke fêmkirna pêwîstiyên pêvajoyê û şer, kûrbûna ji aliyê îdeolojîk û felsefî ve dihate nîqaşkirin.

Belê, êdî ev şer şerê gerîlayên modern e. Dema em gerîlayên modern pratîze bikin wê serkeftin ya me ye. Hejmareke kêm, çawaniyeke mezin û serkeftineke pir mezin.

Di vê pêvajoyê de wendahiyên HPG’ê tên jiyîn. Dema tabûra me ya Herkî çalakî li dar dixe, donzde heval şehîd ketine, şeş heval di paşde kişînê de şehîd ketine. Axx ev paşde kişînan, heval ti car nikarin wê baş bi plansazî bikin. Fêmnekirina ji stratejiyê û di taktîka berê de israr, lezûbez tevgerîn vaye ev e. Ji bo wendahiyên me yên ji ber vê terzê vala, pir bi hêrs im. Çareserî; rêgezên gerîlayên modern e.

“Dewlet ji çareseriyê ditirse. PKK jî ji şoreş lidarxistinê ditirse.” Vaye Rêbertî bi awayekî kurt û cewherî me vedibêje.

**10’ê Tîrmeha 2010’an**

**Îdeolojîkbûn**

Têkoşîna herî mezin, herî biesil û herî bi serbilindî li dijî vê sîstema pûçbûyî sekinîna li ser lingan e. Neketina qrîzê ye, pesnekirin e. Ji ber ku divê bê zanîn, ji ber vî awayê nêrîna ku sîstemê di mêjiyên me de weke dogma lê kiriye, hemû bûyer û diyarde bi vê perspektîfê tên şîrovekirin. Dibe ku têkoşîn kenê xwe bi van kirin be. Di ferqê de bûn jî bi vê karîn be; Rêbertiya ku dibêje, “heya bi nanê ku em dixwun her tişt îdeolojîk e” fêm kirin be. Di ferqê de bûn, kamilbûn be, yên li pêşberê xwe guherîn û veguherîn û di zêhîn de şoreş li darxistin be. Vaye xwezaya sêyemîn wisa tê afirandin. Dema em weke jin li van çiyayên me yên zelal têkoşîna serbilind a afirandinê dimeşînin, aliyên tengav dikin ên vê dozê bi pêş dikevin. Hejandinên di mêjî de di hestan de tên jiyankirin û îxanet, ne tenê di revê de ye. Zerer dayîna Partiyê, nirxên Partiyê, rêgez û pîvanên wê, zerer dayîna xeta îdeolojîk û felsefîk; feraset û terzên cuda afirandin; bi van terzan kes ji aliye fikrî ve ji rastiyên Partiyê dûr xistin, revandin, çelexwarîkirin, bê moralkirin, tengezarkirin îxaneta herî mezin a li hemberî vê rêxistinê ye, vê jiyanê ye. Dîsa li hemberî Rêber Apo û hemû şehîdan îxaneta herî mezin e.

Ma hûn ê nebêjin, “têkoşîna herî mezin a li dijî vê ye?” Hûn ê bêjin. Têkoşîna herî zehmet û dûr û dirêj li dijî vê îxaneta ku dihincirîne ya hindurîn serkeftin bidestxistin e. Fersend nedayîna wan e. Meydan ji wan re nehiştin e. Vaye rêya civakeke nû dê di vê zêhniyeta nû re derbas bibe.

**13’ê Tîrmeha 2010’an**
**Gelî**

**Nêrîna me**

Helena, Sema û hevalên taxima din hatin. Di vê pêvajoyê de pir hincirîne. Hem ji aliyê fîzîkî ve hem ji aliyê ruhî ve…

Gelo kî dema sibeyê şiyar dibe, ewirekî li vê mekana me ya pîroz dike û tîne bîra xwe ku ev der cihên pir bi heybet ên afirandinê ne û jiyana ku weke rûbarekê diherike û diçe hemêz dike û dixwaze wê watedar bike? Gelo fikirandin çêdibe? Eger na, ewir vala vala û bi eczî li ser derûdorê tê gerandin? Û gelo jiyan bi tiştên rojane û ji rêzê tê mijûlkirin? Ma ne guneh e? De ez û tu dest bi şer û lêpirsîneke hindurîn bikin…

**Tîrmeha 2010'an**

**Gelî**

**Êş**

Belê, doh bi şev janên jiyanê bûn volqan. Dîsa min nelet li xefletê, bêzanebûnê anî. Ji bo terzeke herî biçûk a şaş êdî tehamula min nemaye. Me ji bo mirovahiya serbilind ev şer dimeşand, ma we ji bîr kir hevalno!

Ev der bexçeya azadiyê ya Rêbertiyê, ya Roja dilê min a wateyê ye. Li vê derê her tişt nirxdar e. Cihê ku hezkirin tê mezinkirin û çandin e. Diyarê armanc û hedefan e. Em nikarin li vê derê moriyekê bikujin. Li vê derê her tişt cidî ye; empatî, rêza ji bo hebûnê esas e. Demokrasî, wekhevî, dadmendî û bi her awayê hebûn tê jiyankirin…

Belê, me doh nuxteya xwe guhert. Ez, Sema û Helena em di pêşde hatin. Viyan û Ezda li pey hevalan dimeşîn. Em ê li araziya me ya şikêr û asê ji xwe re cihekî çêbikin. Min û Sema, ji bo razanê me ji xwe re cihek peyda kir û paşê dest bi çêkirina kamelyayê kir. Êvarê min baraniyê xwe raxist. Min BKC û çenteyê xwe anî, goraya xwe derxist, lingê xwe yê di nav ax û giyayê ku ketibû pêlavê de da ber hewayê. Viyan û Semaya bê teqat ketibûn jî hatin, em li ser baranî rûnîştin û me dest pê kir hem em sohbet bikin û hem jî tiqetiqa ken ji me bê. Em keçên bi coş ên Samûra, bi pişta xwe ya diêşiya ketin rewşa razanê. Piştre hevala Helena hat û cihê me guhert. Morala min xerab bû, ji ber ku em pir westiyabûn.

Di vê navberê de hevalên ku ji bo çalakiyê çûbûn, Berçem, Rozerîn û hevalê Loqman bi şiklekî xemgîn zivirîn. Dixwazim biçim çalakiyê.

Min nabin naskirina araziyê û hwd. jî. Bê plan in, ne aktîf in. Ka li ku mayî Rozaya dînomîno ku hatiye vê derê, dibe ku bi hêz bibî jî he! Bi ecziya ku nêzîkbûna terza ne erênî ya sar li cem min çêdike, şev baş.

Eger hevaleke/î min serkeftî be kêfxweşiya herî mezin a min e. Di vê pêvajoyê de gelek hevalên min nas dikirin, li cem wan sohbet dikir şehîd ketin. Hevala Barîn hevaleke pir xweşik e, dema hewl dide mayîneke berê hatiye çandin derxe şehîd dibe. Ji perwerdeya sabotajê nû hatibu. Di dewreya xwe de bûbû yekemîn. Di wan rojên baran dibarî de, nava wan çavên wê yên diteyisîn germahiyek belav dikir, hezkirinek belav dikir, me ewirên kûr vedidan hev. Paşê em bi hev re derketibûn firinê, me nanê gerîla lê xistibû. Ya din jî ew porê wê? Ew porê keça bêdeng a Rojava çiqas jî lê dihat. Axx hevalên me, ma çima şandine mayînên hevalên din çandine!

**16'ê Tîrmeha 2010'an**

**Hesret**

Civîna taximê hate lidarxistin û erka hevala Berçem hate sekinandin. Destpêkê ez rabûm û min bi şiklekî dijwar her tişt nirxand û rexne kir. Bi rastî gelek tiştên bên nivîsandin hene. Ez ê bi rojnivîseke din dewam bikim. Rojnivîsek ku min bi israra hevalê Perwer wergirtibû.

Belê hevala Newal di nava vî şerê giran de rojnivîsê xelas dikim. Gelo tu çidikî? Min pir bêriya te kiriye. Hevalên li vê derê jî pir xweş in, em di wê astê de bi dirustî û paqijî bi hev ve hatine girêdan, her difikirim eger em rojekê ji hev qut bibin em ê çibikin. Lê dizanim dê ew rojên qutbûnê bên. Weke qutbûna ji vê rojnivîsê ku hatiye. Ev qutbûn çiqasî ji min hez dike.

Divê bi qasî ku em bikarin binivîsin. Hûn jî binivîsîn! Herî zêde jî vê jiyana alternatîf, jiyana mucîzewî binivîsîn. Bi hemû dilgiraniya tiştên min nekariye binivîsîm, nekariye vebêjim vê rojnivîsê xelas dikim. Her roja li vê derê tê jiyîn weke ronamnekê ye. Çiyayên xoştewîst, di ser jiyana bajaran re salek derbas bû, pir zêde bi we ve hatim girêdan. Bi hêviya ku ez ê layiqê vê têkoşîna pîroz bim...

Kêzikên gûstêrkan bi şevê pir xweş diçirisin. Ronahiya yekane ya rêya me ev kêzik in. Heval û hogirên me yên şevê ne.

**20'ê Tîrmehê**

# ROJNIVÎSA DUYEMÎN

# JI JINA AZAD A PÊŞEROJÊ RE

## Ji Bo Rêbertiyê, Roja Dilê Min A Maneyê Silav û Hezkirinên Bê Dawî...



**Di sotînerbûna jiyanê de çalakiya destpêkê**

Em bi bişirînan dihizirîn, kêfxweşiyên me ber bi têra xwe kenînê dibûn, em gav bi gav dimeşiyan ber bi xetereyan. Araziyên ji kendalan xerabtir ên Çelê ku gerîla li ser wan digeriya. Ronahiyên wê dişibin alaya li qiraxê bajarekî. Ronahî êş û xembariya sih û heft salan e. Êşa asê xwe berdaye nava dilan, bi ewirên tirsonek, gumanperest, ewqas jî bi kelecan, daxwaz û kêfxweşiyê hatiye dorpêçkirin dilê vî gelî.

Qralîçeya sotîneriyê, ji bo ku moralê bide gelê me, tiliyên me li ber textikên BKC û B-7’ê xwe çêkirin. Milên me di qirîza sar a hesin de, weke lehîyeke dîn û har bûyî ku berê xwe daye dîwarên Îmraliyê, me gule barandin bi ser Çelê de. Kesên li Çelê jiyan dikin neçar in her roj guh bidin marşeke şer ê ne bi zimanê wan. Ew zarokên biçgok ên Kurdan bi van ji xewê şiyar dibin. Dema ciwan mezin dibin noqî çala zordarî û asîmîlasyonê dibin û dilê min pê diêşe. Dilê min î ku diêşe ber bi qiraxên Çelê ve dibe.

Em parastina nêzîk û grûba mayînan bûn; heval Roza, Bager û Çiya. Heval Ezda, Amed û Çekdar grûba ku bi çekên giran lê bide, ew deh deqîqe li jêra me ne. Heval Viyan, Loqman û Dijwar li jora Tiyarê qoordîne bûn. Hevalên me tepeyê ewlekariya Çelê kirin hedef û bi BKC û B-7’an lê didan. Her çendî guleyên B-7’ê negihîşt hedefê lê BKC û qlêş bi bandor bû, rewşeke bi bandor a pir xweş çêkir.

Piştî ku vê grûbê lê da û heya bi cem me paşde kişiya, me obûs û hawan xwar. Her cara dengê qepsûnê dihat min bi şiklekî acemî xwe bi erdê re yek dikir. Demekê hevalê Çiya got, “ma hûn çima xwe diavêjin erdê, aliyê pê de biçe diyar e.” Tam di wê demê de bi dengê qepsûnê ku hat min xwe avête erdê, hevalê Çiya bi dengekî eczbûyî got, “ba ye.” Piştî bi deh saniye gurminî pê ket û li pir nêzîkî me da. Ji erdê rabûm û min ji hevalê Çiya re got, çi bû, baye yan na? Werhasil… Ez, Ezda û hevalê Bager em bi şiklekî saxlem çûn tepeyê qoordîne.

Sibe zû dijmin derket araziyê û mayînên me çandî bûn bi destên hevalê Bager dijmin xiste nav mirinê. Vaye teqtîka tirs xistiye dilê dijminê ku xwestiye ji cihê xwe dernekeve û vê hemleyê vala derxe. Roja beriya wê jî li Helwesîsê mayîna me teqiyaye, baweriya min heye

di van deman de MİT'ên Çelê pir ecz bûne. Jixwe agahiyên operasyonê hene. Divê em hişyar bin, niha dîn û har bûne.

Me çend hedef diyar kirin, em hem li ser wan axivîn hem meşiyan, me bi grûba din ve li jêr hev dît û em vegerîn nuxteya xwe ku dişibiya maleke germ. Di vê çalakiyê de tiştê bûbû sedem ku morala min xerab bibe ew bû, bêyî ku bi kar bînim min dîsa BKC zivirandibû. Eger tiştekî awarte biqewimiya yan jî skorsky bihata min ê bi kar bianiya. Dema wisa nebû jî xemgîn bûm, vala vala enerjiya min wenda bû.

Ji Sarahanê li Çelê mêzekirin û ew hîs kirin cuda ye. Ew rojên ku em ciwanên bindest ên nêzîkî azadiyê, zarokên pêşerojê, ronahiyên li wî bajarê biçûk ê serbilindî û şer, bi rengê, kesk, sor û zer bixemilînin nêzîk in. Dê rojek bê, ew roj jî dê bên. Dînitiyên weke zarokan ên hevala Ezda, hevalê Amed û Çekdar, dema paşde kişînê dê bi kenê dengê bilind bibe, kelecan û coşa heval Viyan û Loqman ji nû ve zindî be, vaye wisa dibe hezkirina ji jiyanê. B-7 û BKC xistin destê xwe û bi ser paşverûtî û hovitiya dijmin de çûyîn…

Dema em sibeyê zivirîn me dît, Helena û Sema, fermandara me ya nû ya bolîkê û hevala jiyan ku dê bibûna alîkara hevala Ezda li nuxteyê razayîbûn. Hevala Medya dişibe hevaleke kûr, xwediyê tecrûbe û xweş, em jiyan bikin û bibînin. Ez pêşketinên vê dawiyê jî ragihînim: Civînên taximan pêk hatin, pir rexne hebûn. Erka hevalê Zinar û Ali hate sekinandin. Hevalê Demhat û Ali bi nebesiyên xwe ve diçin Başûr, hin vesazî çêbûn. Yanî taxim tarûmar bû. Me du şervanên nû tevlî kirin. Sîstemê çiqas zêde ciwanên me daqurtandine! Xwaziya her kes weke me bi ken û kêfxweşî tevlîbûna. Bi rê de hevala Rozerîn qederekê bûyer jiyan kirine. Hevala Adar û Barîn dibêjin, "dê pêş bikevin û wê xefikê bibînin." Axx Rêberê min divê em kêliyekê ji beriya kêliyekê Akademiyan bi şiklekî xurt bi pêş bixin. Têkoşîna herî hewce dike û herî bi lez û bez bê meşandin ev e. Hevala Medya li cem her kesî axivî, tenê ez mam. Dîsa bi min re neaxivîn. Nizanim, ew rapora agahdarkirinê, hevala Medya û hevala Sozdar xwendine. Dibe ku hinekê nas kiribe. Belê, jiyan didome, jiyana ku bi her tiştê xwe ve yekparê ye wisa jî didome. Dem weke avekê diherike…

**31'ê Tîrmeha 2010'an**

**Her bijî gelê min ê qedîm**

Lûtkeyên Samûra, ronahiyên Çelê, tepeyên tarî yên Botan. Em li ser erdên tavaheyvê lê daye, bi lez û bez dimeşin. Ji ber wê yekê sir û seqama zivistaneke giran em dijîn. Lingên me ber bi Semedar ve diçin. Li pişta Roza pênc sed gule, li ser milên wê yên diêşe BKC'ya neh kilo û nîv- şaşalê avê, tulumê wê… Li arwazên asê, li ser rêyên Dalê, ber bi Deşta Xanê li rêyan e. Taxima Dalê bi hejmara xwe ya biçûk diçe.

Hevala Medya, Helena, Sema, Amed vê gavê hemû li Zozanan zer bûyî razayî ne. Ez çûm û min keşfek kir û hatim. Li derûdora min erdên bê dawî yên Colemêrgê ku Toros, çiyayên me yên Kurdan pir zêde tînin bîra min. Li zozanên pir paqij bêhnên pir xweş tên pozê min. Rêwitiya me ya doh bi şev zehmet û dûr û dirêj bû. Bi rastî giraniya guleyên BKC'yê pirrr zehmetî dan min. Offf Xwedavenda min, eger ez bi BKC'yê nekevim çalakiyê ez ê bimirim. Eger ez çûbama deh çalakiyan, bi qasî min gerandiye nediwestiyam, nedihinciriyam. Hin hevalên me ewqas bêxem in, bêberpirsiyarî ne û bêçareserî ne, êşa wê laşê min ê egîd dikişîne. Ya din jî di HPG'ê de bê alîkar BKC nayê rakirin lê kî dikare bi fermandarên me bide fêmkirin. Ya rast ew e, îro li cem wan im kî dizane ez ê sibeyê li kû derê bim.

Kes tine ye. Em neçar in. Neçariyê tu diafirînî, eger tiştek ji sûda wê zêdetir zerarê wê hebe, ti maneya kirina wê, sûda wê tine ye. Çi dibêjin, agahiya operasyonê heye, divê em tedbîr wergirin… Bêyî ku ti kes alîkariyeke cidî bike, min BKC rakir. Nêzîkatiyên bi vî rengî didin revandin û li gel çand û exlaqa PKK'ê ti eleqaya wan tine ye. Ev nêzîkatiyên ji aliyê kesan ve tên pêşxistin, dibin sedem ku ez pir bêriya kesên ez ji wan hez dikim bikim. Li ser psîkolojiya min neyînî bandor dike. Ji ber vê yekê hêrsa min a ji bo paşverûtiyê mezin dibe. Û ez di kesayetiya têkoşer de israr dikim.

Weke gelê me yê Geverê. Xweseriya Demokarîk îlan kiriye, gotiye qada sor a hatiye rizgarkirin û navên cadeyan guhrîne. Her bijî gelê min ê qedîm. Belê, bila pêl bi pêl biçe her derê ev hemle. Ji nû ve Kurdistana serbixwe. Êê em ê çi bikin, destê aştiyê vala dimîne. Têkoşîna me ya serkeftî bi lezeke mezin didome.

Min ji Bêrîtana dil nazik a Geverê not wergirt. Nivîsandiye pir zehmetî kişandiye û pir bêriya min kiriye. Axx birîna dilê min, axx jiheveqetîn, rêyên dûr û dirêj, kesên ez jê hez dikim… Xwazîka ez li cem te bûma, hevala min a xweşik. Xwaziya, xwaziya… Te ji bo min gotiye “jina asê û bi hêz.” Di nav vî şerê sotîner de bi rastî wisa me gelo? Êdî ez jî diwestim Bêrîtan! Feraset, terz û zêhniyetên heyî diwestînin. Ma gelo dema her em diwestin bihêz dibin?

Ji bo te pir pir silavên şoreşgerî û hezkirin dûrahiyên ku min bêriya wan kirine…

(Di veqetîna doh de ji ber nelihevkirina min û hevala Ezda me destpêka lehiya hezkirinê ya destpêkê jiyan kir)

**2’ê Tebaxa 2010’an**

**Bavê min î birêz**

Berêvareke bêxem û xemgîn, dîmena te dagirt her goşeyê mêjiyê min. Bavê min î ku ti car nedihate bîra min wê berêvarê bûbû êşeke zirav a dilê min. Di nav hêrsbûn, asêbûn, serhildêriya ciwantiya min û ruhê min ê tarûmar bûye de weke parçeyên cameke şikestiye dinaliya. Kî dizane tu bi çi dihizirî? Gelo tu çiqasî ji bo vê keça xwe ya bi hêrs, bi hêrs bûyî? Ew ruhê te yê weke zarokan, nedikariya biaxive, îfade bike, ew ewirên te yên tije bi hezkirin timî min hîs kirin. Doh min bi hesreteke herî mezin ew mirovê xwe xistiye qaliban bi hesreteke herî mezin bêriya wî kir. Ew ewirên te yên bifikar ên di veqetîna me ya dawî de di bîra min de bûn.

Bavo, di jiyana gerîla de saleke min temam bû. Êdî bêrî kirin û hesretên min kevn dibin. Hezkirinên min weke stêrkeke mezin lê hatin û kesên ji wan hez dikim bi qasî bên bidest girtin nêzîkî min in. Dilê min tije bi hesret e û giran e. Ruhê min li ber kamilbûnê ye, te bi hesret hemêz dikim. Bi utopyayên xwe ve li hev têm. Hêrsa min ji bo sîstema ku te dorpêç dike. Di xeyala çalakiyê de me, berêvarê, bi kelecana guleya destpêkê avêtine me.

Ey jiyan, ey bavo! Ma eger mirovahiyeke me ya rizgar bûyî hebûya, em ê neçar bimana ku vê têkoşîna mirovahiyê bimeşînin? Ma eger

jiyaneke bi mane, wekhev, heqiqî ya te bidaya kurê xwe hebûya, keçeke te ya îsyankar dibû?

Ma min ê wê demê vê bedena xwe ya ku hesretê dayika xwe ye, hesretê xwîşka xwe ye, hesretê birayê xwe yê fîlozof e ku bi bêriyên xemgîn re mezin dibe, hilbigirta? Şoreşgerî dişibe mirina ji evînê. Evîna heqîqetê dilê ji pola digihîne bê mirinyê. Çavên min ên dibiriqin bêriya Rêbertiyê dikin, ji bo ku em li ser aveke deryayê hev bibînin. Di keştiyan de xembar dibim. Em ê biçin çalakiya li Dalê…

**6'ê Tebaxa 2010'an**

**Şehîd namirin**

Hevalê Qendîl li gorî diyalektîka pêkhatina xweza, gerdûn, azman û erdê û li gorî pêvajoya qonaxa hebûna zindiyan, moriyan, çûkan û hem jî mirovan dihizirî, li gorî wê di nava lêgereke maneyê ya felsefîk, îdeolojîk de bû. Her kêlî ji bo jiyanê bişirîn, semboleke Qendîl bû.

Porê dirêj ê Nûdaya min bi xwînê bûye. Xwe li wê realîteya xwe ya radîqal alandiye. Azman tev bi hevokên nîvçe hatiye xemilîn, gotin weke zarokekî zelal e, hîs weke perikê teyran sivik in…

Bi hêrsa hestiyariya kêliyê, rondikên çavan dişibin kêreke tuj. Dil bi ber bayê tûfanî ketiye, ketiye xefika teyr û bazan. Û bi dilekî şikestî tevlî karwana bêmiriniyê bûyîn… Hevalên ku min di pêvajoya hevparvekirinê de nas nekiriye, hevalê "Zinar" û hevala "Berçem" hevalên hevaltiya îdeolojîk. Di pey xewneke xeter a "Sozdar". Gelo dorpêç rastî ne yan xewn in. Çar aliyên mêjî, bi êşa wan di qirika min de asê maye. Dem Sozdarê li rondikên çavê xwe dide, bi israra ku mirinê têk bibe… Û gelek wan hemêz dike. Jinên Kurd birînên wan ên xwîn jê tên dipêçin. Bi mîlyonan gel radike bedenên wan. Li Sumbul, Cîlo, Zagros. Û li hemû çiyayên me yên têhn bûyî. Şehîd bê mirin in!

*"Disoje dilê min!*
*Xwaziya wisa bi encam nebûya."*

**10'ê Tebaxa 2010'an**

**Li pêşberê ronahiyên Colemêrgê xewa du şevan a kişfê…**

Ji hev hez bikin û hêzê bidin hev. Yekîtiya nakokiyan: Xwediyê fezîlet bûn; ne ya xerab lê ya baş tê tercîhkirin, ne ya şaş a rast tê tercihkirin. Ya xweşik zora ya kirêt dibe. Jiyan, diyalektîka hebûnê herî dawî bimisogerî xwe digihîne heqîqetê.

Wê demê meşandina têkoşîneke rasteqînî şert e. Çima yên têkoşînên herî rast dimeşînin neheqiyên herî mezin jiyan dikin? Yên keda herî mezin didin, eziyetên herî mezin dikişînin. Afirînerên herî biesil, tine dibin û diçin. Kesayetiyên herî dirust, êşên herî mezin dikişînin. Mixabin e ku hesûdî, ezezî, egoîzm xwe nîşan dide.

**10'ê Tabaxa 2010'an**

**Ji Jina Azad re**

Em jin em ê kêngî ji hev hez bikin û hêzê bidin hev? Em ê kengî perdeya zor û îqtidarê ji holê rakin ji pencereya me ya zelal û paqij li jiyanê temaşe bikin?

Vê şoreşê çiqas êş û janên wê hene. Weke volqaneke amade ye biteqe me. Dixwazim nefesê li pey nefesê bistînim. Difetisim. Bila bayekî paqij bê. Dilê min nedizin. Dixwazim bibim bayekî azad pêşerojê li hemû sînorên veşartî derbas bikim.

Ez dixwazim bizanibim êş û jana afirandina te çendî mezin e. Têkoşîneke her kêlî û her dema wê zor û zehmet e. Beden westiyayî ne, mêjî di vê labîrentê de westiyayî ne. Ma zengên serkeftinê dê lê bidin. Vî dengî ma hemû jin dê bibihîzin? Li Afrîqayê zarokek keç, li Îranê jinek, li Awrûpayê keçeke ciwan û li Kurdistanê dayikek wê wî dengî ma bibihîze? Adar, Barîn, Nûda û hevalên din…

Gelo dê dîsa sîberên wan derkevin ser dîka dîrokê? Ma dê têkoşînên etnîkî ji her timî zêdetir bi neheqiyan re rû bi rû bimînin? Li Medyayê Maniyek, li Hîndistanê Bûdayek, li: Çînê Konfûçyûsek, li Almanyayê Rozeyek, li Rûsyayê Nataşayek, ji Zapatîstan Marcosek û li Ûrûqê Tîamatek, ji Êzîdiyan Esterek ma dê bi ber tevkujiya xeter a tinebûn û bênavbûnê bikeve? Ma dîrok dê çewt bê nivîsandin?

Li pêşberê evqas rastiyan, li gel evqas ked û nirxeke bêdawî ma dê Marks çawa nirx-pereyên wê diyar bike? Mirov di nava vê têkoşîna hov û derveyê mirovahiye de temen, can û xwîna xwe didin. Ma telafîkirina vê, pere-nirxeke vê dikare bê diyarkirin? Ma ji kengî ve hest ji bo firotinê ne? Sîstem û pergal ji kengî ve kirêt in? Evîn û hezkirin ev çend bihar in kirêt in? Û dostaniyên jidil ev çend sed sal in sexte ne?

Mîdeya min dixele, vedireşim hemû heqîqetên îxanetan. Her ku vedireşim bûnyeya min zeyif dibe, lewaz dibim. Hê jî li wê derê ne bi israr biharên derewîn lê her der tarî ye, kor bûme. Ronahî! Şewqeke lewaz çavê min çavkorkî dike. Bêriya ronahiya gundekî feqîr dikim, aram, xemgîn û rehet. Li mala gundekî dibim hevalê Che. Jineke gundî, ew nîv Xwedavendek e. Li çiyan mêze dikim. Agirê mirandî geş bûye. Ber bi diyarên Zerdeşt, Înana , Mezlûm û Bêrîtanan ve dibezim. Li Zagrosê şiyar dibim û silav didim Îmraliyê. Bi qebiliyeta berekî dema tê avêtin avê pêlên her bi derûdora xwe ve belav dibin, xewnên xwe ber bi çiyan ve dişînim. Ji bo ku berhemeke îdeolojîk bidin dixim nava axê û di wê derê de vedişêrim. Didim ber bayekî û digihînim hemû mirovahiyê. Rêberê min ez ji jiyana paqij, zarokên bê gunek û jiyana bi zanebûn pîr hez dikim!

Hevala Medya Doz di jiyana xwe ya gerîla de salên zehmet, neasayî û bi êş borandiye. Di jiyana wê de hemû rastî nerewa bûne. Ne gengaz e dilê min ji hêrs û kînê nelerize, ji ber vê têkoşîna fedaîtî û maneyê.

Bang dikim, bibihîzin!
Nelet li dema bê ziman
Nelet li bêhefizabûnê
Nelet li bêdîrokiyê
Bila bê neletkirin,
Cihên hatine xerckirn û mirovên xerc dikin…
Xwedî li hev derkevin,
Jinno! ji hev hez bikin û hêzê bidin hev…

Tiştên pênûsa min nenivîsandiye ewqas zêde ne û tên jiyankirin ku…
**11’ê Tebaxa 2010’an**

**Dostanî**

Mirov, bi qasî ku hewl dide zehmetiyên wê/î bixwe jiyan kirine bi kesên din nede jiyankirin, deriyê jiyaneke nû ya îdeolojîk û felsefîk vedike, eger ne wisa be jiyan weke labîrenteke tev bi qaos lê tê. Weke avzêyekê dibe, her ku kişand dikişîne. Û têrê nake. Mirov dişkê, hêvî qut dibe, ma bi ber dikeve?

Pirs bi pêş dikevin. Ji ber ku canê mirov dişewite, dilê mirov dişikê. Dilê mirovan pir bi qîmet û girîng e. Dema carekê dil şikest, belê dema carekê dil şikest… Jiyan di nava dil de veşartî ye…

**12'ê Tebaxa 2010'an**

**Tav**

Ma tu dizanî min çenteyekî nû wergirt, yê min ji şervanên nû stendibû pir hincirîbû û biçûk bû. Ev demeke dûr û dirêj e me çente xwestibûn, her çendî zêde ne saxlem bin jî dawiya dawî hatin. Weke ku ez ê zêde nikaribim bi kar bînim.

Hevala Sînor tevlî me bû. Ji Hawraman e. Weke hevaleke baş xuya dike, em ê bi hev re jiyan bikin. Taxima me ya ku bêkes mayîbû, ji aliyê hejmar ve temam dibe. Hevalê Çiya jî nû ye. Vê gavê ez û hevala Ezda, em ji bo ku çar şervanên xort ku me nû tevlî kiribûn bibin Başûr amadekariyê dikin. Hevalên din jî dest bi amadekariya çalakiyê kirine. Hin heval jî amadekariyên grûba biçe Bakûr dikin. Ez pir dixwazim grûbên Bakur bibînim, hêviya min ew e, em ê xwe bigihînin wan. Hesp jî li cem me ne, em ê ji bo hevelên li Şukê erzaq bibin, qet erzaqê wan nemaye. Em ê ji bo wan çîkolata, penîr û helew bibin. Bila hevalên min cejnê bikin.

Vê gavê ba tê. Dinya pir xweş e. Taxima din çûye çalakiyê, hê ti agahî tine. Dîsa hin heval li cihên cuda cuda şehîd bûne. Me ji bo 15'ê Tebaxê hişyariya êrîşa hewayî wergirt. Nizanim ji bo çi ecz im. Rêyeke dûr û dirêj li benda min e. Baş e, ez ê biçim û rêyan jî nas bikim, ji te re dibêjim bi xatirê te. Min ev pênûs jî nû wergirtiye. Nûbûn…

Hin caran hevala Sema û Sînor bi hev re bi Farisî diaxivin. Ji bo hevala Sema pir kêfxweş bûm. Dê ji bo wê baş be. Dibe ku ez jî fêrî

Farisî bibim he! Ma ne baş e! Dixwazim fêr bibim. Ziman dewlemendiya me ne. Dixwazim dewlemend bim, bi zimanê biesl ê wan xîtabî her kesî bikim û bi wan re parve bikim. Rexne ji bo Helena pêş ket ku bê plan e. Hin caran bi rastî jî pir bêplan tevdigere.

**13'ê Tebaxa 2010'an**

**Pêvajoya bêçalakbûnê**

Heya bi 20'ê îlonê pêvajoya bêçalakbûnê hate îlankirin. Belê, Rêbertiyê berevajî pir zêde hewl dide ku modernîteyeke demokratîk a alternatîfê modernîteya kapîtalîst e biafirîne, wê bide jiyankirin û jiyanî bike… Me tam jî ji bo çalakiyên li pey hev yên piştî wê hincirîna bê mecal xwe amade dikir.

Vê gavê hevalên Medya, Helena, Sema, Rozerîn, Berfîn, Sînor, Roza rûnîştîne û li benda saeta perwerdeyê ne.

Di dawiya dawiyê de hevala Sozdar hat. Hatina wê ya Geliyê Zapê û çûyîna wê bû heman tişt, çawa hat dîsa çû. Civîna herêmê hebû, bi hevala Ezda re çûn. Paşê dê dubare bê. Ji ber bandora şehadetên vê dawiyê, weke dilşikestî û westiyabûyî xuya dikir. Ji aliyê hestewarî ve pir bandor bûbû. Me bi vê dema xwe ya tengav bûyî civîn li dar xist.

Ma ez bi we re tiştekî parve bikim? Em milîtan in, lêgervanên heqîqetê ne. Lê belê hevalên rêveberiyê hev bi tenê hîştine û ji ber vê yekê ketin tengasiyan û nebêsî derketine holê. Rast e, lê belê bi vî şiklî xwe di pişt tiştan de veşartin, bi vî awayî xwe weke bê çareserî be û reben be nîşan dayîn şaş e. Wê demê ez ê bipirsim; ma Rêbertiyê sih û heft salan têkoşîna xwe bi tena serê xwe nemeşand, em bi nebesiyên me ve rexne nekirin? "Bi tenê bûn, heqîqet e." Tê yan ji yarê fedakarî bikî û yan jî ji canê xwe. Ew naxwazin ji her duyan jî fedakarî bikin. Jiyan dijwar e, yên ji jiyanê dijwartir ên karîne di jiyanê de bi ser bikevin.

Hûn ê bêjin çi qewimî? Di nav grûbên Bakur de min hevalê Zamanî dît. Dibêje, "diçim Xerzanê." Em li ser rê axivîn. Dîsa dengê ken bi ser me ket. Dema mirov hevalên li gel wan parve dike dibîne, mirov çiqasî kêfxweş dibe. Axx… hûn diçin. Rojekê ez ê jî biçim, heya bi Semsûrê, Bêzarê…

Me şervanên nû birin bolîka Şukê. Bi wan re pir hêrs bûm. Em ewqas meşiyan, hinekê hatibana pêşiya me dibêjî qey dinya xerab dibû. Em di binê wê tavê de sincirîn!

Ez ji bo hevalên jor pir bi hêrs dibim. Çima çalakiyên hemwext li dar naxin. Rêbertiyê em bi şiklekî cidî rexne kirine, em heq dikin. Em nikarin şoreşê li dar bixin, nikarin berê xwe bidin hedefên aboriyê. Em nikarin pir alî bin. Me nekarî em gerîlayên bajêr rêxistin bikin. Di Parastina Xwe de kêmasiyên cidî hene. Em di Pira Siratê re derbas dibin. Rêbertî dixwaze me ji bo gelek tiştan amade bike. Divê em destê xwe lez bigirin, pêwîst dike em bi lez xwe bigihînin dem û mekanê.

Rojbaş; ez ê vê gotinê ti car ji bîr nekim. Piştî nota hevdîtinê ya Rêbertiyê dilê min zîz bû. Niha min strana “Ey Serok” ji radyoyê guhdar kir. Ez ji vê stranê pîr hez dikim. Her cara ku ez guhdar dikim hin tişt ji dilê min diherikin diçin. Dilê weke çêjikekê çûkan heses dibe, weke çîçekekê pir hestewar dibim, pir xembar dibim, dilê min li hemû deman derbas dibe. Dema borî, pêşerojê, gerdûnê, xwezayê û mirovahiyê…

**20’ê Tebaxa 2010’an**

**Em stranan bêjin**

Pir kêfxweş im. Ji çiyan pir hez dikim, ji vê jiyanê pir hez dikim. Baş e ku li van deran im. Di vê jiyanê de hemû deng xweşik dibin, manedar dibin. Bayê bi aramî tê dilê min kêfxweş dike, ya din jî ji bedena min bêhna xwêdanê ya kedê tê.

Dê hemû deng nexweşno stran bêjin.

**23’ê Tebaxa 2010’an**

**Dola Bêzîvê**

**Parvekirin**

Em doh êvarê li ber taveheyveke pir xweş, li ser tehteke bilind rûnîştin. Tavaheyvê bi biriqîneke xembarê dibiriqî. Hema li aliyekî newala diherikî şivereyek hebû. Xwezaya bîranînên gerîlayan vedişartin ku ji aliyê tepe û sûrên bilind ve hatibû dorpêçkirin, derûdora me girtibû, bayê aram ê zozanan serçavên me mist didin. Kêliyekê ji min re

wisa hat û hesteke wisa ez xistim nav lepên xwe ku ez ê di dema pêş de bêriya vê demê bikim.

Hevala Rozerîn hema bêje ji ber bêrî û hesretên xwe bê zar û bê ziman bûbû; min dengekî tije kêfxweşî, tiştên di mêjiyê min re derbas bûne jê re got. Bersiva wê wisa bû: di nav wê bêdengiyê de bişirîneke bê guneh. Êvarê ez tam weke palyaçoyekê bûm. Bêyî bisekinim min stran digot, diaxivîm û min hewl dida Rozerînê bidim axaftin. Yanî mirov qet nikare barê dîneke weke min ku di dema xwe ya bi coş de ye, rake.

Ji Rozerîn dengekî herî biçûk dernakeve. Westiyam û min got, şevbaş. Herî dawî, di navbereke xewê de ez pê hesiyam ku min bi şiklekî şidiyayî hemêz dike. Heya bi nobedê... Hefizaya hişyar dibe. Tu nabêjî bê dengiya hevala min ji ber hin hîsên wê bûye. Me di muxabereya sibeyê de agahî girt ku çar heval ji bo propagandayê diçin gundên li araziyeke nêzîkî dijmin şehîd ketine. Ev heval hevalên ku Rozerîn berê li wê tabûrê dima. Bêrîtan, Avaşîn, Melsa û hê çend hevalên din… digot, “Dilê min ranake, ez hevalên xwe dixwazim.” Kûr kûr digiriya, çavên wê weke agir bûn, pir bi hêrs bû û laşê wê dileriziya. Ez hizirîm, ya herî baş li ser wana nivîsandin e. Min got, Rozerîn, divê em wan bidin jiyankirin, li şûna rondikan bi ruhê întîqamê xwe amade bikin! Rozerîn vê gavê dinivîse. Ez jî dinivîsim û tiştê min ji Rozerînê re gotiye dihizirim. Ev dil û ruhê weke zarokeke bê guneh û paqij, ev laşê wisa biçûk… Weke ku jiyan jê re nebe asteng, weke ku têkoşîn wê hişk neke, weke ku ev jina îsyankar ne di şerê sotîner ê rasteqîniyê de be… Û min da ber hev Roza û Rozerîn. Ew hevalek ku di têkoşîna sala heftemîn a têkoşîna mirovahiyê de pir neheqî dîtî, pir êş kişandî, dostaniyên pir xweş ava kirî ye. Di nav vê jiyanê de pijiye, amade ye. Li xwe dizivirim û li Rozerînê mêze dikim, hê di destpêka lêgera heqîqetê de ye, hê lingên wê bi erdê nakevin. Hê zêde parve nekiriye. Dibe ku weke çûkekê li azmanan be, ling bi erdê nakevin. Çawa dibe û ev çûka dilekî evqas bêrehm bi xwe re digerîne, dimînim heyirî. Hema li ber serê min hevalên min bi wan re parve dikir tevlî karwanê şehîdan bûn. Lê ez hê ji beriya şer bibînim evqas hişk û bê rehm im.

Naxwazim bibim mêjiyekî ku ji aliyê zanistîbûnê ve hatiye daqurtandin. Jê re nabêjim zanistîbûn jî. Tiştê dibe sedem ku ez wisa bim, veqetîn û hesretên zêde zêde ku min ta ji zarokatiya xwe ve jiyan kiriye. Eger ne wisa be, gelo kamil bûm wisa li min hat? Yan jî gelo êşan ev laşê min î ciwan kir ji pola. Zehmetiyên min dîtine gelo dilê min weke kevir lê kirin? Her ku bi hemû jinan dihizirim rondikên min dicemidin. Ji ber ku oqyanûsek pêk hat ji yên me wenda kirine. Di vê oqyanûsê de melevanî kirin jî ji me re ma. Yan heya bi serkeftinê û yan jî heya bi xeniqînê…

Tabûra Herkî ye îsal ne di cih de zêde wendahî dan. Pir xemgîn dibim. Bila 12'ê Îlonê bihataya, ez ê bi ruhê întîqamê biçim ser dijmin.

**22'ê Tebaxa 2010'an**

**Li ser sînorê qedexeyan**

Em vê gavê li zozanan li nuxteyeke nû ne. Doh bi şevê em hatin. Nuxteya me pir xweş û bi ewle ye. Niha ez li ser tehteke bilind li kişfê me. Giyayê bi germahiya sotîner a Şamasê hişk bûne û zer bûne, bi cilê min ê gerîla ve dimînin. Li ser berîka rastê ya êlekê min li ser zemîna zer-kesk stêrka sor, yanî rozeta ku sembola HPG'ê ye heye. Vaye rastiya min a ku nefes li pey nefesê ez ji bo wê têkoşînê dimeşînim. Vaye rengên nifşê mirov, di hinava xwe de hemû demsalan hildigirin. Li demsalekê digerim ku reng ji qedexeyan xelas bûne. Min di nav qedexeyan de ji te hez kir û li ser sînorê qedexayan di şer de me…

Ev çend roj in Rozerîn pir bê moral e. Pir hestewar e, qet neaxive, tevlî jiyanê nabe. Ya din jî operasyon bihîst, tam çû. Dibêje, "taxim û taxim" tiştekî din nabêje. Weke ku yên şehîd ketine ne hevalên me jî bûne. Ev çend girêdana hestewarî xeteriyê di hinava xwe de dihewîne. Taxima jê hatiye derfetê nade ku hin kesên din jî bikevin nava wan. Pir baş bû, em çûn wê derê, me dît û rexne kir. Nexwe dê feraseteke şaş bi pêş biketa û zerereke mezin bida. Ev tovên malbatperestiyê ye. Li aliyê din em ji bo taxima me ya tarûmar bûyî ya 'Dalê' bêjin çi.

Axx li ecemîtiya min. Vê pratîka zehmet gelek tişt fêrî min kir. Me ji araziya xwe dûr, bi rojan di van dolan de vala vala dema xwe wenda

kiriye. Min nedizanî ku ewqas dûrbûn heye. Dema ez wê roja han çûm, hema çawa hatim, ji hevalê Dijwar û hemû hevalan re min got. Divê em nêzîk bin, araziya xwe nas bikin. Jixwe hedefan jî rojane dikarî bişopînî. Êdî cihên mirov lê bisekine jî hene. Em li vê dolê rasterast bûn binesazî û hemû erzaq jî hirçan herimand. Westabûneke cidî, nebesiyeke cidî heye. Dibêjin, “hûn ne binesazî ne” lê em ne li cihên çalakiyan in jî. Wisa xuya ye me dixapînin, ji bo vê ferasetê pir bi hêrs im. Ji bo taxima din, ji berê ve tîm şandin amadekarî kirin. Li her derê hedef hene. Li nuxteyekê ji derveyê hedefên din şeş tepe hene. Hemû hevalên li ser kar hakim jî bi pirani dan wê derê. Li pêşiya wan jî tenê yek erk heye: çalakî, lidarxistina çalakiyan! Ruxmî vê pir pasîf man. Rêveberiya Dalê bi karakterên li hev nakin, çareserî neafirîne dema xwe xelas kir. Tê bîra min di civîna destpêkê ya taxima me de hema bêje hemû hevalan got, “me nedixwest em bên vê taximê.” Mirovên bê ruh, destpêkirine ji xetê derkevin, pergala fikirandina wan ne li ser hev û bê berpirsiyarî…

Di vê civînê de ez rabûm ser xwe û min got, “mirov cihê lê ye xweş dikin, kesayetiya we ya têkoşînê lewaz e.” Her çendî di hemûyan de bişirînek peyda bû jî, ji ber ku nehate fêmkirin min pêşniyar kir ku du rêveberiyên xort yek jî rêveberiya jin ji erk bê girtin. Di encamê de di taxima me de xort nema. Destpêka pratîkê gotibûn, “bila jin neyên Gelî.” Lê hejmara wan a du qat, niha li gel ya me weke hev lê hatiye. Di jiyanê de rêgez û pîvanan hevalên jin tînin bîra wan. Trajîkomîk e! Di nava rastiya pratîkê de çawa jî serbilindî û xurur bi erdê ve dibe yek. Ji aliyê perwerdeyê ve bi hemû tabûrê re bi hêrs dibim. Ruhê berpirsiyariyê pir kêm e. Di perwerdeyê de ti kes naxive. Çiqas bêberpirsiyarî ne!

Van demên dawî nikarim bixwînim û xwe bi xwe hêrs dibin. Li gorî we di demên pêş de li kû derê dibim gelo? Hevalê Nûredîn Sofî di cîhazê de diaxivîbû. Pir cidî rexne dikir. Me tevî hevalên Helena, Berfîn, Rozerîn, Roza, Zinar, Bager û Amed guhdar kir. Erka hevalê Zinar hat sekinandin. Ew pêşniyar jî destpêkê min bi pêş xist. Hevalekî pir dirust e lê pir pasîf e. Dema heman şaşitî du caran dubare bû min hewce dît. Ew dişandin her derê û her erkê. Ji bo wî bi xwe jî baş bû.

Jixwe wê taximê pêşniyar nekiribû. Li gorî we sedem çi ye gelo? Lîberal in. Endamê wan e ji ber wê yekê. Vê gavê misoger e ku em ê di demên pêş de li cihên hê baştir bin.

Valahî hatin dagirtin, grûba me ya şeş kesî çûye arazî naskirin û kişfê. Çavên me ronî! Baweriya min ew e tiştek naqewime. Van demên dawî li araziyê qontrgerîla pir in. Em zêde agahiyên operasyonê distînin. Divê em vê pêvajoya bêçalakbûnê bêwendahî derbas bikin û bi amadekariyeke baş dest bi payîzê bikin.

Ji jêr dengê cîhazê, dengê tekmîlê tê. Rewşa van hevalên me, carekê safî bûbûya…

Agahiyeke radyoyê, li Çelê pevçûn…

Hevala Berfîn hevaleke baş e. Li Botanê maye. Pir bi biçûkanî tevlî bûye. Dibêje, “bila rêxistin rojekê diyar bike, her herêm çalakiyên hemwext li dar bixe, em ê bi vê terzê dijmin bihejînin.” Dibêjim, rapor binivîse, ji bo pêşniyara min dibêje, “na.” Êê wisa jî fikra mirov vala diçe. Bi xatirê te…

Ez ê kişfeke berfireh bikim û dakevim jêrê.

**23’ê Tabaxa 2010’an**

**Dalê**

**‘Bîranînên li gel hirçan’**

Belê, hirçan beşeke mezin a erzaqê me xwarine. Heval ji bo qontrolê çûne, encam felaket e! Roja han dema em çûbûn çend tiştên mane em bikişînin şikeftê, me hirç bi malbata wê re qefiland. Hevalan gule li ser wan barandin. Kutukeke biçûk û hirçeke mezin mir. Kutekeke biçûk jî bi şiklekî giran birîndar bûbûn revîn. Dilê hevalên me yên ku ji bo vala çûyîna keda wan a mezin pir bi hêrs bûbûn hinekê hênik bû. Lê bertarafbûna ewqas qîmetên madî qet baş nebû. Ev hirç pir balkêş in. Qederekê modern bûn. ‘Göme’ya hevalê Xemgînê qurye, belav kirine û çawa pê kariye hemû şûşe vala kiriye. Dibêjî qey guvaştiye. Hevalê Zinar her digot, ‘bîranînên li gel hirçan’. Ev serenav yê wî ye. Em doh ecêb zêde keniyan.

Ji ber ku hirça miriye mê bû, ji bo hanekên xwe bi me bike hevalê me yê Bager got, “zindiyeke din a mê, ji dinyayê koça dawî kir”. Werhasil em ketin femînîzmê, melkesa difire û têkoşîna azadiya jinê. Ecêb hanek bi pêş ketin. Meşa hirçan, tekmîla hirçan û hwd. hêza me ya xeyalî li lûtkeyê bû. Pir dilê min bi erzaq şewitî, encama nêzîkbûna me ya serasera bû. Hevalê Dijwar qet bi hevalan re eleqadar nebûye, hevalên çûne qontrolê li beramberê hirçan tedbîr stendin nedizanîn. Ji bo tiştên hatine gotin dîn bûm. Guneh e, bi rastî jî weke taxima Dalê ji bo dema ku me di van dolan de derbas kiriye guneh e.

Êvara çûyî ez û hevala Rozerîn, em li ser evîna heqîqetê di jiyana azad de axivîn. Di vê jiyanê de nabe ku ti car ti tişt weke berê hêsan û ji rêzê be. Pîvan û rêgez bilind in. Ji ber ku carekê tehma sêvê kiriye, tehma evînên pir xweş kiriye. Kêliyên kêfxweş bi rastî jiyan kiriye û ti car dest jê bernade. Ji ber ku êdî ew ne yê/a nêzan e, ne yê/a kor e, yê/a dizane ye, ne yê/a dibîne û tehm dike…

Sema û Rozerîn du hevalên min ên heja ne. Pir ji wan hez dikim. Hêviya min ew e di nav vê têkoşîna sotîner de mêzandina wan, asoya wan a îdeolojîk bi hêz bibe.

**25’ê Tebaxa 2010’an**

**Ruxmî her tiştî**

Di gerîla de fedaîtî li ber baraneke şid dibare bûn asteng û şilopilbûn e. Bêderfetî… Belê, me doh bi barana destpêkê ya payîzê ku her aliyê xwezayê bi bêhna axê dadigire, kêlî bi şiklekî pir zindî û çalak dagirt.

Demsala qedîm a xembariyê payîz… Îlon, yekê Îlonek din jî nêzîk dibe. Marotoneke rengîn ku di temenê min de salan kêm bike, temenê min, nefes stendin û dayîna min bigihîje bîst salan! Bîst sal weke mirov jiyan kirin lê ti car weke layiqê mirovan bibe jiyan nekirin. Di gerekstêrka wenda ya mirovên xelas bûyî de, tam bîst saliya fetla tavê, weke mezinbûna stêrkekê û êşa ku weke 12’ê Îlonê li mirovan kar dike… Derbeder kirina serdemên qirase, nalîna zarokên bê guneh di nav avahiyên çîmento de û li paş şîşikên hesinî…

Weke jinekê di sala xwe ya bîstan de me. Niha gerîla me. Xwedavenda mezin dibêje, “raboriya me di qîrkirinên li serê kendalan veşartîne.” Doh li ber brûskên bi xof vedidan ez û hevala Rozerîn qîrqîra me bû. Her ku me li ser van çiyayên bi mij û duman vedana dengê xwe dibihîst, ev xwezaya ku mirov jê ditirsîn weke ku zindî bûbû û bi me re diaxivî. Dayika xwezayê hemû tirs li bexçeyê bihuştê yê Hawa û Adem hiştibûn, ji aliyê din ve Şeytan mabû heyirî li vê erdnîgariya Deşta Xanê ku demekê dengê zarokan jê bilind dibû, jinan li aşê wê genimê xwe dihêran… Dema ku doh me xwe dida ber barana li erzaq dikir, me weke zarokan dikir qîr û hawar hanek û kenê xwe dikir, bi destên xwe yên li ber baranê mafa wan rabûye pênir û nanê di ber rûn de sorkirî dixwar. Û li aliyekî jî em ji kenan zikopişto dibûn.

Vaye şert û mercên zehmet bi kêfxweşî pêşwazî kirin û ew hêsan kirin… Çawa ku keseke/î kamil mijarek ku kesên din dibe ku ji bo wê dinyayê xerab bikin, bi awayekî heses bigire dest û çareser bike. Êê tebî weke min gotiye em dînomîno bûn, ji ber wê yekê qaşo em başî, fedayîtî dikin. Xwêya di kîs de me got şekir e û xist ser şekir. Dema baran sekinî û dema hevalan çay çêkir, tehma çaya şor û şêrîn girtin. Tam dema me tekmîl xelas kir hevalê Xemgîn ev agahî da û hevalan bi hanekî çima negot “ka em tekmîlê nû bikin.”

Ez û Rozerîn, em dîn bûn; me ji bo xwe weke ceza diyar kir em biçin şekirê li Dupirkê bînin. Ji bo tarî bûnê pir kêm mabû em bi rê ketin. Tiştê balkêş ez û Rozerîn jî me şekir nedixist çayê. Hevalê Zinar hanekên xwe dikir û digot, “bila hirç we nebin!” Werhasil em çûn, bi rê de me nan xwar. Ji ber ku baş lê mêze nekiribû, Rozerînê şekir nedîtibû, min dîtibû. Li ber brûskên bi gurminiyek mezin a bi xof lê dida, em di wê şiverêyê tev av û herî di binê baranê de meşiyan. Me tam di wê kêliyê de têra xwe kiribû qîr û hawar ku dê bibûna sedema wê derawa me ya destpêkê. Di wê şeva bi heybet ku min ê nikariya ji bîr bikira de me bi qasî dengê me derket bi navê hevalên şehîd qîr da.

Em di demên qedexe de jiyan dikin û li cihên bi qedexe ne. Ji bo ku hemû qedexe rabin, ferişteyên azadî û serxwebûnê di berbanga sibeyê de mezin bin. Û encam; ji ber ku em nêzîkî nuxteyê bûn, bi îhtimala ku tiştek qewimiye yan na heval ketine panîkê. Hevala Helena ji hevalên

xort re gotiye “çekên xwe bigirin û biçin.” Piştî qîr û hawaran dema dengê ken bilind bûye aram bûyîne. Gava em hatin bi şiklekî bê sebir pirsîn ku gelo çi qewimiye. Ji ne çarî me li vê derê xwe avêt ber bextê tiştê jê re dibêjin derewên spî: me kire qîr û hawar, ji ber ku komeke ga û çêlekan ji tirsa birûskan li ser şiverêyê bûbûn rêz. Ka li tesadufê mêze bikin ku hevala Berfîn jî dîtiye, gayekî mozgirtî berê xwe daye jêrê û dibeze. Yanî projeye me ya bi şiklê hirçê da pey me, zivirî çîroka gayên li ser rê. Hevalan hem kenê xwe bi rewşa me kirin û hem jî xwe ecz kirin. Li gorî rêgezên rêxistinê şaş bû, me ev dizanî lê dîsa jî xweş bû. Roza û Rozerîna dînik bi kêfxweşiya jiyanê bi bextewarî, bi aramiya li çiyan bûnê, ji pêşerojê re dengê xwe hiştibin: gotin ku dibe di pêşerojê de manedar be. Berevajiya hemû qedexeyan!

**27’ê Tebaxa 2010’an**

**Wesiyeta min e**

Dema sibeyekê azman bi ronahiya berbangê xwe amade dike, kolan bê deng in, dem ji bo deng amadekarî dike, li her kolana Kurdistanê, li her cade û pala çiya wêneyekî hevalekê/î …. Bêlê difikirim; li Kolana Samûra wêneyê Şehîd Adar… Weneyekî bejnê, tam li destpêka kolanê. Li Ameda ku dilê me ye, portreyekî mezin ê Rêbertiyê. Tam li meydanê, li nava dilê bajarê heqîqatê… Li ser sînoran kevokên aştiyê… Dema ku van difikirim jî dilê min bi kêfxweşî difore. Dema kêliyeke wisa dihizirim, mane û girîngiya vê rojê hê ji kûr ve hîs dikim.

Û ji ber wê yekê dibêjim, wesiyeta min e, bila li bajarên azad ên pêşerojê portreyên şervanên azadiyê hebin. Dixwazim portreyekî min hebe ku ew zarokên biçûk bi çavên xwe yên diteyisin lê temaşe bikin, xwaziyên keçên ciwan pêk bên, hemû hezkirina bavekî êxtiyar li ser be. Di yekê Îlona vê kolanê de bila kevok ber bi ruhê min ve bifirin. Di meha Îlonê ku min çavên xwe li jiyanê vekiriye de bila bi dewlemendiya rengan a maneyê çavên min li pêşerojê bên girtin.

Eger ez weke gerîlayekê nefesa xwe ya dawî zûka bidim, ji bo zarokên biçûk, keç û xortên pêşerojê wesiyeta min e; li ser rêyên hûn dimeşin bila portreyekî me hebe. Ku hûn li jiyana me temaşe bikin û pê serbilind bin, jê mane û wate bistînin…

“*Ji ber ku di serdema felaketan de ji dayik bûme…*”

**1’ê Îlona 2010’an**

**Têkoşîn**

Min kir û nekir, nekarî li pêş nakokiyên çêkirî bibim asteng. Taxima me ya Gelî ketiye ber lêpirsînê. Hûn ê bejin, “ji bo çi ye”? Ma ji bo çi be, ji ber nêzîkatiyên ku min berê jî di rojnivîsa xwe de behsa wan kiriye yên kevneşop, qlasîk û rehet e. Axxx ev nebesî û paşverûtiyên me…

Werhasil di van rojan de zêde xemgîn dibim. Lê xwaziya her kes wisa bûya. Di van demên dawiyê de têkoşîna azadiya fikir dimeşînim. Di rojanebûna vê jiyanê de hezkirin hatiye xetimandin, hevalên me ji bîr kirine. Em li ser mijarekê nîqaş dikin û ez hizira xwe dibêjim. Tê gotin “na wele divê ya min rast be.” Bi ser de jî xwe ecz dikin, aloz dibin. Tebî ez ê jî bi israr fikra xwe bêjim, dema ez wisa dibêjim jî, bû mijara rexneyê. Min jî di tekmîlê de got, nîqaşeke xwezayî di bin navê xweseriyê de xetimandin şaş e û helwesta xwe diyar kir. Û min got, eger hûn wisa bikin bi şiklekî xwezayî ez jî li gel we nadim û nastînim, bi fikare dibe.

Werhasil, em ji cihê mayî didomînin. Lê jixwe ez ne Rozaya berê me. Ji dubarekirina tiştan re sebra min nema. Ji bûyer û diyardeyên ber bi çav ev derdikeve. Êdî ew sebir, bêdengiya min û aliyê min timî bêhn fireh û niyet baş tine ye. Fêm dikim ku gelek guherîn çêbûne. Lê baş e, bi rastî pêwîst e.

Di vê pêvajoyê de ji aliyê leşkerî vê zeyifî hatin jiyankirin. Nebirina guleyên BKC’yê û hem jî hevala Sozdar li vê derê bû. Ji min re got, “ji romantîzma leşkerî dest berde û xwe perwerde bike.” Bihizirin, ji Rozaya ku her kes weke leşkerî nas dike re ev gotin kirin. Lê yek ji hevalên di mijarên leşkerî de hişyar jî ez im. Werhasil, baş e. Eger dê kêmasiyek derkeve bila li cem wan derkeve.

Di dawiya dawî de çûm cem evîna xwe ya platonîk, gundê Dalê. Gundekî şên û qerebelix e. Zarokên çav kesk li derûdora me diçûn û dihatin. Û dayik… dayikan dîsa dilê min zîz kirin. Dayikek ku bêriya keça xwe ya di meha Îlonê de aniye dinê dike… Weke ku ew dayik hîs dikirin. Wisa çav bi rondik li min mêze kirin dilê min kir çîzinî. Dizanim di kûraniyên dilê xwe de dibêjin, “heyfa vê ciwantiyê.” Ez jî dibêjim; heyfa vî welatî, heyva vê dinyayê ku di bin esaretê de ye. Ev cîhana ku parçeyeke wê me weke cihekî jiyanê lê kirin, azad kirin jî bi

têkoşîna bimeşînim dibe dayikên heja. Ji bo ku dinya tije bi dayikên dilşikestî nebe!

Di van demên dawî de pirtûkan dixwînim, çendî baş e…!

**8'ê Îlona 2010'an**

**Doh bi şev bi stêrkan re**

Mirovên heja ku weke filmekî li jiyanê temaşe dikin, tevî we em di bin banê heman azmanî de ne. Çawa ku di dema borî de wisa bûye, di pêşerojê de jî heman azman ê bi min re bibe. Dipirsim ji yên ku li jiyana min mêze dikin û dikenin, dibe ku hûn bi şiklekî bêxem bêjin, "ax Roza tu yê hê çi bibînî û çi nebînî." We ev pêşeroj dizanî. Ma we çima negot da ku ez wan deman baş bi kar bînim, nirxan biafirînim. Jiyan çawa jî diherike, dixapîne. Doh weke qet nehatiye jiyankirin, pêşeroj weke qet neyê.

Lê dizanim bagerekê dê qiyametê rake. Paşê ez û tu dîsa em ê bi tena serê xwe bimînin. Weke heqîqet û tenêtiyê. Piştre dîsa tu yê bêdeng bî, weke dema min û birayê min ê biçûk me hewl dida di wan şevên havînê de stêrkan bihejmirin.

Kesên dûr ji min ên ku ez jê hez dikim, ma em ê karibin heman azmanî parve bikin? Tu yê bêjî çi, stêrk? Ma dê ewirên me karibin li ber bişirîna me re yekî destpêkê di tariyê de ber we ve tê diyarkirin ku derketiye bibeze? Bêrî û hesretên min li we derbas kirin, bila xeberê we jê hebe. Stêrkên nobeda min a şevê, em ê li binê kîjan azmanî heya heya ji hev xatir bixwazin? Hûn pê dizanin lê nabêjin? Hûn dizanin ez ê vê diyar bikim.

…

Îro cejn e. Me analîza Rêbertiyê ya bi navê "Ez nabêjim evîna heya bi heya, dest ji hev berdana heya bi heya" xwend. Pir baş bû.

**9'ê Îlona 2010'an**

*"Fîzîka xwe, mêjiyê xwe, dilê xwe bi hesûdiya Xwedavendekê biparêzin."*

**Rêber Apo**

**Geliyê Zapê**

**Tesadûf!**

Şevekê gerîlayek daket gund, gerîlayeke jin ku dilê wê bi hesreta veqetînê hatibû honandin...

Û da nav nûçeyan bi kêfxweşî, bi kelecan, heya jê hat. Çavên wê li ser nûçeyeke ku qumandaya zarokekê derxistiye eliqî ma. Heman nav û paşnav bû, heman cih bû; cihê lê jiyan kiribû, hin tişt parve kiribûn û jê dûr ketibû… Di vê serdema ku ax û çîmentoyê parçe parçe dike û diherîne de, dilê vê gerîlayê di nav rondikên ew bi xwe dirêjîne de bû. Gerîlaya jin nikaribû safî bike ku gelo ew bû yan navekî dişibe wê bû.

Lê dilê wê digot, evqas tesadûf nabe. Ma tenê ji bo ku bizanibe di wê kêliyê de li ber televîzyonê rûniştibû. Lingên wê ji ber vê yekê ewqas rê meşiyabû? Jê piştrast bû, ji bo ku evqas tesadûfan bizane hatibû.

Wê kêliyê ew jina pîroz hat bîra wê. Xwest dengê wê qralîçeya êş kişandî bibihîze lê ew jî ne mimkûn bû, bê mecal meşiya arwazên dûr û dirêj.

Û fikra wê çû ser bîranînan. Çû rojeke dema borî. Keçeke ciwan ku di otobûsekê de li ber pencereyê rûnîştî. Dema dengek hat berê xwe da wî milî û dengê lerzok pirsî; “te xêr e, ma çima kûr kûr difikirî.” Keça ciwan pirsa dengê lerzok bersivand: “Dema mirov bizane ku keseke/î pir jê hez dike dê careke din nebîne gelo çi dike.” Bersiv: “Eger dê careke din nebîne nabîne. Tu bê mane van pirsan nakî, ma çi qewimî?” Keça ciwan got, “ne tiştek e, hema wisa.” Dema di tariya çav çavan nabîne de gihaşt li ser şiverêyê dît ku cihê şîr dotina bêriyan derbas kiriye û bi êşa kûr a dilekî hîs dike westiyayî û bi çentêyê tije yê li pişta xwe, xwe li ser erda req dirêj kir û êlekê xwe kir balgîf. Mêjiyê wê çû ser azmanan. Li heyv û stêrkan mêze kir, çavê wê yên diteyisîn û fikra wê ber bi zarokatiya wê ya bi azmanê şîn ve firiya. Ruhê wê nedixwest ev rêwîtî xelas bibe. Weke ku bixwaze vê kêliyê heta hetayî bike, çavên xwe dan ser hev. Dizanî di berbanga sibeyê de nefesek dê kêm be. Dinya dê ronî bibe, dilê dayikan îsyan bike, pêya rê dê bêyî wê pêşwazî bikin wê sibeyê û weke ku bi dehan canên girtine têrê nakin dê bidomînin heya ku dilê kesên cuda bişewitînin. Ya ku dihate jiyankirin berdêla bajarên qirêj, bê plan û çelexwarî bû.

Gerîlaya jin di heman rojê de fêr bûbû ku ev mirova ku rastiya bi êş û heyf ji kûr ve hîs dikir, ji bo hemû xeyal û xweziyan di serdema qedexeyan de bi dizîka şîn û stranek qêriya.

Wê rojê 12’ê Îlonê bû.

**Provokasyon!**

Gelo em pir xerab hatine neletkirin? Li Zagrosên heja, nediyariyê weke miqnetisekê bi pêsîra min girt. Belê, dîsa li bendê mayîn. Pêwîst e wisa nebe, nabe ku wisa be. Em li benda wê ne ku gelo ev bûyera bûye sedema provokasyonekê ji aliyê me ve pêş ketiye yan na. Heval hê nehatine nuxteyê. Vê gavê psîkolojiyeke pir xerab bi min re heye. Radyo dibêjin ku bûyereke dişibe Ergenekonê ye. Yên me jî daxuyanî dan û nelet kirin. Û gel nelet dike. Tiştên weke çente, qablo, qamera û hwd. Ketiye destê gel. Di navbera gel û polîsan de şer derketiye. Heft polîs bi keviran birîndar kirine. Her bijî ji gelê me re. Ji aliyê din ve em ê ji bo wan deh mirî, çar birîndar û sê zarokan çi bêjin. Hem jî di demek ku gelê Colemêrgê bi her tiştê xwe ve çalak bûye, li cihekî ku bûye serbilindiya Kurdistanê. Li gorî nûçeya dawî, provokasyon ji aliyê me ve pêşneketiye; dewletê li dar xistiye.

Off, off nizanim di vê tevlîviyê de çi binivîsim. Lê dîsa jî min xwest hin tiştan binivîsim. Îhtimal, texmîn, hêvî û xewnereşik! Ax Rêbertiya min, di demek ku bi te re hevdîtin tê lidarxistin de gelo komployeke kirêt ku hewl dide pêvajoyê bixetimîne? Axx tava maneyê ya dilê min. Heyfa zarokan, heyfa te û vê rojê û pêşerojê.

**16’ê Îlona 2010’an**

**Çûyîn**

Jina azad! Dizanim, ji ber ku nanivîsim pir ecz î. Min navê vê defterê wisa lê kiriye. Gelo kêfa te jê re hat yan na, nizanim lê dixwazim nivîsên li ser te hatine xêzkirin diyarî Jina Azad A Pêşerojê bikim.

Hevala Sema çû, bi wan destên xwe yên kedkar ku li ser te nivîsî, ji te xatir xwest. Min pir jê hez dikir. Ewirên wê yên wijdanan zîz dikin veqetîn hîs kiribû. Timî êşa dilpaqijî û niyeta xwe ya baş dikişand. Pir sohbet û nîqaşên me çêbûn. Ew cuda bû. Ti car ti tişt li beramberê yên li cem xwe kar nedianî. Di pêvajoya fermandarî dikirî de hevaleke pir baş

bû. Radîqal bû, xwediyê hîsên pir xurt bû… Li Îranê evqas xwe pêşxistin! Li gori min ji bo hevalên li Rojhilat çavkaniya hêviyê ye. Dikare pêş bikeve û di pêşerojê de alîkariyeke mezin bide wan. Kî dizane ev jiyan dê careke din me bi hev bide dîtin? Em vê jiyana ku me bi hev dide dîtin û ji nû ve vediqetîne deyndarê Rêbertiyê ne.

Belê Roja dilê min, di şerê bi mane yê bûne mirov de di şerê pîroz û bi maneyeke din di şerê hov de dilê min pir dişewite. Feraset û terzên cuda, kariyerîzm dîsa mêvanên min in. Dixwazim vê carê wan biezimînim.

Di vê pêvajoyê de gelek tiştên min nekariye binivîsîm hem jiyanî û hem jî siyasî gelek tişt hatin jiyankirin. Ew provokasyon a wan îtihatperestên kevinde bû, ne karê yên me bû. Dilê me rehet bû û me ji bo gelê me kesereke kûr kişand lê hevalê me dema dizivirin ji bo rehetiya canê xwe şaşitiyeke pir mezin a neyê efûkirin dikin.

Di pêvajoya ku min dezgehdarî dikirî de muşteriya min a wê demê hatibû dukanê û li Eskîşehîrê dixwend, li cadeya Colemêrgê ku em li pey hev çûne wezîfeyê ez nas kirim. Ji ber ku wê keça ciwan ez nas kiribûm, bû sedem ku hestên ecêb jiyan bikim. Ji dezgehdariyê heya gerîlatiyê! Min ew nas nekir lê wê ez nas kiribûm. Heya bi çongên xwe ketiye defika kapîtalîzmê. Du pevjînên nû zewicî ku sempatîzanên tevgerê ne jî min dît. Her dihate cem min û pirs dipirsîn.

**22’ê Îlona 2010’an**

***Ez Suweyda me***

*“Ez sonda tolstendinê ya Îştar im*
*Ez sonda tolstendinê ya Tîamat im*
*Ez sonda tolstendinê ya dayika ax im*
*Ez Suweyda me*
*Gogeke ji agir*
*Ya Prometheusê hemdem im*
*Ku rêya xwebûnê nîşanî min daye*
*Ez Suweyda me*

*Jina Kurd im*
*Ku cara destpêkê jiyan afirandiye*
*Û ji nû ve diafirîne”*

**22’ê Îlonê**
**Sema Argeş**

**Ceribandina Xwezayî**

Hevala Roza, Helena, Berfîn vê sibeyê ji xwarina îsotan hema bêje teqiyan. Li ber sermaya zozanan têkoşîna xwarinê...

Di serşoyê de perperikek şêrîn her li ser laşê min datanî. Min nekarîbû bi xweşikî bedena xwe lîf bidim. Di jiyanê de qet xwe nêzîk jî nakin. Perperikek ku karê xwe dizane û zîrek...

Curekî mozên sor û zer, bi têkoşîneke mezin qirêjiya min ji difna xwe derxistiye, xiste hemêza xwe û firiya û çû. Gelo debara xwe pê dike? Doh em hemû rûnîştibûn, hevala Berfîn wisa bi dengekî bilind hilpişkiya, her kes ji kenan kete qrîzê.

...

Ti tişt bi qasî ferasetên şaş, ne xeter e.

**23’ê Îlona 2010’an**

**Wezîfe**

Hemû hevalên taximê li vê derê ne. Taxima Şehîd Hedar li zozanên sar di avhewaya bê biryar a hin caran dibariya, hin caran germ dibû û ba dihat de pir zehmetî kişand. Di vê meha Cotmehê de gelek tişt qewimîn ku pênûs têra nivîsandinê nakin. Her kes hatiye asta rapor nivîsandinê. Min rapora Rozerînê kişand paqijiyê û me hevala Sozdar bir Başûr. Rêwîtîya dûr û dirêj a hevala Rozerîn, Roza, Berfîn û Sozdarê li ber baranê dest pê kir. Çiyayên me yên azadiyê ku dema em disekinin dicemidin tenê dema em dimeşin em germ dibin, li ber êşên zehmet û bi jan niha dinale.

Ez û Rozerîn, sê rojan li pey kerê qiriqa me zuha bû. Em pir westîbûn û şil û pil bûbûn. Dema em bi şevê hatibûn, cihê em lê radizan ji baranê tev bûbû av û herî. Me heya bi sibeyê bi kîsê xewê yê ter,

gorayên ter, şalê ter û hem jî pişta xwe ya qet zuwa nedibû şeveke weke jahrê derbas kir. Timî dilerizim. Rozerîn jî rabibû ser xwe û qet nerazabû. Sînor jî ter bûbû lê ne ewqas. Hevala Medya qet şil nebibû. Wê sibeyê jî em bûn nanpêj.

Ma hûn dizanin, di mercên zehmet de mirovên mercên heyî hê jî zehmetir dikin hene? Ma hûn dibînin ku em ji xweşikî û bedewiyên bi qasî nefesekê dûr in, hin caran çendî bi dûr dikevin. Yên dem û cih (mekan) xweşik dikin mirov in. Em dikarin hin caran li beramberê hev pir bêxem bin. Li şûna ku em di ber mirov re kedê xerc bikin, em dikarin ya hêsantir hilbijêrin. Em kêmasî û nebesiyan rewa nekin, lê divê em di navbera mirov de dubendî nekin û dadperwerane tevbigerin. Ev, tevgera afirandinê ye ne ya nirxên heyî li ber xwe amede dîtinê ye. Hin caran zêhniyetên mirovan ên hiyerarşîk ku tiştê erênî jî weke neyînî nîşan dide derdikeve li pêşberê me. Mînak, divê fermandar hin tiştan fêrî şervanên xwe bikin û berpirsiyarên perwerdeya wan in. Herî zêde ji bihêzkirin û pêşxistina jiyanê ew berpirsiyar in lê hin caran dikarin bibin sedema nerehetiyê.

Belê jina azad, di saeteke sar û ba tê ya sibeyê de, piştî kêliyekê wisa xuya ye dê civîn bê lidarxistin. Rêveberî çû ji bo biaxivin. Hevala Medya jî bi şerê li beramberê rêveberiya xortan zehmetî dikişîne. Mafê wê heye lê mirov pir ecz dikin. Em jî bi sekna xwe ya cuda cuda, pêşengiyê û alternatîfan tine dikin. Vê gavê Rozerîn rêşiyên kefiyeyê biçûk dike, Viyan bi lasqayê re mijûl e û hevala Sînor jî ji bo kîsê me yê xewê qilif çêdike. Hevala Roza jî dinivîse.

Roja ku em ji wezîfeyê zivirîbûn pir li nêzîkatiya germ, dirust û fedakar a hevala Sema geriyam.

Tiliyên min westiyan ez ê paşê bidomînim.

**5’ê Cotmeha 2010’an**

**Serma û berf**

Em li Bêzîwê ne. Vê gavê em ji ber sir û seqamê dicemidin. Belê em li vê dolê ne, quntereyên Garê... Hawîrdora me mij û duman e. Dilopên baranê min dibin biharê. Vê gavê ji wan hevalan, hevala Ezda û Roza

mane. Em tarûmar bûn. Di civîna tabûrê de hedefa hemû rexneyan hevalên jin bûn. Qomîsyon bûm. Dawiya bi êş a pratîkê, zehmetiya cehalet û jinbûnê...

Ez û hevala Ezda em çûn Dalê. Em li cem hevalên Xwe Parastinê, hevala Berfîn, Jiyan û hevalê Remezan şevekê man. Êdî ew ê ji Bakê bizivirîna, şeva wan a dawî bû. Demek ku dilê min geş dike, zîz dike bû li Bakê. Gelekî pir heja ye, kesayetiyên pir xwediyê rêgez û pîvan. Divê mirov ji bo wê derê biçe. Li cem vî gelê pîroz çanda Partiyê pir derbasdar e. Belê, em wisa bi rê kirin ku encax ewqas dibe. Hemû li ber girînê bûn, ez fikirîm û min xwe bi xwe got vê jiyanê çi tişt afirandine. Hevalê Remezan dema dawî li malên gundiyan hat, jarjoreke gule berda hewayê. Dawet hatin bîra min.

Hevala Hêlena, Viyan û Rozerîn çûn. Helena û Rozerîn pir ne baş bûn. Viyan jî bi Samûra ve pir hatibû girêdan. Hin hevalên xort çûn nexweşxaneyê. Hevalên jin ên li geliyê Zapê ji hevala Medya, Ezda, Jiyan, Sînor û Roza pêk tên.

Dinya pir sar e, em ê ji sermayê bibin qeşa. Hevala Medya û Jiyan dê vê êvarê ji bo erk û wezîfeyê biçin Dalê.

Van demên dawî li pey hev civîn hatin lidarxistin. Platforma hevala Rozerîn hate çêkirin. Axxx xwedavenda min, qey çima min naşînin perwerdeyeke leşkerî? Çima? Dîsa ez mam. Dîsa min çavên xwe li sibeyên xembar vekir.

Min doh ji rêyeke qedereke dûr gonî anîn, ava serşoyê germ kir û serê xwe şûst. Li Zagros em dicemidin, ji sir û seqamê qeşa digirin.

...

Ji dilê gerîlayek ku qîr dide; jina weke Xwedavendan pîroz! Dayê, min pir bêriya te kiriye.

**11’ê Cotmeha 2010’an**

**Bezîwê**

Ji ber hemû çûyînan westiyayî me;

Hevala Medya jî li ser esasê ku banî kirin, çenteyê xwe da pişta xwe û çû. Niha em çar kes in. Ji dema ku hatiye pê de min û hevala Medya,

me nekarî biaxivin. Bi her kesî re axivîbû, ez jî timî weke ku dê bi min re biaxive tevdigerîm û dibe ku tiştê herî bi îstiqrar dimeşiya, bû ev mijara me ya axifînê ya ku hatiye taloxkirin. Bi rastî ji hevalên din, ji ber rewşên neyînî zêde zêde hatine jiyîn û pirsgirêkên bi wî şiklî dor nehate min.

Ne ji ber ku pirsgirêkeke min heye, jixwe li cem me tiştekî şaş ê hakim e jî dema pirsgirêkek derket hev kişandine goşeyan û axivîn e. Mirov dixwaze li cihên wisa, li ser jiyanê, feraseta xwe ya jiyanê, başî û bedewiyên heyî jî biaxive. Lê belê em nêzîkî tiştên wisa jî nabin. Bû dawiya pratîkeke bi xemgînî. Dilê hevala Medya pir bi vê rewşê şewitî. Yên ji wan rapor nehatine xwestin hevala Medya, Jiyan û Roza bûn. Ji nav hevalên yekîneyê jî tenê hevala Roza neket rojeva hevalên xort.

Li pêşberê vê rewşê sinirên hevala Medya pir xerab bûn. Lê tenê yeke wisa dikare bi tiştên hatine jiyîn. Ji ber wê yekê hevalek ku min gelek aliyên wê rexne kirine jî bû lê hevaleke vekirî bû. Ez jî vekirî bûm. Ji ber vê yekê me hev du hinekê şikênand jî lê jiyan wisa ye. Ji aliyê fizîkî ve qadeke wisa ji wê re giran tê, ji ber ku têra xwe di mercên wisa de jiyan kiriye. Laşê wê weke bêjingê lê hatiye.

Axx ev valatî û nebesî. Heya ku ev valahî neyên dagirtin hevalên wisa dê hê pir bihincirin. Eger her kesê cilên gerîla li xwe kiriye bibûya milîtan ji mêj ve ev şoreş bi ser diket. Eger hûn ê bibin pirsgirêk neyên! Neyên li ser vê jiyanê tiştên hûn ê karibin her tim di nava sîstemê de bijîn, ferz nekin. Niha hûn ê bêjin, “Roza xanim tu jî ti kesî naecibînî.” Baweriya we hebe, bi nivîsînê tiliyên min qerimîn. Lê wisa nabe. Nikarim xwe ragirim. Jiyaneke dirust, bê hesab û kîtêb û bê berjewendî, ma li kû derê mayî? Gelo dê hevaleke/î min ê ku karibim ji hemû pêşdarêzan dûr, bi eleqadarî guhdar bikim hebe? Belê, tîmek hevalên xort jî çûn. Hêdî hêdî dê me hemûyan bikişînin. Em mêze bikin, hêvî dikim vesaziya hevala Mêdya jî çênakin. Pêwîstiya van deran bi wê heye.

Niha em ê bi hevala Sînor re biçin û xwarina nîvro bînin. Qederekê em li jora hevalên xort in, heya diçin û tên bêhn li me diçike. Ezda û Jiyan ji wezîfeyê hatine, îstirehet dikin. Di vê navbera de, em tûp bi kar

tînin. Vê gavê dengê qobra û obûsan tê. Çend roj in wisa ye. Hêvî dikim bi skorsky'yan leşker danaxin. Di van demên dawî de deng ji Garêyê tê

Bi xatirê te...

**14'ê Cotmeha 2010'an**

**Di kone me yê şîn de dilê me yê evîndarê azadiyê**

"Erêy, Zagros, Geliyê Zapê". Abîdeyên serbilindî û berxwedanê... Ev peyvên ku di van rojên dawî de min ew bi kar anîne, bi dengê bilind bi lêv kirine û her wiha hevalan anîne ziman û hevokên me yên di van rojên dawî de pêk tînin. Li eyaleta Zagros di van deman de li cebheya herî pêş weke hevalên jin tîma me (Ezda, Jiyan, Sînor û Roza) heye. Vaye ji ber vê yekê min ev gotin kirine rojev, em têra xwe dikenin. Me konek vedaye. Pirrr şêrîn e, ji ber ku şîn e me bi baraniyan qamûfle kiriye.

Gotin ku dê hevala Emîne bê vê derê. Em li bendê ne. Ez wê hevalê nas nakim, ez ê cara destpêkê bibînim. Dihizirim panqarteke mezin bi konê me ve bikim. Ez ê li ser tiştên li jor binivîsim. Çawa ye? Dînitî ye ma ne wisa ye? Gerîla hinekê jî dîn e.

Di seranserê rojê de em bûn temaşevanê baranên xweş lê dikin ên zozanan. Lê di van saetan de yanî navbera yanzde û duduyan de, me eniya xwe daye germahiya tavê. Xweza hatiye şûstin, erdên me yên bedew ter bûne. Dibe ku ji ber xwezaya zehmet û asê be, xwe parastiye. Aram û zelal e. Li hemberê min quntareyên Semedar. Weke ku li beramberê min wêneyekî pir bedew heye. Bi temamî mînakeke bedew pir bedew a xwezayê. Wêneyekî xwezayî û xwediyê cewher. Dîmeneke pir xweşik ê cih bi cih bi xişirê hatiye xemilandin ê bi azmanê li goşeyê rastê yê Semadarê xwe digihîne hetahetayiyê, di nav şikêrên reş û belek ên bi kêm darên biçûk biçûk in. Weke asareke dîrokî ya tûrîstîk.

Tûrîstên gerîla, gelo ez vî wêneyî ji kê re bişînim? Ev dîmena ti kesî nedîtî bila ji zarokên pêşerojê yên bêhna azadiyê ji wan tê re bibe diyarî. Erdnîgariya qedexe ya ku enerjiya çavê min zindî dike... (Cihên qedexekirî yên zimanekî qedexe û li van cihên demên mirovên qedexe...)

“Min di demên qedexe de ji te hez kir, min ji dûr ve ji te...” Îmralî... Beriya kêliyekê min notên hevdîtinê guhdar kir. Konsepta kesk, dorpêça çandî û di vê dorpêçê de keçên Kurd ên ciwan...

Pêvajoyeke nû dîsa xefilbûneke herî cahîlane ku mirovahî tê de ye! Hewldanên Roj TV girtinê hene, projeyên keçên Kurd kolekirin û helandinê jî. Hestên dilê min, hestên taa ji kûr ve, dilekî serhildêr ê di cihê xwe da natebite (Weke Ferzad Kemanger...)

Em doh bi goniyên terbûyî bûn nanpêj. Ez, hevala Ezda û Sînor bûn. Hevîrekî pir xweş çêbibû. Doh min bîdonekî mezin tije av anî û hevîr stra. Hevalan jî sêl û cihê sêlê amade kirin. Fedekarî ji bo kesayetiya ked-şoreşê pir girîng e. Bi taybet jî li Kurdistanê.

Ez bi hevala Ezda re li ber sêlê sekinîm. Ji ber ku gonî şil bûn pir duman dikir. Hevala Sînor got “em cih biguherin.” Bi Ezdayê re cihê xwe guherîn, dema ji ber dumana zêde çavên min kor bûn ez li ser kevirê li cem xwe rûnîştim. Hem min îstirehet dikir û hem jî min nan li ser sêlê datanîn û demekê min nanên li aliyê xwe sor dikirin. Hevala Sînor dema bi dumanê nekarîbû bi eczî got, “zû bike, aliyê din ê nan sor bike. Mirov hinekê çalak dibe.” Dixwazim hûn bizanin ku sêla me pir biçûk e. Tenê li ser wê sê nan bi cih dibin. Û ji beriya wê min bi darikan nan sor dikir. Lê dema piraniya pelan çûn aliyê hevala Sînor min ji wî karî dest berda û hejmara nanê ku min sor dikir, daxist yekî. Armanca min jî ew bû, ez hinekê îstirehet bikim. Ji ber ku pir westîbûm. Min bi hanekî bersiva wê da û derbasî şûnê bûm. Û min jê re got, tu westiyayî, îstirehet bike. Her çendî got ku ew newestiyaye jî westiyabû. Temam, ez qebûl dikim, dibe ku min carekê bêxemî kiribe. Lê eger tu westiyayîbî û ketibî zehmetiyê, dikarî bêjî “hevala Roza derbasî cihê xwe bibe.” Jiyana me cihê jiyana kolektîf e. Dikarî bi şiklekî aram û bêyî ku ti kesî bişkînî vê bînî ziman. Lê bi uslûbeke hişk anîn ziman, xwe eczkirin bi ti şiklî nade qezenc kirin û ti aliyê wê yê qezenckirinê tine ye. Eger min jî bersiveke berevajî û hişk dayibûya wê, me dê hev bişkênandana û em ê bibûna rojev. Li pêşberê helwesta ku min nîşan dayî di deqîqeyên pêş de bawer im şaşitiya xwe fêm kiribû ku her gotin diavêtin ber min, hewl dida min bide kenandin. Keseke din dikarîbû bi bêdengiyê helwest nîşan bide, lê ji bo min kîndar tevgerîn bê mane ye.

Weke ti tişt neqewimiye min pê re borand. Hevala Sînor pir jî hevaleke hestewar e...

Ji ber helwesta min dilê min rehet e, ez dixwazim hûn bizanin kesên din ji ber bûyerên wisa, tewîz nadin û encamên pir xerab diafirînin. Vaye li wan cihan pêşketin disekine, ev zanebûn mijareke pir girîng e.

Di rastiya jiyanê de wêneyekî wisa jî heye: Nêzîkatiyên xwe dayîna aliyekî, kêfî, hesabgir, mixabin di jiyana rojane de zêde ne û hin kesayetî jî xwediyê sekneke neyînî ne. Kesên wisa di nav jiyana me de pir in. Vaye li beramberê qurnaziyên wan ên neyên efûkirin kîn û rikeke mezin nîşan didim. Ji ber vê yekê jî, hin caran zêde zêde biwestim jî, ti car xwe paşde nakişînim, tevlî hemû xebatê dibim. Vê heval jî tînin ziman. Ji ber ku ez weke Roza bi felsefe û îdeolojiya “xweşikî û bedewî hewceyî kedê ye, kedê dixwaze” bawer dikim. Her gerîla hinekê bêhna xwêdanê jê tê, ji xwêdanê jî bêhna kedê...

**17’ê Cotmeha 2010’an**

**Piştî 8 mehan li heman neqebê…**

Neqeba Girê Berxan... Belê, di roja yekê Gulanê ku bêhna pratîkê jê tê de tevî grûbeke qerebelix em gihaştibûn vê neqebê. Destpêk li bendê bûn ku bên jiyankirin. Hevaltî li bendê bûn ku bi êşê bi hêz bibin, kêliyên tên jiyankirin li bendê bûn ji bo pêşerojê bibin bîranîn û raboriyeke heta hetayî.

Di nava hestên ecêb de bûm. Li wî cihê ez û Sema rûniştibûn û me xurme xwaribûn mêze dikim. Guhên min li bendê ne hemû dengên wê demê bibihîzim. Weke ji xeweke xweş şiyar bim, noqî bêdengiya rastiyê dibim. Çûyîn çi jî hêsan e, lê zehmet e ku em wan kêliyên ku me bi meqabên xwe ku wan cih û şiverêyên pêlî dike, req û hişk dike dubare zindî bikin. Axx... Dema em di meha Gulanê de hatibûn vê derê, eger ji min re bigotana “tu yê bi xemgîniya Cotmehekê û bi tena serê xwe li vê neqebê rûnî” min ti car bawer nedikir. Lê belê heqîqeta bê nîqaş ez di navê de me ev e. Ji wan dil û hêfizeyan tenê yê Roza dubare rêya xwe bi van deran xist. Weke pelên ji daran diweşin û belav dibin, li erdnîgariya Geliyê Zapê belav bûn û dûr ketin. Ji bo yên dubara li van rêyan vedigerin re tê

gotin “kesên xwediyê pratîkeke serkeftî û berxwedêr. Lê em ê ji şîn û matema di dilê min de ye re bêjin çi?

Ew demên ku hevala Şehîd Berçem li ser vê rêyê dimeşiya tê bîra min. Niha ez rûnîştime bîranînên xwe dihizirim. Yek ez mayîme û yek jî rê, çiya û deşt mayîne. Ji nû ve merhaba Cîlo. Di demên ku mirovan mirov bêesil kirine de, dixwazim ji bo zarokên pêşerojê bibim sembola hêviyê ya xwediyê biesilbûnê.

Hevala Sînor çû perwerdeya çekên giran. Em jî ji bo qampa me ya zivistanê ketin li ser rêyan. Me ji gelî re got, bi xatirê te. Ber bi cihê me yê zivistanê Ezda, Jiyan û ez ku me dest bi meşê kir. Hevalê Loqman û Kendal jî heya bi neqebê bi hesp û keran bi me re hatin, dîsa dê bizivirin. Hevalên li qampê dê me li vê derê bigirin, em li bendê ne. Îsal hevalên jin ên Cîlo û Geliyê Zapê dê bi hev re bimînin, qampa me ya xweser bê avakirin. Gelo ji wan kîjan heval mayîne?

Vê gavê ji ber sir û seqamê qeşa digirim. Li jêr Gundê Bazê heye, dêrên kevn hilweşî ne. Li gund zêde darên fêkî hene. Vala ye, dûrî dengê zarokan e, hêdî hêdî bi tena serê xwe dimîne. Bi xembar û serbilindî...

Heya ku em li nêzîkî qampê hev bibînin bi xatirê we.

**20 Cotmeha 2010’an**

**Oramarê Bilind e**

Belê em çûn kişfa Oramara heja. Li quntereyên Cîlo “Jinên Azad” dê qampa xwe ya zivistanê çêbikin. Di dîroka Partî û şoreşa jinê de ev tişt yekem car pêk tê. De bifikirin hem jî xweser e. Mirov jê pir kelecan distîne, ma ne wisa ye? Bi şiklekî bê sebir li bendê me. Em pir mijûl in. Dema qamp çêdike-bi cih dibe, gerîla di nava mijûlbûneke zêde de dibe. Cîlo bi hemû heybeta xwe ve ber bi azman ve serê xwe hildaye. Li jêr li cihekî, şikeftek dê karibe bibe biryargeha YJA STAR’Ê...

Grûba me ya ewlekariyê ji hevala Ûta, Leyla, Gulan, Medya û Roza pêk tê. Di vê navberê de em bûn du Medya, du Roza. Heval Rozaya din fermandara bolîka Cîlo ye; ya din jî hevaleke nû ya dema di Zagrosê re derbas bûm min li biryargehê dîtî ya bi navê Medya Ronahî ye. Bi wan re nuxteya me ya hevbeş navê şehîdan e.

Fermandarên bolîkan çûn civînên payîzê. Hevalên di tîma me de jî xebatên qampê dimeşînin. Dema dihatim vê derê weke hevalên ku min nas

dikir min hevala Dilar, Bêrîvan, Destan ji nû ve dît. Ew jî dibêjin “ji hevalên yekineyê tenê Roza maye.” Hevala Bêrîvan dibêje “Roza tu bêdeng bûyî, berê tu ne wisa bûyî.” Min jî got, em çibikin em têdikoşin.

Min bi hevala Emîne Erciyes ku evîndareke Botanê ye me jî hev nas kir. Jineke pir estetîk û sempatîk e. Kenê wê dotmama min anîbû bîra min. Civîn û hwd. hatin li darxistin. Hevala Emîne gotinên wisa kirin; “min ev Roza eciband.” Me bi hev re fotoxraf girtin. Hevalên asta jor weke hêza Bakur li ser cîhazê axivîn. Bi lêdana çepikan hate xelaskirin. Hevala Ezda ji bo tedawiya diranan çû, ne diyar e ku dê dîsa bê yan na. Hemû hevalên jin, me şelemeyên nû wergirtin. Vê gavê şelemeyeke herêmî li pişta min e.

Çi qewimî, ma hûn dizanin? Min hevala xwe ya dewreyê Özgür dît. Silav dayîna me û xatir xwestina me ya ji hev, bû yek. Tesadûfeke mezin bû. Ya xerab min nekarîbû biaxivim. Vê gavê ez ê biçim wezîfeyekê, piştre ez ê bidomînim. Vaye mijûlahiya zêde zêde.

...

Vaye li vê derê me. Em li kû mayîbûn, himm temam. Em roja han çûn kişfa qereqola navê wê di strana Oramar ku min sal û nîvekê berê di dawetan de gotiye de derbas dibû. Hevalên Ûta, Roza, Nûman, Hesen, Celal û Gelî. Piraniya hevalan hevalên Cîloyê bûn. Kişfeka xweş bû.

Çar aliyên Oramarê bi giran dorpêç kiriye, di navbera Çarçela û Cîlo de ye. Binkeyeke leşkerî ya derdora wê bi giran dorpêç kirî ye. Girêdaye Geverê ye û hema bêje hemû gund qorîçî ne. Qoriçîtiyeke bi darê zorê heye. Gerîla di geliyên Cîlo re di şivereyên wê yên teng re, di pirên kevir û dar re, li Gundê Bazê dimeşin. Bawer im Gundê Bazê, gundê ku di pirtûka Memed Uzun re derbas dibe. Cihên ji ber çavan dûr û veşartî yên çiyan, pir ez dam fikirandin. Ew cihên navên wan derbas dibin tenê dikare Zagros bin. Fikarandin, fikarandinên hevala kûr a kêliyê... Raborî û pêşeroj. Dema em ji bo payîzeke din wî cihî ez pir dixwazim talox dikin, pê pir kêfxweş im ku em li Cîloyê ev cara destpêkê ye ku tiştekî pêk tînin.

Meheke Cotmehê... Bêrîtan, ma tu dibînî jinan? Mêze bike ev encama berdêl, ked û hewldanên te û çendîn hevalên din e. Dilê min zîz e û dibêjim xwaziya. Dema te bi bîr tînim hê zêde pişta xwe didim çiya, jinan û vê jiyana pîroz.

Îro roja dawî ya agirbesê ye. Em mêze bikin gelo daxuyanî bê dayîn yan na? Şer, şerekî topyekûn li ber derî ye...

**31'ê Cotmeha 2010'an**

**Cîlo/Zeranê**

**Li ser rêya avê**

Vê gavê me baraniyên xwe li dêreke Ermenan raxistiye. Hevala Roza, Leyla û Medya nuxte guherîn. Li araziya Cîlo ya asê, dijwar û cihê lingan jî ji mirov re venake ya bi xîz dihizirim.

Li ser van erdên ku ez di deftera xwe ya pelzerîn de hest û hizirên xwe dinivîsîm, gelo kê bi şiklekî aram baweriya xwe jiyan kir? Keçeke Ermen a por zer, çav kesk a ciwan kîjan utopyayên xwe anî ziman? Kîjan jinan bi awayekî bê eman û ji neçarî guneh derxist? Di serdema qralên bi maske de di lêdana dilê xortên ciwan de kîjan îdealên jiyanê hebûn û kenên zarokan ên renga reng kîjan demên pêşerojê dixemiland?

Zarok...

Ma hûn dikarin fêm bikin bûyîna zarokek Ermen çi ye? Li cîhaneke pêşeroja wê tev kîmyawî ye jiyan kirin, di firinên sincirî de dûr ji hemû mirovahiyê şewitîn. Ma hûn dizanin ku li ser van axan weke Keldanî, Êzîdî, Ermenî, Suryanî û Kurd bûyîna mirov, ev bexçeyên civakî ji jiyanê re vekirinê, fêkî, zehmetî, êş û janên wê çiqasî mezin e? Ey gelên cîhanê, ma hûn di serdema Sedsala 21. de ji dayikbûna bi serbilindî û bi êş a keçeke Kurd dibînin? Berevajiya serdemek Romayê ku bi awayekî zindî tê binaxkirin! Berevajiya mahremiya ku li Zîguratan ketiye haremê!

Mêze bikin li bieslbûna jinê ku tê hewldan bêesilkirin. Mêze bikin û jê ders derxin! Qraltiyên paşverûtî û hovitiyê, ma we karîbû xweşikbûn û rastiya cîhanê tine bikin? Ji bo biharê xweş bişkok daye. Dê gul vebin, ma qet tovê binevş û giyabadekê xelas dibe. Hemû gul û çîçek dê vedin.

Ma azman dadikeve erdê? Piştî sedsalan li dêreke xirbe, ma gerîla dernakevin holê? Bi pênûsa jinekê ma ev derbasî nav rûpelên dîrokê nabe? Ma hûn dikarin ji rastî û heqîqetê xwe bidin aliyekî? Gelên

cîhanê! Ma hûn dikarin bi keştiyek ku ber bi hetahetayî diçe ber bi pêş de biçin. Ji bilî bêmanebûnê benderek ku hûn lê rawestin ma heye?

Ev nuxte pir xweşik e. Serbanê dêrê weke şaneşînekê ye. Pêşî vekirî ye, mirov dikare bêje derincokeke ji kevirên şikestî çêbûye. Dema mirov ji aliyê kelekê ve ji nav axê û tozê derbas be, mirov pêli axa weke bexçeyekî ku bi darên rengê zer û kesk tije ye dike. Pelên daran ên hişk bûne ku bi rengê xwe yê zer, sor, qehweyî, eflatûnî, portaqalî axê dixemilînin bi ber bayê herî biçûk jî dikevin. Sir û seqemeke hişk û zuwa, berêvarê dengê leyistina sîvoriyan. Teyr û bazên li azmanên şîn difirîn dema difirîn xuşiniyek ji ber baskên wan tê hestên mirov digihîne hetahetayiyê. Cihekî îlhamê dide mirov û tiştên di demeke romantîk de tên jiyankirin. Heybeta Cîlo û sir û seqam!

Em çûn neqeba Pêrîxanê û me bi hespan doçqe anî. Dîsa em her sê bûn. Ji ber ku hevala Bêrîvan ev çend roj in nexweş bû, maye. Her çendî me zehmetî kişand jî erka me biserketî bû. Nîqaşên me yên pir erênî û her şev stranên me yên tariya şevê diqetînin li beramberê ava diherike têdikoşiyan û di nava şevê de diman. Vê gavê ew ava li ber çavê me weke xeyalekê lê hat û piştî nuxteya avî, ji bo ku em qîmeta avê fêm bikin em li nuxteyeke nû ya ecêb a xweşik in.

Çîroka jiyana hevala Medya û Roza ku çend saet ji beriya vê tecrûbeyên xwe yên destpêkê jiyan kirine: Piştî ku me du caran erzaq kişand, li araziyeke pir xerab me xwest em bimeşin. Di destên me de bîdon, em hewl didin pir baş xwe bi axa bûye req û hişk û beran ve xwe bigirin û cihê lingê xwe çêbikin, em bi zora xwe dimeşin. Ji ber ku xîz e, qet hatin-çûyîn çênebûye dews venebûye, şemitîneke lingê mirov, tê maneya ku mirov di nava toz û dumanê de, bi şiklê devdevikî û bêyî ku mirov karibe tiştekî bike bigindire û biçe heya bi dolê. Medya li pêş û ez li pey wê dema me hewl dida dolikeke biçûk qut bikin ji ber ku min cihek peyda nekiribû lingê xwe lê daynim û ji ber ku dest û lingê min ji cihê min lê danîbûn şemitîn û bi lez ketin valatiyekê, Roza bi dengekî mezin ê ji Medyayê hawar dixwaze, demekê xirikî. Destê min qaşil avêt, serçavê min, her derê min bû ax û herî. Dema Medyaya li şûna ku bi zora xwe, xwe lê girtiye xuya bû, Roza di nava xîzê de rûnîştiye û dibişîre. Her yek bîdon firiyaye cihekî. Yê herî mezin taa li jêrî ye. Em

bi şiklekî eczbûyî, westiyayî û bi qasî ji me hat bi xeberdanê daketin jêr: “Ev çi ye, ev çi arazî ye. Xweziya em daketana jêr. Ma Leyla em qet nedîtin?” Medyaya eczbûyî, bêçareserî gihaşt dolê. Av dagirt. Dema çû ku ji cihê cirnexweş ê ecêb bîdon bîne, dengê Leyla hat. Dipirsî û digot, “Hûn li wê derê çi dikin?” Çûbû cihê ku me xwestibû em biçinê û dîtiye ku li wê derê av tine ye. Dema em bi awayekî pêrîşan û bêhal ketî, ava me tije kiriye dibin jor, em van gotinan dibihîzin. Gelo ev ketina me baş bû, çi? Rêya avê ku panzde deqîqe bû, bi şiklekî westiyayî, ecz û ji hal ketî, me karîbû di du saetan de biqedînin.

Niha jî em li nuxteya bi daristan a têr dar tiştê ku me jiyan kiriye vedibêjin û têra xwe pê dikenin. Tehtên bilind ên Cîlo ji ber tava diçe ava, bi rengê sorîn xwe xemilandine. Leyla û Medya diaxivin, li bendê ne ku ez dawî lê bînim. Bask bidin, bifirin, min jî, min jî bibin, bibin nav daristaneke dîn û har. “Evîn pir dûr e, ji stêrkan jî dûrtir e. Nizanim ez ê çawa xwe bigihînimê. Balinde... Balinde...”

Mamikek: Ma çima rêyeke avê ya panzde deqîqe. Li cem gerîla dibe du saet?

**7’ê Mijdara 2010’an**
**Nuxteya Dêrê**

**Ezeziyên me yên dilan diêşînin**

Ji aliyekî ve li ser masaya me ya xweşik a bi nozde kursî mêze dikim û ji aliyekî ve jî dinivîsîm. Li vê nuxteya me ya germ ku zû tavê dibîne nizanim çend roj in nexweş bûm. Netirsin namirim. Min sermayeke pir pîs girtiye. Rojekê li erdê û du rojan jî bi şiklekî pir bê hal li ser piyan bûm. Wê rojê, ez û hevala Gulan bi hev re çûn ser kaniyê, di wê sir û seqama mirov dicemidîne ya Mijdarê de bi ava weke qeşa me dûşek girt, bîdonên xwe tije kirin û em zivirîn. Hevala Medya ji ber nexweşiya min bîranîneke xwe bi vî awayî got ku ji beriya çend mehan li Sumbulê, serma girtiye û nexweş ketiye lê belê neçar maye biçe erk û wezîfeyê û piştre bi rojan li erdê maye.

Nêzîkatiyên bi vî şiklî min diêşînin. Hin kes hene, şoreşgeriyê weke robotbûnê digirin dest û wisa jiyan dikin. Yanî pê bawer dikin ku şoreşgerek nexweş nabe, naweste. Weke ku agahiya wan ji hemû hest û

hizirên mirov nebin. Tiştên aîdê mirov, dûrî mirov û li pêşiya mirov xefk in. Gerîla qet ne hebûneke mekanîk a weke moriyan e. Ferasetên wisa, tiştên berevajiya îdeolojiya me, berevajiya sosyalîzm û zagonên sosyalîzmê ne. Hin hevalên ku bi salan e di nava vê jiyanê de jiyan dikin û em weke hevalên kevn bi nav dikin. Dema ev heval, hevalên me yên zehmetî dikişînin yan jî hevalên nexweş di bin psîkolojiyeke wisa de dihêlin, teng dibim nikarim vê qebûl bikim.

Dihizirim ku ev nêzîkatiyên ezez û egoîst berevajiya felsefeya Rêber Apo û têkoşîna mirovahiyê ya ku şehîdan di oxirê de jiyana xwe dayî ne. Ya ku min herî zêde xemgîn dike jî ew e, ev li cem fermandarê me tê jiyankirin. Ruxmî ku ez ji fermandarên me yên pir bi qîmet, dilnizm, kedên mezin dayîne yên kevn pir bi rêz û hurmet im, ji wan hez dikim, qet nikarim ji yên xwediyê ferasetên îqtidarperest, ezez, hesûd hez bikim. Vaye ji ber vê yekê li beramberê van kesan têkoşîneke bi zanebûneke mezin, dilekî mezin têkoşîn bê meşandin, ji bo vê jî hemleyeke Partîbûnê hewce dike. Lê jidil û bi xwestekeke mezin.

Pêvajoya min a nexweşiyê baş derbas bû. Heval pir bûn alîkar. Min û hevala Leyla Azerî me li ser van mijaran nîqaş kir. Medya Ronahî, pêwîst e ez wê keçê ji bîr nekim. Pir bê hesab û dilpaqij e, berjewendiya xwe nafikire û fedekar e.

Min ê hin tiştên din binivîsanda. Vê mijarê da ji bîrkirin.

**13'ê Mijdara 2010'an**

**Li ser erdnîgariyek ku dişewite**

Niha Kurdistan, Mezopotamya meşaleyeke pir mezin e, agirekî azadiyê ye, gurzê sincirî yê di destê Kawayê Hesinkar de ye. Rengên şîn, kesk, zer û sorsorî li ber bayê pêl didin. Agir û pêt di rojên dawî yên demsala payîzê de erdên pîroz ên Zagrosê dorpêç dikin.

Ava Şîn dişewite, ji ber obus û topên tên avêtin xweza weke cihê şewatê lê tê. Bihuşta xweşî û bedewiyê, sembola kedê dayika ax, egera sotîner a şerên xwînavî, Mezrabotan nirxa pîroz a hemû hebûnan! Axx Kurdistan çendî şêrîn î! Ji hingivê herî eslî hê şêrîtir î, ji çîçeka herî şêrîn û ji behrên herî mezin hê mezintir î.

Axx Kurdistan çendî asê yî. Te Îskender bêzar kir û Zeûs dilbijandî kir, ji aliyekî ve jî Cihû mezin kirin. Ya ku Star kiriye hêz, Zîlan kiriye efsane yî. Axx Kurdistan çendî bi êş î... Ji jina herî zehmetkêş û bi êş hê êşkişandîtir î, ji keça ciwan a herî bi tenê ya îsyankar hê melankolîktir û ji payîza herî xembar hê xembartir î...

Axx Kurdistan mirov nikare dest ji te berde! Ji bo yên ku dîlên şehvet û nefsê ne hedef î. Axx azadî çendî bi qiymet î.

Weke Roja ku li Îmraliyê tevahî gerdûnê dorpêç dike yê kesê herî mezin ê bi fezîlet ê hemû mirovahiyê!

Weke keçên li quntereyên Cîlo ku çekê radikin û li hêviya biharê dimînin.

**22'ê Mijdara 2010'an**

**Cîlo**

**27'ê Mijdarê**

Hêvî, berpirsiyariya wijdanî ye, berpirsiyariya wijdanî jî çareserî ye. Ji ber vê yekê hêviya aştiyê ya Rêber Apo pir mezin e û nahêje. Rêbertiyê bi berpirsiyariyeke pir mezin a wijdanî berê xwe daye paşverûtî, hovitî û kaosê û xwestiye bibe çareserî, bûye hêviya hemû gerdûn û mirovahiyê. PKK'ya ku rastiya berbiçav a hêvî, bawerî û bûn çareserî ye, qada azadiyê ya bêsînorî û kêfxweşî û azadiyê ye. Ûtopyaya biesilbûn, fezîlet, mezinbûn, serbilindî û erdên bi xwînê hatiye avdan e. PKK lêgereke heqîqetê ye ku li dijî paşverûtî û saxtekariya bi hezaran sal derketiye.

Rêbertî, roja dilê min, me çiqas jî dixwest em bi te re bin. Dibim keştiyekê û ber bi Îmraliyê ve diçim. Dixwazim bibim kevokekê û li ser milê te daynim, bibim stêrkekê bikevim li nav porê te, pîrozbahiyek ku bi te dicoşe da li dar bixim.

Ez dixwazim bombeya hêrs û kînê ku tije kefa destê min, dil û mêjiyê min bûye bi deriyên hesinî yên Îmraliyê de biteqînim, Roja azad ji esaretê xelas bikim. Dixwazim ji bo ku 'xwaziya' yên zarokên biçûk û Rozayên cuda nebe; xweza xembar nebe û nebe birîneke ser dilan.

Min dixwest li ser navê jina ku te ji nav çar dîwaran ew xelas kiriye, weke jinekê bibim tîrejek ku dikeve nav hucreya te ya tarî. Dixwazim bibim pêlên deryayan, xwe bigihînim tu yî ku bendera mirovahiyê yî. Yên dixwazin bibin çareserî, ked û hewldaneke mezin raber dikin.

Ji ber silava ku te di nota hevdîtinê ya 24'ê Mijdarê de ji gerîla re şandiye û ji bo 1'ê Adarê hêviya min mezintir bû. Ruhê min weke biguvaşin li ber darê êşkencê ye, bê nefes mayîna te ti car nikarim qebûl bikim. Em ê çi li fikarê gelê ku di pençê qirkirina çandî de ye, li fikarê jinan bikin? Hewl didim ku bibim layiqê dîroka ji agir ku Kemalan, Mezlûman, Heqiyan, Zîlanan, Bêrîtanan û çendîn lehengên bênav afirandine û cil û bergên li ser min û pêwîstiya girêdana bi erdên ku em pêlî dikin zanebûna mezin a berpirsiyariyê ya di mêjiyê xwe de weke çiyan saxlem bikim. Di lêgerîneke wisa de me bi şoreşa wijdan û zêhniyetê sih û sê salan bi serkeftinê tacîdar bikim, jiyaneke ji rêzê qet qebûl nakim.

Jina Azad! Di xebata nîvçe mayî ya destanwarî de pêşketin çênebû. Birînên ku dilê min diêşînin û hevaltiya nebes didim ber lêpirsînê. Bi kîn û nefretek ku mezin dibe dema berê xwe didim pêşerojê, şiyara "hêviya min weke deryayan û baweriya min weke çiyan e" qîr didim.

Me sersala avabûna Partiyê li Cîlo, li bajarê pêşerojê yê YJA-Starê, bi hevalên bolîka Şehîd Gurbet ku ji panzde kesan pêk tê bi moraleke kurt pîroz kir. Berêvarê hevala Roza û Dilar ji bo wezîfeyê çûn nuxteya Mede. Li araziya asê ya Cîlo wezîfeya panzde saetan bi nobedên ta û lerzê yên di sir û seqama meha Mijdarê de heya dema derketina tavaheyvê berdewam kir. Em saet di çaran de gihaştin nuxteyê. Ji destpêkê heya bi dawiyê pir keniyam. Her liv û tevgera hevala Dilar pir komîk e. Pir dikenim. Kar û xebata çêkirina qampa zivistanê xelas bû. Dema vesaziyên nû pêk hatin em ê dest bi perwerdeyê bikin. Vê gavê me axaftina hevalê Sofî Nûredîn ji cîhazê guhdar kir. Em hê li dêra pîroz in. Di vê navberê de Cîlo asîmîle bûye. Tav terka min nade. Her bijî! Berf lê nake û ji ber ku pirsgirêka me heye em nikarin biçin qampa zivistanê. Qamp li quntereyên Cîlo ye, dema dibe şev lûtkeya Cîlo bi toneke rengê sor dibe. Qampa me bi vê heybetê tê xemilandin.

Belê dîsa ez ê bi leza xwe ya dawî tevlî perwerdeyê bibim. Em lê mêze bikin, em ê niha dest pê bikin.

Bimîne di nav xêrê de...

**Mijdara 2010'an**

**Tavaheyvê**

Ev du şev in bi saetek ferq di nobeda min de komek ronahî bi şiklekî pir bedew bi şiklê xwe yê dişibe nîv heyvan wê tariya giran diçirîne. Berê jî min hilatina wê ya bi heybet temaşe kiribû. Bi şewqa xwe ya tûj çavê min êşandibû. Kêm mabû biçe, bûka hatibû mala bavê xwe. Wisa dibêjin mîtolojiyên baweriya îdeolojîk ên sîstemê.

**2'ê Kanûna 2010'an**

**Cîlo**

**Divê tiştê em jiyan dikin bêmirin bikin**

Weke bolîk hevalên rojnivîsa bolîkê binivîsîn hatin diyarkirin. Ez û hevala Ronahî ne. Plan heye, em ê rojnivîseke pir xweş binivîsîn bi rê bikin çapemeniyê; ez vê hêviya xwe diparêzim. Dibe ku ev ji rojnivîsa min a şexsî, min dûr bixe. Lê girîng e û ji ber ku dê kolektîf be min pir bi kelecan dike, kêfxweş dibim. Defterên rojnivîsê vê gavê li qampê ne. Eger bager rabe, berf bê em ê biçin û di cih de ez ê dest pê bikim û binivîsîm.

Ma tê bîra we, biharê di deftera xwe ya din de min giliyên xwe ji baranê dikir. Vaye diyariya xerabûna xwezayê ji mirovahiyê re. Kî dizane dibe ku bihar û havîn qet neyê, hûn çi dibêjin? Hêzên zordest û desthilatdar ma hûn ê koçî Marsê bikin? Ji we re ez bêjim: bila agahiya we jê hebe, berhemên we ekolojiya wê derê jî têkbiriye.

Em vê gavê girîngî û maneya perwerdeyê guhdar dikin

**Kanûna 2010'an**

**Şaristaniya tekdestperest**

Dema em xwendina paraznameyan didomînin ji bo tevlîheviya mezin ku hatiye afirandin heyfa min tê. Kaosên pir mezin ku seknên cuda bûne sedem; mirovekî Aşûrî jî dixwaze sîstem Aşûr xelas bibe, ewqas xeterî mezin e. Ev bû sedem ez bibişîrim. Alatewşiyên pozitivîst ên Awrûpa, çanda milîtarîst a olperest, NY, NATO û hwd. teoriyên asîmîlekirina netewan ku wan weke keriyên pez ku bi hêsanî tê birêvebirin lê dike, metafîzîka rasteqîniyê... Ev û gelek tiştên dişibin vê.

Parazname kelecaneke pir mezin didin min. Xwendina wan pir xweş e. Hin caran jî dilê min dişewite, dibêjim axx. Hin caran bi muzewarî dikenim, hin caran jî bi kîneke mezin bi hêrs dibim. Bi taybetî jî ji bo rastiya tekdestiyê! Û li pêşberê gerdûnê weke mirov dilê min bi min dişewite, ji mirovbûna me şerm dikim. Kes û civakeke evqas bûye hêwil!

Lê ma mirov ne hebûna herî biesalet bû? Divê ez pir mezin xwe amade bikim. Pêwîst e em qadên wan li wan teng bikin. Rastiya dîaspora û Cihûyan li her derê ye, di nav her tiştî de ye. Piştî ku beşa li ser Cihûyan hate xwendin hevala Bêrîvan bawer im ewqas ketibû nav şik û gumanê, dest pê kir bêje, “ji nav me kî Cihû ye?” Ya din jî çima ji min re nabêje “tu dişibî.” Hema bêje ji ken teqat di min de nema. Bi vê şibandinê re dîsa bi êşa giran a afirandina Rozayê ketime.

Ez ji bihevmijûlbûnê nefret dikim. Ewqas pirsgirêkên me hene, de were bi paşverûtiyan mijûl be! Pêwîstiya me bi kesayetiyên xurt heye, fêm dikim ku di rastiya jinê de afirandina kesayetiyên bihêz xebateke lezgîn e. Rastiya ku ji serkeftinan pir ditirse... Bessss e!

Dema me ew nîqaşa xweşik kir hevala jiyan got, “mirov li beramberê te ne rehet e. Weke ku tu derûdorê biçûk bibînî.” Min jî got, ji bo min hevaltiya îdeolojîk û jidil, rêgezek e. Ji derveyê vê terzên têkiliyên teng, hestewar, derd û kulê xwe ji hev re gotinê dikin armanc, hev nadin ber lêpirsînê, qebûl nakim. Li beramberê vê disekinim. Hevala Bêrîvan jî hin hişyariyên bi hevaltî kirin û got, “vê sekna xwe bidomîne û hişyar be” dîsa hin feraset û seknên paşverû jî anîn bîra min.

Li Sunayê difikirim û niha jî li Rozayê. Ma tu Rozaya dixwazî diafirînî? Her çendî pir zû be jî hîs dikim. Bi şerta ku biparêze û hem jî bi pêş bixe. Jina Azad, vaye zehmetî, êş û janên vê zêde ne!

Taxima me ji heval, Uta, Jiyan, Rojda, Silav, Gulan, Bêrîvan û Roza pêk tên. Dîsa li taxima duyemîn im û BKC'yê radikim.

Hevalên taximê bi giştî hevalên baş û xwediyê asteke bilind in. Ka em lê mêze bikin, hêviya min ew e, em zivistaneke bi hevaltî derbas bikin. Hê jî berf nebarî, ez ê dîn bim. Doh me li cem hevalên rêveberiyê li ser pêvajoyê nirxandin kir. Perspektîfên wan hebûn. Gotin, "xwe paşve nekişîne, alîkarî bide hevalan, xwe baş tevlî bike, kûr be û hwd..." erênî bû. Ez, Roza û Uta bûn.

**8 Kanûna 2010'an**
**Cîlo**

**Piştî bi salan bi muzîkê hişyarbûyîn**

Çiqas ecêb e, kêliyê pir girîng jiyan dikim. Li şikefta me, bajarê me yê Apollo deng û qerebelixa kêfxweş a jinan radibe azmanan. Azadî sînor nas nake. Belê, em hatin qampa xwe ya zivistanê. Doh bi şev di wê tariyê de ji nav hevalan ya ku ew cihê me yê şêrîn nedîtî tenê ez bûm. Yanî kelecana min pir zêde bû. Piştî ku me rêwîtiyeke çil deqîqeyê bi BKC'yê xelas kir me xwe gihand qampa xwe ya xweşik ku ji sê manga, mitfeq, qamelya, qorîdor pêk tê ya tam bi mirov hestên maleke biçûk didine jiyankirin. Masayeke me heye. Xwaziya we ew bidîta, herî zêde kêfa min ji wê re hat.

Her du taxim jî bi birandayê ji hev hatine qutkirin, dîsa qorîdor, cihê daran û lojîstîkê û hwd... Aladîn, jenerator, DVD, TV, satranc... Çi bixwazî ew heye. Ez doh bi şev dîsa bi helbesteke Umut Altınçağ ku min pir jê hez dikir di wê çilê zivistanê de ketim nav fikirandineke kûr û dûr. Gelek tişt hatibûn bîra min. Hevalê Botan û hevalekî xort ku navê wî qet nayê bîra min, ji bo ku tv'ya me qet naxibite çêbikin hatibûn. Rasthatineke balkêş, bi rê de em dîtin.

Me doh bi şev bi qasî panzde jin û du xortan weke şervanên azadiyê yên pêşerojê di heman şikeftê de li xwe kir sibe. Hem jî bi fezîleta herî mezin a mirovbûnê, bi hevaltî... Bi derbe kirina hemû dogma, awayê lê mêzandina îdeolojîk a sîstemê. Bi heqîqeteke herî rast û watedar... Bi kêfxweşî û bextewarî...

Dikare bi awayekî cuda jî jiyan bê jiyankirin. Ev jiyana ku hûn jê ditirsin, ji bo we îxanetkarên jiyanê xewnereşika herî giran e. Em ê gav bi gav biherikin gerdûnê.

Ji ber dekoderê kanal derneketin. Bê Roj TV nabe. Divê em pêvajoyê bişopînin. Ka dê çi bibe, ew çûn. Îro pir bi mijûlahî derbas bû. Em hewl didin tiştên hûrde mûrde yên kêm temam bikin. Wê rojê em pir westiyan. Cihê me pir ji avê dûr e, çûyîn û hatin du-sê saet in. Naxwe, lingo qurban! Arwazên asê û tîk ên Cîlo bûne derdê lingên me.

Dema mirov ji şikêftê derdikeve, dîmeneke pir xweşik heye. Cihê me pir bilind e. Quntereyên Garê, Sumbul û lûtkeyên girên Çarçelayê û cihê me yê stratejîk ku hê gelek cihên din bi awayê mêzandina ji jor ve xuya dibin, pir xweşik e.

JINA AZAD, were, me û rewşa me ya têkoşînê bibîne.

Şeva em hatin bi şiklekî westiyayî û jihevketî, piştî çaya me ya gerîla me filmê bi navê ‘Dilê Wêrek’ (Cesur Yürek) temaşe kir. Û niha cihê xwe xweş bike û guh bidê; me xwe gihand rojnivîsa xwe, rojnivîsa bolîkê! Xembar nebe, ez ê demekê bi wê re eleqadar bibim û divê ez vê dema dîrokî û cihê dîrokî bi layiqî ji dîrokê re vebêjim. Dê baş be, tiştê ji te re binivîsîm hene, lê niha bi xêr bimîne...

**10’ê Kanûna 2010’an**
**Bajarê Apolo Yê Biçûk**

**Dilê min tar û mar bûye**

Were û li rewşa min temaşe bike, dilê min di erd û azmanan hilnayê. Nayê vegotin, di kaxizan de bi cih nabe... Divê ez liv û tevgerên herî kûrahiyên dilê xwe çawa bînim ziman? Ma mirov dikare vebêje, gelo bêyî ku hûn jiyan bikin hûn ê fêm bikin? Dîmeneke sipûsipî ya berfê ya bêdawî, ya pir paqij bihizirin. Aloziya li ber paşverûtiya deqeke reş a li ser berfê tê jiyankirin, êş û janên dilê min ên di cîhan û galaksiyê de bi cih nabin. Heyf û mixabin...

Tam li nîvenga behreke pir mezin a heyf û mixabinê me. Dilekî melevanî nizane. Ji bo fêr bibim zêde zêde hewl didim. Bi ser dikevim jî lê di behra hêviyê de weke zinarekî dijwar li paşverûtî û tirsonekiyê didim. Di tewazinekê de mayîn pir zehmet e. Dixwazin tewazina min

xerab bikin. Ji ber paşverûtiya hemcinsa xwe û seretayîbûna wê bi rewşa me ya jinbûnê dilê min dişewite û heyfa min tê.

Dîsa li gel Rozayê serê min ketiye belayê. Ax jina azad ax, hewl didim di demên herî bê rehm ê xwe gihandina te de nefes bistînim. Tevlî Partî bûm, bi hewldan û bi kedeke mezin hinekê berê xwe didim serkeftinê. Lê ji ber hasûdî û bi zêhniyeta bêtehamûliyê dikevim bîrên bê binî. Gelo bi serkeftina hevalên xwe kengî dê kêfxweşbûn bi pêş bikeve?... Di saetên êvarê de dema hevala Uta dixwest li ser dersê felsefe bixebite, min bersiv dida pirsên wê yên li ser Descartes, mijar hat ser uslûbên di perwerdeyê de. Ji min re got ku uslûba min û hizirên min mirov pir kûr dikin û bala mirov dikişînin. Li ser zêde kir “tenê li cem hin kesan wisa ye, ji bo ku perwerde bê fêmkirin jî ev girîng e.” Û çavderiya xwe ya li ser min ku bi hevalekê re bi pêş xistine ji min re got; “ez û hevalekê/î li ser te axivîbûn, ji bo te gotibû hevaleke xweş e, mirov dixwaze timî guhdar bike.” Ya din jî got, “ji ber ku di nav me de hin paşverûtî hene û hin hevalên me yên dixwazin bi pêş bikevin ji aliyê derûdorê ve tên tengavkirin û divê ez ji bo vê hişyar bim.”

Heval Roza Şeryusuf ku em her du heman navan bi kar tînin jî, ji bo min hestên neyinî dihewîne. Ji ber çi ye nizanim. Hêza hîskirinê ye ev, ma qet dikare mirov bixapîne? Vê dide der jî. Min di dersê ‘wate û girîngiya perwerdeyê’ de nirxandineke wisa bi pêş xist: ji bo zanebûnê jî perwerde divê hebe. Lê kêm mayîbû îqtidarperestiyê di min de mehkum bike. Got, “ma tu nakokiyan jiyan dikî?” Baş e ku biqasî karibim bidim fêmkirin zanebûna min hebû û hemû heval jî heman tişt difikirîn. Ji ber ku rast bû.

Ew ê hêza hiyerarşiya bê xêr bi kar bîne û bixwaze min sînordar bike. Min ji serpêhatiyên bi hevaltî yên hevala Uta û Bêrîvan fêm dikir ku li paş van hevokên ser girtî, kesên wisa yên xwediyê zêhniyet, terz û ferasetê bin hene û ew kes di rewşên wisa de xwediyê rol in. Ji ber ku ew jî bûbûn şahidê jiyana min. Hevala Uta jî bi qasî min ev hîs kiribû û ji ber vê yekê dema di nîqaşên me çêdibûn de ji min re digot ku divê ez li cem hevala Roza bê xem û fikar nîqaş bikim.

Hevala Roza nû nas dikim. Ruxmî ku taybetmendiyên wê yên erênî hene, dê dem nîşan bide ku di vê mijarê de çi tişt biqewime. Ez ê ruxmî

her tiştî bi wê zanebûnê tevbigerim ev ti car li gel îdeolojiya PKK'ê nabe yek, taybetmendiyeke kesan e û bêyî ku ti car xwe bi paşde bidim, bi hesesiyet nêzîk bibim ku hê çalak, bi moral, bi coş tevlî bibim.

Ji ber ku di vê mijarê de safî me; di encamê de wê kesê jî ecêb bi pêş dixe. Niha pê nizanibe jî di kêliyeke pêşerojê de ji sedî sed bi encamên vê re rû bi rû dimîne. Bi ser de jî eger ev gerîlayeke jin be. Di vê mijarê de her kes dikare pir bi hêsanî, weke baş be, leheng be derkeve holê lê belê di mijara rastiya xwe bi xwe de weke pelên ku payîzê ji daran diweşin xwe berdide erdê û ber bi bayê ve diçin. Ez bi maneya rast herî zêde dikarim mirovan bi van nas bikim. Ev hîsên min jî li serê min bûne bela. Ev bû ya duyemîn. Hê çi li benda te ye Rozê? Te got, ez ê bi hêz bim. Te got heqîqet û tenêbûn, ma qet ev bê berdêl dibin? Ma te digot çi ye? Lê heyfa dem û cih...

Di navbera hevala Medya Doz û Bêrîtan de ji ber uslûbê wê aloziyeke ne xweş bi pêş ket. Ji sibê heya bi êvarê bi şiklekî bêdeng li mangeyê bû. Ne baş e. Dilnizmî, rêz û hurmet, feraset û çareserker bûyîn hewce ye. Di paraznameya Sosyolojiya Azadiyê de, dema min dixwend bi zanebûn paragrafek ku tam jî rewşa wan tîne ziman, bi armanca ku wan bide ponijandin, min dubare kir. Paşê Bêrîvanê got ku min baş kiriye. Tiştên qewimîne ez ê nebêjim, lê aloziyeke bandor li ser her kesî kirî, nehewce, neyînî bû. Qet ne li gorî vê jiyanê ye û ne layiq e.

Baweriya min ew e zivistaneke me bi tiştên hûrde mûrde, bi pirsgirêkên terz û kesayetiyan derbas nabe. Ma mimkûn e? Bila... Ez ê hevokê weke bûyî binivîsim:

**13'ê Kanûna 2010'an**

*"Mirov li kû derê, di kîjan rewşê de dibin bila bibin, eger nikarin pirsgirêkên xwe yên li pêşiya xwe çareser bikin, di vê de faktora bingehîn; ji ber astên hizira seretayî ku wêrekiya rizgarbûna ji dogmayên bi hezaran sal û ajoyan nîşan nadin... Tirsonekiya ji aliyê fikir ve esasê hemû tirsonekiyan e."*

**Rêber Apo**

**Kuarkên jiyanê yên jêratoman ên Apollo**

Kuarkên di tovikê atomê de hem pir tevlîhev in hem jî bi qasî wê bi aheng in, ji taybetmendiyên hev re rêzdar in. Bi heman şiklê taybetmendiyên cuda yên gerîlayên jin ku bajarê me yê APOLLO xemilandine. Bêyî ku kêliyekê jî bisekine, jiyana me bi hemû lez, liv û tevger û guherîna xwe didome...

Ji bo ku jiyana me bê komîserhevkirin bê gihandin herîkîna wê ya bi heybet, divê civak bi hîs, hêz û rastiya elektronên ji hev cuda dibin ji nû bê xistin nav liv û tevgerê! Ji bo ku civak û mirov, hacim, seng û îvme qezenc bike, weke enerjiyê biherike mêjiyên me. Ji bo ku ji çema zer mirov xwe bigihîne çema reş û ji nû ve bibe çemeke zer... Weke paketên biçûk ên enerjiyê bi guherîn, dualîzm, îhtimal û nediyariyên xwe bi awayê maneya exlaqî, weke kuarkên bi aheng û hem jî tevlîhev, em proton-notron û elektronên dixwaze bizivirin tovika atoma xwe ya esasî ne ku berevajiya hev in... Em mirov parçeyek in ji gerdûna ku em nikaribin pê bifikirin; evîndarên leza şewq û enerjiya ku li me mirovan derbas dike ya evîndarên azadiyê ne... Felsefeya me ya jiyanê, yekparetî, di ferqê de bûn û jiyana bi mane ya li beramberê cudahiyan bi hurmet e.

**21'ê Kanûna 2010'an**

**Cîlo diyarê teyrûbazan**

Ma we qet di şevek ku hûn ji ber germahiya havînê ketine rewşeke aloz, li cihê ku we xwe hema wisa dirêj kiriye stêrk jimartin; li gel kesên hûn jê hez dikin ên dûrî we ne, we ew stêrk kirin yek û ji wan daxwaz kirin? Ma hûn bi nîv heyvê ku yek ji rewşên heyvê ye, li şaneşînên hênik, weke ku hûn ê hilatina bi efsûn a heyvê bi destê xwe bigirin, şiyar bûn? Ma qet têhna rojê mijangên we şewitandin?

Di şevên tingûtarî yên hûn meşiyane, ma kêzikên Tebaxê bi efsûnbûna xwe li dora şiverêyan teyisîn? Ma gelo dema bi xişexişa giyayê hişk ketiye hûn heya bi mêjiyê hestiyê xwe veciniqîne? Ma we di azmanê bê dawî de bafironek firandin, bi dilekî şînbûyî? Destê we

ma gihaştin sumbilên zerbûyî? Ma we bêhna axê ku barênê belav kiriye weke bêhna herî xweşik be bêhn kir? Ma damarên xwêdanê yên afirandinê, weke berfa xemkêşiyê ruhê we bi rengê spî kirin?

Lê piştre, ma di keştîgeha dilê we de çileyê zivistanan xwe gihandin biharan? Ma hûn li gel kevroşk, sîvorî, mişk bûn dost û tevî kevok û teyran ber bi azadiyê bask lê da? Ma we karîbû pê bihizirin ku dema hûn arwaz derkevin li serê tepe ji nişka ve hûnê hemû zehmetiyan ji bîr bikin? Û çavê we karîbû bêyî ku jê têr be li dîmenên bê dawî bedew temaşe bike?

Ma we singa xwe daye ber hemû bermahiyên pênc hezar salan, barê zehmetiyê da pişta xwe û gelo hûn derketin lûtkeyê çiyan?

Dipirsim, li ser erdên herî bi berhem ma hûn birçî man, li cihên herî avî lêvên we ji têhnbûnê terikîn, li erdnîgariyên herî bedew bi qeçaxî, surgîn û penaberî we jiyan kir?

**25'ê Kanûna 2010'an**

**Dema salek xelas dibe û saleke nû dest pê dike**

Bi bişirîna kêfxweş a heyvê ku nuxteya me ya şirîk a me hemûyan e em hemû li heman azmanî mêze dikin, ji hemû kesên hez dikim re merheba!

Di çirûsîna şewqa çavê min de, azmanê her cara ku ez lê mêze dikim tenê yekane obje ye ku bi yên dûrî min re parve dikim... Rêbertî! Dema em sala nû bi berfê pêşwazî dikin gelo li deryayan berf dibare? Yan jî derya bêyî ku berfê bihelîne gelo dikare bisekine? Çend caran berfên berwext li zindana te barîn? Ma tu hê weke em berdayîne?

Îro em li quntarên Cîlo panzde jinên evîndarê azadiyê ne û me hemûyan doh ji beriya dest bi moralê bikin tu bi bîr anî. Afirandin û jê bê par mayîn... Ma tenê aîdî Stara ku xwedavenda neolotîkê ye ev? Gelo tu yê ku zarokê wê yî herî girêdayî yî jî, ev li para te dikeve? Aliyê me yê şirîk e, afirandin û bê par mayîn...

Dayê, jina bê çareserî... Ma li azman mêze dikî? Azmanê çav bi rondik, ji nişka ve weke bi sêr be ji te ve weke keça te xuya dibe? Gelo

tu li hemberê demên bêyî serî radikî? Li ser zimanê te stran, dilê te bi xeyala min her kêliyê weke cihê afata şewatekê bê deng dibe?

Axînên di dilê te de di cihê veşartî yê gotinekê de çiqas mezin bûn? Ma dizanî keça te ya ku çavên wê xembar û hesretê cihê dûr e, çiqas mezin bûye? Gelo dibînî qralîçeya êş û janan, berdêl û esareta têkoşînê weke neteweyekê dibînî? Ma yek bi yek tînî bîra xwe? Birayê min ê mezin, xwîşk û birayên min û hemû kesên jê hez dikim... Ma di dilê we de kûl û derdê valahiya ku min ji bo valatiyên din dagirim vedayî heye?

Bîranîn, bîranîn... Cudabûn bi baran û bayê xwe di dilê min ê ax de xwe digihîne êxtiyariyê. Me doh bi şev bi moraleke kêfxweş û bedew sala nû pêşwwazî kir. Me skeç amade kiribû û min ev cara duyemîn e teqlîd dikir. Me pêşberîhevkirina jina kapîtalîst û demokratîk kir. Hevalan jî skêcên cuda amade kiribûn. Hevala Destan teqlîda me ya hemûyan a di perwerdeyê de kir. Ji kenan em zikopişto bûn.

Hevala Leyla bûbû dayika Noel û got ku ew ji Îmraliyê hatiye. Ji ber ku dayika Noel ew kesa ya ne mimkûn e pêk dianî bû. Piştî ku min li ser sala nû hestên xwe parve kirin, wê wêneyên bedew ên li pişta wan bi farsî nivîsî bû yên xweşik da me hemûyan.

Her çendî ew nebihîze jî sala nû ya Rêbertiyê pîroz dikim. Min axaftinek kir. Weke her kesî hevala Leyla jî ji vê bandor bû û wêneyê destpêkê da min. Xwestibû bi min bide hîskirin ku ew min dibihîze. Min hinekê jî bi heyirî mayînê hestên pir cuda jiyankirin. Di veguherîna kêliyê de dibe ku her kêliyê her tişt biqewime. HÊVÎ...

Me li kaxizên biçûk navê hevalan nivîsand ku ew ê xelata xwe bidin kê. Hemû hevalan ji wan kaxizan ji xwe re kişand. Her heval ji hevalekê re derket. Xelata min jî hevalan Roza da min. Em her du Roza derketin ser dikê, di weneyekî de bê mirin bûn. Govend, dans, stran û leyistok di arîfeya sala nû de gerîlayên jin... Dema şev hinekê dereng bû, skecên me yên komîk kêm bûn û stranên me yên dawî jî dihatin gotin, di hewayekî xemgîn de çavê hemû hevalan hêwî girtin û rondikan xwe berda xarê.

Dema em bi pêşengiya hevala Uta diçûn kamelyayê ji bo ku baqlawayê komînal hatiye çêkirin em bixwun min dît ew hevala dilnazik digirî. Pir xembar bû, nedikarî biaxive. Bi îskinî got, “neletê

dijmin" û nalîna wê tije mangeyê bû. Wê kêliyê gelo ji ber ez jî heman hestan jiyan dikim yan çi ye, min ji pir kûr ve psîkolojiya wê fêm kir. Min ew hemêz kir, sêvikên wê yên diteyisîn ramûsand û jê re got, Gulan ma ji bo pêşerojê ye ev rondikên çavan? Bi temamî wisa bû. Ji ber ku dê roj bihata ev qampa me ya ku bi kenê me yê kêfxweş hatibû dorpêçkirin ji ax û keviran re bimaya. Dê me hemûyan hespê xwe biajota nav pratîkên bi dijmin re di nav hev de ne û li pey wê dê di mêjiyê hemû hevalan de raboriyek ku dengê me yê kêfxweş, bi kelecan, bi coş xemilandiye, tev bi mane, hîs û têkoşîn bimaya. Ev kêlî, careke din ti carê dê wisa nebe. Kî dizane li gorî qurala ku guherîn nayê guherîn dê rêyeke çawa derkeve li pêşberê me hemûyan? Bi ser de jî di rasteqîniya sotîner a şer de van hê zêde êş didan wê. Keça dil perperik a Makoyê dibe ku amadekariya pêşerojê dikir.

Ji Gulana ku xwediyê dilekî êşa bişirînên nîvçe mayî pir kişandiye re min got, divê jiyan biherike, eger her tim yek be bifikire, em ê çendî ecz bin, dema çendî bê mane dibe. Her tişt di dema xwe û cihê xwe de baş e. Ya girîng bi vê perspektîfê li jiyanê mêze kirin e, her çendî ya li beramberê me ne jiyaneke asayî be jî. Paşê ez hizirîm. Berê min gelek caran ev hest jiyan dikirin û gelek tişt weke di qirika min de asê diman, min nedikarî nefes bidim-bistînim, difetisîm. Min nedikarî li beramberê neheqiyê xwe ragirim. Lê niha dibînim kamil bûme. Nizanim ji ber kûrbûna zanebûnê ye, tu mezin bûyî Roza...

Di leyistokek ku me dileyistî de ji min re kaxiza 'Roza li ser heyvê xwarin çêdike' derket. Min jî got, ez ê mencel û lalîkê bigirim, di vê çileya zivistanê de derkevim li ser heyvê.

Hevala Destan teqlîda her kesî ya sekna wan di perwerdeyê de kir. Keçeke ku pir nazik Tirkî diaxive û keçek Semsûrî ku Kurdiyeke pir çors diaxive jî li para min ket. Pirrr komîk bû, em ecêb keniyan.

**Çileya 2011'an**

**Kelecaneke zêde**

**Li ber dengê xembar û aram ê blorekê**

Sala 2011'ê dê bibe saleke çawa? Êdî divê bibe, divê hin tişt bên guherîn. Divê rojek bê dayîn evîndaran.

Pir dihizirim, di heman demê de ev pirseke wisa ye mêjiyê min her tim mijûl dike. Şoreş guherîn kirin e. Fêr kirin, rizandin, marjînal kirin û deforme kirin, li beramberê polîtîkayên şelokirinê bendewariyeke bêdeng, mirineke li ser dem belav bûyî ye.

Noteke hevdîtinê ya din jî hate xwendin û hizirên pir cuda ku tarîfa wan nabe ruhê min mijûl kirin... Tê çi maneyê, Îsraîl hewl dide erdên Kurdistanê hemûyê li ser xwe bide tapûkirin, bikire? Ji bo tengazariyên di pêşerojê de çêbin ên di mijara av, enerjî, zîrêtê de razandin û amadekariyê dikin. Siyonîzm dixwaze yek bi yek çîna navîn, burjûwa biafirîne. Li ser jinên me her roj destdirêjî heye. Rêbertî weke hawar bike, qîr dide, dikeve şik û gumanan.

Ma hûn çima fêm nakin?

Hemû pêşniyarên Wî di paraznameyan de ber bi çav in, ev dereng mayîna me mirov vediciniqîne. Lê diviyabû komîte, akademî, komîn, rêxistinkirin û hwd. ev ji mêj ve fonksiyonel bûna. Bandorên oryantalîzmê û xefilbûna me ya rebenokî. Îro erdên me yên herî bi berhem pêşkeşî kapîtalîzma bê exlaq dikin. Dê îsal cuda be, divê bibe.

Û Parastina Xwe, gerîlatiya modern a bajaran nuxteyên serkeftinê yên pêvajoya li pêş me ne. Divê em mirovahiyê ji sêtika sîstemê ya dîrokî, civakî xelas bikin. Divê em karibin enerjiya bi heybet a mirovahî û gelê xwe rast beralî bikin. Vaye pêvajoyek ku pêşengiyên bihêz pir zêde hewce ne. Ev tinebûneke mezin a qadro ye.

**Çileya 2011'an**

## Ma ez ê jî rojekê bêm bibîranîn?

Me CD'yên hevalên di 2005'an de şehîd bûne temaşe kirin. Weke gerîlayekê ev temaşekirina min bû sedem ku hestên pir cuda jiyan bikim.

Fikirîm ku dê me ji hin kes wisa temaşe bikin gelo? Min got, Jiyan, di vê navberê de min rojnivîsa hevalên Şehîd nîşan da û min pirsî, gelo ev rojnivîsa ku ez dinivîsîm jî rojekê dê bê çapkirin wisa bikeve nav destan? Her çendî Jiyanê got "belê" jî weke pir dûr û qet pêk neyê xuyaye. Gelo dema nefes distendin û dinivîsandin ew jî wisa dihizirîn? Kî dizane...

Kî dizane, gelo em ê karibin xwe bigihînin wê şensê û layiqê wan bin? Vaye ev heqîqet di destê me de ye û min biryar da tevlî gerîla bim. Nebêjin, “jixwe gerîla yî.” Heval wisa propaganda û ajîtasyon dikin, dilê min weke baskên balindeyekê lê dide. Mirov dibêje, ez ê hema biçim. Vê gavê stranek ku pir jê re kêfa min tê di bêdengiya şevê de di serê min de diçe û tê, dixwazim guhdar bikim her li ber guhê min e. Dixwazim guhdar bikim, lê divê em binivîsîn. Belê têkoşîna zehmet a Rozabûnê bi leza xwe ya herî dawî didome.

Civîna bolîkê hate lidarxistin, ji ber ku ji bo hin tiştên dubare dibin ecz bûm min biryar girt neaxivim. Bi zora xwe ez rakirim, lê neaxivîm. Cara destpêkê ye civînekê bêyî ku biaxivim derbas dikim. Ji min re pir ecêb hat. Min dixwest pirsgirêkan vebêjim, lê belê têkoşîna me ya navxweyî ya zêde û sotîner. Wisa xuya dike, her du fermandarên me yên bolîkê dê bikevin pêşbirkê. Em lê mêze bikin, navbera Rozê li cem hemû hevalan baş e. Hevaltiyên me yen baş hene. Dilar, Medya Ronahî, Rojda, Jiyan, Silav û hwd... Ji hemûyan pir hez dikim. Min paraznameya Sosyolojiya Azadiyê û Rojhilata Navîn di dawiya dawî de bi şiklekî şexsî xwend. Kêliyekê ji beriya niha xelas bû. Tenê bi gotinekê ecêb xweş bûn.

Me bi hevalan re nîqaş kir, ji derveyê taslaxa pirsên hatine û raporên me yên şexsî yên em ê binivîsîn ku çarçoveya wan bi bîst pirsan hatiye diyarkirin, min, hevala Jiyan, Dilar û Medya Ronahî me li ser pêvajoya li pêş nîqaş kir û biryar da ku em ê hin pêşniyarên xwe yên şirîk weke raporeke şirîk ji Navenda Parastina Gel A PKK’ê re rêbikin. Ew dibêjin, “em ê raporên şexsî jî binivîsin.” Dema min dît em heman hiziran tînin zimên min got, ma çima em hemû bi hev re raporekê nanivîsîn. Wan jî got, “baş dibe.” Ka em ê temaşe bikin, em ê vê biryarê çendî pratîze bikin.

Wê roja han dersê me di çarçoveya perwerdeya xweser de cinsiyetperestiya civakî bû. Min destûr girt û got, dema navê vê dersê dibihîzim pir ecz dibim. Li ser vê bingehê, min nirxandineke dûr û dirêj kir. Vê helwesta min heval dan fikirandin û wêrekî da wan. Ji ber ku min îşaretê têkoşîna navxweyî ya ku birîna derbûyî ya her kesî bû kiribû; lê kesî nedikarî bîne zimên. Divê diyar bikim ku dema min hewl

dida sîstem û derdora xwe çareser bikim, pir zêde ecz dibim, ev jî bandora xwe li ser hemû helwest û tevgerên min dike. Ev jî dibe sedem ku heval li ser mijarê biponijin. Piştre perwerde germ bû. Vaye pêwîst e wisa bibe. Hevala Medya Ronahî di rojnivîsa giştî de ev weke, "hevaleke cuda û balkêş e" nivîsandiye. Werhasil bi şiklekî bi hêz tevlî perwerdeyê dibim.

Îro komîsyona nota hevdîtinê ez û hevala Leyla bûn. Cîlo bi çiyayên xwe yên serê wan berf, bilind, bixof û reş û belek, li van cihên bêkes û bêdeng li pişta me ye.

Gelek tiştên bên nivîsîn hene lê destê min qerimî.

Min go, bi kelecana di dîrokê de hin destpêk jiyankirinê ji Jina Azad re binivîsîm.

**Çileya 2011'an**

**Ji çiyayên me re!**

Bibin şahid, bibin şahidê çiyayên me. Di her kêliya xwe de destanekê vedişêre, di hinava xwe de hezar efsaneyan dihewîne, sibeyê dibe şîn û matemek ku mij û duman bi ser de hatî di berbanga sibeyê de. Dengê teyran dibe saza ku sibeyê guhê me dadigire...

Li çiyayên Cîlo ku sir û sermayê lê daye, teht pir bilind in. Çiya û Zagros spî bûne...

Mezopatamya, diyarê qedîm ê hezaran sal, deryaya bê dawî ya hêviyê, landika mirovahiyê... Evîna me heya bi rêzeçiyan didome. Toros, Dalê qut dike şerê me. Di Firatê de bi efsûna rengê şîn dibe gul û çîçek vedike. Avhewa Behra Spî di hemêzê de ji Amanos heya bi Nûrheqê didome. Di demsala payîzekê de weke dilopên baranê, bi dilê me de bariya. Em bûn peyrewên karwanan, bûn dengê hawarê li cihên kesk. Xuyabûna Şamaş e û di kûrahiyên mêjiyê me de çarêyana 1'ê Nîsanê ye. Li erdnîgariyeke birûmet ji Zeûs heya bi Kleopetra hemû bênamûsî her biçûk dibin. Em li Mûnzûr bûn çîçekeke asê ya di hemêz çiyan de; ji Ceyhanê herikîn hemû serdemên Bêzar bûyî.

...

Paşê ba tê li gerdûnê, bayê mane û heqîqetê ku her derê dike toz û duman...

Hemû dar şîn tên, pêlên deryayê zindiyên deryayê li peravan didin û em ên li benderan li bendê ne, li keştiya evînê ya pêşverûtiyê siwar dibin. Û paşê? Paşê di çavê westiyayî yê gerîleyekî/ê de em bi tenê dimînin. Bi kemaleta barê li pişta me di dilê bi sîstem yê mirov de em cuda dibin û dûr dikevin.

(Beşek ji rojnivîsa ku min li rojnivîsa Cîlo nivîsandiye)

**15'ê Çileya 2011**

**Du nirxandinên cuda**

Îro dersê me Îslamiyet û Mihemed bû. Tam di nava tevlîhevî û kaosekê de em paraznameya Rojhilata Navîn a Rêbertiyê dixwînin û nîqaş dikin. Nirxandinên hatine nivîsîn zelal in lê persektîfa me û qasiya fêmkirina me cuda ye. Divê em ji bo cudahiyan rêzdar bin. Temam lê ji sedî sed heqîqetek jî heye. Em li ser gelek mijaran hemfikir bûn lê me nekarîbû li ser hin mijarên esasî bi şiklekî li hev bikin. Di vê rewşê de rastiyeke sotîner jî hebû; ji ber hevalan ji Îslama îro pir kişandibûn, dema hevalan weke biteqin diaxivîn hema bêje ji devê wan agir dibariya. Bi taybetî hevala Medya Doz nirxandinek wisa bi hêrs û kîn kir, ji ber vê rewşê ecz nebûyîn ne mimkûn bû. Em hemû heval hema hema heman tiştî tînin ziman. Yanî min kir pirsgirêk. Heval aliyê kapîtalîzmê yê afirandinê û gelek aliyên din derdixin pêş. Bi asta zanebûna îro nirxadinên wisa giran li ser dikin, li cem min hestek peyda dibe ku ev ne adil e. Dibe tiştekî trajîkomîk, van aliyên hevalan bi xetere dibînim. Hema bêje faqtorên wan tînin vê astê didin jibîrkirin. Weke ku jidayikbûnê ev zanebûn bi xwe re anîne. Mirov dibêje qey weke jinekê ji sîstemê qet êş nekişandine.

Divê mirov li pêşberê mercên mirov afirandin, ked û nirxan rêzdar be û ti car faktora dem û mekanê paşguh neke. Lê li cem me xwe jibîrkirin heye. Civaka em jê hatine, qonaxên me borandine pir zû tên jibîrkirin. Ev rewş jî dibe sedem ku kes ji xwe razî be û xwe bes bibîne û jixwe kêm mayîn, paşketîbûn ji vê derê derdikeve, tam di van

nuxteyan de jî qiyamet radibe. Di van nuxteyan de nêrînên cuda derketin pêş. Lê min hesesiyeta hevalan jî li ber çav girt û diyar kir, ez ji bo nêrînên hevalan rêzdar im, ev nirxandina min a şexsî ye, min xwest bi vê helwesta xwe, dawî li nîqaşa bi hevala Medya Doz bînim. Ji ber ku mijara Mihemed û Îslamê hê jî birîneke ne kewandî ya saxnebûyî ye. Ji bo kesayetiya Rojhilata Navîn, weke fenomenekê ji hatine çareserkirinê dûr e. Lê ez dikarim vê diyar bikim; di nava tevlîheviya serdema me de divê mirov Mihemed, civaka Ereb û Îslama dijber bi xeteke zirav ji hev cuda bike.

**22'ê Çileya 2010'an**

**Ji Sonya heya bi Rozayê**

**Li ser raboriya dişibe hev a jinê**

Semsûr ji aliyê erdnîgariyê ve xwe dispêre raboriyeke kûr a dîrokî. Yek ji cihên destpêkê yên pêşketinê ye. Li ser erdên bi aluvyon ên Toros û Firatê, cih û warê destpêkê yê cihnîşînê ye, di heman demê de mohra gelê Hûrî li ser e. Dîroka civakê ku Rêber Apo ew gihandiye eslê wê, ev rastiya ku heya bi roja me ya îro berdewam bûye di navê pîrikên me de ber bi çav dibe. Navên ji wan deman mayîne, îsbata bi heybet a 'dîrok niha ye û niha jî dîrok e' ye. Ji vê re mînakeke ber bi çav navê pîrika min e. Bi navê 'Hurey' banî wê dikirin û ji binarat û kokê Hurî tê. Her çendî lîteratura KT xwestiye vê weke Hurihan biguhere jî nekariye perde bikişîne li ber rastiyê.

Niha jî em bên ser nuxteyek ku di asta mirov matmayî dihêle. Dayika min weke keça pêncemîn a malbatê tê cîhanê. Hejmara zarokên kur ên malbatê jî çar in. Malbat bi hêviya bila bibê keça dawî, navê 'Besê' li wê dike. Dema piştî salan dayika min dizewice û çar zarokên malbatê ji dayik dibin (ji van zarokan yek mirî ji dayik dibe) weke keça pêncemîn ji dayik dibim.

Ji ber ku pevjîna apê min miriye ji bo ku hejmara malbatê ya ji sê kur û çar keçan pêk tê bi tewazin be navê 'Sonya' yan jî Suna li min dikin. Ya balkêş ew e ku keçeke din a dayika min tê dinyayê. Keça dawî piştî salan dibe ew û ji bo min jî dibe xwîşka min a du sal ji min

biçûktir. Di hinava dayika min û min bi xwe de dîrokeke çendî matmayî dihêle û dişibe hev...

Navê Sonya yê jineke şoreşger e û navê Roza jî yê Marksîsteke Alman ku bi bineratê xwe Cihû ye û xwediyê roleke bandor e û piştî demeke dûr û dirêj weke Sonya-Roza di nav refên şoreşê de me. Besê jî li Dersîmê navê jineke Kurd a berxwedêr e. Û navê wê yê din jî Suna Çîçek e.

Ez Roza Semsûr. Di meha nehemîn ê sala 1990'an de rojeke yekşemê ji dayik bûme. Di sibeyên xembar ên Îlonê de min li deriyê mirovahiyê daye. Şerbeta bisêr a hilweşîn û cudahiyan di nav dilê min de hatiye hêvinkirin. Ji ber vê yekê jî timî rê veqetînê li benda min in. Lê di belgeyên KT'ê de meha dehemîn a 1989 derbas dibe. Min xwe spart van danayan û sicîla xwe weke li wê derê ye da Partî. Dema ku rojekê bigihêjim asta şehadetê ji bo ku tevlîhevî dernekeve. Lê dîsa jî ev ne heqîqeteke. Ji ber vê yekê ji bo ku wenda nebe, min hewce dît ez vê rastiyê li vê derê binivîsîm.

**22'ê Çileya 2011'yan**

**Jiyana Rozayê çawa dibore**?

Jina Azad, baweriya min heye min pir tişt afirandiye. Sekna min a di perwerdeyê de, bi giştî jiyana min rûnîştiye, li gorî xetekê dimeşe. Li gorî zivistana borî min gelek tişt ji ser xwe avêtine. Hem ji aliyê diyalogên li cem hevalan, hem ji aliyê tiştên ji saya perwerdeyê derketine holê...

Doh êvarê min û fermandara taximê, me nîqaş kir. Min jî çavdêriyên xwe yên ji bo wê anîn ziman. Erênî û baş bû. Wê jî rexneyên xwe yên ji bo min bi pêş xistin. Di mêzandina destpêkê de hevala Roza çawa ye, nêrînên xwe yên li ser vê mijarê anîn ziman. Ji min re got, "ji aliyê îdeolojîk ve xwediyê potansiyeleke xurt û mezin î. Aliyekî te yê pir mezin ê mane dayînê heye. Lê belê hevalek ku xwe pir sînordar dike yî. Sînorên te esas in. Tirsa min ew e, rojekê dema yek bi zora xwe sînorên xwe li ser te ferz bike tê tar û mar bibî. Her kes nikare ji te re her tiştî bêje. Pîvanên te yên qebûl û redkirinê diyarker in. Di perwerdeyê de

cihekî te yê diyar heye, asteke te ya hevalan dide ponijandin, jiyanê beralî dike û li ser bandora xwe dike heye. Ev mirov pir bextewar dike. Li cem te her kes nikare bi hêsanî her tiştî bike. Baweriya min pê heye, tê xweş bi pêş bikevî. Lê bi hin kesan re pir nede nestîne û hin kesan jî bernede, biqasî ku xwe diafirînî yên derûdora xwe jî biafirîne.” Piştre li ser mijarên ku ez ê tê de zehmetî bikişînim nêrînên xwe anînin ziman.

Jixwe rastiya van gotinan hebû lê sedemên xurt ku çavkaniya xwe ji kesên li pêşberê min distînin jî hene. Xwe mezin dîtin nêzîkatiyeke burjuwaziya biçûk e. Lê min got taybetmendiyên kesayetiyên ez diecibînim hewce ye xwediyê feraset û terzên pir esasî bin. Min got ez bi xwe re nabînim ku vê bi yek carê ji kesên li pêşberê xwe re bêjim û wan tar û mar bikim, bê alternatîf bihêlim. Wê jî got, “di nav jiyana me de gelek rewşên paşmayî ku neyên qebûlkirin tên jiyankirin, divê li dijî van têbikoşî” û nîqaş xelas kir.

**Çileya 2011’an**

**Nîqaş didomin**

Me îro talîmata civîna Konseya KCK guhdar kir. Hatibû qeydkirin û dengê wê pir kêm dihate fêmkirin. Li ser mijarên qadro, Partîbûn, paradîgma, pratîk û hwd. bû. Piştî ku xelas bû bi qasî hatiyê fêmkirin me xwest em li ser pirsgirêkên me nîqaş bikin. Hevala Medya Doz mijarên gelek girîng girtin dest û destpêkek kir. Piştî wê hevala Uta, pardon, hevala Leyla axivî. Werhasil min li ser gelek mijaran ji hevala Uta pirs pirsîn ku ew çawa dihizire. Mînak, weke çanda kurûpistê ya ku di nava me de pir caran tê jiyîn, helwestên kêfî yên hin kesan û hwd. tebî min pir şênber kir. Mînak, mirov carekê lê mêze dike, gotinek belav bûye, mirov matmayî dimîne ku çawa kariye evqas belav be yan jî ferq û cudahiya di navbera rêveberî û hevalên din de. Feraseteke wisa heye, weke ku qadro cuda ye, rêveberî cuda ye. Hevala Uta hin feraset mehkum kirin û nerehetiya xwe anî ziman, hizirên xwe gotin.

Ma hûn ê nepirsin, piştre çi qewimî? Demokrasiya me ya ku hewce bû, hê bêhnfireh bûya firîya û çû. Hevala Leyla got, “li gorî min şaş e tiştên wisa bên nîqaşkirin.” Hevala Roza Ş. jî got ku hewce dike em

mijarên qadro-fermandar ji hev cuda bikin, gotinên ne ji min cudatir anîn zimên. Lê ji bo heseskirina rewşa heyî têrê kir û zêde jî bû. Tu dibêjî qey min weke şervanekê hevalên fermandar kirine hedef. Ma qet bixwe dikarim? Piştî destûrê min got, min rêvebirnameya HPG û YJA-Star baş xwendiye, baş dizanim çi tê nîqaşkirin û çi nayê nîqaşkirin, talîmatan baş dişopînim, hemû tiştê dibêjim di talîmatan de jî tê gotin, heta di talîmatan de bal tê kişandin ser ku ne weke feraset, pêwîst e weke zêhniyet bê dest girtin û li beramber têkoşîn bêmeşandin. Û min xwest bêjim ya rast wisa heseskirin. Li ser nîqaşkirin bi me dide wendakirin. Tebî her çendî nîqaş di vê çarçoveyê de bi dawî bûyîbe jî Roza Semsûr tiştê bistîne stendibû: “heval dikarin nîqaş bikin, hesesiyet tine ye.”

Du roj berê di civîna taximê de hevala Roza Ş. ji hevalan re got ku heval êdî dikarin mînakên ber bi çav bidin, hev bidin ber lêpirsînê û bibin sedem ku hev du biponijînin, piştî ku got ku hewce dike em heses tevnegerin, ji bo rehet nîqaşkirinê divê em derketinên wêrek bikin, min rexneyên li ser qedemeya fermandariyê bi pêş xistin. Tebî dema wisa bû, tiştê hatiye gotin bi erdê ve bû yek. Hevala Roza Ş. got, “em paşê bi te re biaxivin.” Min got, hewce nake. Wê got ku mijar ne ev e, ew dixwaze çavderiyên xwe yên cuda bîne ziman. Vê gavê ew û Uta li mangaya rêveberiyê diaxivin. Ya rast ew e, dê pir baş be. Ez jî hin çavdêriyên xwe tînim ziman. Bi rastî asteke bilind a pêkhateya me heye. Bi rastî jî hin tişt di encama kedê de hatin afirandin lê qalibên me girtî ne.

Hevala Leyla ku beşa psîkolojiyê xwendibû ji bo hevalan testek çêkir. Me weneyê mirovekî/ê çêkir. Hêza maneyê, mantiq û hîs, li gel şexs di çi astê de ye tam jî li gorî karektera me hemûyan derketibû. Her çendî hin heval ecz bûyîbin, mantiqa îqtidarê ya hin hevalan derketibe holê jî testê tam li hedefa xwe dabû.

Ji testa Roza Semsûr encameke wisa ku hêza maneyê li pêş e, mantiq û hîs jî weke hev e û ji ber wê yekê zekaya hestewarî û ya analîtîk weke hev e derket. Hevala Rojda got, “tam li gorî te derketiye, bi rastî jî wisa yî.”

**Çileya 2011’an**

*“Divê hûn bi qasî xeyalên xwe mezin bin, bi qasî hizirên xwe jî azad bin.”*

**Rêber Apo**

**Oryantalizm**

Em bi rê ketin, di nav hesabên serdemên arkaîk ên qeşa girtî de em weke mûmekê heliyan. Em kî bûn, çi bûn, me temsîla çi dikir? Aîdbûnek ku nayê xeyalkirin a kirêt, rastiyek ku ya esl xerab kiriye, bedenek ku mirov ji ber ve bê şermê...

Dihizirim nikarim ji bo xwe, neteweya xwe û gelê xwe, mirovbûna xwe pênaseyekê diyar bikim. Bêpênasetî! Tenê dikarim vê pênaseyê diyar bikim, ji bo em ên ku her tişt in û ne ti tişt in.

Lê dizanim bêpênasebûn ne li gorî rêgezên pêkhatinê ye. Wê demê ya ku me bêpênase dike, li kursiya bûkalemûnbûnê dide rûnîşkandin çi ye? Qedexe û sînor... Demsaleke bê sînor, parçeyekî biçûk ê demê, sembola aramiyê. Di hucreyên min de û weke her liba xîzê, di her atoma min de sînor... Dîroka me tijebûnek ku hatiye valakirin e. Tenê zelalbûneke hatiye tevlîhevkirin e. Paşê jî mirovahiya hatiye bêesilkirin e. Behra bê dawî ya paragmatîzmê ye. Jê sûdgirtin û îxanetkirin, biçûkdîtîn û bi tiştekî nehesibandin...

Ji nava sîstemê û ji sîstemê bi nefret kirinê bi zanebûn û bi rêxistinî, di pratîkê de bûn xweşikên çalakiyê. Dibe ku formûla çors a ev tiştê naşibe ti tiştî, şibandin tiştekî ev be. Her kêliya ez bêzanebûn dijîm di asoya min de li ser xewnereşkan xewnereşikek zêde dibe. Ji bo ku bê derbaskirin, divê ez di nav sînorên zanînê yên sîstemê de ‘noqî nav dîrok û niha’ bibim.

Mêjî û dilê me yê ku globalîze dibe, weke jahrek ku her mirov vedireşe bandora wê kêm dibe li ser zimanê min helbesteke dilbijînê ye. Wendakirineke timî ez dixwazim xwe bigihînimê di hefizeya min de ye, her ku ez dûr dikevim rastiyek ku şelo dibe di destê min de ye...

**27’ê Çileya 2011’an**

**15’ê Sibatê**

Tarî her bi ser min ve tê. Hilweşîn, erdhêj, zincirên tên xwestin di xewnên tar û mar bûne de li hêvî û baweriya mirov bên xistin...

Rojek ku dihesûdin, Rojek ku hatiye xistin Îmraliyê, hewl tê dayîn ku xwe negihîne derve. Bêhna giran a çîmentoyê ta ji hinava xwe distînim. Şamaş, ma tu vê hîs dikî? Înannaya Xwedavenda çiyayên bakur ku bi biharê xwe xemilandiye! Mêze bike li zarokên xwe, mêze bike zarokê neolotîkê yê esmer. Di hucereyeke çar metro de xeniqî ye, bê nefes maye. Hemû nefes danûstendin di sala senzdemîn de ne, sohbetên xembar jî. Di berfa 15’ê Sibatê ku li du metroyê derbas dibe, çavkorkî dibim ji ber ronahiyê û noqî êşan dibim.

Pêvajoya ku borî sê mehên zivistanê bûn, lê çavên te? Ma senfoniya bijan a êş û esaretê tê bîra wan? Ev wisa tiştekî çawa ye, ez nikarim daqurtînim. Nikarim vê êşkenceya hovane ya Îmraliyê daqurtînim. Ji fêrbûnan re kîneke min a mezin heye. Kîn û întîqama min weke anaforekê, volqanekê lê hatiye. Dixwazim rast beralî bikim, bi wate û zanebûnê bistirêm û biafirînim û bibim bersiv. Dema wê hatiye, hîs dikim dixwazim bibim hevalekê, hevaleke têrê dike. Ji bo vê pêşniyarên min ên ber bi çav hene û ez ê li benda bersivê bim. Bi zanebûna ku êdî dê ya li bendê ye ne xweşik e...

Ji ber raporên min nivîsîne tilêyên min pir diêşin. Pirsên Komîteya Parastina Gel A PKK’ê min bi raporeke deh rûpel bersivand û dîsa ji bo Biryargeha Navendî Ya YJA-Starê min raporeke bi çar rûpelî nivîsî. Rojnivîsa min, hwd. raporên du hevalan jî li benda min e. Bi rastî jî destê min pirr diêşe. Her kêliyê dibe ku ez ji ber nivîsînê bi jahrî bikevim. Jixwe serê min jî pir giran bûye, pir nivîsîna min jî van tehrîq dike.

Jina Azad, ez ê ji ber vê yekê karibim evqas binivîsîm. Lê weke her tim gelek tiştên bên nivîsîn hene û gelek tişt hatin jiyankirin.

**15’ê Sibata 2011’an**

**Semsûr rabûye ser lingan**

Ji derve du metro berf heye. Li quntereyên Cîlo, di nav şevên krîstal ên Zagros de me.

Hin caran nîvê şevê diçim ji derve. Krîstalên li ser berfê yên dest pê kirine bicemidin temaşe dikim, dema ewirên min diçin ser çirûsîn û xweşikiya stêrkên eynika li azmanan wan di dema wan a herî lewaz de diqefilînim. Nikarin xwe veşêrin û birevin. Bi şiklekî şaş mayî, fediyokî û poşmanî, hemû sêra xwe di tîreja çavê min de temam dikin. Piştre weke ku xwe temam kirine, bi nêcisî ji min re çavên xwe diqurmiçînin û fêm dikim ku ya ji şevê kêm e û ya tê payîn ez bûme. Her çendî xwe weke hatiye xapandin hîs bikim jî, stêrk xwe nêzîk dikin, qîr dikin û dibêjin ku ew dixwazin bi min xwe bînin ziman (gerdûn di mirov de xwe îfede dike).

Û nîvê şevên wisa hin caran ewqas ronî dibin ku li ronahiya nava rojê jî derbas dibin, berfa zêde ya li erdê di vê dê xwediyê roleke mezin e. Weke fotoneke pir mezin a bi enerjiyê bar kirî, weke stûnên elektrîkê ku rêyan ronahî dikin ên mirov biçe kîjan cihê dinyayê derdikevin li pêşbere mirov. Çiyayên bi mij û duman ên bilind û bixof ên Cîlo ji vê dîmenê aliyê xuya dike yê xeta sînor e. Dilê min şewq dide, bi hesret e û hem jî giran e di van şevên bi çîrûsk ên Zagros de. Gelo tenê ez mêvanê van şevan im?

Heya vê koma ronahiyê, yên jê hez dikim li erdnîgariyeke din mêvanê tepeyê hîlal in. Û çavên me bi hêviya hevdîtinê didin pey hev. Heyv, stêrk û krîstal bi çirûsînê bi me ên ku li pey dem ketine dikenin.

Îro ji sibê heya bi êvarê çavê min ê rastê bêyî ku biweste avêt. Hevala Uta dibêje “hin kes ji dûr ve te bi bîr tînin û îşaretek e ku di demên pêş de tiştên baş li hêviya te ne.” Her çendî hinekê weke paşmayî xuya bike jî hêza hîskirinê di sînorên kûantûmê de ye.

Û eger hûn rojekê vê rojnivîsê bixwînin, vaye vê rojê cihê ku çav û mijangê min digihîne hev ecêb lê dabû, bila agahiya we jê hebe. Ya xerab ew e min ewqas kes nas kirin ti car nikarim tiştekî bêjim. Her çendî zêde baweriya min pê tine ye jî min xwest ez li vê derê binivîsîm.

Hevala Destan îro ji min re got, “Semsûr rabûye serhildanê.” Bi coş û kelecaneke mezin min pirsî, ev tişt kengî û li kû derê çêbûye. Min go, wê nûçe guhdar kirine. Wê jî got, “li ser serê te rabûye serhildanê.”

Serhildan, tevlîhevbûna porê min bûye. Em ji hefteyê du caran şe dikin ji ber wê yekê. Em ketin dîrokê, ji saya hevala Destan. Ji ken zikopişto bûm.

Vê gavê hevala Dilar li nivîsên min li rojnivîsê nivîsîne mêze kir û keniya, min jê re xwend.

Jina Azad, platformên me çêbûn. Bi rastî min dixwest nirxandinên hatine pêşxistin, di rojnivîsa xwe de bicih bikim lê nebû. Zêde tiştek nehat gotin. Min ji xwe re sînor diyar kirin, bi xwe re sînordarbûn û weke aliyên min ên mînak bi kurtî bînim ziman. Bila hinekê dem derbas be ez ê tiştên wisa berfireh binivîsîm.

Roza, ma dikarim te biafirînim. Ka bêje Rozê? Me vê zivistanê gelek tişt afirand, gelek têkoşîn meşand lê baweriya min heye me qalibên nahejin ên hin mirovan şikandin. Dibe ku paşê weke dizanin bidomînin lê heya em li vê derê ne ti car!

Zivistaneke baş, nûjen, pêşîxîner bû. Û di dîrokê de bicihbûna xweser a bajarê biçûk ê Star ê Apollo nivîsandina destpêkekê bû. Gelo dê dîrok me jî bi bîr bîne? Ha ciwano, ma hûn ê van panzde jinan nas bikin û binivîsîn? Ma hûn ê van dilên biçûk ku hesreta raboriyê û xeyalên pêşerojê di destê xwe de digire bizanin? Gelo dê dîrok li ser me bêje, “asê, wêrek û xwediyê îrade bûn?” Kî dê vî pênûsê dîrokê bixe destê xwe? Min dixwest vê bizanim, bişopînim, wêneyê wê yê di sînemayê de...

**20’ê Sibata 2011’an**

**Rêwîtiya bêmirin a mirovê derketiyê rêwîtiya giyayê bêmiriniyê**

Gerdûnê di nav aştî û aramiyê de azadî jiyan dikir. Hemû mezinahî, ji bo gerdûna ku raza jiyanê bûn. Sêr biefsûnbûn hate naqişkirin. Mirov bi fezîleta exlaq û wijdanê di behra bêdawî ya bawerî û ewlehiyê de melevanî dikir.

Dil dişibiyan demos. Di ruhên evîndar de hezkirin, ked, wefa, şewq û coş diforiya.

Çemek bû porê Înannayê, bi tovên sed û çar Me’yan dirêj dibû. Şewq dida qiraxên Dîcleyê, Firat, Nîl, Pencab. Mirovahiyê qurban didan berhem û afirendeyên jiyanê. Ji ax, agir, hewa û avê re qurban...

Nifşê zarokên biesl ên agir û rojê yên Mezopatamyayê! Sumbulên zêrîn û Xwedavendên asoya wan weke tavê!

Van diyarên arkaîk polîtîka hildibirandin ji bo depoyên dîrokê. Li Rihaya ku cihê lihevparvekirina merhametê bû, piştî sedsalan perestgeh derdikevin holê. Hurmet nuxteya wan a şirîk bû, hurmeta ji bo raza hebûnê, ji ber ku tam di wê derê de veşartîbû sêra maneyê. Cihê afirandin û belavbûna çand û zanebûnê, cihê ku ferq û cudahî hev dibînin û zêde zêde dibin. Her kişfa nû xwe kişf dikir, di laboratuara aram a baran, ba û xwezayê de, ji ber vê yekê bû diyariyên zêde. Bêhna humanîzmê ji dayikan dihat. Evîn nedihat sînordarkirin, li cih û warên xweajoyan diket gerava neletê hemû saltanatên Sumerîk. Niha em bi mirovbûna xwe derkevin rêwîtiyeke weke xewn û xeyalan. Em bi bêdawîbûnê bihizirin, bêdawîbûna nebez a çerxînekê, em bihizirin demsal sekinîne. Em bihesibînin li roja 1’ê Nîsanê asê ma sir û seqam û stêrkan jidayikbûn zêde kirin. Azman bi stêrkên natemirin hate xemilandin û hemû nijadên zindiyan vegeriyan kolanên bêmiriniye. Sêra bêdestpêk û bêdawî li hemû goşeyan. Em tam di vê nuxteyê de bêmanebûnê bifikirin; psîkolojiya ku bêmanebûnê diafirîne, endamên civakê ku ji ber jiyankirina dubarayan eczbûne, depresyon, alozî û zemîna întîharê. Em bifikirin timî em ciwan dimînin, timî di qonaxa bîst salî de. Kîjan dogme ber bi benderên mêjiyê me dibezin? Ti zarok asta zanabûnê ya êxtiyarbûnê fêm nakin. Demê di hestên me de qeşa digirt. Curbicurbûna hemû mekanan li ber sêra ‘niha’yek bêpar diman, veşartî diman. Di deryayan de sêra jiyanê xelas dibû, hemû sêr têk diçûn, hemû mûcîze, bawerî û hêvî dihatin wendakirin, jixwe diyariya herî bedew a ji bo mirovahiya serdemê Nîhîlîzm bû. Lê mirovekî ewliya yê li ser felsefeya “xwe bizanibe” kûr bûyî dibêje “jiyan diherike.” Niha em bi mirovbûna xwe hewl bidin ava diherike bidin sekinandin. Ma dikare av bê sekinandin yan jî me jî dide berxwe û dixirikîne demên cuda? Eger em bixwazin demê ji holê rakin, bê guman em ê ber bi bayê lezê bikevin.

Rêyên em dimeşin gelo weke xwe dimînin, pel diweşin, giya şîn dibin û çiqilên daran nayên kesixandin gelo? Her çendî îdeolojiyên mirovahiyê di heman çerixînan de bi pêş bikevin jî banq û xanên me

rêya xwe bi wan xistiye tên guherîn, ji ber qurala ku tenê tiştê nayê guherîn guherîn bi xwe ye.

Niha ez bi mirovbûna xwe bi mihendisiya civakê ya Dîmurg dest pê bikim. Em bi encamên ji sedî sed made û enerjiyê kamil bikin û bi teoriya Rölatîvîteyê hemû raz û sirên veşartî, eşkere bikin. Bila M. Planck bê ber masayê û em bimînin heyirî li ser kar. Em bibin şahidê parastina rewa ya şewq û enerjiyê, bila bi refleksa wan çavên me şelo bibin; weke Einstein bê sînor bi pêş bikevin fikirên me. Em ji bo yekparetiya azad a dîroka civakî ya gerdûnê ku ketiye zikhev heyran bimînin û bi heqîqeta demê ya afirîner bidin nav mijara kûarkan. Bila şahiya cudahiyan govend bigire. Em di kaosa tevlîheviyê de bibin şahidê rêkûpêkiya ahengê, tevlîheviya kaotîk a ahenga bi dil ku ji mîkro gerdûnê heya bi kozmosê berfireh dibe.

Niha em bi mirovbûna xwe derkevin rêwîtiya îdeolojiyan. Em zêhniyeta ku li cem hemû zindiyên li ser dinyayê jiyan dikin heye, di gerdûna mirov de weke depoyekî îfade bikin. Depoyekî fonksiyonel ku ji bo her awayê îdeolojiyên zanînê vekirî ye... Weke tovên şînatiyan ku em kîjan aşiyê bikin wê berhemê bide û ji ber wê yekê dîrok çekeke pir mezin hildibirîne, di serdemên mirovahiyê de. Ji bo fonksiyonelbûna ku bi pêlî textikê kirinê erka xwe bi cih tîne, şert û mercên esasî yên jiyanê amade dike. Em bifikirin em her tiştî dizanin. Nuxteya ku meraqa me ya bê qeyd û bend, eleqaya me, daxwaz û xwestekên me yên bi her awayî xelas dibe. Vaye olperestiya herî serasera ya pozîtîvîzmê. Bila di berbanga oryantal a tinebûn û biyanîbûnê de ji bo sir û seqema mirina esasî û rebeniya felsefeyê dest bi meşê bibe.

Ji mirovbûna min re şerebeke ditevizîne ya şeveke destpêkê ye!

Di hemû bîran de hefizeyeke jê çûyî ya nediyar. Nijadkujî, civakujiyek e, medyumê ku di çiyayên volqanîk de difore di şaristaniyên bi medeniyet de pêvajoyeke fahişetiyê ye. Zarokeke eslê xwe wenda kiriye di tûfana bê eslbûnê de ye! Vaye li ser navê hemû Xwedayiyan, li ser navê hemû pîroziyan heqê mirovahî yê gotin kirinê xelas bûye.

Sûre, di pîrozbahiya ferqkirinê ya mirovahiyê de di hemû xwezayên êş kişandî û bê mane de xofa hovitiyê jiyan dike. Bi qeçaxiya jiyaneke şaş...

Arafat, kêliyeke ku civakek bêberpirsiyarî mayîneke serserî biteqîne. Dem têkdiçe, mekan têkdiçe, hemû zindî bêşikil dimînin. Lê jiyan yekparetiyek bû li cem mirovbûna min. Mirovê/a ku evîndarê/a gerdûnê ye, bi xwe li cem Xwedavendan vediguherî zimanê dîroka civakê ya dîrokî.

Ji ber vê yekê bû, KURDISTAN dayika hemû zarokan bû.

Weke ku li Mezopotamyaya jorîn, porê Înannayê ber bi Riha li ba dibû klan bûn. Malên bi sêr ku têkiliya cinsî kêliyeke mirinê bû, zindî di pîroziya Me’yan de di nava çînayetiyê de ji dayik nedibûn.

Niha em bi mirovbûna xwe biçin Ûrûqa doh ku Newyorka îro bû. Ji bo çarêyana Mag’an û mirovê ku îxanetê gerdûna ku rekorên gişeyê şikenandiye bi asoyên Oskarê em bîletekê bistînin.

Li ser dikê, Gilgamêş, li azmanan Înana, li ser erdê şer û li azmanan bombe, Enkî’yê li paş perdeyê di hemêza mirinê de ye... Hemû lêger di hewldana xwe gihandina mitlaqiyetê de ne û Gilgamêşê derketiye peydakirina giyayê bêmiriniyê di ocaxa dawî ya kapîtalê de, li kolana faniyan e.

Em niha jî bi mirovbûna xwe li malzaroka îxanetê mêze bikin.

Ûra çelexwarbûnê em rakin, bermahiyên şaşitiyan kom bikin. Li cihê me xwe wenda kiriye em ê li xwe bigerin. Em ji wê derê bin şoreşa dîrokê ya rojane. Em aşê konfederalîzmê fonksiyonel bikin. Em ji bo jiyana bizanebûn diyariyan pêşkeş bikin darê mirazan. Dema dibe hespê serxweş ê aramiyê, em li ser parçeyên cama bi rengê boz wêneyê jiyanê yê nepenî û bi sêr xêz bikin...

Niha em bi azadî ji dema aram a berpirsiyariya wijdanî re bihêlin tirpetirpên dilê xwe.

Û em bi mirovbûna xwe, xwe bigihînin ÎMRALI’yê.

**22’ê Sibata 2011’an**

**Şaşmayînên min!**

PKK bûyereke bi ruh re eleqadar e.

Hîskirin... Belê, vê gavê li ser vê dihizirim. Yekparetiya ruh û hîskirinê... Kêliyekê ji beriya niha min agahiyeke pir bi kelecan wergirt. Konferansa YJA-Starê ya 5. di navbera 6-18'ê Sibatê de pêk hatiye. Û me kêliyekê ji beriya niha talîmata wê guhdar kir. Çendî xweş e, ma ne wisa ye, lehengên dîrokê yên bênav jinên me yên 'heja'? Di arîfeya pêşketinên cara yekem pêkanînê de em heqîqetê neqşê dîrokê dikin. Pir xweş e, ev hestên pir baş in û dema dor hat şaşmayînên min, piraniya nirxandinên di talîmatê de derbas dibin tiştên ku min di raporên nivîsandiyê de aniye ziman bûn.

Dema Konferansa 5. pêk dihat û di çarçoveya tiştê hatiye ziman de min raporeke pêşniyarê ji bo Biryargeha Navendî ya YJA-Starê nivîsand. Min gelek mijarên weke aliyê xweseriya demokratîk û xwe gihandina gel û mijarên hwd. girtin dest. Ji ber ku asta min a ruh, pêşdîtin û biryardarbûnê di vê astê de bi aheng û bi zanebûn dimeşiya, bû sedem ku ez ji bo xwe bimînim heyirî. Bi rastî jî analîz û tiştên hewce dike bên kirin weke hev bûn. Weke ku di Konferansê de amade bûme. Vaye ahenga mezin a bihevrebûna hîs û ruh. Tebî pir kêfxweş bûm.

Ev asta lêhûrbûn û pêşdîtinê ji bo şoreşgerekî/ê girîng e. Ya din jî ji bo me gerîlayên jin ên YJA-Starê ku di dîrokê de cara yekem e vê pêk tînin. Jiyana min tije bi heyirî mayînên wisa ye. Mînak, biharê dema em derbasî aliyê Geliyê Zapê bûn min helbesteke bi navê Jinên Azad ku li Cîlo/Alantus nivîsandiye têgînên wisa bi kar anîbûn; li Cûdî, Sîpan û li Cîlo dem ber bi bajarên YJA-Starê ve diherike. Û dema ku zivistan bi ser me ve hatibû, me weke 15 jin li Cîlo bi şiklekî xweser qampa xwe ya zivistanê çêkiribû. Vê yekê wê demê ez matmayî hiştibûm. Niha jî di vê qampê de ev tên nivîsîn.

Helbesta min ne li cem min e. Di mehên havînê de min rojnivîsa xwe bi rê kir çapemeniya Zagrosê û ji ber ku qopyayeke wê ya cuda ne li cem min e ez ê nikaribim parve bikim. Hêvî dikim rojnivîsa min bi şiklekî saxlem gihaştibe û hatibe parastin. Heval dibêjin ku di van mijaran de bêxemî tên jiyîn û rojnivîs xerab dibin. Vê yekê zêde ez xistim nav fikaran. Hemû 'destpêkên' min di wan rojnivîsan de bûn. Ka

bêje dîrok, ez ê van rojnivîsên xwe çawa bigirim saxlemiyê? Divê ti car ev tevlî yên bênav nebin. Bi ser de jî di vê têkoşîna pîroz a zor û zehmet ku ez li dijî çelexwariyê, derewan, diziyê, bênaviyê dimeşînim de... Û dîsa hêvî...

Dema donzde sênzde salî bûm min xeyal dikir ku li cem hevalên xwe yên jin li malekê jiyan bikim û min digot divê ti car jiyaneke min a bi zilaman re nebe. Ev hesreteke wisa bû, bi şiklekî bêzanebûn û pêşdîtinî bû û piştî salan li çiyan weke bolîk bi jinan re jiyan dikim. Ev jî matmayîneke min a mezin e. Di heman demê de ev ji min re îşareteke gerdûnê ye ku sir û raza heqîqetê ya hebûnê parve dike.

**28'ê Sibata 2011'an**

**8'ê Adarê**

Merhaba ji we re mirovên jin ku li cihên tenha yên dîrokê bê nav mayîne, derfeta jiyan kirinê peyda kirine yan jî nekirine... Silav ji we re jinên berxwedêr ên Şîkago, hezar silav ji we re jinên di bin navê pîresêr de hatine şewitandin, jinên li Îranê hatine recmkirin, keçên ciwan ên li Ewrûpayê hatine metakirin, keçên biçûk ên li Afrîka ku di nav lepê birçîbûnê de diperpitin.

Û mîlyon car silav ji we re dayikên li Kurdistanê yên dilşewat û rondikan dirêjînin... Merheba û ji nû ve silav ji te re Înanna; Xwedavenda çiyayên bakur... Îro li çiyayên te navsera wan bi berfê xemilîne keçên te yên nûgihaştî kevneşopiya te diparêzin. Ka bêje Înanna, bûn çend sedsal, çend hezar sal şiverêyên tu tê re meşiyayî bêkes mayîne? Ma bayê te ji te re gotin, çi ye rewşa dilê me yê zîz bûyî: serdemên ku li çiyayên te yê bilind, ti ba çîrûskên agir pênexistine, ma qet awazên te demên zor û zehmet, bijan û bêçareserî lorandine?

Axx Înana... Ma wêjeyên te, keçên te yên xweşik ku ji ber aloziya êş û çewisandinê întihar kirine anîn bîra xwe? Û Înana, xwedayên ku Me'yên te yên pîroz dizîne, ma ji te re gotin ku wan tu ji zêhniyeta me dûr xistine û derxistine?

Û li diyarê te, Înana, ez bi bayên Cîlo ji bo çiyayên bakur, Toros, hezkirinê xwe, hesreta xwe, bi dilê xwe yê zîz ê bi şîn û matema giran,

hest û bendewariyên xwe yên pîrozbahiyê dişînim. Hêviya min ew e, ew ba biçe û li kesên jê hez dikim bide û bi heybeta keçên te yên bi rumet û biesl, bi heybeta Zîlan, Bêrîtan, Viyan, Nûda, Aleksandra, Clara û gelekên din, bi hezkirineke bêdawî jinên cîhanê hemêz dikim. Bi zanebûna neteweyî, bi xweseriya jinê silav dikim û dibêjim, her bijî YJA-STAR, rêxistinbûna jinê, parastina wê ya rewa, xwe parastina wê. Soz didim lawê esmer ê çiyan û neolotîkê di rêwîtiya maneyê ya heqîqetê de, bi xwestekeke mezin ji bo ku xwe bigihînim milîtaniya jinê ya mezin a bi fezîlet, ez ê hewldaneke mezin nîşan bidim.

Û li çiyayên tev berf û qeşa 8'ê Adarê!

Belê Jina Azad, li ber şikefta me du metro berf heye. Xwezayê. Li 8'ê Adarê xemleke bûkaniyê ya sipûsipî diyarî daye me. Em amadekariyên xwe yên dawî dikin da ku weke bûkeke bi rengê kesk ê bihare xwe xemilandiye di çiyan de bikevin tevgerê. Timî em destgirtîbûna bi rengê kesk ê biharê talox dikin. Li welatê min di biharê de hevalên jin ên ciwan ku dê bi destgirtî bin bi ruhê tije kelecan, mereq, kêfxweşî, coş bi bêsebiriyeke mezin xwe amade dikin û zewaca ku Rozayê bi welatê xwe re kiriye ket sala xwe duyemîn. Û jiyana wê ya rengîn jî didome.

Di nava xwe de êş, tenêtî, kêfxweşî, xemgînî, hesret, kelecan, ked, hezkirin, neçarî, azadî û hwd. hezar curbûnê dihewîne. Zewaca min a pir dewlemend Rozayê kamil dike. Dilekî ji pola yê di veqetînan de bi zanebûnê qeyim bûyî, sebireke bi fezîlet a bi nefreteke pir mezin a li dijî sîstemê dihewînim.

Di nava sohbeta me re hesreta te hate ziman. Belê, Cemocan, ew hesretên te yên di dilê te de mayîne di qiriqa zarokekê de bû girêk û asê ma. Hin caran dixwazim li şûna te li çiyayên navsera wan tije berf, xwezaya kesk û şîn, li çîçekên rengareng û li vê jiyan û gerîla mêze bikim. Ma tu dizanî Cemal, heval ji min re dibêjin ku tu baş gerîlatî dikî. Yanî Cemocan, mirov dikare di çema heqîqetê ya hindurê xwe de her tiştî biafirîne. Dizanim dê pênûs, defter û gotin têrê neke. Dil dixwest ez karibim gotinên nîvçe mayîne temam bikim, lê îro di mercên roja me ya îro de ev ne mimkûn e. Jiyanekeke we ku sîstema kapîtalîst weke robotan lê kiriye û bê naverok kiriye, xistiye bin çewisandina

hatin û çûnekê heye. Ji bo jiyana mirovahiyê pir xemgîn im. Dostê min î birêz û entelektuel; dixwazim tu vê bizanî ku ev hilbijartina min kiriye, dibe ku ya herî zehmet be lê jiyana herî xweşik pêşkeşî min kir. Cihê ku ez lê jiyan dikim, ji bo pirsên min pirsîne. Lêgera min a maneyê, bû cihekî aram. Ez hewl didim bi objektîfbûna dîrokê, berê îsyankariya xwe, kîna xwe, hêrsa xwe, bidim cihekî rast. Çiya û jiyana gerîla kesayetiyeke bihêz û xwediyê zanebûn ava dike. Ev, li ser rûyê erdê naşibe ti tiştên di dema borî de hatine jiyankirin, pêvajoyeke pir cuda ye.

Ji bo jiyana mirovahiyê ev civaka xweserî xwe, rast û bimane ye têkoşînek tê meşandin. Dema di nav vê têkoşînê de sala xwe bîstan tije dikim, dixwazim hûn bizanin ku min xwe gihandiye xeyalên xwe. Ji ber ku di vê jiyanê de min nekariye bi we re biaxivim xemgîn im. Dûrbûna we timî di nava min de birînek e, dixwazim hûn bizanin ji bo ku ji we cuda bûme pir xemgîn im û li beramberê sîstema vê bi me dide jiyankirin kîn û rikeke min a mezin heye. Bi kurtasî malbata min a heja, ji ber ku li ser vê cîhanê sîstemên heyî em bi şiklekî neheq bi êş û derdên serdemê re rû bi rû hiştine, li dijî wê bi kîn û rik im. Bi xemgîniya jiyana nehatiye jiyankirin, bi hêrsa jiheveqetîna me, we hemûyan hemêz dikim. Hêdî hêdî zehmetî dikişînim ku we bînim bîra xwe û dibînim ku çavên min tije rondik dibin û tirs û fikarên min ên di vê derbarê de zêde dibin. Pir zorê didim ser bîr û hefizaya xwe û hûn hemû, bi kenên xwe yên xweşik tên bîra min. Li ber çavên min ew kenê germ, paqij û pîroz ê diya min xuya dibe û ez jî dibişîrim.

Gava ku em bi bişirînê hev dibînin, eger hûn di pêşerojê de bixwînin ji bo hûn bizanin vê gavê Roza çi dike min xwest van ji bo pêşerojê bihêlim. Di dema pêş de ez ê nivîsandina xwe bidomînim. Vê gavê ez nizanibim hûn çi dikin lê dixwazim hûn bizanin. Bi jiyan û dilê min ê ku tev bi êşa jihevcudabûnê tije ye ji we hemûyan re silav û rêz...

**8'ê Adarê 2011'an**

**Û ji nû ve tesaduf dest pê dikin**
**Bi Rêbertiyê re hevdîtinek**

Roja 11’ê Adarê komîsyona dersa birêxistinkirina HPG’ê bûm. Di hin nirxandinên ku min bi pêş xistibû de min gotibû, fermandar jiyanê dike wezîr jî, rezîl jî dike. Piştî wê bi du sê rojan me nota hevdîtinê di cîhaza mezin de guhdar kir. Rêbertiyê li ser mijara zewac û têkiliya jin û mêr, analîzeke wisa bi pêş xist; “jiyanê rezîl jî dike, dike wezîr jî.” Ev bû sedem ku ez hestên cuda jiyan bikim.

Niha hûn ê bêjin, “hevala Roza tu jî ecêb î, dibe ku her kes wê gotinê bike. Dibe ku her kêlî her kes wê hevokê bi kar bîne, wisa maneyeke taybet jê derxistin, xwe xapandin û zêde mezin kirin e.” Belê, ez ê jî vê bêjim; tiştê ku ev cudahî daye jiyankirin û di yanzdeyê mehê de heman hevok bikaranîn, ji bo yek salîse be jî li gel Rêbertiyê hevdîtinek e. We nizanim lê ez pir kêfxweş kirim.

“Ya ku her kes dizane divê ti kes îfade neke!”

“Bawerî li tiştê ku mirov nabîne bawer kirin e. Diyariya vê jî tiştê ku em pê bawer dikin dîtin e!”

“Her tercih destjêberdanek e.”

“Yên ku wan gotinên pir mezin dikin armanca wan ew e, ne ku tiştekî fêrî we bikin, li ser we bandor bikin.”

(Çavkanî: Întifada Navê Îsyanê: Filîstîn)

**15’ê Adarê 2011’an**

**Merhaba rojnivîsa min a heja!**

Kêliyekê beriya niha êşeke kûr û zirav xwe berda nav dilê min. Bi fikra bîranînan dîsa dilê min bi lez lê da û dizanî dîsa xemgîniyekê ez dorpêç kirim. Bişkokeke hêrs û kînê ya din jî teqiya.

Kêliyekê beriya niha, kovara Parastina Gelekî di dest min de bû û min li fotoxrafên hevalên di 2010’an de şehîd ketine mêze dikir.

Bi gelek hevalên şehîd ketine re ez par bi hev re mayîbûm, nîqaş û sohbetên me pêk hatibûn. Gelek heval di gerîla de bûbûn ‘destpêkên’ min. Şehîdê destpêkê yê şubeya Şehîd Rizgar jî di nav van de bû. Şubeya ku min li wê derê perwerde dîtibû. Hevalê Kurtay, Ronî...

Hevalê Kurtay jiyana te ya gerîlatiyê pir kurt bû! Sohbetên me yên li şervanên nû tên bîra min. Te ji bo teoriya bîng bangê gotibû, “ew çîrûska destpêkê ji kû derê hat, çawa pêk hat?” Bi vî awayî te kerûparçe ji xwe dikirin ku ev çawa bûye, paşê spor, perwerde û hwd. hevalê min î ku di hemû destpêkên min de destpêkên xwe jiyan kiriye. Portreyekî şubeya Şehîd Rizgar gihaşt hetahetayiyê. Em ên ku hevalên rêya we ne jî, erk û berpirsiyariya dan ser şopa we û hemû tiştên we jiyan nekiriye dan jiyankirin dikeve li ser milê me.

Dîsa li ser heman rûpelê ji hevalên tabûra Arê ku ez lê mayîbûm, fotoxrafên hevalê Devrîm û Kurtay û Botan jî heye. Hevalê Devrim fermandarê bolîkê yê destpêkê yê jiyana min a li tabûran bû. Komîsyontiya me ya di noteke hevdîtinê de û axaftinên wî yên di dersa dîroka jinê de gotine, di mêjiyê min de olan didin. Paşê pêvajoya me ya guz komkirinê... Gelek bîranîn hene û niha li cem van bîranînan jî xembariyeke mezin... Dema me qampa xwe ya zivistanê çêdikir hanekên me yên bi hevalê Botan re, diyalogên me... Paşê hevalê Kurtay û sahaya me ya voleybolê tê bîra min. Şermoke û fediyokiya wî û ji bo çêkirina şikeftê çûyîna wî ya Evdalkofî...

Bîranîn, bîranîn...

Hûn hemû pir ciwan bûn. We hemûyan jî heq dikir ku hûn hê zêde jiyan bikin hevalên min ên bedew. Lê dijminê li Girê Qonserveyê tehamûlê serkeftina we nekir û ji ber vê yekê şaşitiyek kir ku ew ê karibe jiyanên we ji we bistîne. Niha li pey we dîrokek we ya bi xwîna xwe nivîsandî heye. Her çendî dihizirim hûn berwext çûn lê hûn bûn xwediyê çûyîneke manedar. Ez ê ti car we ji bîr nekim hevalên leheng û careke din; ŞEHÎD NAMIRIN...

Gelek hevalên me gelek tişt parve kirine li cem, li dûrî min di sala 2010’an de şehîd bûn. Hevalên Kandil, Adar, Barîn, Berçem, Nûda, Kurtay, Ronî, Întiqam, Dewrim, Botan,

Sîpan û gelek hevalên din li ezmanan bûn stêrk, her şev li wan temaşe dikim. Çav li min dikin.

**23’ê Adara 2011’an**

*“Şehîd birînên dilê min ên nayên kewandin in.”*

**Rêber Apo**

**Rêwiyên Rojê**

Silav ji te re Jina Azad! Îro 27'ê Adarê ye û ji ber berfa bariye, em li quntereyên Cîlo di qampa xwe de weke girtiyan têra xwe bêriya ji derve dikin. Pêvajoya me ya zivistanê pir dagirtî bû. Kîjan ji wan dikare bê vegotin. Ferasetên her tim, mijarên hewce ye li beramberê wan têkoşîn bê meşandin e. Dixwazim behsa mijareke cuda bikim û ma dizanî dema nêzîkatiyên hin kesan ku naecibînim û hestên xwe yên di vê derbarê de li cem te parve dikim, li ser rûpelên te dinivîsîm, hin caran hesteke wisa bi min re çêdibe ku weke ez kurûpist bikim. Lê ez hîs dikim divê ez parve bikim. Van dubendiyan rojnivîseke wisa derxist holê. Hêvî dikim hûn ê min fêm bikin. Tiştê dinivîsîm di jiyanê de di fermiyetê de tiştê ji sedî sed min aniye ziman e. Tenê ferq û cudahiya di rojnivîsê de ew e ku tiştên pêş ketine, ji aliyê zêhniyetê ve temsîla çi dikin bi awayekî hûrgulî û detay hewl didim analîz û tehlîl bikim. Bila rojnivîsa min a birêz, jixwe navê te jî rojnivîsa şexsî ye. Ev jî tê maneya hest, hizir, ruh û fikra min a ji bo derûdorê. Ji ber vê yekê bûyer û diyarde bi şîroveya Rozayê tên nivîsandin. Min ew kêlî, ew kêlîna weke bûyî bi her tiştê xwe ve, bi awayekî xwezayî nivîsand. Ji ber vê yekê hêviya min ew e, kesên dixwînin bi vê zanebûnê nêzîk bibin. Werhasil Jina Azad, eger rojnivîsên gerîla bibin pirtûk, ya hê jî li pêş e eger rojnivîsên gerîlayên artêşa YJA-Starê ku di dîrokê de destpêkek in ji bo dîrokê, ji bo afirandina te dibe ku rêbazên girîng bin. Li ser vî esasî hêviya min ew e, bêyî ku wenda bibî tê bigihîjî ber destên kesên te bixwînin.

Temam, dizanim min pir dirêj kir. Tiştên hatine nivîsîn bi serenavê 'Rêwiyên Rojê' re ne bi aheng bûn. Em di cih de bên ser tiştên ez ê parve bikim. Dibêjim di cih de, ji ber ku mirov 'Rêwiyên Rojê' çawa bîne ziman, çawa dikare bê anînziman?

Li qampa me ya Şehîd Adar, xemgîniya hevala Bêrîtan ku wê roja han birayê wê yê mezin li Gabarê şehîd ketibû digeriya. Dilê min ji kûr ve êşiya. Dizanî, keseke wisa me kêrî ev êş û jan tarîfkirin û nivisandinê nayêm.

Roja ku hevalê Nûrheq û heval di şer de bûn, me jî li wan rojnivîsên xweşik ku wî û hevala Bêrîtan bi hev re dagirtîbûn mêze dikir, dixwendin û hevala Bêrîtan jî li ser esasê gihandina wî deftereke biçûk dadigirt. Min ji bo hevala Leyla, Farsî wergerand Tirkî û tiştên ji bo hevalê Nûrheq nivîsîbûn derbasî defterê kir. Hevala Bêrîtan jî got, "dixwazî tu jî binivîsîne." Sedem çi ye nizanim, ez a ku ji tiştên wisa re pir kêfa wê dihat, min nenivîsand û min jê pirsî ku birayê wê li kû derê Botanê ye. Dema got, 'Gabar' ketim nav gumanan ku gelo ev defter dê bigihîjê. Tebî ev fikrên min ji min re man. Heya ku min du roj ji beriya vê ji cîhazê bûyer guhdar kir.

Û gelo tu dizanî, zarokên vê malbatê ji ber ku Kurd in ji aliyê dewletê ve hatine koçberkirin, endamên malbatê di êşkenceyan re hatine derbaskirin. Hevalê Nûrheq neçar maye piştî refa 5. bixebete, debara malbatê pêk bîne û bêyî ku du kêçên xwe yên li pey xwe hiştiye bibîne tevlî gerîla bûye.

Di nava vê jiyanê de tenê bi her tiştê xwe ve li fezîletê geriyaye. Wêrekiyeke pir mezin e. Hurmeteke mezin didim vê helwestê û li cem min dibe sedema bipêşketina ponijîneke pir cuda. Bêrîtan, dema hevalê Nûrheq tevlî bûye pir biçûk bûye û bi salan piştî wî tevlî bûye. Hevalê Nûrheq berê tevlî bûye û li Gabarê dê sala wî ya şeşemîn tije bûya. Ew ê vê biharê bihata û dibe ku xwîşka xwe ya ku di nav rojnivîsên xwe yên xweşik de bi cih kiriye hemêz bikira. Lê gotinên nîvçe mayîne yên pêk nayên, ewirên li asoyan asê mane hêdîka xwe berdan nav jiyanê. Di jiyana gerîlatiyê de qet hev nedîtine. Vaye tiştê herî zêde êş daye min ev bû. Naxwe kesayetiyên pir bihêz ên şoreşger in. Şopdêrên felsefeya 'mirin ji kû derê tê bila bê, serseran û serçavan hat'. Lê dîsa jî pir zêde hestewar dibim. Vaye bûn Kurd, weke Kurd hatine cîhanê û wisa jiyankirin tiştekî wisa ye. Li welatê xwe, ji bo jiyaneke asayî û legal, bi şiklekî veşartî û îlegal têkoşîn meşandin...

Çi tiştekî baş e ma ne wisa ye, weke du xwîşk û birayan hevaltî kirin? Xwîşk û birayên min bi xwe hat bîra min û bişirîm. Gelo min tiştekî wisa dixwest? Hem erê û hem jî na. Min bixwesta jî ma dê pêk bihata? Vaye dubendiyên her berdewam dikin.

Yek ji taybetmendiyên mirovbûnê jî timî jiyankirina dubendiyan e. Lê ya girîng ew e, di navbera dubendiyan de nemayîn û hilbijartinek kirin e. Biryara herî nebaş ji bêbiryariyê baştir e.

(Weke bersîva şehadeta li Gabarê hevalan li sê polîsan da. Dema me bihîst me hemûyan li çepikan da)

**27'ê Adara 2011'an**

**Û dawî**

Hevala min Jina Azad. Tu jixwe Rozaya ji 'dawiyan' û ji veqetîne ecz e nas dikî. Dema li malê bûm ji ber rewşa malbata xwe ya ji hev cuda, xeyala li cem hev jiyankirinê timî di goşeyekî mêjiyê min de weke êşeke zirav bû. Dema em li gund bûn min digo, xweziya neçûna, birayên min ên mezin, bavê min, xwîşkên min ên mezin û hemû hevalên min me bi hev re jiyan bikirana. Me bi hev re li dîmena Torosan temaşe bikira û me xwe bigihanda maneyekê. Qey çi diqewimî, ma qiyamet radibû? Min digo, ma evqas nemimkûn e. Paşê min dest bi rêwîtiya Stenbolê kir û jiheveqetînek jî, ji bo dayika xwe jiyan kir. Piştî ku dayika min ez anîm dinyayê timî hesreta wê û ya xwîşk û birayên min li ber serê min bû. Hin caran hêdîka digirîm û dema min li mala vala mêze dikir, ruhê min dikişiya. Gava di saet heştê de dihatim malê û min wisa dixwest diya min, min pêşwazî bike. Baranên xemgîniyê bi ser dilê min de dibariya û min bêriya gund dikir. Ez pir li paqijî, zelalî, exlaq û xwerûbûna wê derê digeriyam.

**29'ê Adara 2011'an**

**Têkoşîna rêgez û pîvanan di jiyana rojane de çawa tê pêkanîn?**

Hevalek ku ev demek bûbû min nedîtibû, sibeya êvara ku ji wezîfeyê hatibûm ji nav hemû hevalan tenê ji min re got, "rojbaş hevala Roza." Hevala Roza wisa berisiv da: "Di nav evqas heval de ma tu çima tenê ji min re dibêjî "roj baş." Rûyekî sor bûyî û bêdengiyeke di nav hevalan de çêbûyî...

Her kes her kêliyê nikare di mêjiyê xwe de vê rastiya sotîner ragire. Vaye kêlî bi kêlî têkoşîn wisa dibe. Mirov di jiyanê de li ser her tiştî, wê daqurtandinê pêk tîne.

Piştî çend rojan dema mijar vebû, hevaleke jin dibêje, “helwesta te ya wê rojê pir li xweşiya min çû.” Helwesta rast, bi mirov xweşikî û rêz dide qezenckirin.

Piştî çend rojan ku hevala Sema çû, min ew nivîsandina ji bo min nivîsandibû bi hevala Sînor da xwendin. Lê belê serasera xwendibû û paşê min bi hevala Leyla da xwendin û pir jê bandor bûm.

**2011**

**Rojnivîsa me ya qampa Cîlo ya zivistanê ya bajarê biçûk ê Starê**

Belê, me bi awayekî pirengî û tije tije ev rojnivîs dagirt. Gelek nivîsandinên min, helbestên min li wê derê jî hene. Min û Medya Ronahî vê zivistanê, me gelek ked da. Bawer im kêm jî be me heqê wê dayê. Heqê vê jiyanê dayînê pir zehmet e.

Dawî li wê rojnivîsê jî anîn li benda min e, li benda me ye. Min niha dawî li vê neanî, plana min a din dawî li wê jî anîn e. Diviyabû destpêkên panzde jinên li Cîloyê bibûna dîrok.

Belê, rojnivîsên min ên hêja, rexnedanekê didim we rojnivîsan. Dema ez we bi kar tînim ji ber şert û mercan pir dihincirînîm, nikarim biparêzim. Ez ê ji vê bi şûn de hewl bidim bi vê zanebûn û hesesiyetê nêzîk bibim. Bimîne di nava xêrê de, çi bikim rûpelên te tije bûn.

*“Cewhera jiyana mezin xweşikbûna ziman û helwestê ye.”*
**Rêber Apo**

**29’ê Adara 2011’an**

# ROJNIVÎSA SÊYEMÎN

## JI BO JINA AZAD A PÊŞEROJÊ



**Jina Azad**

Jina Azad a xoştewîst û bi rêz; ji bo ku dema ez tê de jiyan dikim û bîranînên wê di behra bênaviyê de wenda nebin, hewl didim jiyana gerîla bikim belge û di dîrokê de bi cih bikim. Ez ê hewl bidim û girîngî bidimê ku di vê têkoşîna ez ji bo heqîqeta dîrokê dimeşînim de hestên min ên di têkoşîna min de, zehmetiyên min, êşên min, kêfxweşiyên min, ecziyên min û hwd. ji bo jina azad a pêşerojê bibe zanebûnekê û bibe qutiyeke dîrokê. Ji beriya vê min du rojnivîs temam kirin, ev ya

sêyemîn e. Baweriya min ew e, bêyî wenda bibin bigihîjin pêşerojê û biçin berdestê kesên bixwînin.

**Dixwazim di dem û mekanek ku mirovahiyê hemcinsên xwe kiriye bêesl, bibim sembola afirandina cîhaneke biesl.**

**Berfa Nîsanê**

Nebêjin, “ev çi berfa Nîsanê ye? Ma di Nîsanê de berf dibare, ya ku ez dizanim barana Nîsanê heye.” Eger hûn li Cîlo gerîlatî bikin dê berfa Nîsanê jî, we pêşwazî bike. Niha em li derûdora agirekî mezin rûniştîne. Li asoyê rêwitî xuya dike. Em ji qampa Şehîd Adar derketin û çar pênc rojan li nuxteyeke demî man. Me perwerdeya leşkerî dît. Min pir xweş B-7 û BKC bi kar anî, ji sih guleyan çar, cot avêtin. Yên din jî lib bi lib û zû zû... Jixwe em ji wî bajarê xwe yê şêrîn û xemgîn ê biçûk ê Starê veqetîn. Niha jî em ê ji hevalên xwe yên hêja veqetin. yanî em diçin tabûra xwe, tabûra giştî. Û pratîkeke din dest pê dike.

Dijmin dest pê kiriye jî. Li Gabar, Çewlîg, Amanos hevalên me şehîd xistin. Xweziya dinya xweş bûya em biçûna pêş û me çalakiyên bersivdanê li dar xistana. Belê em hemû pir bi kelecan in. Heval dê ji bo civînê biçin Başûr.

...Heval çûn û nivîsa vê rojê piştî bi şeş rojan temam dikim. Hevala Medya Doz, Bêrîtan, Leyla çûn Başûr. Em ên din jî çûn cem hevalên tabûra Geliyê Zapê, hevala Uta û hevalên din çûn cem hevalên Cîlo ku nîv saet ji me dûr e, hevala Roza Ş. jî li cem wan çû. Tîma me ya ciwan û şêrîn ku ji hevalên Jiyan, Zîlan, Gulan û Rozayê pêk dihat tevlî xebata tabûrê bû. Tîma me rojên baran, berf dibarî û ba dihat mangaya xwe çêkir, tê de bi cih bû.

Dê heya ku heval ji Başûr bên hevala Gulan li cem me bimîne. Vesaziya hevala Silav li Bakur çêbû. Li ser navê wê pir kêfxweş bûm. Min hevaleke xwe ya xebatê nas kiribû, niha dê ji bo wê qadê ji sifirê dest pê bike. Kî dizane dê dîsa kî bê? Di pratîkê de hev nas bike, jidil bûn û samîmiyeta heval bipîve. Min weke bûyî ev di fermiyetê de jî anîn ziman. Ji bo vê pêvajoyê qadroyên stratejîk pir girîng e. Di van rojan de em tevlî perwerdeya leşkerî dibin. Beriya vê kêliyekê me

operasyon li dar xist û em hatin. Doh jî hevalan perwerdeya sizmayê dîtin, ez mitfeqçî bûm. Hevalê Çiya bolîk xistiye nav perwerdeyeke pir şidiyayî. Me zêde zêde ceribandina bombe avêtina mewziyan kir.

Ez lîsteya nobedê dinivîsim, Gulan berpirsiyara lojîstîkê ye, Jiyan fermandara tîmê ye, Zîlan jî alîkara wê ye. Em hemû li ser wezîfeyê ne. Cihê me yê nobedê dûr e û di tariya şevê de, di baranê de, di heriyê de qira me radike. Hevalê Çiya dibêje, “kevir jî bibare em ê biçin cihê nobedê.” Hevalê Çiya fermandarê me yê bolîkê hevalekî ciwan e û bi disîplîn e. Em ji ken zikopişto dibin, dibe ku her kêlî întîşar dest pê bike. Ma hûn dizanin, hevalên bolîka me hemû ciwan in. Şiyara “me bi ciwanî dest pê kir, em ê bi ciwanî dawî lê bînin” tîne bîra min.

**13’ê Nîsana 2011’an**

**Sêgoşeya Zeranê/Medê**

***

*“Eger hez bikî tê bi ser bikevî.”*

**Medya Ronahî**

***“**Hevala/ê herî baş, ya/ê ku hevala/ê xwe heya bi stêrkan, serê hevala/ê xwe bilind dike.”*

*“Jin pîvana azadiyê ye.”*

*“Xwedavend ew kes in ku hêzên xwe yên taybet herî baş bi rêxistin dikin.”*

**Rêber Apo**

***

**15’ê Nîsanê**

Jina Azad a birêz, îro ew li benderên mêjiyê min didin: Rojên ji dayikbûnê. Îro hûn çi dikin? Dibe ku her kes, derûdora we hemû roja we ya ji dayikbûnê pîroz bike; kurên we, keçên we... Hûn bûn dayik û bav jî. Emoş û Cemalê birêz, roja we ya ji dayikbûnê 15’ê Nîsanê li çiyayên Zagros ku landika mirovahiyê ye, li navsera Cîlo, di vê bihara bi dengê newalên ku diherike, azmanê şipûşîn û bi tava germ ku piştî

baraneke dûr û dirêj bariyayî derketiye ya bi rengê zêrînî, pîroz dikim. Hûn dengê min nakin, ji xwîşka we ya dûr ku gerîla ye ev du sal in nikarin agahî bistînin. Hin caran dema ewirên we diçin li cihekî dûr xwe ji bîr ve dikin, xeyala nezelal a Roza bi ber çavê we dikeve. Ew hesreta ku di nav mijangên we de xwe vedişêre, pêwîst e hûn bizanin nuxteya me ya şirîk e. Cemocan rojeke te ya jidayikbûnê ku tu di zindanê de bûyî tê bîra min. Min, Emoş, Gulsum, Hacik me ji te re nameyeke pîrozkirina rojbûnê û kertek şandibû. Ev malik hebûn. Li ser kaxiza ku me ji bo dostê me yê li dûr Cemal ku me pir bêriya wî kiribû ev nivîsandibû;

Rojbûna te pîroz be
Bi salan bextewar be
Me ji bo te bi morikan çûkek çêkir û honand
Dê bifire û li şibekeya te dayne
Lê polîs te digirin û bi şevan didin ber lêpirsînê
Em qet li benda te nesekinin dibe ku tu neyê, çendîn salan neyê!...

Belê Cemocan, tu piştî sê salan vegerî cem me û dema tu vegerîbû em mezin bûbûn. Dem borî bû, gotin nîvçe mayîbûn... Niha dîsa dem derbas dibe û hesretên nîvçe mayî... Cemal, bi îhtimaleke mezin bûyî bav, yan keç yan jî kurekî te çêbûye. Li van çiyayên ku ji bo te jî derketimê yên hêlîna teyrûbazan Cîlo, ji te re pîrozbahiyeke germ a gerîlayekê dişînim, hêviya min ew e bêxtewar bî. Her çendî dizanim di wê sîstemê de ev ne mimkun e jî.. Keça por zer Emoş! belê Emoş, weke ku min timî layiqê te didît, difikirîm ku hewce ye tu wisa bî, tu yê bibûya gerîlayeke pir baş. Min her ji tê re digot. Wê demê ne gerîla bûm, tenê sempatîzanek bûm. Lê xwîşka min a mezin a birêz, min piştî du salên têr û tije yên gêrîlatiya xwe fêm kir ku tu xwediyê potansiyeleke pir mezin a bûyîna gerîla bûyî. Her ku bi wê sîstêmê dihizirim ewqas bi hêrs dibim... Jineke xwediyê ruhekî weke te xistiye nav çar dîwaran, porê wê nuxumandiye û bêyî ku şerm bike navê wê lê kiriye evîn.

Em azadiya xwe ji dest didin, navê wê dibe evîn. Ev çi evîn e, çi eşq e ku azadî tê wendakirin? Tu ne çarnûsperest bûyî lê te lêgerînên xwe bi evînên platonîk guherî. Û tebî şert û merc... Weke jin li çiyan jiyan kirin, tam jî jinên xwediyê ruhekî weke te dixwaze. Bi xwezayê re di zikhev de lê mixabin yên weke te jî sîstem wan dirizîne. Werhasil keça por zer. Ez li şûna te jî têra xwe li çîçek, balinde û teyran, dar û beran, çiyan, tavê, heyvê, stêrkan û çi tiştê bê bîra te hebe mêze dikim, bi wan nefesê distînim, tehm jê dikim.

Belê diya min a por zer, Doğukan bawer im mezin bûye û pir şêrîn û lihevhatî bûye. Li şûna min wî maçî bike. Vaye ji bo ku yên Doğukan bi azadî, xwezayî bijîn ev cudabûn û hesret, ken û gotinên nîvçe mayî. Hêviya min ew e, yên jê hez dikim weke bişirînên vê rastiyê lê tên û em li wê derê jiyana azad weke mirov, weke jin bi evîndarî, bi heqîqetê, bi evînê jiyan dikin.

Hin kesên din dibin tekela bisikletê, weke te gotiye Cemocan; "eger pedalê bisikletê nezivirînî tê bikevî, nikarî li vê rêya jiyanê bimêşî." Ji ber ku nan ne di devê şêr de ye di nav mîdeyê de ye.

Rojbûna we pîroz be
Her bextewar be
Ji Cîlo ji we re Bayê Azadiyê dişînim
Bi wî bayê ji nav azadiyê, hinarikên rûyê we radimûsim
Ez spartî bi çiyan, dar û beran im
Gerîlatî her didome li cem temenê mirov
Qet li hêviya min nemînin
Nazivirim, nikarim bêm nav wê paşverûtiyê

**Mîdeya min dixele**

Tê bêjî, "çi bûye, gelo tiştek lê nehatiyê li vê Rozaya li ser rêya bûn gerîla?" Ne li mîdeya min, lê tiştên li mêjiyê min nayên wisa zêde bûne û mezin dibin...

Min di nivîseke din de diyar kiribû, hemû kesên cilê gerîla dixe ber xwe nabe gerîla û milîtan. Birçî dimîne, di seranserê salekê de dimeşe, çek di dest de, çente li piştê ye. Ji her nîmeta xwezaya xweşik sûd

werdigire û dibe şahidê wê yê efsûnkar lê nikare bibe gerîla, nikare bibe milîtan, nikare xwe bigihîne heqîqeta xwe.

ÎXANET! Çi ye îxanet?

Ji bo min yekane ferq û cudahiya di navbera kesekî/e ku hevala/ê xwe di mewziyê de dihêle, direve cem dijmin û di navbera kesekî/e di nobeda şevê de hevalên xwe di xewê de dihêle, diçe ditina kesekê/î, îdeolojîkbûna îxaneta tê kirin e. Ev ji ya destpêkê hezar qatî hê girantir û nayê efûkirin. Tu çawa diwêrî, bi kîjan heqî bi nirxên hevaltiyê dileyizî; şik û gumanê, bê baweriyê û hwd. çêdikî, di nav vê jiyana piroz de tevlîhevî derdixî, jirêderketinê, şelobûnê bi pêş dixî, dikevî nav pratîka sûc? Hem tê bi qîmetên pîroz ên vê jiyanê bileyizî û hem tê neletî bî! Hem tê bêjî ez ê bibim milîtan û hem tê paşverûtiyê, ajoyan heya nuxteya xwe ya herî dawî jiyan bikî û li araziyê, bi randevûyan li cem hin kesan hev bibînî. Ev çi jiyanek bê şerm û fedî ye? Têra xwe bêhna qirêjî û duritiyê jê tê. Kesayetiya xwe qurnaz dihesibîne, hesabên herî zirav dike, her xwe vedişêre. Ji bo ku xwe jiyan bike hin kesên cuda dike rojev, neletîbûna xwe di paş qurbanîbûna hin kesên din de vedişêre... Du kesên reben ên ketî ku her roj, her kêlî di nava têkoşînê de bi paşverûtiya xwe re mijûl dibe, qaşo bi zimanê rêxistinê xwe dixapîne... Jinek, zilamek...

Di têkoşîna sosyalîzmê de bi nasnameyeke şoreşgerî, di demek ku pîroziya têkoşîna azadiyê ya YJA Starê de weke jinekê ÎXANET.

Ev rezalet di bihara 2011'an de, di vê meha Nîsanê ya pîroz de ma ne navê îxaneta li Rêber Apo ye ji vê cudatire çi ye? Dema di çarê Nîsanê de ji bo dar çandinê diçî, tu yê nizanim kîjan ajoyên xwe mezin bikî. Navê vê îxaneta herî mezin e. Tu yê bi salan weke torekê di kîjan goşeyê dilê xwe de kîjan ketîbûnê mezin bikî. Ka em mêze bikin bila ew evîna te ya biçûk bê û te rizgar bike. Di bin navê "ez tenêtiyê jiyan dikim" de xwe negihîne heqîqetê. Ev çi tenêtî ye, hemû ruhê te dixe nav dubêndiyekê û nahêle xwe bigihînî heqîqatê. Tu ji xwe direvî, parangayên te yên koletiyê pir mezin in... Bêyî ku şerm bikî bi nirxan dilîzî. Yanzde sal in ji rêxistinê distînî û pê dileyizî, xwe didî jiyankirin. Bi keda hin kesên din, bi xwêdana eniya wan, bi xwîna wan, di berdêla şehadetên wan de jiyan dikî.

Ji bo ku egoya xwe jiyan bikî, li benda valatiyan dimînî.

Bi hêrs im, xwediyê bertek û kîn im. Hûn kesayetiyên ji dijmin jî xetertir, awam, bi wîrûs û nexweştir in. Divê şerê herî mezin li dijî îxanetkarên weke we bê meşandin. Têkoşîna herî bihêz mixabin bi salan li dijî yên weke we hatiye meşandin. Ji ber vê yekê ye meşa azadiyê bi serkeftinê tacîdar nebû. Paşê jî hûn bêyî ku şerm û fedî bikin rexnedana hevaltiya xwe ya nebes didin. Bi kîjan rûyî? Ma hûn zarokan dixapînin? Divê mirov taktîkên xwe di nava şer de li dijî dijminê xwe bi pêş bixe, ne ku rexnedana ketîbûna xwe bi pêş bixe. Ev tê maneya xwe rêwa kirinê, bê hurmetî, bê exlaqî û bê wijdaniya herî mezin.

Ev her du îxanetkarên xwe herî qurnaz dihesibandin, ji bo milîtaniyê berendam bûn lê neletîbûna xwe jî dixwestin di nav jiyanê de bi cih bikin û bi terza xwe ya jiyanê, pê bawer kirine dê karibin derûdora xwe bixapînin. Lê ji bîr kirin ku PKK sekneke ruhî ya cuda ye.

**21'ê Nîsana 2011'an**

**PKK sekneke ruhî ya cuda ye**

Kesên ji aliyê ruhî ve tiştên cuda jiyan dikin nikarin bibin PKK'yî. Nikarin bibin xwediyê dil û mêjiyekî saxlem ê gerîla.

Ji rêzêbûn çi ye? Tên nav rêxistinê, destpêkê pir bi kelecan û giran tevdigerin, ecêb hurmet raber dikin. Paşê rêxistin dixwaze hinekê wan bigihîne asteke fonksiyonel, pêşiya wan vedike, derfetên pir mezin dide wan. Dibêje, "ha ji te rê dîrok, bi îdîaya ku tu yê mucîzeyan pêk bînî biafirîne", lê ev kes çi dikin hinekê mezin dibin, dibin xwediyê cih û mewkî û ji ber wê yekê yan jî li ser mijara ku dîrok çawa tê nivîsandin hinekê derfetên wan çêdibe, dest pê dikin bi nirxan bileyizin. Ji wan e ku destkeft pir bi hêsanî hatine qezenckirin. Ji bîr dikin ku ev qas nirx û cewhera jiyanê çawa hatine afirandin. Hema bêje zêde zêde sivik tevdigerin. Diyalektîkbûna jiyanê li ber çavên wan wenda dibe. Îradeya wan a rebenokî li ajoyên ku weke madeyên hişbir e asê dimîne, dialiqe. Ma tu dikarî çawa evqas xwe bixapînî? Ma ne mixabin e ji bo mirovahiyê?

**Nîsana 2011'an**

**Merhaba rojnivîsa min**

Em li cem hevalên Cîlo ne. Nuxteya ku em lê ne heya bi saet dehan tavê nabîne. Heval îro ji Başûr hatine. Ji rêveberiyê hevalek jî bi wan re tê. Hemû roja me bi girtina nobeda girtî, derbas dibe. Bi şev du subay û bi roj û şev jî nobedar derdikeve. Hejmara me kêm e û em hemû bê xew in. Ya din jî mercên hewa, rojên baran, ba tê me şepirze dike. Laylon kêm e têra me nake û kunkunî bûne. Barana Nîsanê li araziya asê ya Cîlo rojên zivistanê yên bi ba û bager tîne bîra mirov. Barana xweş lê dike di nava saniyan de heya bi tiliya lingên mirov şil û pilo dike.

Du manga û konekî me heye. Kon ne li gorî mercên hewa ye, pêşwazî nake. Em dema dinya xerab dibe girtî tînin mangeyekê. Ji derveyê subay û nobedaran her kes li mangaya din radizê. Roja han li nobedê pir zêde baranê li min kir. Hevalên din jî wisa. Ji bo ku heyfa me neyê me xwe bi zehmetî ragirt. Ji ber ku zivistan dereng xelas bûye li cihê bilind giya derneketiye. Li dolên jêr jî zêde mezin bûye. Roja han em çûn giya komkirinê. Ji ber ku biçûk bû me kêm kom kir. Kereng, lûş, guhbizin, guhreşk...

Xweza bi ava baranê têra xwe xwe paqij dike, paşê taveke germ hemû xweşikiyên wê weke zumrud diçirûsîne. Dibêjim hey tavê, ma çi diqewime van qirêjî û gemariyan jî bişoyî û paqij bikî? Ne ji te be, dê gerdûn di nav vê qirêjî û gemariyê de bixeniqe.

Gerdûna biçûk a dilê min, roja min! Rêbertî... Têkiliya te û gerdûnî bi şiklekî eceb ji nû ve li hemberê min e. Ev meha Nîsanê ku aloz derbas dibe, serkeftinan jî dihewîne.

Ji perwerdeya sekvaniyê weke yekemîn derketim. Serweriya min a di vê mijarê de hevalên komîsyon jî matmayî hiştin. Ez jî matmayî mam. Min nedizanî di beşa sekvaniyê de evçend xwediyê qebiliyet im. Perwerdeya sekvaniyê ku ez tesadufî û piştî macerayekê hatimê, taybetmendiyên min derxist holê û bi vî awayî erênîbûna van rojan afirand. Min di van rojan de qlêş bi kar anî. Di pozîsyona bê destek de herî kêm carekê min di 12’yê de li hedefê dida. Ji beriya perwerdeyê hevalê Hozan ji me re got, “di vê perwerdeyê de eger kî li hedef bide, diyar dibe ku serwerî û hakimiyeta wî heya yan na.” Bi giştî pir kêm lê

dayîn çêdibe. Min li hedefa hatiye diyarkirin da. Potansiyela min heye, bibim sekvaneke baş. Perwerdeyeke amator û ji bo du-sê rojan bû. Perwerdeyeke hê berfirehtir dibe ku gelek tiştan eşkere bike. Lê ji bo mijara sabotajê eleqadariya min hê zêdetir bû. Her kes dibêje ku taybetmendiyên min ên şexsî ji bo vê beşê hê destdayîtir in. Di dema pêş de ez ê biçimê. Eger mirov bixwaze mirov dikare di her mijarê de xwe bigihîne mikemeliyetê. Di van rojan de min ev bi şiklekî zêde sotîner jiyan kir.

Weke qadroyên Geliyê Zapê ez û hevala Zîlan mane. Hevala Medya Doz li ser navê hêza YJA-Starê çûye civînê. Me go, “hevala Medya dê li ser me herduyan plansazî çêbike, bi vî awayî me hanekên xwe kirin û em têra xwe keniyan.

Eger di Nîsana 2010’an de ji min re bigotana ez ê di Nîsana 2011’an de rû bi rûyê rewşeke wisa bimînim, min ti car bawer nedikir û pê nedihizirîm lê rastiya di nav de me ev e. Hevalên jin araziyê nas nakin. Dîsa ji despêkê em ê dest pê bikin. Li herêmê ji taxima Şehîd Hedar tenê ez mayî me. Piraniya wan di mijara têkiliyên jin û zilam de pirsgirêk jiyan kirin û tasfiye bûn. Gerîlatiya min a salekê bi bûyerên wisa tije bû ku nizanim çi bêjim. Ma ev çarenûsek e? Qet ne wisa ye! Yan jî ma tesadufek e? Ne wisa ye!

Ji ber ku di felsefeya me de ji tiştên wisa re cih tine ye. Axx jino, ma ev kevneşopîbûn, bêzanebûn ji çi re ye? Belê Jina Azad, têkoşîna min a li Geliyê Zapê li gorî dilê min pêk hat. Li cem van şaxsiyetan yên ku di rêgez û pîvanên xwe de rast û saxlem in jî dikarin li vê herêmê jiyana xwe bidomînin. Ez ê vê piştrast bikim.

Ji bo te daxwaza şenseke zêde dikim! Ez ê biçim nobedê.

**27’ê Nîsana 2011’an**

**Çima?**

Ev Uta û Dilar dê min dîn bikin. Ma mirov li cem kesekî/e girtî diaxive? Fikrên van ên îdeolojîk çi ye? Di tekmîla doh de qiyamet daket. Hevala Roza Ş. jî tevlî bûbû. Wisa kirina Uta û Dilar ne tiştekî baş e. Axx...

**28’ê Nîsana 2011’an**

**Di sala min a duyemîn de**

Vê gavê tav li porê min dide û diteyisîne. Li erdnîgariya asê ya Cîlo ku bi rengê kesk xwe xemilandiye azman şipûşîn e. Xwezayê bêhna azadiyê bi ser xwe de kiriye.

Di arîfeya destpêka pratîkekê de em li Gundê Bazê ne. Li vê erdnîgariya nas Rozeyek ku ji meha Gulana par mayî heye.

Hemû endamên taxima Şehîd Adar nû ne. Sala borî difikirim. Eger di Nîsana 2010'an de ji min re bigotana ez ê di Nîsana 2011'an de rû bi rûyê rewşeke wisa bimînim, min ti car bawer nedikir û pê nedihizirîm lê rastiya di nav de me ev e, weke bayekî dijwar li rûyê min dide. Rêwîtiya Geliyê Zapê di sala xwe ya duyemîn de ye. Piraniya tabûrê mirov dikare bêje nû ye. Hevalên kevn kêm in.

Hevala Medya bi heft hevalan ve zivirî.

Platforma girtiyan hate lidarxistin. Pir giran bû. Piştre me ew şandin cem hevalên Cîlo. Me ji hev xatir xwest. Çi ecêb e, min ti car texmîn nedikir ku em ji hev wisa cuda bin. Zivistanî demekê di mêjiyê min re hizirek derbas bûbû ku em ê di kîjan mercan de jê cuda bin. Qonaxên ku hîsên min wisa berçav bûne ti car ez şaş dernexistim. Hevala Rûken Bîngol îro encamên Konferansa YJA-Starê ragihand. Li gorî vê li ser hin kesên me nas dikir hin encam hatine eşkere kirin ku bi heman şiklê ku min berê jî li ser van kesan hin çavdêrî kiribûn. Tiştên li Xakûrkê hatine jiyankirin tam rezaletek bû. Ji aliyê din ve jî hîsên min ez nexapandibûm. Ji ber ku em li Bakur bûn, em ji pêvajoyê, ji pêşketinên hindurîn dûr bûn. Dema min valatiyên îdeolojîk guhdar dikir hem ez nebaş dibûm û hem jî min guhdar dikir. Demeke dûr û dirêj e min nenivîsandibû, min go ez binivîsîm.

Vê gavê dengê stran û govenda hevalên xort di guhê min de ye. Sibeyê dê hevalek tîm derbasî hindur bibe. Ji ber vê yekê moral çêdikin. Em ê jî paşê biçin. Hê vesaziya me diyar nebûye. Nizanim ez ê biçim kû derê. Ji jinan tenê ez mam ku Dalê û Gelî nas bike. Em lê temaşe bikin rêwîtî ber bi kû derê ve ye? Ez ê paşê li ser xwe û li ser hevalan jî dûr û dirêj binivîsîm. Ji bo niha ji nuxteya me ya li jorê Gundê Bazê şev baş!

**9'ê Gulana 2011'an**

**Wate**

Bi qasî ji dîrokê fêm dikim di demên ku ez mêvanê wê bûm de dîsa demek ku heyfa wê bû, derbasî rûpelên spî bû. Ma tu dizanî, dibêjim xweziya min neçariya nivîsandina tiştên li ser hev kom bûne hîs bikira û ev bayê tê, xumxuma dengê ava ji quntereyên Samûra diherike, ewrên li azman dizivirin û wenda dibin, bi temaşekirina palên bi kevirên şipûşîn xwe xemilandine, wêjeyeke aram bikira. Aram... Yên ku li aramiyê digerin ma tenê êxtiyar in? Gelo çima ji bo wan malên staregeh tên vedan? Dizanim, hûn ê bêjin westabûna salên tev bi barê bîranînan derbas bûyiye. Dixwazim bipirsim. Ma westabûna jiyaneke bi wate dibe? Yan jî ma westabûna temenekî bi lêgerînê boriye dibe?

Gelo cihê ku bêmanebûn û tinebûn dest pê dike kû der e? Ez dibêjim payitexta, dubareyan e. Dibe ku hûn bêjin, "ti tişt ne dubare ye." Rast e, ya ez dixwazim bêjim, israra kesan ya ji bo her tiştî ye. Û hem jî ruxmî ku felsefeya 'yekane tiştê nayê guherîn, guherîn bi xwe ye' qebûl kirine, daqurtandine.

Mane, bi fêmkirin û manedanê çêdibe. Mane edalet e. Ji ber vê yekê ye, meşa piroz a maneyê... Edalet bingeha heqîqetê ye û heqîqet hebûn e. Îrade AZADIYA pêkhatî ye.

Bêedaletî bêmanebûna bindestiyê ye.

Bêmanetî stûna bingehîn a rêyên ber bi tinebûnê diçe. Eger di tinebûn û valatiyê de îsyan û hêrs tinebe tiştê li wê derê tê jiyankirin heya bi dawiyê koletiya bêbingeh e.

**22'ê Gulana 2011'an**

**Jinên Azad**

Sê roj bûn ku derbasî 19'ê Gulanê derbas bûye. Di gerîlatiyê de du salên têr û tije, du salên watêdar ku hewl dane aîdbûnê ber bi çav bike... Heft sed û bîst rojên ku kendala tinebûnê mezin kirin e... Kamilbûna valatiyê di nava tinebûnê de... Dema dikeve valatiya tinebûnê, gelo bi emrê min ve bask çêdibin? Gelo bi bayê bêmanebûnê ez ê li erdê biterpilim? Ruhê min î li ber kendalê pê re bask çêdibin, gelo dê gilî û

gazincên kelecan, coş, kêfxweşiyan bibihîze? PKK’ê di nav bişirîneke de veşartî ye, PKK ruhek e. Ma nexwe dê di çileyê zivistanê de li ber sir û seqamê, bibe dilekî ji ber êş û azarê jan dikişîne. Li goristana ‘xweziyan’? Mirin! Bêdengiya mirinê çiqas jî dişibe aramiyê. Lê di navbera wan de kendalên mezin ên biqasî oqyanûsan heye.

Min cihê xwe guhert. Li ber sîberê daran rûnîştime, qerisîm. Niha li ser tehtek ku tavê ew germ kiriye didomînim. Şoreş rojane ye. Em bizivirin ya rojane.

Weke hûn fêm dikin û ez jî texmîn dikim vesaziya min li Gelî yanî Samûra çêbû. Roja 19’ê Gulanê li ser Çelê em di nava kişfeke bi kelecan de bûn. Ji ber ku rojnivîsa min ne li cem min bû min nekarî binivîsim. Xebata me ya kişfê sê roj berdewam kir. Di çarde û panzdeyê mehê de em ji Bazê weke grûbekê derbasî herêma Geliyê Zapê bûn. Di çardeyê mehê de ji bo girtina erzaq em çûn Zeranê. Rêyeke panzde saet bû, bi barê giran ê ard em zivirîn. Piştî rojekê banî grûbê kirin. Bêyî ku em wê westabûnê ji ser xwe biavêjin, bi êş û jan em meşeke bîst saetan neçar man bên cihê randewûyê. Ji ber neçariyê em heman rojê bi rê ketin û nêzîkî saet duduyan û me ji Bazê xwe gihand zîrveyên Samûra. Lingên me yên ji ber westabûnê xerab bûbûn, bûbûn avlêzik û werimîbûn.

Grûba me ya di vê rêwitiyê de ji hevalên Berwar, Roza, Dijwar, Çekdar, Mezlûm û Dijwar Riha pêk dihat. Quryeyên grûbê ez û hevalê Çekdar bûn. Hemû hevalên din nû hatibûn herêmê. Em ê di çardeyê mehê de derketana lê nebû. Bêplaniya rêveberiyê, mantiqa wan a dest jê berde û hem jî nêzîkbûna wan a pragmatîk, li ser hevala Roza û Berwar giran kelifî û hem jî pir giran kelifî. Hevalên xort ji ber ku nehatin wê wezîfeya Zeranê bi rehetî lê dan û hatin. Ji ber ku dê grûb bihata, hevalên di grûbê de neşandibûn. Lê belê hevala Medya em şandibûn. Hem jî ruxmî ku dizanî em ê kengî biçin. Ev bû sedem ku ez ecz bibim. Hevala Berwar di rêveberiyê de ye, lê ji ber ku nû ye û herêmê nas nake ev rewş hate jiyankirin, paşê ew jî pir ecz bû. Wisa lê hat hevalên xort, dilê xwe bime şewitandin.

Werhasil dotira roja ku em hatine, ji bo kişfa çalakiyê em çûn Sarabenê. Yanî bi temamî em di tevgerê de ne. Dema em zivirîn grûba

Sorxwîn û Ronahî tê de bû hatibûn. Tîma me ya şêrîn ji hevalên Berwar, Roza, Dijwar, Egîd, Mezlûm û Şoreş pêk tên. Em di gundên Hereke, Gissê, Tiyarê re derbas bûn. Me dayikên gerîlayan hemêz kir. Di tekmilê de fêr bûm ku di hatinê de Sorxwîn aloz bûye. Çi tiştekî ecêb e. Em heman rêyê dimeşin, bi heman şiklê diwestin lê em heman refleksê nîşan nadin, bi heman şiklî pêşwazî nakin. Ew kêlî pir girîng e, dilnizmî û hwd. ew kêlî pir girîng e, dilnizmî û hwd. piştî ku her tişt derbas dibe, mirov hezar carî jî hewl bide derbas bike bêmane ye. Ji ber ku şoreş kêlî bi kêlî ye. Hin caran di kêliyê de dîrok tê wendakirin. Weke pêvajoya dîrokî ya rewşa hebûn û tinebûnê ku em di nîvenga sala 2011'an de di nav de ne. Lê dubare nebûna wê girîng e ji ber ku jiyan hin caran şenseke duyemîn nade.

Em ê di saet sisêyan de nuxteyê biguherin, biçin nuxteya şehîd Hedar. Di vê navberê de piştî rakirina du sala ya BKC'ê ez ê B-7'ê rakim.

Min pir nivîsand, westîm. Niha, bi xatirê te.

**22'ê Gulana 2011'an**

**Merhaba Newal**

Li navsera Samûra dilê min weke deryayekê ye û çavên min li asoyê ne. Ev asoyên di dilê min de ye, sibeya Gulanê hemû ewrên xemgîn kom kirine, li ber baraneke mezin e. Lê baranê dema xwe tije kiriye, di van rojên dawî yên Gulanê ku xwe digihînin erdnîgariyên zuwa û hişk de, kêfxweşî û şabûnên hevalan dilê min î demî hênik kir. Min ji hevala Newal notek girt. Ji beriya vê bi mehekê ji min re nivîsandiye, lê encax niha gihaşt min. Rewşa wê baş bûye. Min ew pir meraq dikir. Wê pirsa min kiriye, agahî stendiye ku ez çawa me. Lê belê ji ber ku derfetên min tine bûn min nedikarî qet agahî bistînim. Her cara min ji wê re not nivîsandiye fikara ku gelo dê bigihîjê yan na û ya din jî ji ber sedema nebûna çanda min a nivîsandina notan min hinekê li hevalên xwe neheqî kir.

Hevala min Newal ku li azmanê dilê min dibiriqe. Ewqas zêde dixwazim wê bibînim. Dotmama wê jî ji wê bandor bûye û tevlî bûye.

Pir kêfxweş bûm hevala min a heja. Xwînrêj dîtiye û ji malbata me agahî aniye. Axx, dibêjim xwaziya min zanîba çi qewimiye. Di notê de gotiye ku rewşa wan baş e. Ev agahiya destpêkê ye ku min ji malbatê girtiye. Xwaziya şensa min hebûya karibûya bi detay û hûrgulî biaxiviya. Lê ev agahî li ber dilê min wisa bû, weke ku mirov piştî westabûneke zêde navberekê bidê.

Belê, Newal dixwazim ji te re binivîsîm lê nizanim kengî bigihîje te. Tu niha ji sedî sed derbasî saziyê bûye. Hevala min a hêja hedefên me yên mezin hebûn û hemû hewldana me ji bo em xwe bigihînin hedefê ne. Helbet bila wê demê ya baş bibe. Li cihê çûyî, li hêviya min î, ji destpêkê ve israreke min a zêde heye. Lê li Zagros, ya din jî li çiyayên Bakur di hêlîna Îştar de bêhndan û stendin jî tiştekî cuda ye.

Di pêvajoyeke girîng a wisa de li herêmeke wisa bûn şenseke mezin e. Awantejeke hêja û hewce ye mirov layiq be. Hemleya sala 2011’an li Samûra pêşwazîkirin kelecana min pir mezin dike. Hevalan bi navê ku ez araziyê nas dikim vê biharê ez bernedam. Ji bo taximekê quryetiya araziyê dikim. Tebî dema prensîbên min jî destûr nedan, min meşa hedefa mezin ji bo payîzê plan kir.

Hevala Newal, vê rêveberiyê pêşniyar kir min bişîne Bakur û ez bi şiklekî tam amadekirî derbasî saziyê bibim. Niha jî neçarî bûne barîqatên min. Biharê ez xwestibûm, pirsa min kiribûn. Dîsa ez dereng hatim agahdarkirin. Li vê derê ji ti tiştî agahiya me nabe. Lê ne pirsgirêk e. Li Zagros tevlî hemleya 2011’an bûyîn jî xwediyê xweşikiyeke efsûnî ye. Xwediyê qîmet û maneya gav bi gav ji pelpelokê derketinê ye.

Ez ê hinekê ji te re behsa Colemêrgê û Çelê bikim. Vê gavê li nobeda roj im. Li hemberê min girên dijmin hene. Nuxteya ku em lê ne ji bo ku bê dorpêçkirin ecêb xweş e. Hemêzkirina me ji aliyê gelê Bakur û dayikên kedkar ve, wan hestên nayên tarîfkirin, di nava goristana xemgînî û hesretê ya dilê xwe de vedişêrim. Li vê derê bi roj tevgera me sifir e. Em timî bi şevê dikevin nav liv û tevgerê. Bi piranî grûbên biçûk in. Tîmek ji çar hevalan pêk tê. Diçim kişfê. Dema hevalan dibim nuxteyan, rê pêş hevalan dikim. Serweriya min a li ser araziyê baş e. Awantajeke pir mezin bû ku min pratîka xwe ya destpêkê ya gerîlatiyê

li Geliyê Zapê derbas kir. Xweziya tu jî li vê derê bûya. Mirov zû dikeve nava pratîkê, dema jê sûd bistînî mirov zêde zêde xweş pêk tîne. Dişibe medreseyên yekparebûna fikir-zikir-çalakî pratîze dikin, diceribînin. Rewşa min weke ji te re hatiye gotin baş e. Girîngiyeke mezin didim xurt tevlîbûnê, lêpirsînê, ponijîn û pêkanînê. Baweriya min heye tu jî wê hezkirina xwe ya bê dawî, hêza xwe ya mezin nîşan didî. Gelek tiştên ji te re bêjim hene. Lê mixabin ne defter û ne jî pênûs têrê dikin. Te bi hesreta dilê xwe hemêz dikim. Baweriya min heye, em hev bibînin.

Bi germahiya tava li Samûra dide bi xatirê te.

**26 Gulana 2011**

**Samûra**

**Hevdîtin**

Doh ez û hevala Ronahî me xwe berda Gundê Herete. Em çûn cihê randevûyê. Pir hatibû çêkirin, em pir kêfxweş bûn. Eger ne wisa bûya, em neçar bûn di şeva reş û tarî de di erdeke ne xweş re biçin. Hemû grûbên me hatin cihê randevûyê. Hevala Medya Doz û Ekin jî hatin aliyê Samûra. Hevala Medya demekê dê li vê derê bimîne. Ji bo vê yekê kêfxweş bûm. Ji sedîsed hewce ye. Em doh axivîn. Rewşa tîmê pirsî. Wê jî bi çavdêriyên min re heman tişt anîn ziman. Tiştê di dawî de mirov bîne ziman em destpêkê bêjin. Weke jin eger em li vê derê serkeftî nebin herî zêde jî ji vê mewziya YJA-Starê re dibe mixabineke mezin. ‘Û ez ti carê destûra vê nadim. Ya girîngtir jî piştî rewşa par, ev dibe bêwijdanî. Ked pir girîng e. Ya din jî eger yekeyeke biçûk be û li Bakur be hê jî girîng e.

Hevala Sorxwîn bi xwe re sînordar e, hinekê jî ecemî ye, cara destpêkê ye tê qadên pratîkê. Lê dişibe keseke ji aliyê çavdêrî û rêgezan ve bi hêz. Me pir dide kenandin. Hevala Berwar hevaleke kevn e. Demeke kurt li Botanê maye. Ji derveyê wê timî li Başur û li qadên perwerdeyê maye.

**Gulana 2011’an**

**Roja dilê min, Rêbertiya min**

Kêliyekê beriya niha me Nexşa Rê xwend, piştî demek ku dereng maye. Bêyî ku bêhna xwe vekî bang li hemû mirovahiyê dikî ku dê bazar rekabetek ku nûjeniyan diafirîne bi pêş bixe, afirêneriyeke mucîzewî nîşan bide, modelên nû yên KT û KCK weke bişgokên azadî û aramiyê vekin. Rekabeta di deryaya hesûdiyê de, ma dê weke pêşbirkeke kêfxweşî dide ya deryayeke bê dawî ya afirandinê bibe? Bextewarî dê çi nûjeniyan biafirîne. Bêyî ku ti kes ecz bibe, bibe xwediyê bertek, weke Îngîlîzan bibe komploger.

Ji dema ku min ji îksîra vê utopyayê vexwariye ve aliyekî dilê min deryayeke şewitî ye. Utopya... Xewn û xeyalên li bendê ne ku di bin çewisandina humanîzimê de pêk bên. Lê ne ewqas zehmet e ku mirov bibe xwediyê perspektîfa edaletê. Kesayet, gel, beşên civakî ku xwediyê fezîleta xwe gihandina van in fedakarî, dilnizmî û kedkariyê ji xwe re dikin rêgez û di panayira wijdanê ya wekheviyê de dibin xwediyê esalet. Ji bo bûn xwediyê esalet hewldan, xwestek, eleqa, berpirsiyarî hewce ye. Şînkirina tovê van di xumexuma cokê avê yê di dilê min re derbas dibe veşartî ye. Azadî berdîlê dixwaze.

Lê mirov ji bo berdêlên vala, ne heqiqî çi bêje? Ji sedî sed wan naxwaze. Heta ji bo qîmetên vala tên xerckirin pir bi hêrs dibe. Pir nêzîkî rewşeke wisa bûme. Dilê min weke volqanek ku kêm maye bifore dikele. Volqaneke li ber teqînê ye dilê min. Divê mirov çi bike? Berpirsiyarî ji pêsîra wijdanê min nakeve û pir bi hêrs im. Dubare, dubare, dubare... Çima, ji ber çi ev xerckirinên bê rehm. Di dilê min de bêybûnek her ez lê temaşe dikim dibişirim di ruhê min î rastiya êşa welidînê dikişîne de.

**31'ê Gulana 2011'an**

**Jina Azad**

Rêwiyên ji ewrên meha Hezîranê mane doh weke bi hemû hêza xwe hewl bidin xwe bigihînin refa hogirên xwe bi lez û bez ketin nava liv û tevgerê. Belê, hin caran weke ku îstirehet bikin bêhna xwe berdidan û dubare leza meşa xwe zêde dikirin.

Rêwiyên li ber çavê min dikirin lez û bez, barana di meha Hezîranê de lê dike bû. Dibêjî qey Nîsanê li cem Hezîranê cihê xwe guherî bû,

baranê xwe ji bîr kiribû. Dilopên ku bi şiklekî dijwar li erdê didan erd dişûstin, çiya dişibîn xişirên bêhempa yên piştî tav derkeve bibiriqîne.

Çiya... Ji beriya rojekê li çiyayên me nobedar bûm. Li hemberê min tepe û mewziyên dijmin ku bi kesên weke qurbaniyên ji aliyê mirovê xwediyê zêhniyeta kevneperest a hezaran sal ve tije kirine heye. Li cihên herî xweşik û bedew ên Zagros weke deqeke reş dîmenên paşverûtiye... Di destê min de dûrbînek, li milê min qlêşa min a pir jê hez dikim, li pişta min bombeyên min ên ku min ew weke zarokên xwe hemêz kirine. Li ser min, ji jor ve li azmanê şipûşîn leyistokên xwe yên kêfxweşiyê dileyizin. Û bêhna axê, zerê sumbulan bi tavê re dibe yek. Portreyê çiyan ku dişibe wêneyekî bêhempa, dema binevşên dilê min her mezin dikin gotineke Che tê bîra min. “Mirin ji kû derê tê bila bê...”

Belê Roja dilê min RÊBERTÎ, dibêjim; dema pêwîstiyên Şerê Gel Ê Şoreşgerî yê 15’ê Hezîranê bi awayekî rast û weke tê xwestin tê pêşwazîkirin, mirin ji kû derê tê bila bê, li ser seran û ser çavan hat. Rêbertî dibêje, “Hin caran pêwîstî dibe şoreşgera/ê herî mezin.”

Berpirsiyariya wijdanî ya peydakirina biwate ya pêdiviyên îro, weke êrîşê li ser mêjiyê min bikin û dibêjim çareserî. Dikevim li ser rêyên çareseriyê ku hêviyê di çileyê zivistanê de weke berfînan şîn dike.

Weke wan rêwiyên ku di nobeda xwe de şahid bûme, weke rêwiyên dereng mayî yên dawî ku ji Samûra biçin Îmraliyê, bi kelecana ji ruhê min diforê leza meşa xwe zêde dikim. Dixwazim ji baskên lê didin ên teyrekê veguherim teyr û bazekî.

**15’ê Hezîrana 2011’an**
**Samûra**

**Hemleyê dest pê kir**

Me vê sibeyê talîmata ku Navenda Parastina Gel piştî hilbijartinan amade kiribû ji cîhazê guhdar kir. Bi kêfxweşiya di dilê min de kom bûye di cih de min pênûs girte destê xwe. Lê mixabin pênûs û defter têrê nake ku ez van hestên xwe yên nayên ziman neqşê dîrokî bikim. Dibêjim, tenê dikare bê jiyankirin ji bo yên bixwazin.

Hemleyê dest pê kir. Weke gerîlayekê, weke jineke Kurd li kûrahiyên Zagrosa Mezopatamya ku landika mirovahiyê ye ji bo azadiyê şerkirin, bawer im fezîleta herî mezin a sed sala bîst û yekemîn e. Ji bo ku hêzê bidim vê fezîletê ez ê bi hemû hêza xwe ve seferber bim. Hezkirina min a bêdawî ya ji bo jiyana bizanebûn dê bibe meşaleya herî mezin ku rêya min ronî bike. Dema em diçin ser cehaletê dê jiyana herî manedar bişkok bide û di pêşerojê de jiyaneke azad bê avakirin.

Ev jidayikbûna mezin ku bûka Kurdistan janên wê dikişîne li ber pêkhatinê ye. Dibêjim pîriktiya vê dayikê kirin wezîfeya herî lezgîn a dîrokê ye. Gelek tiştên rojane hene lê ez ê nenivîsîm. Ji bo vê yekê rexnedana xwe didim û dibêjim bi xatirê te.

**Nuxteya Şehid Qendîl**

**Samûra**

**Çalakiya destpêkê**

Rojnivîsa min; vê gavê li nuxteya me ya Şehîd Cûdî tepeçî me. Ka tê bizanibî li cem min kî heye? Dilar û Ronahî li cem min e, em her sê tepeçî ne. Niha tê bêjî çi karê Dilar li Samûra heye, ma ne ew qadroya Sumbulê bû? Di vê jiyanê de dibe ku her kêliyê her tişt biqewime. Piştî pêşniyar û raporên me yên zêde di pey konferansa 6. a HPG'ê tîm û taximên bitevger ketin dewreyê. Uta û Dilar her çendî bi şiklekî xemgîn û ecz ji Cîlo derketibin jî bi taxima xwe ya bitevger niha li cem me ne. Ji çar jin û neh hevalên xort pêk tê. Dê di navbera Cîlo û Geliyê Zapê de bixebitin. Hemû hevalên pir kêrhatî ne. Piraniya wan ewlekariya hevalê Abbas bûne, bi taybetî hatine perwerdekirin. Ji sedî sed dê xebata me ya bi hev re hebe. Min dixwest di nava yekeyeke wisa ya bitevger de cihê xwe bistînim. Lê rewşa me ya li Samûra jî ne cuda ye û ji ber ku xwediyê awantaj im, ji bo wan jî ji bo me jî serkeftin.

Tîma wan ji Uta, Dilar, Deniz û Axîn pêk tê.

Belê Jina Azad, hevalê Brûsk di asta rêveberiyê de hatiye eyaletê û hate cem me û nîqaşên Konferansê ragihand. Vê gavê jî li cem me ye. Hevala Rojîn Gevda jî hatiyê. Niha li aliyê Dolê ye, dê bê vê derê.

Rojnivîsa min a heja, fîrarek bi pêş ket. Ji ber wê yekê em evqas heval li cem hev in. Û ev îxanetkar teslîmî Çelê bûye. Ev kesê îxanet kirî, di taxima Dalê de di asta tîmê de wezîfedar bû. Ev heft sal in di nav Partiyê de bûye. Niha jî îxanetkarek e. Hem jî di pêvajoyeke wisa de. Niha dê gelek agahiyan bide dijmin, hem jî di pêvajoyek ku fermandarê eyaletê û rêveberiya herêmê li cem me ye de ev rev pêk tê.

Di vê navbera de em çûn çalakiyê. Heval ketin hindurê Çelê. Me bi roketan li asayîşê da. Ez û heval Dijwar û Ronahî di parastinê de bûn. Grûba êrîşê ya fedaî ku ketibû hindurê Çelê ji havalê Dijwar Suruç, Dijwar Riha û Şoreş pêk dihat. Hevalê Zinar û Loqman ji ber ketina dest a mayîna me hinekê bê rol mayîbûn jî li cem qoordîne bûn. Çalakî, bû çalakiya destpêkê ya eyaletê. Me wendahî nedan lê belê me nekarî encamên tê xwestin jî bi dest bixin. Weke destpêkirinekê erênî bû. Ketina Çelê li ser dijmin bandoreke psîkolojîk ava dikir. Me çalakî şopand. Dijmin zûka bersiv neda. Bi hinêke dereng mayînê li derûdora xwe zêde zêde gule reşand. Ji ber ku di nava bajar de ye bi xwe re van awantajan tîne. Piştî çalakiyê her devera li Çelê girtine. Li Hinê operasyon li dar xistine. Mixabin li wê derûdorê ji bo pêşwazîkirinê hêza me tine bû û heya bi nîvro mane û çûne. Min pir dixwest bên cihê em lê bûn. Eger bihatana dê êrîş bihatana li darxistin. Min hinekê jî ev rewş texmîn dikir.

Werhasil me dest pê kir lê ev rastî heye; ev çalakiyên biçûk têrê nakin. Dijmin nagire cidiyetê. Divê çalakiyên berfireh û encamgir ku dijmin bikişînin cidiyetê bên lidarxistin. Bi hêviya pêkhatina van vê mijarê xelas dikim. Dema em ji çalakiyê zivirîn em fêr bûn fîrar pêk hatiye. Şeva em zivirîn Harûn reviyaye.

**Hezîrana 2011’an**

**Em dimeşin**

Vê gavê saet 14:00 ye. Ez jî bi psîkolojiya min ji mêj ve nenivîsandiye bi lezgînî dinivîsîm. Mêş dê me bixwun. Cihê em lê ne daristan e û pirr germ e. Mirov dikeve qrîzê. Doh çêlekên Gundê Girsê hatibûn nuxteya me. Weke ku ji min û Ronahiyê re bêjin ‘rojbaş’ li ber

serê me bûn. Hevala Sorxwîn û Denîz hem kenîn û hem ew qewitandin. Paşê jî hanêkên xwe kirin.

Hevala Dilar qet araziya Geliyê Zapê nêcibandiye. Dibêje “ka Sumbul!” Belê, divê hûn araziya Geliyê Zapê bibînin. Ji ber ku bi gotinê nabe, derbas dibim. Uta dibêje, “Roza ev çi Samûra ye wisa!”

Werhasil gelek tiştên bên nivîsîn hene lê dema me ya daketinê hat, em diçin. Pirsgirêka me ya neteweyî dîsa av e. Ava me dûr e. Em timî di nav liv û tevgerê de ne. Li nuxteyekê herî zêde em heft rojan dimînin.

Em her dimeşin, dimeşin û dimeşin.

**25’ê Hezîrana 2011’an**

**Nuxteya Şehîd Cûdî**

**Min heya bi hucreyên xwe gerîlatî hîs kir**

Pevçûna me ya li Çelê ku di bîst û nehê Hezîranê de dest pê kiribû û heya bi çarê Tîrmehê berdewam kiribû, ji aliyê pêvajoyê ve hemleyeke xurt a taktîkî bû.

Belê Jina Azad a hêja, me di çarçoveya plansaziyeke pir baş çalakiyê de, tevî taxima bitevger, derbeyeke şoqê li hêzên dewletê yên li Çelê da û nîvenîv hema bêje şerê cebhe meşand.

Belê, ez dibêjim bihizirin. Beşeke mezin a artêşa KT’ê li xeta Colemêrg-Çelê ye. Di araziya Samûra de zêde zêde tepe, qereqol, alay, tugay û hwd. heye. Ruxmî hemû amadekarî û derfetên teknîkî yên dijmin yên li vê derê, wêrekî û fedekariya mezin a gerîla, careke din serkeftina bawerî û biryardariyê îsbat kir. Me li Hinê û Sarabenê ku di nava tepeyên dijmin de dimînin, bi roj nêzîkî saet donzde di şeş cihan de li artêşa Çelê da û bi vî şiklî jê meydan xwest.

Li gorî plana berfireh a ku hevalê Brûsk çêkiribû de, ji bo ku di encama pevçûnên şeş rojan de qet wendahî nehatibû dayîn û li gorî ruhê 30’ê Hezîranê encamek hatibû bidestxistin, bûbû sedem ku ji her aliyê ji bo vê çalakiyê peyamên pîrozbahiyê bên. Di pevçûna giran ku li Sarabenê hatiye jiyankirin de ji ber ku guleyan, hevala Sorxwîn û hevalê Hakî şermixandibû, niha hinekê nerehet in. Ev heval hatibûn dorpêçkirin hema bêje ji mirinê xelas bûn. Timî bi dijmin re di temasê

de bûn. Ez bi xwe li Hinê bûm. Hinê li nîvenga Bîlîcanê dimîne. Skorskyan hewl dan leşker daxin. Me destûr neda lê belê dîsa jî daxistin. Û em bi leşkeran ve ketibûn nav hev, me ew xistibûn bin qontrola xwe. Grûba kemînê ketibû Çelê. Piştî ku li her deverê pevçûn dest pê kiribû dijmin şoq bûbû hemû rojê teknîka xwe dabû sekinandin dengê xwe qut kiribû. Dotira rojê encax şiyar bû, zêde zêde teknîk bi kar anî. Li her derê leşker danî. Qobre qet vala nesekinî û tebî em ketibûn rewşa paşve kişînê.

Min, Uta û Dilar, me di heman pevçûnê de cihê xwe girt.

Bi destpêkirina amadekariya çalakiyê min heya bi hucreyên xwe gerîlatiyeke pir bi heybet hîs kir. Ya hatiye jiyankirin pêvajoyeke du hefteyan bû. Ya herî baş jî ew bû ku ji hevalên YJA-Starê yanzde kesan di çalakiyê de cihê xwe digirt.

**9'ê Tîrmeha 2011'an**

**Feraseta Zagros**

Jina Azad a hêja; ev du sal in li Zagros li ser rêya gerîlatî kirinê dimeşim. Rêbertiyê ji beriya salan mantiqa pratîka çors a Zagrosê analîz kiribû û derheqê wê de broşur daye amadekirin û ew feraset hatibû mehkûmkirin. Tiştê di vê materyalê de hatibû ziman di vê civîna me ya ku nêzîkî du heftayan ji beriya vê hatibû lidarxistin de xwe ji nû ve nîşan da. Ji ber ku min di civînê de ew rexne kir, fermandarê taburê hevalê dijwar di civînê de ez kirim hedef û hemû rexneyên min bersivandin, hema bêje xwe weke parêzgerê rêveberiya pê re dixebite nîşan da. Weke rêveberekî gelo hevalê Dijwar yê rapora xwe ya mehane ji bo Komîteya PKK'ê çawa binivîse? Bawer im dê wê wêrekiyê nîşan nede ku di civînê de ew şiyara dibêje, "destpêkê pêk bîne û paşê biaxife" kiriye rojev û rojane kiriye.

Ji wî ye ku ti kes fêm nake, hemû hevalên xort ji terza Dijwar nerehet in lê nawêrin û ji ber wê yekê lîberal nêzîk dibin. Hema bêje bûye mode, dema ku bêqebiliyetbûna wan eşkere dibe rêveberiyên me îstifa dikin. Li cem fermandarên me taktîka dema nû ev e. Belê, ji min û

hevala Sorxwîn ziravê hevalên taximê qutifiye. Di her civînê de li me temaşe dikin ku ka em ê çi tiştî rexne bikin.

Di civîna ku hevalê Reşîd li dar xistiye de bi şiklekî suprîz hevala Sorxwîn bû hedefa duyemîn a hevalê Dijwar T. Ji ber ku hevala Sorxwîn ew rexne kir. Hevalê Dijwar ê fermandarê bolîkê jî psîkolojiya xwe ya dewixî da der. Hevalê Reşîd jî bû şahidê van nêzîkbûnên teng û serasera, rexne û mehkûm kir, ji jiyana xwe mînak da û diyar kir ku kesayetiyên nakevin paradîgmayê li ber serkeftina pêvajoyê dibin asteng. Bal kişand ser pêwîstiya di pêvajoya nû de herî zêde bi rêveberiyê re eleqadarbûnê û ji ber vê yekê civîna ku ji bo rêveberiyê li dar xistiye heya bi nîviya şevê berdewam kir. Ji ber ku ez ê nikaribim hemû hûrguliyên bûyerê binivîsîm xemgîn im. Lê demek ku havela Roza û Sorxwîn radîqal bûn. Rexneyên ku min bi awayekî xweser li hevala Sorxwîn kirine sûdmend bûn. Zimanê ezop ku li wê derê bi kar dianî li vê derê bi kar neanî. Û vê ez pir kêfxweş kirim. Hevalê Dijwar ku li beramberê min bê çareserî maye, got “heval pir rexne dike, tîne ziman lê bila di pratîkê de jî heman performansê nîşan bide” û hewl da bi vê helwesta xwe min bêdeng bike. Û dema asta min a pratîzekirinê ji aliyê her kesî ve tê zanîn, hewldanên ku asta dahûrandinê weke demogojî nîşan didin û desteka hin hevalên jin ji bo vê hewldanê li ser min bandor kir.

Ez ê vê bêjim şoreşa me ji aliyê Rêberekî ku îxanet li xeyalên xwe yên zarokatî nake ve tê mezinkirin: “Têkoşînên azadiyê, tevgerên şoreşgerî, bi mirovên îdealîst mezin dibe. Di seranserê dîrokê de jî her tim wisa bûye.”

Navê dozê têkoşîn e. Dema ez bi vê têkoşînê bextewar dibim, ji ber ku hevaleke min a jin dikeve nav van xefikan dema ev bûyer tên jiyankirin, bûn yekane tiştê ku ez pê êşiyame. Ya din jî hevalek ku ez qîmet didimê û wisa lê mêze dikim ew keseke zîrek e dikeve bin bandorê. Tiştekî çiqas bixemgînî... Eger wezîfeya me ya hemûyan yek tişt bûya dihate gotin ku “ev xebateke yekeyê ye.” Wê demê ji bo ku pêşengî bikin fermandar nedihatin erkdarkîn. Û civînên taybet ên rêveberiyê nedibûn. Helbet asta berpirsiyariyê ya fermandarekê/î û ya şervanekê/î cuda ye. Divê ti kes weke heman tişt be negire dest.

**24'ê Tîrmeha 2011'an**
**Samûra**

**Xweserî û rêxistinîbûn**

Diçim nav dîroka pênc hezar salî ya weke mirovekê bêeslbûna jinê. Dema vê dikim pir zêde diwestim. Her serdema ku ez tê re derbas dibim hinekê zêdetir rewşa bêrûmetî, xwe înkarkirinê, ji pêwîstiyên hebûnê bê agahîbûn û bêzanebûnê girantir dibe. Zêhniyeta kevneperest ku cilê sîstema nû xistiye ber xwe, rewşa bêaîdiyetê bi soza pêşerojeke lîberal kûr dike. Xwe digihînim serdema bi pranga ku jina di vê demê de heya bi hucreya xwe ya dawiyê vediguhere û tirsê jiyan dike, di nav cilên sîstema kapîtalîst de heya dawî kirêt dibe, bê çareserî dibe. Ez hem pir biçûk be jî nefesekê didim vê rewşa xerab ku cinsa min di hemû van qonaxên dîrokê de pê re rû bi rû maye û soz didim zemîna guherîna vê ava bikim. Paşê dibêjim jin, jinên weke Xwedavendan xweşik, dizanim bê guman hemû mirov wisa ne, dema ji dayik dibin bê guneh in. Ya ku wan diguhere, şikil dide wan, qalibên wan ên zêhniyetê, depoyên wan dadigire îdeolojî ne. Jina Azad, ez ê li ser vê bingehê mijarek ku di nav me de heye û ez objektîf lê mêze nakim nîqaş bikim. Di paradîgma û felseye Rêber Apo de diyardeya mirov faktora esasî ye. Ev diyarde heqîqeteke wisa esnek e ku ji aliyê diyalektîkî ve amade ye di hinava xwe de erênîbûnê jî neyînîbûnê jî bi pêş bixe.

Di rengîniya kûantumê de tercihên şexs bike derdikevin pêş, ti tişt ne çarenûs e û darêzên mutlaq cihê xwe yê di ansîklopediya fîzîka klasîk de di raboriyê de cihê xwe digirin. Wê demê dibêjim şiyara "jinên dikevin bin qalibên êşkenceya pozîtîvîzmê weke mirov paqij in, hemû sûcdar zêhniyeta zilamperest a pênc hezar sal e" di nav refên şoreşê de dişibe avahiyeke bê bingeh, weke amûra bê guneh ya nuxumandina kevneperestiyên xwe yên civakî tê kirin, her tişt di bin navê xweseriyê de tê asêkirin û rêxistinbûn tê lêwazkirin.

Dixwazin gotineke Rêbertiyê bi bîr bînim. Ji bo hevalên min ên jin ên di neguherînê de israr dikin û ber bi paşverûtiyê ve dibezin; "*têkoşîn, cejna yên ku pêwîstiya wan zêde zêde bi pêşketinê heyî ye...*

Belê, dema çiyayên azadiyê hemû derfetan dide kes û hemû deriyên bûne îrade li kesên dixwazin xwe bi pêş bixin vedike, ez nikarim di nav pîvanên xwe yên red-qebûlê de cih bidim propagandayên hestewar ên hevalên min ên jin ên naxwazin xwe ji qalibên ku sîstemê ji bo wan diyar kirine dest berdin. Ev ti car ne têkoşînek ku bi şiklekî bê zanebûn li dijî hevalên min ên jin tê meşandine. Ev têkoşîneke wisa ye, li dijî paşverûtiyê, yên li guherînê bawer nakin divê weke şerê mirin û mayînê bê meşandin. Ji ber ku dîrok efû nake. Mehkemeya heqîqatê, mohra ku nezanîn feqîrtiya herî mezin e li her serdemê daye.

Ez dibêjim temam, sîstema kapîtalîst heya durêyanê hat, rastiya tê dagirkirin jin e. Ew di rastiya sîstemê de, bi eslê xwe zumrudeke bêhempa ye, dilekî herî paqij e JIN. Li pêşiya pêşketina wê barîqatên hatine danîn, tiştê ji ruhê wê yê biesl bi şûn ve maye, di qefesa hatiye girtin bû. Di qeyd û bendan hatiye dayîn de perpitîna ji bo xelasbûnê ye. Jin di hemû van dem û mekanan de Xwedavendeke pir paqij e. Ji ber ku derfet tine ye, qedexe pir in. Mane, girîngî û qîmet dayîn esalet e.

Lê dema li bexçeyê bihuştê yê Roja dilê min, Rêbertiyê di nava refên têkoşînê de derfet heyê hevalên min jin ên ku xwe bi pêş naxe, li ser xeteke çelexarî dibeze, dema dikeve jî di bin navê xweseriyê de xwe rebenokî dike, xwe guneh dike û hewl dide bi vî şiklî bêberpirsiyarbûna xwe rewa bike, ez nikarim mesumane nêzîkî paşverûtiya hevalên xwe yên jin ên wisa bibim, bêjim, ‘dema ji dayik bû, pir paqij bû, hemû sûc ê zêhniyeta zilamperest e” û xwe bixapînim.

Hemû sûc; ê zêhniyeta zor, şidet, tehakum, îqtidar, klîkên tekdestan, hegemonyaya zilamperest e, dizanim lê tu salên dûr û dirêj e pê de ji qedexeyan dûr jiyan dikî. Çawa dibe û tu nikarî hinekê jî azad bibî? Ji ber ku tu berdêl û kedê nadî, eleqadar nabî. Dema hinekê firsendê peyda dikî, heya bi dawiyê xwe jiyan dikî. Hemû potansiyela xwe diherikînî valahiyên sîstema şexsperest. Çiyan qirêj dikî. Bi ked û hewldanên mezin ên Rêbertiyê dileyizî. Di kesayetiya xwe de baweriya ji bo îdeolojiya azadiya jinê kêm dikî. Ev sûc e û ez a ku ji bo milîtanbûnê hewl didim, nikarin vî sûcî weke bê guneh be pêşwazî bikim û bibim qurbana hestewariyê. Dema ez guherîneke çelexwarî datînim pêşiya xwe jidil dixwazim ku hevaleke min a jin şemaqekî dijwar li binê guhê

min bide. Ji ber ku baweriya min bi wê heye û min ji xwe re kiriye rêgez; divê mirov rasteqînî be û ya nabe bixwaze.

Hevalên min ên jin ên birêz, ez ê li maneya li ser çiyan ferzkirina çarenûsperestiyê negerim. Li şûna vê ez ê hêvî bikim tovên bi ava pîroz a kîn û hêrsê şîn bûne li ser erdên hatine kêlandin weke qut û daxlên heqîqatê ku bi ked û rencê xweşik bûne bên hilbirîn.

**24'ê Tîrmeha 2011'an**
**Samûra**

**Li ber kişfa dijmin kişfkirina xwezayê**

Doh ji beriya ku bibe berbang du saet, di tariya weke sîberê de, bi westabûneke pir dijwar, bi xilmaşiya xewa nîvçe mayî, di pala nuxteya me ya arwaz re min ber bi lûtkeyê meşa xwe xweş kir. Li milê min qlêş, dûrbîna min û hwd.

Min xwe gihand lûtkeyê, çar aliyên min heya heya didomin û çavê mirov diwestînin. Heya cihê ku mirov dibîne, cihên dûr di wê astê de şelo dibin û germahiya havînê ya mirov ecz dibe, bi bayê germ dema li ser çavê min dide hemû azman û dinya li ber safîbûna dûrbîneke ku li ber tehteke bi rengê axê û bi mîj û duman têk çûye dibe asteng.

Dema sîberên tarî hêdî hêdî belav dibin bi çavên min re heya nuxteya xwe ya herî dawî hev dibîne, tepeyên dijmin ên sabît bi monotoniya xwe her tim berbangê pêşwazî dikin. Dema saet li şeş û çaryekê dibore, dinya bi tîrêjên tavê digihîje jiyanê, dûrbîne di destê min de jî firsendê peyda dike ku bêhnekê bistîne.

Dema ev karên rûtîn xelas bûn saet li heftê derbas bû, min xwe komî ser hev kir û dest pê kir xwe berdim jêr, dengê balafira kişfê weke aşekî talîmata "di cihê xwe de bisekine" da. Di rêya ku du deqîqeyan dadiketim de rasterast sekinim. Ev dengê aş vê carê bawer im karê wî zêde bû qederekê dirêj berdewam kir.

Piştî ku bîst deqîqe derbas bûn, pezkuviya qralîçeya cihê bilind û lûtkeyan, ji ber tehta lê bû bi şiklekî bêxem derket. Bi awayekî bê fikar û can giran daket ji xwe re geriya. Di navbera me de du metro hebûn. Piştre li ser tehta herî bilind weke hewl bide şaxên xwe li zike azman

bide, bi hemû esaleta xwe ve bi qasî pênc deqîqe bêhna xwe veda. Ji ber ku ez vê dîmenê bigihînim asteke bêmirin wênekêş li cem min nebû, pir heyfa min hat.

Pezkuviya ku bi awayekî bê deng li cihê sekiniye ez ferq nekirime, ji nişka ve bi çavên xwe yên şelo li min mêze kir. Dema westabûna çavên wê, bi westabûna çavên min re hev dîtin me pênc-şeş deqîqeyan li hev mêze kir. Ez bişirîm û pezkuviyê li derûdora xwe temaşe kir. Dîsa bi heman şikle mêzandina xwe ya li min domand. Piştî ku li derûdora xwe turekê fitilî, bi wê bêxemiya xwe. Li pişta tehta ji ber derketibû wenda bû.

Ez hê jî ji cihê xwe nedileqîm ji ber ku dengê aş dûr diket û nêzîk dibû. Di ser re deh deqîqe derbas bûn. Li ser vê rêya ku em her roj hildikiştin û dadiketin hêlîna me nedîtiye ya teyrekê; bi hewldaneke neasayî bi axa ku bi tehtê ve daliqandiye hatiye çêkirin. Ji ber ku teyreke biçgok a bi rengê portaqalî şid li wê hêlîna ecêb dida ez pê hesiyam. Teyrê her lê dida, pişre dixwest bikevê, her hal nedikarî bikevê, heman tişt dîsa dubare dikir. Piştî demekê, her hal pir ecz bûbû bi wî dengê xwe yê weke qiyametê, kir qîr û hewar. Min go eman Xwedavenda min, gelo ewqas deng ji vê balindeya biqasî tiliyekê ye derdikeve? Piştre, teyra me ecz bû go, “cirrr” û firiya çû. Saet û nîvek derbas bûbû, karê aş xelas bûbû. Yan jî elektrîk qut bûbûn. Lingê min tevizîbûn. Gêj bibûm. Rabûm min dest pê kir hêdî hêdî dakevim.

Paşê ez fikirîm balafira kişfê ji bo psîkolojiya me xerab bike difire. Lê min jî vê sibê gelek tiştên berê kişif nekiribû, ji saya balafira kişfê ve kişifkirin. Serenivîseke weke, sûdên aşê kişfê fikirîm.

Dema min xwe berda jêr û hevalan çaya li ser agir kelî bû dirêjî min kirin, min çîroka xwe ya kişfê ji hevalan re got. Niha jî dixwazim bîranînên xwe yên gerîla weke diyarî bidim dîrok û mirovahiya xwe.

**27’ê Tîrmeha 2011’an**
**Samûra**

## Girtina rîskê

Em ê êvare biçin Hinê ku cihê me ye. Grûba me hevala Medya, Ekin, Roza û hevalê Baran, Azad in. Çalakî berfireh e, lê ji bo nivîsandinê dem tine ye. Em nebin şehîdên Hinê baş e. Rîskê cih hene lê rîska herî mezin negirtina rîsk e” ruhê me bi kelecan e, aram dibe. Ez ê B-7’ê rakim. Hêvî dikim skorskyê bînim xarê.

**2011**

**Meşa gerîla**
**Em li hemû dem û mekanan digerin**

Piştî rêwitiya me ya westiyayî, birçî, tî û pir û pêrîşan bi şiklekî têra xwe di nav xwêdanê de mayî di dawiya dawî de me xwe gihand avê. Li araziya ku em nas nakin û ji bo lê bicihbûnê em meşyane, me daristaneke tarî ji xwe re kir hedef, em biçinê. Ma rêwitiya du rojî ya bi rewşeke nediyar ve di cîhana ruhî û hestan a kesan de atmosferên bi çi curî dernaxîne holê? Eczbûn, bi hêrsbûn, ji bo tiştên di jiyanê de ji nişka ve çêbûne yên trajîkomîk bi eczî û bi necisî, bi dengekî ku bi zora xwe, xwe digire û ken...

Hêvî; li ser hebûn û nebûna avê li diyarên mirov nas nake, hêvî û bêhêviya di dilê mirov re weke bayekî derbas dibe!

Zehmetî; hemû laşê ku ji ber westabûneke pir giran jan dide, bi xwêdana xwe ya diherike, zehmetiyên bedena li hemberê tava germ îsyan dike...

Kelecan; kelecana giranbiha ya weke gerîlayeke jin ku nûjeniyê û destpêkan diafirîne û kişf dike. Ji aliyê stêrkan ve dagirtina ezman û dilan, ew kelecana ji ber ku hevalên Geliyê Zapê cara destpêkê ye diçin Berewle û dê bibin xwediyê gavên ku dikevin dîrokê, lêhiya hê gelek hest û hizrên dewlemend ên nayên tarîfkirin...

Li pişta min roketên min, di destê min de B-7 û li pişta min palasqaya min, di lingê min de meqaba min, li serê min kefiyeya leşkerî, li cem min hevalên min ên pir ji wan hez dikim.
Di qada jiyanê ku dilê me ji bo heman utopayê lê dide de bi bîranînên hevbeş bi meşa gerîla em li hemû dem û mekanan digerin.

Ev rêwitiya me ya zehmet, bi dîtina me ya avê û bi çûn û hatina hevalan a gund, bi fêrbûna me ku em ê ji bo pêşwazîkirina pêdivên lojîstîkê çend sirtan qut bikin, karîbû hinekê bikeve rehetiyê. Eger ne ji vê bûya, ji ber ku fermandarê me yê bolîkê bi vî şiklî bê tedbîr gerîla xistibû nav rewşeke nayê zanîn, em hatibûn li ber sînorê ku em weke hevalên grûbê, fermandarê bolikê bi şid şermezar bikin. Jixwe ev

şermezarî jî ne neheq bû. Araziyeke nenas destpêkê bi du sê hevalan tê kişfkirin. Paşê heval tên herêmê. Ev rêbazeke gerîla ye. Yekeya xwe li çiya û baniyan dayîn û hincirandin, ponijandina wan birin ser erzaq û avê ji bo fermandarekî/ê şer ti car nayê qebûlkirin.

Di vê pêvejoyê em Şerê Gel Ê Şorşgerî esas digirin de; di kûraniya çiyan de xwe veşartin esas girtin birînên kûr vedike û ev birîn jî ti car sax nabin. Jixwe dûr dûr çûyîn, xwe gihandin lûtkeya girekî nayê maneya ewlekarî saxlem bûye. Ya din jî li herêmeke wisa ya şer eger tê li ber difna dijmin xwe bi cih bikî qet nabe. Tê bîst û çar saet gerîlatî bikî û dema derdikeve jî derbe lê bidî. Pêvajo ji nivîskarên dîrokê dermanekî wisa dixwaze.

Weke di rastiya gotin hevaleke/î me di kêliya eczbûnê de anîbû ziman, “eger pratîka me wisa bidome dê Kurdistan bibe pênc parçe.”

Niha saet neh in. Ez ê biçim û ji bo xwarina nîvro meqerne çêbikim. Paşê bi îhtimaleke mezin di nobeda xwe de nivîsandinê bidomînim. Hema bêja mêşan ez xwarim. Destê min ê pênûsê digire, dixwure. Dereng maaamm...

...

Saet sisê û deh deqîqe, ez li nobedê me. Min meqerne jî çênekir. Hûn ê bêjin, “gelo ji ber çi?” Hevalan ji gund bacansor anîbûn. Ji ber ku li ber xerabûnê bûn min tirşik û birincek çêkir. Ev xwarinên ku me demeke dirêj e nexwarine bi hevalan tehmxweş tên.

Himmm, belê em bidomînin. Grûba me ya li vê derê ji bo niha ji şeş hevalên xort û du hevalên jin pêk tê. Roza, Zîlan, Dijwar, Loqman, Sîpan, Şiyar, Baran û Bagok. Hevala Rojbîn û Sorxwîn ji bo lidarxistina çalakiya sekvaniyê du roj in ji me qut bûne.

Hevalê me yê Bager jî ji ber ku li Çelê çalakiya sabotajê li dar xistiye hê xwe negihandiye me. Em ê vê êvarê ji bo erzaq anînê û randevûya me daye wî, biçin wezîfeyê. Erka me dûr e û pir biwestin.

Jina Azad a birêz, ji ber ku min nekariya ji bo te binivîsîm xemgîn in. Pirsgirêka demê zêde heye. Di pratîkê de em ne dikarin binivîsîn û ne jî dikarin bixwînin. Ya din jî dema ji aliyê plansazîkirina jiyanê ve pirsgirêka lawazî û zeyifî nîşandanê ya rêveberiyên me li ser zêde dibe, em vala vala enerjî wenda dikin. Paşê jî em dibêjin hevaltiya nebes û

kêm! Lê belê vê rewşê em bi xwe diafirînin. Xeta me ya felsefîk û îdeolojî di pratîkê de dibe ji rêzê.

Weke fêrbûnên me yên ku li sîstema ÎMRALIYÊ dibin.

**10'ê Tebaxa 2011'an**

**Berewle**

**Îrade**

Jinek li çiya çawa jiyan dike, çawa şer dike? Zehmetiyên bûyîna gerîlayeke jin, bi sêrê veşartî ya fêrbûnan tê derbaskirin. Bûyîna gerîla pir zehmet e. Ya din jî bûyîna gerîlayeke jin neasayîbûnê dide pêwîstkirin. Têkiliya Îrade û fêrbûnan weke goşt û neynûkê ye. Îrade girêdayî bi zanebûnê ye. Zanebûn jî fêrbûna ku bi rastiyan re tê çêkirin e.

Keseke/î di mercên asayî de jiyan dike bi şevê bi bataniye, xwe bi lehifê dinixumîne û radize. Lê li çiyê gerîlayek li ber hewaya sar bi kefiye û baraniya xwe radize. Li gel mirovekî di şertên asayî de bê lehîf nikare razê, gerîlayeke/î bi kefiye radize di nuxteya fêrbûnê de digihîjin hev. Sedema ku li ber van xwe radigere, hêviya gihîştina hedefê ye. Cihê îdîa cihê ku îrade xelas dibe.

Di 11'ê Tebaxê de piştî nîvro du gerîlayên bi navê Roza û Zîlan li araziyeke nêzîkî dijmin daketin ser kaniyeke bi daran bi şiklekî xwezayî kamûfle bûbû. Kelakela germa havînê di saetên pêş de cihê xwe ji bayê bi şid tê û barana mêvan ku bi navber dibare ya Tabaxê re berda. Gerîlayên jin ku firsend peyda kiribûn cil û laşê xwe yê ji qirêj û xwêdanê bê hal mayîbû bişon, bêyî ku ewrên di Tebaxê de giran bûne bi cidî bigirin bi lez dest bi şûstina cilên xwe kirin. Ava weke qeşa laşê wan zindîtir kir lê cilên hatine guvaştin ji ber baranê li cihê sivik bin hê girantir bûn. Şenseke çi ne baş!

Hevala Zîlan dibêje; "ji min re qet ne xem e! Şevên ku min bi recifînê derbas kirine pir in, êdî fêr bûme."

Hevala Roza dibêje; "wele di jiyana min a gerîlatî ya du sal de bi piranî serşûstina min û piştî wê ji ber cilên nîv şil bi libendê mana sibeyê diborin. Kengî ez çûme serşûstinê yan baran, yan balafir û yan jî

qobre hatiye, ditirsim mirina min dê dema serşoyê bibe. Ji min re jî qet ne xem e.”

Hevala Zîlan; *“dema mirov qîrêj be psîkolojiya mirov têk diçe. Ne mirov dikare xwerin bixwe û ne jî dikare li ser tiştekî din biponije”.*

Hevala Roza; *“welleh mirov nikare tehm ji jiyanê bike. Ev hevalên xort çawa dikarin xwe bigirin? Firsendan dikin qurbanê cangiraniya xwe. Av jiyan e. Em ji vê qirêja xwe xelas bin, bila bêhna xwêdanê biçe em dest berdin ji heya bi sibeyê recifînê, dixwaze bila kevir bibarin. Ruxmî her tiştî em ê xwe bişon”.*

Hevala Zîlan; *“ev barana Tebaxê dît em hatin serşoyê xwe wisa şor kir bawer im. Min digo, dê veke. Bila, dibe tiştekî cuda. Ev demeke em zuha zuha radizên. Vê carê jî em ê bi cilên ter razên. Dem nema em agir jî bikin. Dibe tarî, em xwe bigihînin çayê baş e”.*

Hevala Roza; *“hevala Zîlan em karê guvaştinê dubare bikin. Nexwe dê şeveke pir cuda be; gurçikên me dê ji me bikevin. Saet tê şeşan. Hevalên xort dê niha dakevin ser avê, em zûka biçin”.*

Du jinên gerîla, cilên xwe yên leşkerî yên ter li laşê xwe yê ter alandin û berê xwe dan jor yanî nuxteya xwe. Dema ku piştî bîst deqîqe gihaştibûn cihê xwe, dikir dinya tarî bibe. Bi lez û bez di çaydanekî biçûk de çay kelandin û hewl dan hinekê hindurê xwe germ bikin.

Hevala Roza; *“hevala Zîlan lîste ne hewce ye. Heya bi sibeyê em xwezayî nobedar in. Bila hevalên xort têra xwe razên”.*

Hevala Zîlan; *“kîsxewên me jî li Samûra man. Xweziya diya min niha ez bidîtama. Niha hevalan têra xwe kenê xwe bime kirine. Dibe ku gotibin, “ev baran şensa wan pîresêran e”.*

Hevala Roza; *“gelo dê bibe sibe? Yek ji şevên dixwazim zû biqede ye ji bo wê yekê. Em ê îşev biqerisin. Sibê jî em nanpêj in. Sibê jî em ê li ber nan bipijin. Yan hero yan mero. Em guh nedinê dibe ku ew jî guh nede me”.* Bi îradeya ku zanebûnê ew diafirand, ji bo armanc û lêgerên xwe, ew şeva ku ji bo wan ne cara destpêkê bû bi hanek û espriyan hêsantir dibû.

Di roja me ya îro de jin di nava qefesekê de tînin nuxteya şikestinê, bi temamî tê nazîkirin. Bi vî şiklî bê îrade tê kirin, fêrî bê hêzbûnê tê kirin.

Jina ku li çiyan bi her tiştî re rû bi rû dimîne, fêrî çareserî afirandinê dibe. Baweriya xwe ya bi xwe qezenc dike, ber bi jiyana bi zanebûn ve dimeşe û şer dike. Her ku şer dike, xweşik dibe, her ku xweşik dibe jiyan manedar dibe. Jiyana manedar dibe, xweza û civakê weke bexçeyê xweşikiyê lê dike.

Li vê bexçeyê çîçekan "Evrim Demir" vedide. Bi îradeya bi hêz ku ji aliyê armanca mezin ve tê afirandin zincîrên paşverûtiyê tên qutkirin. Dema hevala Evrim li ber îradeyê bi rêzdarî bejna xwe xwar dike, rondikeke heyfê ya din dilê min tije xem dike.

Divê mirov fêrî van kirinan nebe, êşkencexaneya ÎMRALI normalîze neyê kirin.

Îradeya min weke enerjiya dema xwe temam kiriye û dixwaze bikeve liv û tevgerê herikbar e...

Û dixwazim her biherikim.

(Hevala Sorxwîn û Rojbîn piştî çar rojan zivirîn. Ne destdayî bûye, nekarîne çalakî li dar bixin. Hevalê Dijwar û Baran jî di heman şevê de çalakiyeke suprîz li dar xistine.)

**13'ê Tebaxa 2011'an**
**Berewle**

**Diçim**

Qe nebêje bi kû derê ve. Diçim wî cihê pir dixwazim, yanî diçim çalakiyê. Vê gavê saet pênc e. Vê êvarê pênc heval bi çekên giran ji bo lêdanê em ê biçin tepeyê tugaya Çelê. Roza ji bo B-7'ê bi kar bîne diçe. Grûba me ji çar hevalên xort û hevaleke jin pêk hatiye. Ez bi xwe neçûme kişfa wê lê heval dibêjin ku hedefeke pir xweş e. Dengê skorskyyê ji xeta kelekê ve zêde dihat.

Em li herêma Tiyarê ne. Li pişta girê Sorabenê yê li hemberê me Çelê û artêşa KT heye. Hêvî dikim em serkeftî bibin. Pir bi kelecan im. Ji bo bikaranîna B-7'ê çûyîn jî kelecaneke cuda dide mirov. Hevala Rojbîn jî vê gavê xwarin çêdike. Hevala Sorxwîn û Zîlan çûn wezîfeyeke du rojan. Dema hatin dê me nebînin, ji ber ku wê demê em derketine.

Ez ê zêde nenivîsîm, hewce ye ez xwe amade bikim. Min xwest bi lez û bez vê kêliyê parve bikim. Ev du hefte dibin hevdîtin nayê pêkanîn. Ez ê bi hêrs û kîna wê ya mezin bimeşim.

**16'ê Tebaxa 2011'an**

**Merhaba Jina Azad**

Dema em hewl didin utopyayên em dixwazin biafirînin niha jî dîroka borî difikirim. Çûm çalakiya ku min li ser rûpela ji beriya vê nivîsandibû. Zivirîm û hem min rê pêş hevalan kir, hem jî bi armanca sekvaniyê çûm heman cihî. Di her du çûna min de jî encam bi serkeftî bû. Min B-7 bi kar anî. Tam li hedefa xwe ket. Roketên min li pey hev û çalak bûn. Bikaranîna B-7'yê ji aliyê hevaleke jin ve li gorî zêhniyetan ne tiştekî asayî ye, hê jî bermahiyên wê nêzîkbûnên bi awayê 'jin nikare bike' derdikevin pêş. Bi taybetî jî çekeke B-7 ku çors û bi rîsk xuya dike, weke ku zehmet be jin bi kar bînin lê tê mêzandin. Di vê çalakiya ku bi vê çekê û di vê dem û cihî de tevlî dibim, divê ez serkeftî bim.

Hem ji aliyê hevalê jin ve hem ji aliyê YJA-Starê ve me li mewziya Samûra weke deskefteke girîng û bi hêz dema xwe dagirt. Gelo ya ku rewşa tê zanîn a dîrokê diguhere, guherînin ku di kêliye de demê dadigirin in? Eger ya ku diyardeyên nû tevlî zêhniyetê dike, di nuxteyên werçerxanê yên dîrokê de derketina ji derveyê qalibên hatiye fêrbûn be, hîs dikim ku em ê karibin di kêliyan de bi derketina derveyê qalibên hatiye fêrbûn, diyardeya îqtidarê ku heya roja me ya îro kom dibe û tê, rewşa jinê ya bi her tiştê xwe ve girêdayîbûnê biguherin.

Di bîst û nehê mehê de her çendî hin nakokiyên ji derveyê her carê bandor kiribin jî, ji bo lidarxistina çalakiyê, ez û çar hevalên jin em çûn cihê tevlî çalakiyê bibûm. Hedef heft sed û pêncî metro dûr bû.

Hevala Sorxwîn ji destpêka pratîkê ve qet nekarîbû çalakiya dixwaze pêk bîne. Dema ev hedef dît kêliyekê ew êşa xwe ji bîr kir. Weke ku pê hanekê xwe bike bişirî û got, "çiqas nêzîk e." Êvarê, saet şeş û çil û sêyan de bi sê guleyên qirnasê me bi sekvaniyê li leşkerên girê Pira Şûtê G. da û piştî kêliyekê bi lez û bez paşvekişîn... Li pêş Roza, li pey

wê Sorxwîn, li pey Sorxwîn Medya û hema li pey wê jî endama çaremîn a grûbê hevala Zîlan bi qasî karîbûn beziyan. Hinekê obûs û hewan avêtin. Weke çûna me ya destpêkê zêde zêde neavêtin. Heta mirov dikare bêje li gorî wê carê qet nehate avêtin jî. Tam li nîvenga cihe ku min cara destpêkê B-7 bi kar anîbû obûsek lê dan. Eger dereng tevgeriyabûma dibe ku şehîd biketama.

Werhasil ev çalakiya me li dar xistibû, çalakiya pratîk a hevala Sorxwîn a yekemîn e. Hevala Medya ji bo çalakiya xweser em li dar bixin li cem rêveberiya xort ketibû pevçûnê. Bi vê çalakiyê digihîşt serbilindiya pêkanîna çalakiya xweser. Dîsa hevala Zîlan paşve kişîna xwe ya yekemîn jiyan kir û Roza jî gihaşt pêşengiyeke serkeftî. Di têkoşîna ji bo xelasiya gelê Kurdistanê de gelek mirovên me yên bi rûmet û bê hempa şehîd ketine. Ev çalakî ji aliyê YJA-Starê ve ji bo van mirovên bi rumet weke çalakiya bersivdayînê û tolstendinê, bi armanca guherîna meşa asayî ya dîrokê û bi zanebûna ku ev rastî guherîn zehmet e, di bîst û nehê Tebaxê de hatiye lidarxistin. Û guherîn bi vî şiklî bi pêşketin.

Bi temamî bû tarî, nabînim. Vê êvarê dê hevalê Brûsk û Rûken bên. Ez vê gavê li quntereyên Samûra guh li muzîkê didim. Heyfa min bi wê ye ku ji mêj ve nanivîsîm lê hêviya min heye paşê kêmasiya xwe temam bikim. Niha dibêjim bi xatirê te.

Şevbaş!

**2'ê Îlona 2011'an**

**Samûra/Nuxteya Şehîd Sîpan**

# HELBESTÊN ROZAYÊ

**Bûma**
Ewrek bûma
Her cara baran dibarî
Min destê xwe bida porê te
Bûbûma stêrkekê
Her şevê dema tu radiza
Min ramûsanek ji hinarikên te bistende
Bûbûma tav
Dema her sibeyê tu hişyar dibûyî
Te karibûya li min mêze bikira
Bûbûma bayekî

Ku her dihat porê te pêl bida
Bûbûma staranekê
Ku her cara te navê min bianiya bîra xwe
Bûbûma heyvekê
Her şev min li wan çavên te yên xweşik mêze bikira

**Xwedavenda Dîrokê**
Ey Xwedavenda dîrokê
Çi ye ev qîr û hawara te?
Ma ti kes te nabihîse?
Ev îsyana te ji bo çi ye?
Ma ti kes bi destê te nagire?
Weke çîçekên payîzê çilmisiyî
Ma kes te nabîne?
Xweşikbûna te dizîne
Tu neçarî koletiyê kirine
Zimanê te kilîd kirine
Tu layiqî mirinê dîtine
Ma ti kes vê nabîne?

**Ji Bo Zarokên Kurdistanê Yên Weke Gulan**
Eger rojekê bi xilmaşiya xewê
Sibeyê zû hişyar bî
Hemû cudabûn bi şer encam dibin
Rêya hemû westabûnan bi kaosê encam dibe
Li van çiyayên yeman hemû derî vedibin
Dibe hêviya ku bi hezaran kes xwe lê digire
Ji bo jiyaneke azad,
Xweser,
Xwediyê zanebûn,
Bi wate
Ji hêviyê re xwe amade dikin

**Qampa Şehîd Bêrîtan/Xakûrkê**

**Ji Îmraliyê Re**
Jê re tê gotin stran
Tê gotin qîr û hawareke bi xof
Deng li asoyan vedide
Jê re tê gotin şer
Têkoşîn,
Serbilindî,
Deryayeke çiyayî
Oqyanûsek bê dawî mezin dibe
Hesretê bi îradeyê dike ji pola
Ji tinebûnê hebûnê diafirîne,
Ji mirinê jiyanê
Jê re tê gotin pêşeroja azad
Û gavên wî dîrokê diguhere
Li Îmraliyê kevokek bask dide
Jê re tê gotin zanebûn, tê gotin teqandina maneyê

**23'ê Adara 2010'an**
**Gelîyê Zapê**
**Mezopotamya Îro Bêzar Bûye**
Xwezaya bi rengên kesk û zêr xemilandiye
Berfa spî vekişiyaye lûtkeyên çiyan weke biskên bi ser cênîkan de berdayî
Dar û devî bişgok dane
Bi hesreta bihareke têr û tije...
Baran radimûse erdê
Teht û lat şîn tên bi têhna tîrêjên rojê
Çav çend dem e li hêviya coş û xuroşa xwezayê ne
Gundên kavil bûyî û şiverêyên hatine jibîrkirin
Weke agirekî kor lê hatiye bi qîr û feryadê, dilê dayikan...
Axx Kurdistan,
Îro Mezopotamya Bêzar bûye

**27'ê Nîsana 2010'an**

**Dalê**
Araziyeke asê û dijwar e
Li diyarên destpêk û dawiya wan tine ye
Girê bi qasî ku çavan biwestîne bilind
Di nîvenga tepeyan de rê
Kendalên kûr amade ne ji bo parçe parçe kirinê
Rêyan kêmîn danîne di dilan de
Axx Dalê, erda bêçare û westiyayî
Deştikên hesretî zarokan
Şînatî hewceyê heywanekî ne
Rebenoka gerdûnê, dinya
Di dilê min de bayekî tirsê yê sivik
Her ku tê dost û hogiran bi bîr dixe
Li zozanên ku tavê bi tîrêjên xwe zer kirine
Hevdîtina bi germahiya bêtevgeriyê
Şervanên heqîqet û wateyê
Ji diyarê dûr, pir dûr ve hatine li ber rehma te
Mêze bike li dijminê bê rehm
Rik girtiye li hemberê te
Kişî ser me dike, hovitiya xwe kişî ser me dike
Zozanên te bêkes mane
Mirov li benda biharê te ne
Bihareke din derbas dibe
Dema mirina kîmyawî xwezaye pûç dike
Û mirin pêk tê...

**Gulana 2010'an**

**Xwedavendên Samûra**
Hawîrdor digirt bêhna barûdê
Her ku ba dihat
Kêfxweşiya Silayê bi xwe re hildigirt

Dema lingê hespên hovitiyê pêlî singa Semar dikir
Xwezaya bi bombeyên li Zîlanê bişgok didan
Dengê kenê paqij olan dida li Valto
Xewnên di malzaroka kedê de
Dostanî di gola xwînê de dihatin avakirin
Mirinê ji bêçarserî mayînê dikire, mizemiz
Ji ber birîna Bêrîtanê...
Dema dil ji bo dostaniya gerdûnî amade dibûn
Dengê Hedar ê ku bûbû qîrekê di dîrokê de cihê xwe stend
Agirê bûye pêt
Di sukra Dilgeş de ye
Teqîna volqanekê û dema bê deng
Û bi bihara hatiye, Adar...
Rê weke Sîpan aram in...
Weke deryayeke bi coş pêl didan
Weke aveke boş ku xwe li tehtan dida
Dilên asê, kamilbûyî
Û xewnên li ser xweşikbûna jiyanê
Hêrsê di mewziyan de mezin dibe
Diketin li ser singa axê
Semedar bi xwînsarî raborî dinuxumand
Û Xwedavendên pêşerojê digihand bêmiriniyê

**16'ê Hezîrana 2010'an**
**Samûra**
**Azadî**
Axx! Azadî,
Tu weke bibaskbûnê yî azadî
Weke guleke bêhn kirinê yî
Weke xweşikbûna gule yî, azadî!
Piştî zehmetiyê yî
Piştî şer û pevçûnê yî
Piştî aştiya di şeran de yî
Gelo maneya jiyanê yî?
Yan jî weke ku Rêbertî dibêje
Gelo armanca gerdûnê yî?

Fedayê te dikim pêşeroja xwe,
Êdî tê wê bikemilînî, ma ne wisa ye azadî!

**Çiya**
Rondikên çend jinên ku bi jana pêşketinê bûn bi ber ba ketin
Çend tovên hatine reşandin şîn hatin di biharê de
Çend ruhên çilmisîne bi sibeyê re zindî bûn
Ji Hawa heya bi Meryemê kîjan şîn û girî li goristanan hatin binaxkirin
Di singa tehtên ku çiyan asêtir dikin
Li ser gul û çîçekên bişkivîne yên çiyan!
Çend dil dê meydan bixwinin ji neheqiyê re
Çend şitil dê berê xwe bidin tavê dema mezin dibin
Dengê kê dê sûrên dîrokê efsûnî bike
Kîjan laş di hindurê xwe de dilên bi qasî azman bi xwedî dikin
Kîjan gerîla dema dikeve li ser erdê dê ber bi azman bilind be...
Û bi heyvê
Û bi stêrkan
Dê kîjan Xwedavend xwe bixemilîne?

**5'ê Cotmeha 2010'an**
**Bêzivê**

**Sir û Raz**
Di her qerebelixê de
Çavên te li min digerin...
Lê bi hezaran hene
Ma sir û razekê aşkere bikim ji te re?
Lê bi hevaltî...
Di nav wê sîtemê de evîn namîne, xelas dibe
Hezkirin pûç dibe
Eşq weke qehpikan lê tê...

**Pênûsê Li Ber Tavaheyvê**
Min dixwest li bin heman azmanî
Bi heman nefesê li cem kesên hez dikim nefes bida û bistenda
Min dixwest li kolanên qerebelix tenêtiyê kêm bikim
Min dixwest li cîhana hatime dinyayê nebim pênaber
Min dixwest li şûna marşên şer
Coşa eşq û evîne mezin bikim
Min dixwest weke keçeke ciwan a bê sînor
Li bajarê bêsînoriyê derbas bikim
Min dixwest bibim stranekê
Ku fezîleta wê li hemû zimanan derbas bûye
Xwe gihandiye mirovahiyeke ku bûye dengê mirovahiyê
Min dixwest pênûsekî
Ku hebûna di oqyanûsê tinebûnê de wenda bûyî karibim bikim hetahetayî

**19'ê Mijdara 2010'an**

**Derya û Çiya**
Tu bi deryayan, em bi çiyan
Tu giraveke di nîvenga deryayan de
Em çiyayên baweriyê yên qedîm
Tu azadiya esaretê
Em esareta azadiyê
Tu pêlên heqîqetê
Em berên maneyê
Tu deryaya aştiyê
Em erdên serbilindiyê
Tu dilopa zanebûnê
Em tehtên xwe ragir

Tu kurê Îştarê
Em keçên Zerdeşt
Tu welatê kevokan
Em diyarê teyrûbazan
Tu heqîqet û tenêtî
Em qerebelix û lêgerîn
Tu di nav deman de peyker
Em di fezayê de delîl
Tu Roja li azman
Em agirê li ser cîhanê
Tu bafirok
Em zarokên dane pey te
Tu rê
Em rêwî
Tu dîlê azad
Em hêrsê serbilind
Tu deryaya bi hezaran sal
Em libên xîza li peravê
Tu hêvî
Em heya ku baweriyê çêbikin
Pêşerojên azad...
Em gerîla û şervan, xemgîn
Tu pêşeng û şerger, bi coş
Tu PKK
Em HPG
Tu yê herî dûr, em yên herî nêzîk
Ji bo yê hetahetayî ye, hezkirineke bê dawî...

**25’ê Mijdara 2010’an**

**Awaza Bilorê**
Serbestî û azadî
Dûrî hemû qaliban, dogmayan
Heman şiklê herikbariya esnek a enerjiyê
Ji bo hemû nefesên tên stendin xwediyê tehemûl

Weke jiyana xwediyê raz ku diçe heya bi kûarkan
Ji bo hemû tenêtiyan hevalek
Weke hebûna xweser a her tiştî
Fezîleta evîn û eşqê ku bi mirov ber bi çav dibe
Ku heqîqeta di cewhera gerdûnê de
Dûr ji hemû îxanetan
Weke hevpeymana civakî ya gerdûnê
Weke ku li ber sîbera darekê
Bayekî bi hêwî
Serçavê mirov bimelîse
Weke dilê zarokekê ku pîr û paqij e
Û nû ji dayik bûye
Di pîrozbahiya maneyê ya evînê de
Ku xwe li derveyê sînoran daye
Li cihê ku zanebûnê ferqa xwe hîs kiriye
Kevokeke azadiyê
Ku ji forîna çirava xwezayê ye
Niha li peravên Îmraliyê ye...

**8'ê Çileya 2011'an**
**Cîlo/Bajarê Apollo**

**Ji Bo Yên Çûne**

Li ser bêndera ruhê min giya şîn tê
Azman dibe ji rengê keskê herî kesk
Dişibe hêlîna balindeyên jiyana me
Yên bask didin û difirin
Bixwazim bigirim jî bêmane ye
Weke xurucîna pîroz a stêrkekê ne
Libekî zerbûyî yê genim
Sembola kedê ye
Dest û lingên me yên bizmargirtî

Di gerava kûr a axê de
Ber bi erdên diqemirin ên Mezopotamyayê ve diçin
Şiverêyên çiyan
Û dilê me...

**Jina Azad**
Cudabûn sêra te ya jiyanê ye
Zehmetî laşê te yê bihêz dibe
Êş û azar dilê te yê dibe ji pola
Bîranîn hefiza te ya saxlem
Janên te kişandine, canekî ciwan ê ji dayik bibe
Dema tebeqeyên kûreya erdê bi hev şadibin dê biderizin
Dê bibe erdhêj xapînokên sexte yên ji çîmentoyê,
Tufanek dê dorpêç bike gerdûnê
Tev bager û bahoz
Dê tenê pejna yek erdhêjê jî neyê
Ji Kleopetrayê dê ber bi Prometeus biherike diyalektîka jiyanê
Dê ji cih û warên Diyonosos bifûre çem
Dema ji Amarê Roj derdikeve,
Li Nîsanê tov şîn tê
Dê Jina Azad... bimêjîne...

**14'ê Cotmeha 2010'an**
**Li Quntereya Cîlo**
Tavaheyvê kelem e
Xwêya li ser birînê, bermahiya eşqê
Û weke kêra li ser canekî ye Tavaheyvê
Yê/a çûyî surgîn e, yê/a maye jî qeçax
Li Zagros tavaheyvê bûkeke şîn û matem girêdaye
Bûka hemû mirovahiyê
Ya heman azmanî
Keçên ciwan ên sertac
Keçên ciwan ên ji te hez dikin li quntereya Cîlo ne

(helbesta ku min ji bo bolîka xweser a Cîlo nivîsandî)

**Bûkên Nazenîn Ên Welatê Min**
Çendî jî xweşik in bûkên welatê min ên nazik
Her yek jê kaniyeke hezkirinê ye
Her yek dewlemendiyeke cuda ye
Her yek weke bi kelecana perperîkekê ye
Ma çawa dê laşê we yê narîn bi barûdê bibe
Gelo dê çawa bê girtin çavên we, bi teqemeniyê
Ji bo pêkanînê
Ku xeyal bibin rastiyên jiyanê
Ji bo berdêla azadiyê ya pêşerojê
Hûn ê bûkaniyeke grî li xwe bialînin
Û xwe bigihînin biharan

**16’ê Kanûna 2010’an**

**Jiyan**
Û destê min vala ma
Min ken di dagirtîbûna dîrokê de wenda kir
Paşê weşiya
Bi pelên zer dibin ên payîzekê ve
Li çîksayiya sotîner a havînê, asê ma xeyalên min
Li ber tariya stêrkek ditemire û xweliya wê xeniqîm
Û
Pekîm goşeyekî herî dûr ê gerdûnê
Li varoşên herî wenda ên bajaran eliqîn, ewirên min

Perdeyeke nijadkujiyê hate kişandin
Û
Baranên derewîn barîn
Li ser hemû erdên min ên demî
Li erdên ku ji ber baranê şil nebûyî, ji ber dêmîbûnê deriz lê ketine
Min dest berda ji bêdengiya xwe ya bêdeng
Ketim nav lêgerînê
Di nav qeliştokên demê yên weke deryayan de
Bi felaketa îxanetê re rû bi rû mam
Li bircên mirovê ku li giyayê bêmirinbûnê digere
Û min fêm kir
Min tije kir destê xwe, li rawesteka dîrokê ya vala maye
Matmayîna min li afirîneriya efsûnî ya kêliyê asê ma
Û min ferq kir,
Dema jiyan tê jiyankirin nayê fêmkirin

**14'ê Çileya 2011'an**

# NIVÎSÊN JI ROZAYÊ RE...

**Ji keça asê ya Semsûrê re,**

**Ji hevala min a şêrîn re!**

Li cihê heqîqet heye ya rast bi ser dikeve. Ji bo biserkeftinê jî divê mirov kedê bide. Tiştekî me di ber re ked nedaye ku bi rehêtî tê bidestxistin li me heram e, ne exlaqî ye. Baweriya min bi vê heye; her kes tiştê heq dike dibîne. Dibe ku pir êş bê kişandin, zehmetiyên cidî bên jiyankirin, bêbawerî, eczî û hêrs jî hebe, lê heqîqet bi ser dikeve. Dibe ku yên ji derve cuda jî bibînin yan jî dîtibin lê eger wijdanê mirov rehet be pir zêde ne girîng e ku kê çi gotiye û kî çawa bûye. Ji bo serkeftinê bawerî, girêdan û kedeke mezin divê. Roza can; hin kes

nankor in, wisa ye ku hin caran dibe pêhnê xwe li keda xwe jî bide. Hewldana me hemûyan ew e, em xwe bigihînin mirov û asta wê milîtaniya Rêbertiya me dixwaze biafirîne.

Di wateya rastîn de hevaltiya jidil û dirust avakirin yan jî peydakirin zehmet e.

Dema em hatin nav vê jiyanê em bi hemû dilê xwe tevlî bûn. Me soz da em bi her awayê bar rabikin. Lê em niha dinêrin tevlîbûneke temam ji bo Rêbertî û rêxistinê nayê çêkirin. Ezezî û takekesî hê li pêş e. Nêzîkbûna kes a şaş ku difikire rêxistinê û hevalên xwe dixapîne, tiştekî bi êş e. Hewldana kuştina cinewirê ku sîstemê ew afirandiye pir kêm e. Ev cinewir her roja derbas bûyî mezin dibe. Wê kelecana dilê me, hezkirina ji hevaltiyê, eşq û evîna jiyanê xelas dike. Dema ku ev cinewir van nahêle û xelas dike, bêwijdanî, bêexlaqî, hesûdî, bêhestbûn dest pê dike. Em hezkirin û hevaltiya rastîn di bin bandora kirêtiyên bi vî awayî de nexeniqînin. Ji bo ku paşê em nebêjin ‘xweziya min wisa nekira’ em baş bibînin.

Hevala min a hêja Roza; em gelek tiştan bi hev re parve dikin. Ji te bendewarî û hêviya min heye, ji hevaltiya te baweriya min heye û nirx didimê jî. Di parvekirina bi te re armanca me ew e em hêzê bidin hev. Lê ev jî heye; bêyî ku şaşitî bikin em fêr nabin. Jiyan bike, lê bila tedbîrên te hebin. Tiştekî gelek baş e ku di pratîka xwe ya destpêkê de tu li herêmeke wisa yî û di nav komeke hevalên wisa de yî. Vê firsendê ji dest xwe bernede. Pir bi mane jiyan bike, naverokê dagire. Paşê bila tiştekî te ku tu jê re bejî ‘xweziya min wisa nekira’ nebe.

Jiyan dema tê jiyankirin xweş e. Ji fikar, tirs û bertekên şexsî dest berde. Bila ev weke dîwar dernekevin li pêşiya te. Bihêle bila vebin, mezin bin, bila gulên te yên bi stirî jî hebin. Eger tu bixwazibî ya herî baş jiyan bikî, divê xwe ji bo êşên mezin jî amade bikî.

Hevala min a xweşik; carinan nakokî derdikevin, dibe ku nêzîkbûnên mirov qebûl neke bi pêş bikevin. Ya girîng bi serxistina ya zehmet e. Li beramberê tiştê mirov qebûl nake têkoşîn meşandin e. Yanî li beramberê şaşitiyan tu jî bi ya şaş nêzîk nebe. Ji aliyê îdeolojîk ve hê jî xwe xurt bike. Weke ku me nîqaş kiriye, hin kes soz didin. Lê vala

diaxivin û pir ji rêzê jiyan dikin. Mirovên girêdayî bi soza xwe ve, cidî, ji sedî sed bi ser dikevin.

Eger tu nêrîna xwe ya maceraperest biguherî baş dibe. Ne maceraperest be lê bibe rasteqînîparêz.

Hevaleke min ku zêde qîmet didimê yî, bi te baweriya min heye.

Bi xatirê te, ji te hez dikim.

**Silav û Rêzên Şoreşgerî**
**20'ê Îlona 2010'an**
**Rozerîn Ararat**

**Bi Kenê Zarokan**

Dema bi şiklekî bêhn lê çikiyayî
Bi hêviyên
Di kenê zarokekê de veşartî
Ber bi pêşerojê ve dimeşî
Dema ber bi pêşerojên dagirtî bi hevî dimeşî
Ber bi pêşerojên dagirtî ji hêviyê...
Bi wêrekiya zarokên
Têhniyên azadiyê ne
Ku bi berên ji bo şer bikin
Xistine destê xwe lê ji destê wan mezintir in
Di kenê zarokan de
Weke rûberekê lê hatin û asêbûn
Bi qetandina kemînên bêbext
Di sir û seqama şevê de
Û di hinava stêrkan de
Bi stranên serkeftinê
Li pişta çiyayên navsera wan bi mij û duman
Li pişta Cûdî,
Mûnzûr,
Û Çiyayên Qafê
Xwe gihandina pêşeroja veşartî

Belê hevala min a şêrîn. Bêyî ku tu wê paqijbûna zaroktiya dilê xwe wenda bikî bimeşe. Bila azadî li ser rêyên tu rêwiya wan î laşê te binuxumîne. Wê demê, tê bibînî çiya bûne weke dayikek ku dest bizmarî û dil bi şewat û tu hemêz kirine. Bes em wê watedar bikin û jiyankirinê bizanin. Vaye wê demê dê azadî biqasî nefesekê nêzîkî te be.

Bi hezkirina dilê xwe te hemêz dikim.

**Berfîn Zozan**
**Îlona 2010'an**

**Merhaba ji te re dost û hogira min!**

Belê tu hogir û dosta min î. Bi vî şiklî xîtabî te dikim. Ji ber ku baweriya min heye min bi te re wêdetirî hevaltiyê têkiliyek ava kiriye. Û dixwazim bi vê baweriyê jiyan bikim. Vê baweriyê jî didim te. Tu jineke serkeftî û biaqil î. Parvekirineke me ya pir mezin bi pêş ket. Me gelek aliyên cuda yên hev du rexne kir. Ez ê bi van jiyan bikim. Ji ber ku ez di têkiliyek ku pêşketinên her du aliyan çêdibin de hevaltî û dostaniyê dibînim. Dema tê gotin 'hevgirtina nakokiyan' timî têkiliya di navbera min û te de tê bîra min. Baweriya min heye em heman hîsan û hin taybetmendiyan hildigirin. Û bi taybetmendiyên te ji te hez dikim. Ev jî xweşikbûnên jinan in. Xwaziya her kesî weke te ev taybetmendî nîşan bida.

Niha dema ji hevcudabûnê ye. Gotineke min ku her dubare dikim heye. Hezkirin û hesreta me ya ji Rêbertiyê me timî li cem hev radigire. Û heya ku em bi van re jiyan dikin em ê bi hev re jiyan bikin. Hîs û hestên me yên şirîk... Di kêliya ku em bi Rêbertiyê ve hev dibînin jî vaye em ê wê demê dest bidin hev li cem Xwedavendan bikevin govenda agir.

Ji ber ku min pir bi lez û bez nivîsand, gelek tiştên min binivîsandana min ji bîr kir. Niha dixwazim vê kêliyê binivîsîm. Grûb dê cuda bin. Hevalan banî kiriye. Her kes komî ser hev dibe. Ez jî hem

ji bo te dinivîsîm û hem jî qaseta te ya dixwazim qeyd bikim, qeyd dikim. Bi ser de jî ya Ahmet Kaya ye. Û em ê di bin barîna berfeke zêde de biçin.

Hevala Roza; di nava vê Partiyê de ji bo te serkeftin û bextewariyên mezin dixwazim. Eger em rojekê li ser bedenên Amedê Rêbertiyê pêşwazî bikin yan jî Rêbertî li Amedê xitabî gel bike, wê demê em ê li her deverê qîr bikin û bêjin; 'vaye jiyan û azadî'.

Heval û hogira min a hêja, baş li xwe, li dilê xwe û çavên xwe yên xweşik binêre. Porê xwe berda, bila dirêj bibe, eger em rojekê xwe bigihînin Xwedavendiyê bila em wisa bigihîjinê. Bi naskirina te pir bextewar im. Em ne bûn ehbab-çawîş û ne jî me têkiliyên teng jiyan kir. Ya me dostaniyek e. Yên ku ev fêm nekirine helbet dê rojekê fêm bikin.

**Heval, hogir û dosta te ya ji te hez dike!**
**Medya Ronahî**
**9'ê Nîsana 2011'an**

(Medya Ronahî bi hevala Roza re li Geliyê Tiyarê şehîd ket)

**Merhaba hevala min!**

Di nava deşt û dîmenên Zagros û Geliyê Zapê de dimenên bi hest û kelecan me bi hev re derbaz kir. Gelek parvekirinên bi wate di nava wan cihên xweş de hate jiyan kirin. Rêheval Roza, em li warê Xwudavendan li hebûna xwe digerin. Bi pîrozbûna rêhevaltiya PKK'ê re em xwe û hevdu ji nû ve ava dikin.

Heval Roza ruxmê nûbûna te jî di kesayetiya te de taybetmendiyên pir bedew û bi hêz heye. Van taybetmendiyên xwe derxistina zanabûyînê pir girîng e. Herdem ji xwe bawer û radîkal be. Her çiqasî zehmetî hebe jî ji rêhevalên xwe yên jin hêzê bigire. Bila çavkaniya hêza te rêhevalên te yên jin be. Ger ku tu zivistanê li gel heval Medya

biminî derfetek pir mezin wê bikeve destê te de. Rêheval Medya mirovek hêja ye û mirov dikare gelek hêz jê bigre.

Heval Roza, bila dilê te her tim weke xwe pak bimîne. Çavreşa Semsûrê; tim xwedî îrade be. Di heman deme de her tiştê xwe bi hevalan re parve bike. Hevala min me gelek rojên xweş bi coş bi hev re derbas kir. Bi rastî jî min pir dixwest em li gel hev bimînin. Hevala Roza, her tim lêgerînvana heqîqeta jiyana rast be. Ji bo vê her tim evîndara vê rastiyê bimîne. Bingehê ku tu van rastiyan di xwe de pêş bêxî heye. Ji bo wê bila demên te qet vala derbas nebe. Bi hêvî be, hêvîdar im ku pêşniyara te were pejirandin. Di zivistanê de derfetên xwe baş binirxîne.

**Helbest**

Helbesta her helbestvanekê
Mîna gelawêjê ye
Mîna dilopeke avê ye
Mîna asîbûna zinarekî ye
Mîna lênûs û pênûsekî ye
Mîna şireşira avê ye
Mîna pepûle ye
Mîna hest, coş û moralê ye
Mîna bawerî ye
Mîna evînê ye
Mîna zarokek di nava dergûşê de ye
Mîna tirêjên rojê ye
Mîna hebûnê ye
Mîna lûtkeya çiyayekî ye
Mîna gotineke bi wateye
Mîna fêmkirinê ye
Û hesta helbestvanekê ye
Mîna dayikê ye
Mîna niştîmanê ye
Û mîna heqîqetê ye
Ango heqîqet bi xwe ye

Bila dilê te her tim bi hesta îlahiyên Zagrosê lê bide.
Bi ramanên Rêber Apo re jiyana xwe domdarî bike.

**Bi xatirê te**
**Serkeftin**
**Sînor Gelawêj**

**Merhaba hevala min Roza, ku ji ewirên wê hêvî difore**

Ez nizanim wan ewirên çavên te yên tije hezkirin jê diforin çawa vebêjim. Ji ber ku li ser hevalekê/î axivîn yan jî ew tarîfkirin zehmet e. Tu jî dizanî, gerîla wêrek û egîd in. Di temenê xwe yê pir ciwan de bi dilekî mezin û bi wêrekî tevlî jiyanê, tevlî hevalan û têkoşînê bûn. Dilê gerîlayan bi hezkirina ji hevaltiyê, bi hesreta wê mezin dibe... Hestên xwe yên kûr ên ji bo hevalên xwe jiyan dike, tenê di hindurê xwe de jiyan dike. Ne dikare bi zimên bêje ne jî bi boyaxa ku ji pênûsan diherike dikare bê vegotin. Ruxmî wê jî hêstên herî xweşik û herî bihêz jiyan dike. Ji ber her ku gerîla şiverêyên zehmet qut dike, dewsên hezkirina ji hevaltiyê dibîne. Û li ser gerîla bandoreke pir mezin dike.

Ma tu dizanî hevala min a hêja, tiştê min bi te re dîtiye û ez dixwazim hê jî wê mezin bikî; hezkirina hevaltiyê ya di wî dilê te yê germ de yê girêdana te ya bi hevaltiyê û nêzîkbûna te ya bi dilnizmî ye. Sekn û ponijîna te ye. Divê tu sekna xwe ya îdeolojîk û rêxistinê hê jî bihêztir bikî. Divê zêde nelezînî û xwîngerm nebî. Biqasî ku tu xwîngerm î divê bibî xwediyê zanebûn.

Di nav HPG'ê de, li qada şer bi sedan hevalên me yên ciwan hene. Tu jî dizanî ji bo me HPG di wê astê de ye; bêyî wê nabe. Ji ber ku em hem hêza parastinê ya Rêbertiyê ne, hem ya gelê me û hem jî hêza parastinê ya hevalên me bi xwe ne. Ji ber vê yekê divê em xwe rêk û pêk bikin, bibin bersiv.

Divê em hê bihêztir bibin bersiva ked, nirx û mîsyona pêşengiyê ku Rêber Apo daye me jinan, timî Rêbertiyê ji Rêbertiyê guhdar bikin, fêm bikin û Rêbertiyê ji Rêbertiyê bixwînin ku em jidil bizanin ku ka em çidikin.

Hevala min a hêja, tu yê van tiştan pêk bînî. Baweriya min heye, tu yê bi vî awayî şiklekê bidî xwe, tîştan fêm bikî û li ser hakim bibî û xwe perwerde bikî, bigihînî wê astê. Ji te bendewariya min ev e.

Hewce dike her gava tu di vê jiyanê de biavêjî ji bo te bibe ezmûnekê. Jiyan ji bo me ezmûnek e.

Li xwe baş mêze bike. Bila serkeftinên mezin ên te bin. Bi hêviya ku em ê her kêliyê û li her deverê bi Rêbertiyê re bin...

Bi hêviya ku em ê di sala 2011'an de Rêber Apo li çiyayên azadiyê hemêz bikin...

Bi xwesteka em ê careke din hev bibînin, serkeftî bimîne...

**Uta Amara û Ronahî Botan**

**4'ê Gulana 2011'an**

**WÊNEYÊN ROZAYÊ**



















